



BİNGÖL
ÜNİVERSİTESİ

K.T.

ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ

ENSTÎTUYA ZİMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANİSTA ZİMAN Û EDEBİYATA KURDÎ

WERGERA EDEBÎ DI KURDÎ DE:

DAHÛRANDINEK LI DOR MODELA WERGERÊ YA CHRISTIANE
NORDÊ

Amadekar

Sami ÇELİKTAŞ

TEZA DOKTORAYÊ

Şêwirmendê Tezê

Prof. Dr. M. Zahir ERTEKÎN

Bîngol-2024



T.C.

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

KÜRTÇE EDEBİYAT ÇEVİRİSİ:

**CHRİSTİANE NORD'UN ÇEVİRİ MODELİ ÇERÇEVESİNDE BİR
ANALİZ**

Hazırlayan

Sami ÇELİKTAŞ

DOKTORA TEZİ

Tez Danışmanı

Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN

Bingöl-2024

NAVEROK

NAVEROK	i
BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ	vii
TEZ ONAY SAYFASI	viii
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ	viii
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE	viii
SPASNAME	ix
KURTE	x
ÖZET	xi
ABSTRACT	xii
KURTEBÊJE	xiii
DESTPÊK	1
A) Mijar	2
B) Armanc û Giringiya Xebatê	3
C) Kurteya Lîteratûrê	4
D) Rêbaz	6
E) Materyal û Sînorê Xebatê	10

BEŞA YEKEM

WERGER Û WERGERNASÎ

1.1. Paşxaneyê Dîrokî ya Wergerê	12
1.2. Biwarê Wergernasiyê	22
1.3. Teoriyên Wergerê	25
1.3.1. Teorî û Ekolên Sereke	28
1.3.1.1. Teoriya Wateyê (Theory of Sense)	29
1.3.1.2. Teoriya Têkiliyê (Relevance Theory)	30
1.3.1.3. Teoriya Polîsîstem (Polysytem Theory)	30

1.3.1.4. Ekola Leipzigê (Leipzig School)	31
1.3.1.5. Ekola Manîpulasyonê (Manipulation School)	32
1.3.2. Teoriyên Fonksiyonel.....	32
1.3.2.1. Teoriya Skoposê (Skopos Theory).....	33
1.3.2.2. Teoriya Çalakiya Wergerandinê (Translational Action Theory) .	35
1.4. Têgih û Stratejiyên Sereke yên Wergerê.....	36
1.4.1. Têgihên Sereke.....	36
1.4.1.1. Hevtayî (Equivalence).....	36
1.4.1.2. Guherîn (Shift)	39
1.4.1.3. Rastbûnî (Accuracy).....	39
1.4.1.4. Herikbarî (Fluency).....	40
1.4.1.5. Wergera Dilsoz (Loyal Translation) û Wergera Serbest (Free Translation)	41
1.4.1.6. Jêder-navendî (Source-oriented) û Armanç-navendî (Target-oriented)	41
1.4.2. Stratejiyên Wergerê.....	42
1.4.2.1. Wergera Rastîne (Literal Translation)	43
1.4.2.2. Deynkirin (Borrowing).....	43
1.4.2.3. Libergirtin (Calque)	43
1.4.2.4. Eşkerekirin (Explicitation).....	43
1.4.2.5. Telafîkirin (Compensation).....	44
1.4.2.6. Modulasyon (Modulation)	44
1.4.2.7. Lêanîn (Adaptation)	44
1.4.2.8. Biyanîkirin (Foreignization) û Kedîkirin (Domestication)	45
1.5. Wergera Edebî.....	45
1.5.1. Wergera Cureyên Edebî	49
1.5.1.1. Wergera Cureyên Pexşanî.....	50
1.5.1.2. Wergera Helbestê.....	52

1.5.1.3. Wergera Şanonameyan	59
------------------------------------	----

BEŞA DUYEM

WERGERA KURDÎ

2.1. Paşxaneyê Dîrokî ya Wergera Kurdî.....	62
2.1.1. Wergerên Kurdî li Tirkiyê.....	68
2.1.2. Nimûneyên Wergeran Li Iraq, Îran û Sûriyeyê.....	73
2.1.3. Nimûneyên Wergeran li Kavkazê	81
2.1.4. Li Ewropayê Wergerên Kurdî.....	83
2.2. Xebat û Lêkolînên Derbarê Wergera Kurdî de	86
2.3. Cihê Wergerê di Edebiyata Kurdî de: Armanç û Fonksiyon	95

BEŞA SÊYEM

MODELA *DAHÛRANDINA TEKSTÊ YA WERGER-NAVEND A* CHRISTIANE NORDÊ Û *DAHÛRANDINA NIMÛNEYÊN WERGERÊN* KURDÎ

3.1. Modela <i>Dahûrandina Tekstê ya Wergere-Navend a</i> Christiane Nordê	105
3.1.1. Wergera Fonksiyonel û Rewşa Ragihanî	106
3.1.2. Fonksiyona Teksta-jêder û Armanca Wergere.....	108
3.1.3. Qonaxên Wergerandinê di <i>Analîza Tekstê ya Wergere-Navend</i> de	109
3.1.4. Hokerên Dahûrandina Teksta-jêder.....	110
3.1.4.1. Hokerên Dermetnî.....	111
3.1.4.1.1. Şander	111
3.1.4.1.2. Niyeta Şander.....	112
3.1.4.1.3. Wergir	113
3.1.4.1.4. Navgîn.....	113
3.1.4.1.5. Cihê Ragihanê.....	114
3.1.4.1.6. Dema Ragihanê	114
3.1.4.1.7. Motîva Ragihanê	115
3.1.4.1.8. Fonksiyona Tekstê	115
3.1.4.2. Hokerên Navmetnî	117
3.1.4.2.1. Mijar.....	118

3.1.4.2.2. Naverok.....	118
3.1.4.2.3. Feraziye.....	119
3.1.4.2.4. Kompozîsyona Tekstê.....	119
3.1.4.2.5. Hêmanên Ne-peyv.....	120
3.1.4.2.6. Peyvsazî	121
3.1.4.2.7. Hevoksazî.....	121
3.1.4.2.8. Taybetiyên Raparçeyî	122
3.1.4.3. Bandora Tekstê ya Wekî Hokareke Wergerê.....	122
3.1.5. Kêşeyên Wergerê	124
3.1.6. Rexneya Wergerê	125
3.1.7. Têkiliya Fonksiyonalîzmê û Wergera Edebî di Modela C. Nordê de	127
3.2. Dahûrandina Nimûneyên Wergerên Kurdî Bi Modela C. Nordê.....	131
3.2.1. Tekst 1.....	134
3.2.1.1. Analîza Hokarên Dermetnî	134
3.2.1.2. Analîza Hokarên Navmetnî.....	136
3.2.1.3. Armanc û Tercîhên Wergêr.....	138
3.2.1.4. Hevtayiya Edebî û Rexneya Wergerê	140
3.2.2. Tekst 2.....	142
3.2.2.1. Analîza Hokarên Dermetnî	143
3.2.2.2. Analîza Hokarên Navmetnî.....	145
3.2.2.3. Armanc û Tercîhên Wergêr.....	146
3.2.2.4. Hevtayiya Edebî û Rexneya Wergerê	147
3.2.3. Tekst 3.....	149
3.2.3.1. Analîza Hokarên Dermetnî	150
3.2.3.2. Analîza Hokarên Navmetnî.....	152
3.2.3.3. Armanc û Tercîhên Wergêr.....	153
3.2.3.4. Hevtayiya Edebî û Rexneya Wergerê	154
3.2.4. Tekst 4.....	157
3.2.4.1. Analîza Hokarên Dermetnî	157

3.2.4.2. Analîza Hokarên Navmetnî.....	160
3.2.4.3. Armanc û Tercîh Wergêr	161
3.2.4.4. Hevtayiya Edebî û Rexneya Wergerê	162
3.2.5. Tekst 5.....	164
3.2.5.1. Analîza Hokarên Dermetnî	165
3.2.5.2. Analîza Hokarên Navmetnî.....	167
3.2.5.3. Armanc û Tercîhên Wergêr.....	168
3.2.5.4. Hevtayiya Edebî û Rexneya Wergerê	169
3.2.6. Tekst 6.....	172
3.2.6.1. Analîza Hokarên Dermetnî	177
3.2.6.2. Analîza Hokarên Navmetnî.....	179
3.2.6.3. Armanc û Tercîhên Wergêr.....	180
3.2.6.4. Hevtayiya Edebî û Rexneya Wergerê	181
3.2.7. Tekst 7.....	185
3.2.7.1. Analîza Hokarên Dermetnî	191
3.2.7.2. Analîza Hokarên Navmetnî.....	194
3.2.7.3. Armanc û Tercîhên Wergêr.....	195
3.2.7.4. Hevtayiya Edebî û Rexneya Wergerê	196
3.2.8. Tekst 8.....	200
3.2.8.1. Analîza Hokarên Dermetnî	205
3.2.8.2. Analîza Hokarên Navmetnî.....	208
3.2.8.3. Armanc û Tercîhên Wergêr.....	209
3.2.8.4. Hevtayiya Edebî û Rexneya Wergerê	210
3.2.9. Tekst 9.....	212
3.2.9.1. Analîza Hokarên Dermetnî	214
3.2.9.2. Analîza Hokarên Navmetnî.....	216
3.2.9.3. Armanc û Tercîhên Wergêr.....	218
3.2.9.4. Hevtayiya Edebî û Rexneya Wergerê	219

ENCAM.....	222
JÊDER.....	228

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Doktora tezi olarak hazırladığım Kürtçe Edebiyat Çevirisi -Christiane Nord'un Çeviri Modeli Çerçevesinde Bir Analiz- adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu beyan ederim.

05/09/2024

Sami ÇELİKTAŞ

TEZ ONAY SAYFASI

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Sami ÇELİKTAŞ tarafından hazırlanan "*Wergera Edebi di Kurdî de: Dahûrandinek li Dor Modela Wergerê ya Christiane Nordê*" başlıklı bu çalışma, 05.09.2024 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda [*oybirliği ile*] başarılı bulunarak jürimiz tarafından Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı'nda Doktora tezi olarak kabul edilmiştir.

TEZ JÜRİSİ ÜYELERİ (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan, Danışman :	Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN	İmza:
Üye :	Doç. Dr. Yakup AYKAÇ	İmza:
Üye :	Doç. Dr. Mehmet YONAT	İmza:
Üye :	Dr. Öğr. Üyesi Ömer DELİKAYA	İmza:
Üye :	Dr. Öğr. Üyesi Songül GÜNDOĞDU YÜCEL	İmza:

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun tarih ve sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Dr. Öğr. Üyesi Abdullah BEDEVA

Enstitü Müdürü

SPASNAME

Piştî pêvajoyeke dirêj a şeş salan ev xebata tezê di axiriyê de bi encam bû. Di vê xebatê de, bi rêya dabînkirina agahî û çavkaniyan tevkarî û alîkariya gelek kesan gihîşt min. Di serî de ez spasiya şewirmendê xwe rêzdar Prof. Dr. Mehmet Zahir Ertekin dikim ku ji bilî pêşniyazên hêja ji bo qedandina tezê bi taybetî ez teşwîq kirim. Her wisa ez spasiya kesayetên hêja yên wekî Dr. Hêmin Omar, Dr. Ömer Delikaya, Dr. Songül Yücel Gündoğdu û Dr. Mehmet Yonat dikim ji bo keda wan a di pêvajoya şopandina tezê de. Alîkarî û teşwîqa dostên hêja yên wekî Doç. Dr. Yakup Aykaç, Doç. Dr. Zafer Açar, Dr. Mehmet Yıldırımçakar û Dr. Ziyattin Yıldırımçakar jî divê ez bi bîr bînim.

Di pêvajoya vê xebatê de, biryardayîna li ser têgihên wergerê yên Kurdî û peydakirin û destnîşankirina nimûneyên destpêkê yên wergera Kurdî karekî dijwar bû. Di amadekirina têgihan de alîkariya Dr. Dilawer Zeraq hêjayî pesndayîne ye. Di tespîta nimûneyên wergeran de, bi taybetî jî yên li herêmên ku derfetên lêkolînê kêm bûn, alîkariya gelek kesayetên hêja gihîşt min, ji bo alîkariya wan ez spasiya Pirîskê Miho, Mirazê Cemal, Mueyed Teyîb, Firat Cewerî, Yeqîn H., Sabîr Ebdullahîzad, Ebdulkerîm Sirûş, Zozan Birko, Ebdo Şêxo, Qadir Egîd, Dr. Perwîn M. O. Elalef, Segvan Taha, Nezîr Ocek, Doç. Dr. Haşim Özdaş, Hanîfî Taştan, Aydın Üneşi, Mustafa Kılıçarslan û Jiyar Homer dikim.

Ez hêvî dikim ku ev xebat di qada wergera Kurdî de bibe kêliyeke lêkolînên heyî, karibe valahiyekê tijî bike û bi kêrî lêkolînên pêşerojê were.

05/09/2024

Sami ÇELİKTAŞ

KURTE

Werger di edebiyata Kurdî de hem wekî hokareke dîrokî hem jî wekî çalakiyeke edebî ya rojane xwedî ciheke giring e. Wergera Kurdî xwedî paşxaneyeke dîrokî ye û di pardemên cihê yên qonaxa edebiyata Kurdî ya nûjen de pêngavên wergerê çê bûne û nimûneyên wergeran di weşangeriya Kurdî de cih girtine. Di gel vê yekê, lêkolînên derbarê wergera Kurdî de û dahûrandina berhemên werger ên li gor teorî, ranêzikî û têgihên wergernasiyê ji hêla hejmarê ve kêmtir in. Di qonaxa îro de pêwîstiyê berbiçav bi xebatên teorîk û pratîk ên lêkdayî hene ji bo diyarkirina rola wergerê û bandora wê ya li ser edebiyata Kurdî. Bi vê pêwîstiya lêkolînê ya navborî, ev xebat li dor modeleke teorîk û bi rêbaza dahûrandina tekstên wergerê ve wergera edebî ya Kurdî ji xwe re dike mijar û armanc dike ku tevkariyê li lêkolînên wergera Kurdî bike.

Di vê çarçoveyê de, xebata me neh tekstên werger li gor modela wergerê ya Christiane Nordê ya bi navê *analîza tekstê ya werger-navend* dinirxîne. Keresteyên vê xebatê tekstên edebî ne ku her yek wekî nimûneyeke cureya edebî hatiye bijartin. Tekstên nimûne ji wergerên edebî pêk tên ku piştî salên 2000an ji Îngilîzî bo Kurmancî hatine wergerandin. Tekstên werger li gor modela wergerê ya C. Nordê hatine dahûrandin û hevtayiya edebî, fonksiyon û armanca wan wergeran hatiye nirxandin. Di xebata xwe de, bi armanca sazkirina çarçove û paşxaneyêke teorîk, me cih da geşedana dîrokî ya wergerê û behsa teorî û têgihên sereke yên wergernasiyê kir. Bi heman awayî, me dîroka wergera Kurdî, nimûneyên destpêkê, lêkolînên derbarê wergera edebî ya Kurdî pêşkêş kirin û armanc û fonksiyona wergerê ya di edebiyata Kurdî de jî şirove kir. Xebata me encamên giştî yên derbarê serpêhatiya wergera Kurdî de û encamên spesîfik ên ku ji dahûrandina tekstan bi dest ketine pêşkêş dike.

Peyvên Sereke: Analîza Tekstê ya Werger-navend, Christiane Nord, Edebiyata Kurdî, Wergera Edebî, Wergera Kurdî

ÖZET

Çeviri, Kürt edebiyatında hem tarihsel bir faktör olarak hem de güncel bir edebiyat edimi olarak önemli bir yere sahiptir. Kürtçe çeviri tarihsel bir arka plana sahip olup modern Kürt edebiyatının çeşitli dönemlerinde çeviriye dönük çabalar olmuş ve çeviri örnekleri Kürt yayıncılığında yer almıştır. Bununla birlikte, Kürtçe çeviri alanındaki araştırmalar ve Kürtçe çevirilerinin çeviribilime özgü teori, yaklaşım ve kavramlarla analizleri sayı olarak azdır. İçinde bulunduğumuz tarihsel süreçte, çevirinin Kürt edebiyatındaki rolü ve etkisini yorumlayabilmek için teorik ve pratik araştırma örneklerine açıkça ihtiyaç duyulmaktadır. Söz konusu bu ihtiyaçtan hareketle, bu çalışma teorik bir model çerçevesinde ve analitik bir yaklaşımla Kürtçe çeviri örneklerini konu edinmiş olup Kürtçe çeviri araştırmalarına katkı sunmayı amaçlamaktadır.

Bu çerçevede, çalışmamız dokuz Kürtçe çeviri metnini Christiane Nord'un çeviri-odaklı metin analizi adlı modeline göre incelemektedir. Çalışmamızın materyalleri her biri birer edebiyat türünü temsil eden edebiyat çevirisi örneklerinden seçilmiştir. Örnek çeviri metinleri 2000li yıllar sonrasında İngilizceden Kurmanci'ye yapılmış çevirilerle sınırlandırılmıştır. Çeviri metinleri C. Nord'un söz konusu çeviri modeline göre analiz edilmiş, metinlerin edebi eşdeğerlikleri ve çevirilerin amaç ve fonksiyonları ele alınmıştır. Çalışmamızda teorik bir çerçeve ve arka plan oluşturmak amacıyla, çevirinin tarihsel gelişimine yer verdik ve başlıca çeviri teorileri ve kavramlarından söz ettik. Aynı şekilde, Kürtçe çevirinin tarihsel geçmişine, ilk çeviri örneklerine, çeviri ile ilgili yapılmış araştırmalar ve kaleme alınmış yazılara değindik ve çevirinin Kürt edebiyatındaki işlevi ve amacını yorumladık. Çalışmamız hem Kürtçe çeviri serüvenine dair ulaşılan genel sonuçları hem de metin analizleri sonucunda elde edilen verileri sunmaktadır.

Anahtar Kelimeler: Christiane Nord, Çeviri-odaklı Metin Analizi, Edebiyat Çevirisi, Kürtçe Çeviri, Kürt Edebiyatı.

ABSTRACT

The role of translation in Kurdish literature is significant, both as a historical factor and as a current literary act. The Kurdish translation has a historical background, with efforts made towards translation in various periods of modern Kurdish literature. Examples of translation have also been documented in Kurdish publishing. Nevertheless, research in the field of Kurdish translation and analyses of Kurdish translations with theories, approaches and concepts specific to translation studies remain scarce. In the historical process we are in, there is a clear requirement for theoretical and practical research examples in order to interpret the role and impact of translation in Kurdish literature. In response to this need, this study focuses on examples of Kurdish translations within the framework of a theoretical model and an applied method, with the aim of making a contribution to the field of Kurdish translation studies.

In this context, our study examines nine Kurdish translated texts according to the model of translation-oriented text analysis proposed by Christiane Nord. The materials selected for analysis were chosen from examples of literary translations, with each example representing a distinct literary genre. The sample of translated texts was limited to those created from English to Kurmanji from the 2000s onwards. The translated texts were subjected to analysis in accordance with C. Nord's translation model. Additionally, the literary equivalence of the texts, along with the purposes and functions of the translations, were subjected to discussion. In order to establish a theoretical framework and context for our study, we have included an overview of the historical development of translation, as well as an examination of the key translation theories and concepts. Similarly, we have provided an account of the historical background of Kurdish translation, an overview of the earliest translation examples, and a discussion of the research and written articles about translation. We have also commented on the function and purpose of translation in Kurdish literature. The present study offers a comprehensive account of the findings pertaining to the Kurdish translation endeavour, accompanied by a detailed exposition of the data yielded from the textual analyses.

Keywords: Christiane Nord, Kurdish Literature, Kurdish Translation, Literary Translation, Translation-oriented Text Analysis.

KURTEBÊJE

Amd.	: Amadekar
BZ	: Berî Zayînê
d.t.	: dirok tune
d.x.	: dîroka xwegihanê
ed.	: edîtor
h.	: hejmar
hwd.	: her wekî din
yd.	: yên din
r.	: rûpel
rr.	: di navbera ... rûpelan de
TA	: teksta armanc
TJ	: teksta jêder
url.	: girêkên înternetê.
wer.	: wergêr

DESTPÊK

Werger hem wekî çalakiyeke zimanî ya nivîskî û hem jî di çarçoveya wergernasiyê de wekî qadeke zanistî ji nêzik ve bi xebatên edebî re têkildar e. Berî ku bibe qadeke serbixwe, wergernasî di nav sînorê lêkolîna zimannasiyê de bû û di edebiyata berawirdî de jî wekî têgiheke giring dihat nixandî. Ji nêveka duyem a sedsala 20an û bi wê de jî wergernasî bi teorî û têgihên xweserê xwe di nav lêkolînên zimanî û edebî de cih girt. Gelek xebatên berawirdî, analîzên metnên edebî û xebatên çandî yên bi wergerê re têkildar derketin holê. Teoriyên wergerê bi pêşekîdayîna taybetiyên cihê yên wekî fonksiyona wergerê û armanca wergerê, bi derxistina pêş a sîstem û binyadê û bi taybetiyên din ên wergerê ji hev cuda bûn. Di nav demê re, ji bo lêkolîna li ser tekstên wergerandî modelên wergerê ketin rojevê û di çarçoveya wan modelan de jî stratejiyên wergerandinê hatin pêşkêşkirin.

Werger di nav xebatên Kurdolojiyê de wekî parçeyeke edebiyata Kurdî cih digire û di ser berhemên wergerê re bi qadên din ên zanistî û lêkolînê re têkildar dibe. Nimûneyên wergerên Kurdî berî serdema modern de jî xuya dibin, lê bi taybetî di sedsalên 19 û 20an de piştî ku derfetên zimanê Kurdî yên nivîskî bi her awayî zêdetir dibin, wergera Kurdî jî bi pêş de diçe. Şopa wergerên edebî yên bi Kurdîya Kurmancî li gor belgeyên berdest di serdema klasîk a edebiya Kurdî de xuya dike. Nimûneyên wergerên berhemên dînî û hin berhemên edebî û kulturî di sedsala 19an de tînin. Di sedsala 20an de li herêmên cuda û bi dîyalektên Kurdî em rastî zêdetir nimûneyên wergerên edebî tînin ku di nav wan de berhemên bi zimanê Îngilîzî jî cih digirin.

Wergerên destpêkê bi taybetiyên xwe yên wergerandinê û bi helwestên wergêran ji pîvanên hemdem ên wergernasiyê cudatir in. Pêwîst e ku ew wergerên navborî jî wekî nixên zimanî, edebî û çandî divê bi nêzîkbûneke li gor rastiya wan a serdemî bînin lêkolandin. Di Kurdiya Kurmancî de bi awayekî bêtir rêkûpêk û pisporane, rasterast ji zimanê jêder û bi danûstandinên navbera wergêran, wergerên edebî piştî salên 2000an tînin kirin. Wekî wergerên tekstên tam ew berhemên ku piştî salên 2000an hatine çêkirin ji bo bikaranîna wekî materyalên tekstî ji bo teoriyên wergernasiyê guncavtir dixuyin, lewre xebata me, her çî qas

bi giştî qala werger û wergêrên beriyê jî bike, wekî kereste wergerên piştî salên 2000an ji xwe re dike mijar.

Di pêvajoya dîrokî de, di gel astengiyên û nebûna derfetan, berhemên klasîk û modern ên edebî, pirtûkên dînî, pirtûkên dersan û hwd. ber bi zimanê Kurdî hatin wergerandin. Bi rêya wergerên edebî nimûneyên edebiyata cîhanê gihîştin xwînerên Kurd û tevkarîya wan berheman ji bo dewlemendbûna edebiyata Kurdî çê bû. Wergerên berhemên dînî, wergerên Qur'anê û pirtûkên têvel di nav pirtûkxaneyên Kurdî ya giştî de cihê xwe girtin. Wergerên berhemên perwerdehiyê jî bûn çavkaniyên esasî ji bo pêşveçûna perwerdehiya bi Kurdî û derfeta gihîştina çavkaniyên zanistî yên bi zimanê xwe yê dayîkê ji Kurdan re çê kir.

Di roja îro de wergera Kurdî ji hêla astengî û derfetan ve dikeve qonaxeke nû. Astengiyên li pêş wergera Kurdî heman astengiyên li pêş zimanê Kurdî ne ku bi statuya zimanê Kurdî re û bi kêşeyên zimanî yên wekî standartbûn û ortografiyê re têkildar in. Ji hêla din ve, kêşeyên xweser ên wergerê, derfetên kêm ên perwerdehiya wergêran, nebûna bi têrê ya çavkaniyên wekî ferheng, ansîklopedî û çavkaniyên din û kêşeyên pişeyî yên karê wergerê jî wekî arîşeyên sereke li holê ne. Di gel wan kêşeyan jî, hewldanên têvel ên wergera Kurdî hokareke giring e ji bo têkildarbûna bi wêjeya cîhanê re, û her wisa ji bo danasîn û pêşveçûna edebiyata Kurdî jî.

Di qada wergera Kurdî de îro pêwîstî bi zêdetir lêkolînên teorîk û pratîkî hene. Pêwîst e ku teoriyên wergerê yên ku seranserê cîhanê derbasdar in, bikevin nav lîteratura Kurdî, kulîyateke Kurdî ya wergerê, bi taybetî jî ya wergera edebî çê bibe û wergerên heyî li dor çarçoveyên teorîk bînin nîrxandin. Bi ranêzikiya pêwîstiyên ku me li jor destnîşan kirin, ev xebat armanc dike ku li dor modeleke teorîk dahûrandina tekstên werger ên Kurdî bike û asta edebîtiyê ya wan wergeran bi lêkdana teorî û pratîkê ve destnîşan bike. Bi vî awayî jî xebata me hem dibê gaweke ji bo lêkolîna derbarê wergerê ya di çarçoveyêke teorîk de, hem jî xebateke sepîner e ku li dor modela Christiane Nordê ya bi navê *analîza tekstê ya werger-navend* nimûneyên tekstên werger analîz û rexne dike.

A) Mijar

Wergerên berhemên edebî yên Îngilîzî yên ku piştî salên 2000an ji bo Kurdî hatine wergerandin mijara vê xebatê ye. Bi tevahî 9 tekst, ku di binbeşa materyalê

de hûrgiliyên wan hatine parvekirin, ji helbest, çîrok, fabl, mesel (parable), cerebe, roman û şanoyê, an jî ji beşên wan pêk tên, di çarçoveya têgih û zanyariyên teorîk ên wergernasiyê de û bi modela *analîza tekstê ya werger-navend* a C. Nord hatine analîzkirin. Di vê xebatê de ji bo ku çarçoveyeke teorîk û lêkolînî ji mijara me ya sereke re çê bibe, me cih da mijarên wekî paşxaneya dîrokî ya wergerê, biwarê wergernasiyê, teorî û têgihên wergernasiyê, wergera edebî û xasyetên wergera cureyên edebî. Her wisa em li ser wergera Kurdî û paşxaneya wê ya dîrokî, mînakên wergerên destpêkê û cihê wergerê ya di edebiyata Kurdî de û xebat û lêkolînên Kurdî yên derbarê wergerê jî rawestiyên.

B) Armanç û Giringiya Xebatê

Di qada wergera Kurdî ya edebî de, pêwîstiyêke berbiçav heye ku divê bê ronîkirin bê ka werger li gor qaydeyên teoriyên kifşe pêk hatine û gelo têkiliya wan a bi têgihên wekî hevtayî, guherîn, rastbûnî, herikbarî û yên din çawa çê bûye. Ji ber kêmasiya lêkolînan, bi têrê nayê zanîn gelo li gor xasyetên cureyên edebî model û teknîkên wergerê hatine bijartin; gelo helwest û stratejiyên wergerê bi awayekî yekgirtî û lihevkerî di tekstên werger de xuya dibin; gelo di wergeran de guncaviya şewazî heta çî radeyê pêk hatiye; gelo li gor taybetiyên tekstên edebî model û stratejiyên wergerê hatine bijartin; gelo di wergeran de ji bo kêşeyên kultur-spesîfîk çareseriyên çawa pêk hatine; gelo di wergerên berhemên Îngilîzî de armanca wergerê û modelên wergerê bi awayekî eşkere xuya dibin; gelo di çalakiya xwe ya wergerandinê de wergêr xwedî helwestên hevpar in, an jî di vî warî de tercîhên takekesî pêk anîne; û herî dawî jî, gelo hevtayîyeke edebî di wergeran de çê bûye.

Di çarçoveya pirsên jor de, armanca xebata me, bi rêya analîz û berawirdkirina tekstên werger û tekstên resen nîrxandina rewşa wergera edebî ya Kurmancî ye. Bi rêya tetbîqkirina modela *analîza tekstê ya werger-navend* û bi perspektîfên rexneyî tê armanckirin ku ji xwînerên Kurdî re hin encam bîna pêşkêşkirin, da ku ew bibînin û binîrxînin bê ka di tekstên wergerandî de heta çî radeyê peyama û niyeta nivîskaran hatine raguhestin. Di heman demê de xebata me armanç dike ku derbarê teorî, model û têgihên wergernasiyê û paşxaneya dîrokî ya wergerê de û derbarê wergera Kurdî de lêkolîneke giştî jî pêşkêş bike. Ev xebat hewl dide destnîşan bike bê ka fonksiyona edebîtiyê di wan wergeran de bi çî awayî pêk hatiye. Bi heman awayî, xebata me hewl dide ku bi rêya analîza wan

berheman rexneyeke wergerê pêşkêş bike û têkiliya edebî bi rêya wergerê şirove bike. Bingeh û fokûsa xebata me tekst in, û bi heman awayî jî nirxandin, rexne û fonksiyona edebîtiyê di dorhêla tekstan de hatiye nirxandin. Berawirdkirina wergêran û nirxandina şiyana wan a takekesî bi tu awayî armanca xebata me nîn e.

Her çî qas di wan bîst salên dawî de hejmara wergerên ku ji zimanên wekî Tirkî, Îngilîzî, Farsî û y.d. zêde bûbe jî, kêmasiyeke berbiçav a rexneyên wergeran û xebatên rexneyî yên zanistî balê dikişînin. Berhemên werger ên ji zimanên cihê ji hêla weşanxane û kovaran ve tîn pêşkêşkirin, û bi vî awayî jî danûstandinên zimanî, edebî û çandî çê dibin û tercîhên xwendinê yên xwînerên Kurdî berfirehtir dibin. Lê belê, tiştê ku pêngava wergerê temam bike, an ku lêkolînên zanistî yên li ser wan xebatan û rexneya teorîk û pratîk, bi tîra xwe nayên pêkanîn. Di encama wê newekheviyê de jî gelek pirsên teorîk û valahiyên hişmendî derbarê rewşa wergera Kurdî de bê bersiv li holê dimînin. Bi armanc û problematîka ku li jor hatiye pêşkêşkirin, ev xebat dikare têkiliya rewşa pratîk a wergerên Kurdî û teoriya wergerê bêtir bide xuyakirin û ji bo nirxandina wan berhemên wergerandî yên heyî perspektîfeke zanistî pêşkêş bike.

C) Kurtiya Lîteratûrê

Di lêkolînên wergerê de, ji ber pêşekiyên cihê yên lêkolîneran, qada lêkolînê ji kontekstên zimanî, edebî û çandî bigire heya dîroka wergerê, kontekstên înterdîsîplîner, medya û qada bazirganiyê berfireh dibe. Lêkolîner li kêleka tercîhên xwe yên tîkildarî qada xebatê, xwe dispêrîn tercîheke teorîk û di xebatên xwe de sûdê ji hin tîgih û stratejiyan jî werdigirin. Ji bo dabînkirina perspektîfeke dîrokî, di beşa yekem de me bi referansên wergernasên wekî Baker (2001), Lebert (2016), House (2018), Windle û Pym (2012), Munday (2001) û yên din behsa serpêhatiya wergerê ya dîrokî kir. Her ku biwarê wergernasiyê sînorê qada wergerê û mijarên lêkolînê diyar dike, me bi referansên Holmes (1988), Shuttleworth (2014), Gottlieb (2005) û yên din ev mijar rave kir. Bi heman awayî, di beşa yekem de me nêrînên bingehîn ên ranêzikî, teorî û êkolên wergerê yên sereke yên wekî Ranêzikiya Sosyolinguîstîk, Ranêzikiya Ragihanî, Ranêzikiya Hermenutîk, Ranêzikiya Lînguîstîk, Teoriya Têkiliyê, Teoriya Wateyê, Teoriya Polîsîstem, Teoriya Skoposê, Ekola Leipzigê, Ekola Manîpulyasyonê bi nêrînên Baker (1990), House (2018), Munday (2001), Seleskovich û Lederer (1993),

Steiner (1998), Catford (1965), Pym (2010), Hermans (2014), Vermeer û Reiss (2014) û yên din ragihandin.

Di lîteratura wergernasiyê de li gel teoriyên sereke, hin têgih û stratejiyên wergerê jî hene ku bi awayekî bûne angaştên sereke yên teoriyên wergerê. Li ser têgih û stratejiyên wergerê yên wekî hevtayî (equivalence), guherîn (shift), rastbûnî, jêder-navendî û armanc-navendî, libergirtin, lêanîn, bîyanîkirin, kedîkirin û hwd. gelek şiroveyên berfireh hene ku me di beşa yekem de bi referansên wergernasên wekî Nida (1964), Koller (2004), Catford (1965), Popoviç (1987), Newmark (1997) û yên din cih da pênaseyên wan. Her ku materyalên vê xebatê tekstên edebî ne, pêwîstiyê berbiçav ji bo zelalkirina taybetiya wergera edebî çê bû û di vê çarçoveyê de me cih da nêrînên kesayetên wekî Toury (1995), Riffaterre (1992), Benjamin (1992), Devy (1999), Landers (2001), Lefevre (1975), Holmes (1970) û yên din ên ku taybetiya wergera edebî û xalên cudaker ên wergera cureyên edebî destnîşan kirine.

Wergera Kurdî, çend nimûyên peregende yên ku di çavkaniyên kevn de derbas dibin ne tê de (Bruinessen: 1985; Yıldırım: 2013), di serdema edebiyata Kurdî ya klasîk de bi wergera mesnewiyên Farsî (Menbari û Farahzad: 2024), bi wergerên Mela Mehmûdê Bazidî (Ehmed: 1997, Dost: 2009; Öztürk: 2018) û Mela Mûsayê Hekarî (Omer: 2022) dest pê dike. Wergerên ku mîsyoneran bi xwe kirine an jî dane wergerandin û di nav koleksiyonên xwe de tomar kirine (Alakom: 1991, Hassanpour: 2005, Malmisanij: 2006, Kurij: 2014, Varol: 2015, Şanlı: 2022), û wergerên berhemên dînî û wergerên Qur'anê (Kırkan: 2020, Özdaş: 2016, Yıldız: 2020, Adak: 2015), wergerên Încilê (Serfiraz: 2014, Sayım: 2024) di dîroka wergera Kurdî de nimûneyên giring in. Seranserê sedsala 20an li bajarên wekî Şam, Silêmaniye, Bexda, Stenbol, Êrîvan û li bajarên Ewropayê yên wekî Parîs û Stokholmê bi rêya kovaran û weşanxaneyan nimûneyên wergeran diyar bûne û ber bi dawiya sedsalê jî ji hêla hejmarê ve zêdetir bûne (Uzun: 1995, Taha: 2006, Öpengin: 2011, Konê Reş: 2013, Ahmed: 2017, Mihemedpûr û Rizayî: 2017, Boyik: 2019, Yıldız: 2020, Avcı: 2021). Di pêşdeçûn û dîtbariya wergerên Kurdî de rola kovarên wekî Hawar, Gelawêj, Hêvî, Nûdem, Jiyana Rewşen, Kovara W, Nûbihar û yên din giring e, her ku di nav wan de kovarên Nûdem Werger, Tabularasa û LEWerger yekser kovarên wergerê ne. Di wan bîst salên dawî de derbarê wergera Kurdî de kêm be jî em rastî lêkolînan (Nebez:

1958/2021, Pîrbal: 2002, Lezgîn: 2005, Öpengin: 2011, Menbari û Farahzad: 2024), tezên zanistî (Taha: 2006, Elalef: 2009, Yıldırımçakar: 2016, Egîd: 2018, Taştan: 2019) û gotar û nivîsên li nav kovar û bultenan tên (Aydoğan: 2001, Duzen: 2005, Zeraq: 2009, S. Aydoğan: 2013, Yıldız: 2020, Açar: 2020, Aykaç: 2022, Kan: 2024) ku behsa rola wergerê, armanca wê û kêşeyên wergerê dikin û kêmbê jî cih didine rexneya wergeran. Di beşa duyem de me cih daye nimûneyên temsîlî yên wergerên Kurdî û lêkolînên vekolerên Kurd ên ku me li jor bi nav kirin.

Modela *analîza tekstê ya werger-navend* a C. Nordê, ya ku me bi berfirehî di beşa 3yem de rave kiriye, yek ji modelên analîzkirin û nirxandina wergerê ye ku di nav ekola fonksiyonel a teorîk de cih digire. Ji bilî modela Nordê, Teoriya Skopos û Teoriya Çalakiya Wergerê du teoriyên sereke yên ekola Fonksiyonel in. Ev her du teoriyên ku me di beşa yekem de bi referansên danerên wan Vermeer û Reiss (2014) û bi şiroveyên Munday (2001) û Pym (2010) rave kirine, pêşekiyê didin armanc û çalakiya wergerê û xwedî helwesteke armanc-navend in. Modela Nordê ji hêla pêşekîdayîna armancê ve nêzikî wan teoriyan dibe, lê belê Nord bi qasî ku xwedî helwesteke armanc-navend e, di heman demê de giringiyê dide ziman û çanda tekstê jêder û hevsengiyekê di navbera helwesta jêder-navend û armanc-navend de çê dike. Bi vî awayî jî, ji her du teoriyên navborî cuda dibe. Nord modela xwe ya navborî di berhema xwe ya sereke de ya bi navê *Text Analysis in Translation. Theory, Methodology, and Didactic Application of a Model for Translation-Oriented Text Analysis* (Analîza Tekstê di Wergerê de. Teorî, Metodolojî û Sepandîneke Hînkê a Modeleke ji bo Dahûrandina Tekstê ya Werger-Navend) (1991) bi berfirehî rave dike. Nord di berhema xwe ya bi navê *Translating as a Purposeful Activity* (Wergerandin Wekî Çalakiyeke Xwedî Armanc) (1997) de jî têkiliya hevtayîya fonksiyonel û edebîtiyê dinirxîne. Me jî di beşa sêyem de bi referansên wan her du berhemên Nordê behsa xalên bingehîn ên vê modelê kirin.

D) Rêbaz

Ev xebat di nav lêkolînên wergerê de dikeve nav çarçoveya xebatên analîza tekstê. Di analîza tekstên werger de lêkolîner tekstê jêder û tekstê armanc bi hin pîvan, sînor û modelên analîzê berawirdî hev dikin. Bi giştî sê cureyên analîza berawirdî derdikevin pêş: Berawirdkirina tekstê jêder û wergera wê ya wekî tekstê

armanc; berawirdkirina wergerên cuda yê heman teksta jêder; û berawirdkirina navbera teksteke werger û teksteke ne-werger ya bi heman cureyê nivîsê. Ev xebat wekî rêbaz berawirdkirina teksta jêder û teksta armanc ji xwe re esas digire û modela C. Nordê wekî referansa teorîk bi kar tîne.

Di modela *analîza tekstê ya werger-navend* de, lêkolîner di analîza xwe de bi rêya analîza hokarên dermetnî û navmetnî têkiliyeke domdar di navbera teksta jêder û teksta armanc de çê dike. Her wekî xudanê modelê Nord bi nav dike, ev modeleke lixweger (looping) e, yanê di navbera teksta jêder û teksta armanc de bi awayekî bazneyî analîzê pêk tîne. Ev model di çarçoveya hokarên dermetnî û navmetnî de teksta wergerê dinirxîne. Di modela Nordê de hokarên dermetnî ji şander (sender), niyeta şander, wergir, navgîn/kanal, cihê ragihanê, dema ragihanê, motîva ragihandinê û fonksiyona tekstê pêk tên. Her wisa di vê modelê de heşt hokarên navmetnî jî hene ku ew jî: mijar, naverok, ferazîye (presupposition), kompozîsyona tekstê, hêmanên ne-peyv, peyv sazî, hevoksazî, û taybetiyên raparçeyî (suprasegmental features) ne. Her çî qas ew hokar wekî dermetn (extratextual) û navmetn (intratextual) hatibin senifandin jî, têkiliyeke hevgerîdayî heye di navbera wan de. Lêkolîna li ser hokarên dermetnî bingehekê dabîn dikin ji bo dahûrandina hokarên navmetnî. Hokarên dermetnî beriya xwendina tekstê tên analîzkirin, da ku rewşa ku tekst tê de hatiye nivîsîn bê diyarkirin. Xwîner dema ku tekstê dixwîne têkiliya rewşa nivîsînê û hokara navmetnî çê dike û bi vî awayî jî bandora tekstê li ser çê dibe. Modela *analîza tekstê ya werger-navend* ji aliyekê ve bala xwe dide ser têgiha tekstualiteyê, ji aliyê din ve jî li ser têgiha fonksiyonê ya di wergerê de disekine. Ev model tekstualîte û fonksiyonê bi awayekî têkildar dinirxîne. Di modela Nordê de têgiha hevtayiyê jî xwedî roleke sereke ye, lê Nord hevtayiyê di asta fonksiyon û bandora tekstê de dinirxîne ku hûrgiliyên vê mijarê di beşa sêyem de hatine pêşkêşkirin. Hemanên çandî û kêşeyên kultur-spesîfik jî xaleke sereke ye ku di modela Nordê de cih girtiye û di analîza xwe ya tekstan de em li ser hûr dibin.

Di vê xebatê de daneyên sereke tekst in û tekst jî bi *ranêzikiyêke şayeser* (descriptive) di çarçoveya tercîhên wergêran de tên nirxandin. Di dahûrandina tekstan de me cih nedaye *ranêzikiyêke qaydeçêker* (prescriptive), an ku helwesta me ya analîzê destnîşankirina wergera baş û rêbaza baş nîn e. Nîvenga xebatê tekst in, an ku lêkolîn li ser daneyên şênber ên wekî tekstên wergeran tê meşandin.

Bi awayekî berawirdî tîkiliya teksta jêder û teksta armanc tê şirovekirin, lê belê armanca berawirdkirinê bi awayekî basîd peydakirina xeletiyên wergerê û wergêr nîn e. Her teksta wergerandî li gor teksta resen û bi xasyetên cureya xwe ya edebî tê berawirdkirin, an ku berawirdkirinek navbera wergêran û şiyânên wan ên wergerê nayê kirin. Bi vî awayî jî, ev xebat ji xebatên ku lêkolînê li ser bandora teksta wergerê ya li ser xwînerên armanc dikin vediqete. Bi heman awayî, ev xebat pêvajoya wergerandinê û şiyana wergêr jî nake navenda lêdikolinê.

Tekstên nimûne di heman demê de ji bo avakirina rexnegiriyeke giştî ya wergera Kurdî hatin şixulandin. Helbet şiroveya tekstan jî pêwîstî bi referansên teorîk û bi pîvanên ji bo nirxandina wergerê dibîne. Modela *analîza tekstê ya werger-navend* hem berawirdkirina teksta jêder û teksta armanc digire nav xwe û hem jî bingeha nirxandina wergerê ava dike. Nirxandina wergeran li gor armanc û prensîbên wergerandinê yê ku li destpêka xebatan hatine kifşekirin (eger hatibe diyarkirin) û bi berawirdkirina teksta jêder û teksta armanc a li gor hokarên rewşa ragihanî hatiye kirin. Di xebata me de, rexneya teksta wergerê ya objektîf bi analîza berawirdî ya teksta jêder û teksta armanc û bi pîvana hevtayiya edebî pêk hatiye. Modela *analîza tekstê ya werger-navend* ji bo nirxandina tekstan a bi awayekî berawirdî, ji bo nişandana tîkiliyên tekstan ên çandî û zimanî, ji bo rexneyeke sîstematîk a wergerê perspektîfeke berfireh dabîn dike. Ji ber van xasyetên wê yê wekî modeleke teorîk û sepîner, ev model ji bo vê xebatê hat bijartin.

Dahûrandina me ya tekstan di 3 qonaxan de pêk tê. Qonaxa 1em analîza wergeran a bi hokarên dermetnî û navmetnî digire nav xwe. Di qonaxa 2yem de em tespîtan li gor armanca wergeran û tercîhên wergêr dikin. Di qonaxa 3yem de em li ser hevtayiyê radiwestin û rexneya wergeran li gor armancê, tercîhên wergêr û pêşekiyên hevtayiyê dikin. Di qonaxa 1em de em analîza tekstan li gor hokarên dermetnî û navmetnê yê modela C. Nordê dikin. Em wan tekstan yek bi yek, bi pêşkêşkirina Îngilîzî û Kurdîya wan, li gor hokarên dermetnî û navmetnî rûberî hev dikin. Ew hokar, li gor guncaviya tekstê ji bo analîzê hatine bikaranîn. Di dahûrandina tekstan de hemû hokar bi hev re cih nagirin, ji ber ku berginda hin hokaran di tekstan de peyda nebûn.

Di qonaxa 2yem de ji bo her tekstê me bala xwe da ser armanca wergerê û tercîhên wergerandinê, da ku em derbarê tekstên werger de tespît û hîpotezan bi

dest bixin. Me armanc û tercîhên wergêr di çarçoveya modela Nordê de, li dor pirsên ku me bi xwe dariştin, wiha nirxandin:

a) gelo armanca wergerê hatiye diyarkirin û werger li gor wê armancê pêk hatiye?

b) gelo teksta jêder û teksta armanc çawa têkildar bûne, dilsozî û girêdana bi teksta resen û asta wergerandina serbest çî ye?

c) gelo şêwaza edebî ya tekstan û şêwaza şexsî ya nivîskaran çî qas hatine parastin û çawa hatine guncandin?

Di qonaxa 3yem de, me tekstên werger li gor hevtayiya edebî dahûrandin. Ev jî qonaxa nirxandin û rexneyê ya xebata me ye. Me hevtayî li gor 4 kategoriyên hevtayiyê, ku Nord (1997: 84-88) destnîşan dike, nirxand. Kategoriyên ku Nord destnîşan dike ev in:

1. Şirovekirin û raguhestina tekstê ya ji hêla wergêr ve
2. Dûratiya çandî û çareserkirina kêşeyên kultur-spesîfîk
3. Fonksîyona tekstê
4. Bandora tekstê

Di nirxandina hevtayiya edebî de, me di çarçoveya pêwîstekên jêr de yên ku Nord (1997: 88-93) rave dike, hevtayiya edebî ya tekstên nimûne şirove kirin:

Pêwîstek 1: (*têkildarî raguhestina/şiroveya tekstê*) Wergêr divê raguhestina/şiroveya xwe ya tekstê bi tenê ne li gor niyeta nivîskar, lê raguhestina/şiroveya xwe li gor şert û mercên çand/teksta armanc jî pêk bîne.

Pêwîstek 2: (*têkildarî fonksîyona tekstê*) Teksta armanc divê bi awayekî wisa bê kompozekirin ku fonksîyona wê ya nû li fonksîyona teksta resen bigunce (lê dibe ku ne heman fonksîyon be).

Pêwîstek 3: (*têkildarî mesafeya çandî*) Divê cîhana tekstê/atmosfera tekstê ya wergerê li gor fonksîyona-tekstê ya tê niyetkirin bê çêkirin.

Pêwîstek 4: (*têkildarî bandora tekstê*) Divê kod û hêman bi awayekî wisa bên tercîhkirin ku bandora teksta werger li gor fonksîyonên armanckirî yên wergerê çê bibe.

E) Materyal û Sînorê Xebatê

Piştî lêkolîneke derbarê wergerên Kurdî de, di çarçoveya armanc û rêbaza xebata xwe de me tekstên edebî yê Îngilîzî û wergerên wan ên Kurdî, yê ku wekî pirtûk ji aliyê weşanxaneyên Kurdî ve hatine çapkirin an jî di kovaran de hatine weşandin, wekî materyal diyar kirin. Di vê çarçoveyê de, wergerên berhemên Îngilîzî yê ku bi Kurmancî li Tirkîyê wekî pirtûk çap bûne an jî di kovaran de hatine weşandin materyalên sereke yê xebata me ne. Her wekî tê zanîn, di lêkolînên zanistî de ji bo pêkanîna hevahengiya materyalan û ji bo sepandîneke hevseng û hevger, sînokirinên li gor dem, cih û pêwendiyên din giring dibin. Li gor nêrîna me, di nav wergerên ku piştî salên 2000an de çap bûne ji hêla formasyona zimanê wergêran, ji hêla xwînerên potansiyel ên wan wergeran, û ji hêla armanc û helwestên wergêran ahengek heye da ku di nav komekê de bibin mijara lêkolînê. Lêkolîna me ya derbarê xebatên wergerê yê Kurdî giraniyê dide xebatên li bakur û li Tirkîyê. Ji ber vê yekê, me berhemên ku li bakur û bi destê wergêrên bakur hatine wergerandin û ji hêla kovar û weşanxaneyên vê herêmê hatine weşandin daxilî nav analîza xwe kirin. Dîsa jî, bi amajepêdana nimûneyên wergeran û bi nirxandina nivîs û gotarên li ser wergerê, me hewl da ku em wêneyeke giştî ya li herêmên din jî bidin xuyakirin.

Li gor lêkolîna me, di cureyên helbest, roman, çîrok, fabl, mesel, şanoname û cerebeya edebî de berhem ji zimanê Îngilîzî bo Kurdî hatine wergerandin. Di çarçoveya pêwîstî û armancên xebata me de, ji bo ku dahûrandîneke temsîlî ya cureyan pêk were, di nav her yek cureya edebî de ya ku ji Îngilîzî bo Kurdî hatiye wergerandin, me biryara dahûrandîna yek tekstê da. Helbest, çîrok, beşên kurt ên ji roman, şanoname û cerebeyê pêk tên keresteyên lêkolînê ne. Bijartina wan tekstan bi şiklê bijartina li gor armancê pêk hat û ji bo her cure û jêr-cureya edebî yek berhem bi bijartina rasthatinî ya di nav wergerên heyî de hat destnîşankirin. Di cureyên sone, fabl û haîkûyan de, li gor sînokdarkirina me ya dem, cih, zarava û herêma berawirdkirinê, derfeta bijartinê ya di nav wergêrên cihê de çê nebû. Wekî nimûne di cureyên sone û şanonemeyan de Kawa Nemir û di haîkû û fablan de Sidîq Gorîcan tenê li pîvanên me yê bijartinê dihatin, lewma jî ew her du wergêr û tekstên wan ên wergerandî du caran bûn mijara me ya lêkolînê. Di encama wan biryar û tercîhên navborî de, me 9 tekst ji berhemên werger diyar kirin. Tekstên ku me ji bo dahûrandinê bijartin ew in:

- Tekst 1 Helbest/Sone: Sonnet 10 – Sone 10, W. Shakespeare, Wer.: Kawa Nemir. Weşanên Lîs, 2010.
- Tekst 2 Helbest: A Late Walk – Meşa Dereng, Robert Frost, Wer.: Rizgar Elegez. *Kovara W.* 2012, h. 41.
- Tekst 3 Helbest/Haiku: Seven Haikus – Heft Haîkû, Jack Kerouac, Wer.: Sidîq Gorîcan. *Kovara Bar Helbest*, 2022, h. 6.
- Tekst 4 Fabl: Lion's Share – Şêr û Parvekirin, Aesop, Wer.: Sidîq Gorîcan. Weşanxaneya Sîtav, 2013.
- Tekst 5 Mesel (Parable): – Zîlamê Dîn, Gibran Khalil Gibran, Wer.: A. Rahman Çelik. *Kovara Tabularasa*, 2012, h. 3.
- Tekst 6 Çîrok: The Gift of Magi – Diyariya Sersalê, O. Henry, Wer.: Sidar Jir. Weşanên Lîs, 2013
- Tekst 7 Roman: Animal Farm – Çewliga Heywanan, George Orwell, Wer.: Salih Agir Qoserî. Weşanên Lîs, 2015.
- Tekst 8 Şanoname: Macbeth, William Shakespeare, Wer.: Kawa Nemir. Weşanxaneya Avesta, 2021.
- Tekst 9 Cerebe: A Room of One's Own – Odeyek Ji Bo Xwe, Virginia Wolf, Wer.: Aynur Kaş. Weşanxaneya Avesta, 2021.

BEŞA YEKEM

WERGER Û WERGERNASÎ

1.1. Paşxaneya Dîrokî ya Wergerê

Dîroka wergerê bi qasî dîroka şaristaniyê qedîm e, lewre çalakiya wergerê bi rasthatina şaristaniyên xwedî çand û zimanên cuda dest pê kiriye. Her wekî Newmark (1988: 7) diyar dike, werger ji roja ku gel û zimanên cihê pêrgî hev bûne dest pê kiriye û heya roja îro bûye navgîneke neqlkirina çandê. Xebatên li ser dîroka wergerê cur bi cur in û xwedî qewareyeke berfireh in. Lêkolînên derbarê dîroka wergerê bi awayekî demkî dîroka wergera neteweyekê yan jî ya parzemînekê digirin nav xwe. Ekolên wergerê, dîroka wergera cureyên nivîskî, dîroka wergerên pirtûkên pîroz an jî wergera berhemên kanonîk jî wekî mijar dikeve nav sînorê xebatên têkildarî dîroka wergerê.

Rûdana Kokela Babilê ne tenê ji bo niqaşên ser dîroka ziman, lê di heman demê de ji bo dîrok û çavkaniya wergerê jî xwedî nirxeke sembolîk e. Yücel (2007: 12-14) balê dikişîne ser wateya peyva Babilê *tevlîhevî*; û dîroka wergerê bi cezayê îlahî ya cihêkirin û tevlihevkirina zimanên mirovan dide destpêkirin. Piştî cihêbûna zimanan, werger bûye navgîneke sembolîk ku mirov bi vê navgîne bikevin pey *zimanê hevpar* ê ku di serdemên qedîm de jê qetiyane. Baker (2001: 21) destnîşan dike ku romantîkên Alman ên wekî J. G. Herder, W. von Humboldt, J. W. von Goethe û post-romantîkên wekî W. Benjamin, M. Heidegger û G. Steiner çîroka Kokela Babilê ya ku di Incîlê de (Genesis 11:1-9) derbas dibe wekî mîta jêderka wergerê rave dikirin. Wan kesan baweriya xwe bi zimanekî tekane yê qedîm dianîn ku piştî bûyera Babilê bi cihêbûna zimanan ve ji holê rabûye. Li gor nêrîna wan kesan, bi rêya wergera mîstîk a tîkûz dibe ku ew ziman ji nû ve peyda bibe û di vê çarçoveyê de jî wergêr wekî *xilasker* dê bibe avakerê yekîtiya zimanî.

Nimûneyên wergerê yên bi zimanê Sumerî û Akadî yên kevn hene ku dîroka wan digihîje sê hezar sal BZê. Ev tekstên dînî yên Babîlonî ne ku di ser wan de bi tîpên biçûk wergêrên wan jî hatine diyarkirin (House, 2018: 11). Keşeyê Budîst ê bi navê Kumārajīva di sedsala 4an de tekstên baweriya Budîzmê yên bi zimanê Sanskrîtî wergerand zimanê Çînî û bi rêya wan wergeran Bûdîzma Çînî geş bû (Lebert: 2016). Dîsa wergerên Gilgamêş ên ji bo zimanên Asyayî nimûneyên kevintirîn ên wergerê ne. Li gor agahiya ku Yazıcı (2005: 32) dide, di gel wan

nimûneyên qedîm ên wergerê jî, Luvius Andronicus (BZ 240), ê ku *Odisea* ji zimanê Grekî bo Latîni wergerandiye, wekî yekem wergêr tê qebûlkin.

Dîroka wergerê ji hêla wergernasan piranî bi referansên ji serdema Romayê ve tê girêdan. Şaristaniya Romayê bi rêya wergerê hewl da ku berhem û zanyariyên aîdî şaristaniya Grekî bike malê xwe û ji bo vê yekê jî ji wan re pêwîst bû ku ew wan berheman wergerînin. Dema Romayîyan dest bi wergera berhemên Grekî kir, armanca wan a sereke bi rêya sûdwegirtina ji berhemên Grekî têkûzkirina zimanê Latîni bû (House, 2018: 11). Friedrich (1992: 12) balê dikişîne ser bandora wergerê ya li ser şaristaniya Romayê û wergeran wekî palpişt nîşan dide bê ka çawa edebiyat û felsefeya Romayî ji modelên Grekî hêz û teşe wergirt. Romayîyan werger bi awayekî ji bo talankirina berhemên edebî û felsefî yên aîdî çanda Grekî bi kar anîn û bi vê talanê jî wan hem çanda xwe û hem jî wêje û estetîka xwe bi pêş ve birin. Ji ber vê armancê jî, ji bo wan giring nebû ku wergerên ku dikin li gor xasyetên zimanî yên berhema resen be, an ku qîma xwe nedidan xasyetên ziman û berhemên jêder.

Bi vê têkiliya ku me bi nêrînên House û Friedrich tilnîşan kir, zimanê latîni bi her awayî bi pêş de çû, gelek kêşeyên têkildarî rêbaza wergerê hatin nirxandin û ya herî giring jî fikrên bingehîn ên derbarê wergerê derketin holê. Wergernas bingeha teorîk a wergerê bi nêrînên zanyarên Romayî yên wekî Cicero, Horatius, Hieronymus datînin û ew niqaşên ku wan dane destpêkirin jî bûn kakilên wergernasiyê. Bi fikrên cuda yên têkildarî jêder-navendî û armanc-navendiyê li roja îro jî heman niqaş berdewam dikin. Helwesta wan pêşengên wergerê yên navborî wekî dijberiyê li hember kevneşopiya wergera *peyv bi peyv* bergeha nêrînên wergerê geş û berfireh kir.

Li gor zanyariyên berdest, Cicero (BZ 106-43) û Horatius (BZ 65-8) yekem kes in ku dijberiya bingehîn a wergerê dane kifşê û ew dijberî jî wekî wergera *peyv bi peyv* (*verbum verbo*) û wergera *wate bi wate* (*sensus senso*) diyar kirine (Windle û Pym, 2012: 21). Cicero di berhema xwe ya bi navê *De Oratore* de kêşeyên wergerandinê nirxandine û têgihên wî yên wekî "ut interpres" wergera sadiq û "ut orator" wergera şirovekirî mohra xwe li dîroka wergerê daye. Wî *ut interpres* ji bo wergera girêdayî teksta jêder û *ut orator* jî ji bo wergera ku ji hêla wergêr li gor şert û mercan hatiye şirovekirin bi kar aniye (Yazıcı, 2005: 35). Cicero di heman demê de li gor cureyên tekstan û fonksiyonên wan tekstan

pîvanên wergerê jî pêşkêş kirine. Ew di wergera tekstên ramanî de û di wergera têgihan de girêdayîbûna bi teksta jêder pêşniyaz dike, lê belê di berhemên edebî de alîgirê wergera serbest e û helwesta wî jî armanc-navend e. Horatius di berhema xwe ya bi navê *Ars Poetica* de gotina "fidus interpres" an ku wergerê dilsoz, bi awayekî neyînî şirove dike û ew jî her wekî Cicero alîgirê wergera wate bi wate ye (Yazıcı, 2005: 36). Diyar e ku helwesta Cicero û ya Horatius, hin nuans ne tê de, bi gelemperî wekî hev e û her du hev û din tamam dikin.

St. Jerome (Hieronymus) (347-420) jî li gor rêgeza *sensum de senso*, an ku wate bi wate, wergera Incîlê bi berawirdkirina Peymana Nû ya Grekî û Peymana Kevn a Îbranîkî çê kiriye. Mebesta St. Jerome ya bi wergera wate bi wate rasterast nayê wateya wergera serbest, berevajî vê, ew berawirdkirina wergerê ya bi çavkaniyan re wekî pîvan digire û bi awayekî jî girêdayê teksta jêder e (Yazıcı, 2005: 36-37). Di serdema Romayê de kakilê wergera serbest di mînakên Quintilian (35-100) de tê dîtin. Quintilian wergerê wekî pêşbazî û meydanxwestina li hember teksta resen dibîne. Armanc ew e ku mirov ji berhema resen derbastir bike û teksteke têkûztir biafirîne. Di vê helwestê de tekste resen çavkaniya îlhamê ye ku bi wê wergêr derbirîneke nû diafirîne (Friedrich, 1992: 13). Di serdema klasîk a edebiyatê de hem li rojava û hem jî rojhilat gelek nimûneyên edebî hene ku beramberî helwesta Quintilian tèn, an ku bi awayekî hem werger in û hem jî afirandinên meydanxwaziyê ne.

Di dîroka wergerê de, li rojhilat bi navê Ekola Bexdayê destpêşxeriyêke giring çê bûye ku rastî serdema Ebbasiyan (750-1250) tê. Vê destpêşxeriyê bi qasî du sedsalan bi piştgiriya xelîfe û rayedarên payebilind ên xelîfetiye û bi alîkariya aborî ya xezîneyê domandiye (Gutas, 2003: 16). Li wê heyamê, wergerên berhemên zanistî û felsefî yên Grekî bo Erebi çê bûne ku zimanê Suryanî jî wekî zimanê navbeynkar hatiye bikaranîn (Munday, 2001: 21). Tevgera wergerê ya ku xelîfe el-Mansûr daye destpêkirin, di serdema xelîfetiya kurê wî el-Mehdî de geştir bûye û di serdema Harun er-Reşîd û Abdullah el-Memûn de jî berdewam kiriye (Gutas, 2003: 38-105). El-Memûn li Bexdayê Beyt-ul Hikme (Mala Aliman) da vekirin ku peywira akademî, mekanê wergerê û pirtûkxaneyê digirt ku tê de ji zimanên wekî Grekî, Suryanî, Sanskrîtî, Farsî berhem dihatin wergerandin (Yazıcı, 2005: 44-45). Li gor zanyariyên ku Baker (2001: 320) dide, di Beyt-ül Hikmeyê de 65 wergêr dixebitîn û ji wan 47 kesî ji zimanê Grekî û Suryanî, 17

kesî ji Farsî, 2 kesî ji Sanskrîtî û 1 kesî jî ji Aramî werger dikirin. Di nav berhemên ku hatine wergerandin de gelek pirtûkên zanistî yê qada çandinî, sîmya, cebîr û astronomiyê û berhemên edebî cih digirin (Gutas, 2003: 185-188). Ev çalakî ji bo dîroka wergerê û çanda cîhanê jî pir giring e. Lewre bi wergera wan, li destpêkê Erebî bi pêş ket û pê re jî bi wergerên ji Erebî bo zimanê Ewropî, welatên Ewropî ji hêla zanistê ve bi pêş de çûn.

Ekola Toledoyê piştî Ekola Bexdayê di dîroka wergerê de xwedî ciheke berbiçav e. Lebert (2016) dide xuyakirin ku di sedsala 12 û 13yan de Ekola Toledo ya Wergerê ji bo zanyarên Ewropî bûbû navenda temasa bi çand û zimanê Erebî re. Di bin sîvana Ekola Toledoyê de gelek berhemên zanistî, felsefî û dînî ji zimanê Erebî bo Latînî bi destê wergêrên Ereb û Cihû ve hatin wergerandin. Wergêrên vê êkolê piranî Cihû, Conversos (Cihûyên bûbûn Xirîstiyen) û Mozarab (Xirîstiyên bin hukmê desthilatiya Îslamî) bûn. Ji bilî wan, alimên Xirîstiyen ên ji Sîcîlyâ û Stenbolê jî di nav de hebûn (Baker, 2001: 552). Li gor Yazıcı (2005: 66) Ekola Toledoyê ji bo dîroka wergerê ji du hêlan ve giring bû: Ya yekê, bi wergera ber bi zimanên netewî yê Ewropayê bandor li ser pêşveçûna wan zimanan pêk anî; û ya duyem jî, niqaşên têkildarî wergera ji zimanê resen û ya ji zimanê navbeynkar ketin rojeva wergerê.

Dijberiya dîrokî ya wergera *peyv bi peyv* û *wate bi wate* di nerîta wergerê ya Ereban de jî xwe dide kifşê (Munday, 2001: 20) û di dawiyê de wergera *wate bi wate* bi ser dikeve û bi giştî tê pejirandin. Baker (2001: 320-321) qala du rêbazên wergerê yê sereke dike ku wergêrên Ereb bi kar dianîn: Rêbaza yekem, ku wergêrên wekî Yuhanna Ibn al-Batriq û Ibn Na'ima al-Himsî pêşengê wê bûn, rêbazeke peyv bi peyv bû û li şûna her peyva Grekî peyveke Erebî bi kar dianî. Li cihê ku peyveke hevta tuneba jî, wê demê peyva resen dihat bikaranîn. Di nav demê de diyar bû ku ev rêbaz kêrhatî nîn e, hingê wergêrên wekî Ibn Ishaq û al-Jawahari rêbaza *wate bi wate* dipejirînin û naveroka berhemên resen li gor qaydeyên zimanî yê zimanê jêder neql dikin.

Di cîhana rojhilat de mijara wergerandina Qur'anê ji bo niqaş û pêşketina wergerê xwedî cihekî giring e. Baker (2001:203) balê dikişîne ser niqaşên dîrokî yê wekî 'gelo tiştêkî caiz e Qur'an wekî gotinên Xwedê bê wergerandin bo zimanekî din?', 'kî dikare û kî divê wergerîne?', 'wergereke çawa û li gor kîjan şert û mercan?' û hwd. Di gel wan niqaş û nelihewkirinan jî wergerên Qur'anê yê

bi gelek zimanan -wergera Farsî di serdema Ebasiyan de, wergera Latîni di 1143yan de, ya Îngilîzî di 1649an de- çê bûn. Baker (2001: 203, 573) li ser şewaza wan wergeran jî agahiyan dide û destnîşan dike ku wergerên Qur'anê ji hêla şewazê ve wekî tekstên paralel in, an ku teksta werger û ya resen li hember hev in. Di wergerên Qur'anê de stratejiyeke jêder-navend heye, lewre divê werger ji hêla form, naverok û şewazê li gor teksta jêder a pîroz be. Di wergerên destpêkê de, her wekî mînaka wergereke Tirkî ya di sedsala 14an de nîşan dide, li ser rêbaza peyv bi peyv bû û bi du şiklî çê dibûn: Ya yekem, wergera înterlîner (interlinear), ku her peyva Tirkî di bin peyva Erebî de dihat nivîsîn; û ya duyem jî rêbaza şerhkirî (annotated) ye ku di vê rêbazê de komeke peyvên Erebî bi rengê sor di rêzeke ser de tîn nivîsandin û wergera heman komê jî li gor rêziman û hevoksaziya zimanê armanc di bin koma şerhkirî de cih digire.

Windle û Pym (2012: 21) destnîşan dikin ku dîroka wergerê ya cîhana Rojava ji nêzik ve girêdayî dîroka dîn û pirtûkên pîroz ên wekî Incîlê ye. Di serdema navîn de niqaşên qada wergerê yê sereke derbarê teksên dînî û kêşeyên wergerandina wan de bûn û ev pêvajoyên di bin sîvana saziyên dînî de û bi destê pispor û bawermendan ev pêvajoyên dimeşiya. St. Jerome (Hieronymus) Incîla Grekî ya bi navê Septuagint (Heftê) wergerand zimanê latîni. Septuagint bi destê 70 wergêrên Cihû ve di sedsala 3yem de li Îskenderiyeyê ji zimanê Îbranî bo Grekî hatibû wergerandin û di dîrokê de wekî yekem wergera Incîlê tê qebûl kirin. St. Jerome bi mebesta wergera xwe ya vê berhema navborî qala rêgezên wergerê jî kirine. Wî nêrînên xwe yê derbarê wergerê wekî tezên zanistî bi ser navê *De optimo genere interpretandi* nivîsandiyê û di nav wan nêrînan de her wekî Friedrich (1992: 12-13) destnîşan dike, emperyalîzma çandî ya Romayîyan di helwesta wan a wergerê de jî aşkere dibe. St. Jerome dibêje ku "Naveroka fikrî di nav berhemê de mîna yekî hepskirî ye û wergêr wekî xilaskerekî, her wekî wî kesê girtî rizgar bike, naveroka fikrî jî bi wergera bi zimanê xwe rizgar dike" (Friedrich, 1992: 13). Her çî qas St. Jerome alîgirê wergera wate bi wate bû jî, diyar e ku wî wergera pirtûka pîroz derveyê rêbaza serbest hişt. Lewre di wan serdeman de rîskek mezin bû ku wergêr pirtûka pîroz şirove bikin û wergerînin.

Martin Luther yek ji pêşengên wergera serbest e di serdema navîn de. Wî Incîl li gor rêgeza wate bi wate wergerand ser zimanê Almanî û ev yek tiştekî nû bû û rastî gelek rexne û tawanbarîyan hat. Di nivîsa xwe ya bi navê "*Ein Sendbrief*

vom Dolmetschen” (Nameyeke Eşkere Derbarê Wergerê) de hem qala nêrînên xwe yê têkildarî wergerê dike û hem jî bersiva tawanbariyên derheqê wergera xwe ya Incilê ya ji bo zimanê Almanî dide (Yücel, 2007: 40). Nêrînên Luther ên derbarê wergera edebî de bûne xîmên hin fikrên nûjen. Li gor Luther wergêr divê xwe nêzikî naveroka berhema ku dê wergerîne bike û bala xwe bide ser rîtm û newaya tekstê da ku bikare heman bandora teksta resen di wergerê de jî pêk bîne (House, 2018: 13). Wergera Îngilîzî ya *Peymana Nû* ya ku William Tyndale wergerandibû bi heman sedemê hat qedexekirin û Tyndale hat îdamkirin. Li gor agahdariyên ku Windle û Pym (2012: 22) didin zanyarê Fransî Etienne Dolet jî wekî Tyndale bi tawanbariya kafiriyê bi rêya şewitandinê hat kuştin û di nav sûcên wî de wergereke wî jî hatibû hesibandin.

Ji sedsala 16an û pê ve di şexsê hin zanyarên Ewropî de fikrên nû li ser niqaşên kevn zêde bûn û wan niqaş û nêrînan bingeha teoriyên wergerê yê nûjen ava kirin. John Dreyden, Etienne Dolet, Alexander Fraser Tytler û Friedrich Schleiermacher her yekî li gor paşxaneyê xwe ya fikrî pênaseyên nû dan wergerê, pêwîstiyên şiyarî yê wergêran destnîşan kirin û bi têgihên nû sînorê fikrî yê wergerê berfireh kirin. J. Dreyden, bi senifandina xwe ya teorîk di dîroka wergerê de ciheke taybet digire. Sê kategoriyên ku Dreyden (1992: 17) kifşe kirine ew in: 1) metafraz (metaphrase); wergera peyv bi peyv û rêz bi rêz. 2) parafraz (paraphrase); di vê rêbazê de peyama nivîskarê resen ji nû ve tê nivîsandin û ev rêbaz beramberî wergera wate bi wate ye. 3) teqlîd (imitation); di vê rêbazê de hem peyv hem jî wate tê guhertin û beramberî wergera serbest û adaptasyonê ye.

E. Dolet (1509-1546) di dîroka wergerê de bi 5 pênc rêgezên xwe yê derbarê wergera baş tê naskirin. Ev rêgez di destnivîsa wî ya bi navê *La manière de bien traduire d'une langue en aultre* /*Şeweya wergerandina baş a ji zimanekî bo zimanekî din-* de cih digirin. Munday (2001: 26) wan agahiyên jêr derbarê tevkarîya Dolet a ji bo pêşveçûna wergerê dide: Li gor Dolet divê wergêr wateya tekstê baş fêm bike, divê wergêr zimanê jêder û zimanê armanc baş bizane, xwe jî wergera peyv bi peyv dûr bigire, formên deredetî bi kar neyne, û divê wergêr peyvan baş li hev bîne. Dîsa Munday (2001: 27) bi me dide zanîn ku her wekî 5 rêgezên Dolet, A. F. Tytler jî çend qaydeyên giştî pêşkêş dike: 1) Werger divê hemû fikrên di nav berhema resen de ragihîne. 2) Şewaza wergerê divê wekî berhema resen be. 3) Werger divê wekî berhema resen xwedî kompozîsyoneke

lihevhatî be. Ji wan nêrînên wan diyar dibe ku hem Dolet û hem jî Tytler xwedî helwesteke qaydeçêker (prescriptive) in û rê û rêbazên pêwîst datînin pêş wergêran.

Teolog û wergêrê Alman F. Schleiermacher bi nivîsa xwe ya *Über die verschiedenen Methoden des Übersetzens – Li ser rêbazên cuda yên wergerê–*tevkariyeke giring kiriye ji bo biwarê wergerê û ji bo wergernasên Alman ên sedsala 20an bûye pêşengekî fikrî. Nêrînên Schleiermacher (1992: 36-54) bi kurtî wiha ne: *Parafraz* û *teqlîd* du rêbazên wergerandinê ne. Di parafrazê de wergêr hewl dide kêşeyên ku ji cudatiya her du zimanan çê dibin bi rêya kêmkirin û lêzêdekirinan çareser bike û wate û qîmeta teksta resen biparêze. Di rêbaza teqlîdê de jî wergêr dizane ku ji ber cudatiya zimanan berhema zimanekê nikare bi zimanekê din ve bê raguhestin, lewre berhemeke wisa diafirîne ku êdî ne wekî berhema resen e û nemimkun e ku heman bandorê jî çê bike. *Parafraz* ji bo berhemên zanistî û teqlîd jî ji bo berhemên hunerî guncav e. Li gor Schleiermacher du cure wergêr hene, yên ku nivîsên ticarî werdigerînin wekî *Dolmetscher* û yên ku nivîsên zanistî û hunerî werdigerînin jî wekî *Übersetzer* bi nav dike. Schleiermacher bi taybetî li ser têkiliya nivîskarê teksta jêder û xwînerê teksta armanc disekine. Li gor wî, wergêr ji bo ku peyama nivîskar bigihîne xwînerê nû, yan divê nivîskar ber bi xwîner ve bibe yan jî xwîner ber bi nivîskar ve bibe, lê divê teqez hewl nede ku ji her du rêbazan yeke nû ya dureh biafirîne.

Niqaşên li ser wergerê heya sedsala 20an bêtir bi têgih û fikrên ji serdema Romayîyan mayî yên wekî wergera peyv bi peyv, wergera azad, dilsozî û serdestî, hevtayî û çawaniya wergerê çê dibûn. Di nav wan nêrînan de niqasha li ser pêkanî û nepêkaniya wergerê li cihekî cuda disekine. Ev nêrîn bi fikrên zimannasê Alman W. von Humboldt cara yekem li dor têgiha naywergerandinê (untranslatibility), an ku nemimkuniya wergerê, ket rojevê û di salên 1950yan de jî ji bo demekê bi alîkariya teoriya "linguistic relativity" a Edward Sapir û Benjamin Lee Whorf di rojevê de ma. House (2018: 59-61) angaşten sereke yên vê nêrînê wiha rave dike: W. von Humboldt xwedî vê nêrînê ye ku mirov jiyanê bi zimanê xwe yê dayîkê dibînin, lewma ji bilî zimanê dayîkê di zimanekî din de nikarin danûstandinê bikin. Ji ber vê çendê jî nemimkun e ku bikarînerên zimanekî peyama ku bingeha vê bi zimanekî din e fêm bikin. Whorf jî xwedî vê nêrînê ye ku di wergerê de ji ber ku teşeya rêzimanî diguhere wateya di hişê

bikarînerên zimanan de jî dê biguhere û werger dê çi carî nebe wekî ya resen. Lê fikra *naywergerandinê* eleqeyek mezin nedît û roja îro jî di niqaşên wergernasiyê de behsa wê zêde derbas nabe.

Nêrînên ku bingeha wan lînguîstîk e di sedsala 19an û bi taybetî jî di destpêka sedsala 20an di qada wergerê de bandordar bûn. Piştî Lînguîstên Romantîk, ji salên 1950yan û pê de fikrên nû yên ber pê lînguîstîk derbarê wergerê şirove kirin. Ji wan ekolan yek jî Ekola Leipzigê ye ku di beşa teoriyên wergerê de em ê qala wê bikin. Dîsa ekoleke din a zimannasiyê ya bi navê Ekola Pragê ya Lînguîstîka Fonksîyonel jî tevkarî li fikrên wergerê kiriye û di paşxaneyê dîrokî ya wergernasiyê de qonaxeke giring temsîl dike. Yek ji pêşengên ekola Pragê Jakobson (1992: [1959] 144-151) wergerê li dor têgihên lînguîstîk pênase dike û wê bi sê şêweyan dabeş dike: 1) wergera nav-zimanî, 2) wergera navber-zimanî û 3) wergera întersemîyotîk (navber-nîşandek). Jakobson bala xwe dide ser niqaşên derbarê têgiha hevtayiyê jî. Ji bo ku hevtayî (equivalence) pêk were wergera nav zimanî serî bi peyvên hemwate dide. Dîsa jî li gor Jakobson (1959: 233) bikaranîna peyvên hemwate gelek caran hevtayî û hevniixîyeke yekser dabîn nake, ji ber ku di navbera peyvên hevwater de jî nuansên wateyî hene.

Di sedsalên 19 û 20an de gelek fikrên nû ketin rojeva wergerê. Wan fikr û nêrînan di hin çarçoveyan de hev û din temam dikirin, lê bi awayekî jî dijberî hev bûn. Di sedsala 19an de piraniya nêrînên derbarê wergerê jêder-navend bûn û pîvanên xwe li gor teksta jêder diyar dikirin. Di vê serdemê de dilsoziya bi teksta jêder çarçoveya etîk a wergerandinê diyar dikir û armanca esasî ya karê wergerandinê avakirina hevtayiyê formel bû. Tiştê ku ji wergêran dihat hêvîkirin ew bû ku peyv, hevoksazî û şêwaza teksta armanc wekî pîvan bigirin û wan hindî ku ji dest hat di zimanê armanc de ji nû ve hilberînin û teksteke hevta derxînin holê. Di sedsala 20an de nêrînên têkildarî hevtayiyê jî guherîn. E. Nida li şûna hevtayiya formel hevtayiya fonksîyonel derxist pêş û bala xwe da ser fonksîyona ragihanê ya wergerê. Li gor Nida (1982: 12-15) di wergerê de tiştê herî pêwîst çêkirina heman bandora teksta jêder a di teksta armanc de bû û lewma jî adaptekirina teksta jêder a li çanda armanc divê armanca sereke be, da ku bandora ku teksta jêder li ser xwînerê xwe çêkiriye bi heman awayî li ser xwînerê teksta wergerandî jî çê bibe. Nida bi hevkarîya C.R. Taber berê niqaşa wergerê zivirand û li şûna peyama teksta jêder giringî da ser şêweya wergirtina xwîner a

peyamê. Helwesta Nida, ya ku fonksiyona tekstê derdixist pêş xasyetên formel, ji bo fikrên pêşerojê bû bingeheke xurt.

Li sedsala 20an werger di çarçoveya zîmanzaniyê û wêjeya berawirdî de dihat niqaşkirin. Berî ku teoriyên xweser ên wergerê di salên 1970yan derkevin holê, nêrînên nû yên derbarê wergerê yan li dor teoriyên zimanî yan jî bi têkildarî hin têgihên sereke yên wekî hevtayîyê diyar bûn. Ew nêrînên nû her çî qas jî aliyê zimannas, wêjewan û çandnasên hevdem bihatana pêşkêşkirin jî, kakilê fikrî li ser xîmê heman pirs û niqaşan bû ku seranserê dîroka wergerê di rojevê de mabûn. Ranêzikiyên wekî 'wergera jêder-navend an wergera armanc-navend', 'wergera serbest an wergera girêdayî berhema resen', 'dilsozî an azadî' û helwestên din ên dijber tev xalên cudaker û diyarker ên wan nêrîn û ranêzikiyan bûn.

Di sazûn û teşegirtina nêrînên xweser ên wergerê de lînguîstan roleke girîng lîstin, her wekî Yazıcı (2005: 77) jî destnîşan dike, fikr û têgihên zimannasiyê çarçoveyeke zanistî ji qada wergerê re çê kir û bû alîkar ku werger bibe disîplînek zanistî ya serbixwe. Wekî mînak, Nord (1997: 6-7) behsê tîne ser rola girîng a zimannasiya binyadger (structuralist linguistics) ku wergerê wekî kareke zanistî dibîne û wê dike mijara lêkolîna zanistî. Di nîveka sedsala 20an û pê de wergernasên wekî J.C. Catford û Gideon Toury li gor daneyên zanistî hewl dan ku wergerê şirove bikin. Catford (1965) bi xebatên xwe bingeha teoriya wergerê ya lînguîstîk datîne û di çarçoveya têgihên zimannasiyê de mijarên girîng ên wekî, hevtayî, guherîn, wergera fonolojîk û grafolojîk, wergera rêzimanî û peyvîkî dinirxîne û hewl dide sînorên wergerandinê di têkiliya zimanan de diyar bike.

G. Toury ranêzikiya xwe ya wergerê di bin sernavê *wergernasiya şayeser* (descriptive translation studies) de rave dike. Toury xwedî helwesteke armanc-navend e û girîngiya çandê ya di çalakiya wergerê de derdixe pêş. Beşeke girîng a xebatên Toury (1995: 53-70) derbarê normên wergerê ne û dema pênaseya wergerê dide, diyar dike ku werger çalakiya navbera du zimanan, du çandan û du sîstemên norman e. Toury norman di nav xwe de wekî normên navmetnî û dermetnî dabeş dike û bi navên wekî normên seretayî, normên derbarê polîtîkaya wergerê, normên pêkanîna wergerê û normên tekst-lînguîstîk wan pênase dike. Xulasa, Toury werger wekî pratîkeke çandî û civakî bi nav kir û bala xwe da ser tercîh û normên di çalakiya wergerandinê de.

Di sed sala 20an de bi taybetî piştî salên 1970yan fikr û teoriyên nû yên ku bingeh û ranêzikiya wan çand û çandnasî bû mohra xwe li qada wergerê dan. Toury (1995: 6) destnîşan dîke ku karê wergerê her tim di hawirdoreke çandî de dimeşe û armanc dîke ku bibe bersiva pêwîstiyên endamê çandekê. Ev nerîna Toury rastiyeke esasî ya wergerê dide xuyakirin û angaştî sereke ya wan kesan e ku pêşekiyê didin çandê. House (2018: 20-21) jî destnîşan dîke ku werger çalakiyeke ragihanê ye di navbera çandan de. Ziman hem rastiyeke çandî îfade dîke û hem jî teşeyê dide rastiya çandî, ji ber vê yekê jî wergêr divê ji xasyetên çandî ya teksta resen haydar be û peywenda civakî ya ku teksta werger dê tê de cih bigire baş bizane. Ev tespîta House rola çandê ya pirqetmanî dide kifşê, an ku çand hem konteksta wergerê ye û hem jî çarçoveya wê diyar dîke.

Di nav çarçoveya çandî ya berfireh de ji hêlekê ve teoriyên fonksiyonel û teoriya polisîstem hene ku em ê di beşa teoriyên wergerê de cih bidinê, ji hêla din ve jî ranêzikiyên îdeolojîk ên têkildarî wergerê û nêrînên postkolonyal ên wergerê hene. Nêrînên Susan Bassnett û Andre Lefevere yên ku di pêşgotina xebateke hevpar de pêşkêş dikin kurteyê nêrîna wan a giştî dide kifşê. Li gor Bassnett û Lefevere (1992: 12-13) werger venivîsîneke teksta resen e û hemû cure venivîsîn jî bi awayekî dibin rengvedana îdeolojîyê. Werger edebiyatê jî bi awayekî wisa manîpule dîke ku ew fonksiyoneke kifşe ya li gor civaka xwe pêk tîne. Venivîsîn bi xwe manîpulasyon e û di xizmeta hêzekê de ye. Li gor Bassnett û Lefevere werger hem wekî venivîsîn û hem jî wekî navgîneke manîpulasyonê, ji hêlekê ve rêya tiştên nû vedike û cureyên nû derdixe pêş, ji hêla din ve jî dibe navgîneke astengkirina tiştên nû.

Wergernas Lawrence Venuti bi têgiha nexuyabûniyê (invisibility) û bi stratejiyên kedîkirin (domestication) û bîyanîkirinê (foreignization) wergerê bi îdeolojî û hegemonyayê şirove dîke. Têgiha nexuyabûnî, ku Venuti bi wê cihê wergêrê di endustriya wergerê ya roja îro de destnîşan dîke, tevkarîyeke giring e. Li gor Venuti (2008: 1-2) wergerek çî qas herikbar be û her wekî teksteke resen bê xwendin wergêr jî ew qas nexuyayî dibe û li şûna wergêr jî nivîskar û wateya tekstê ew qas dîtbar dibe. Venuti (2008: 7) vê yekê wekî pratîkeke xwe-kuştinê ya wergêr bi nav dîke, her ku li Amerîka û Îngilîstanê qîmeta ku wergêr dibîne kêmtir dibe. Lê belê ew herikbariyê ji bo wergerên ber bi zimanê Îngilîzî bi kar tîne û ve yekê jî bi serdestiya zimanê Îngilîzî ve girê dide, lewre tiştêkî bi zimanê

Îngilîzî bê wergerandin divê bi Îngilîziyeke herikbar û fambar be. Ew encama vê helwestê jî wekî kedîkirina berhemê bi nav dike. Venuti (2008: 18-20) qala tundiya wergerê jî dike û vê têgihê bi wateya zordariya çandî ya Anglo-Amerîkî ya li ser ziman û çandên gelên din bi kar tîne. Venuti li hember kedîkirinê stratejiya biyanîkirinê diparêze û vê stratejiyê wekî ranêzikiyeke berxwedêr dibîne, lewre di stratejiya biyanîkirinê de berhema ku ji bo Îngilîzî tê wergerandin xasyetên xwe yên resen diparêze û bi xasyetên xwe yên biyanî temsîl dibe.

Nêrînên postkolonyal ên li ser wergerê zêdetir bala xwe didin desthilatiya kolonyal a li ser ziman û çanda niştecihan. Her wekî House (2018: 15) destnîşan dike, lêkolîn û analîzên post-kolonyalan li ser rola wergerê ya wekî navgîneke desthilatiya civakî û çandî bû. Helwesta postkolonyal a di wergerê de, her wekî ranêzikiya xwe ya giştî ya çandî û polîtîk, bala xwe dide ser temsîlên çandî, durehiyê û rola wergerê ya li hember serweriya zimanî û çandî. Munday (2001: 133-135) nêrînên du kesayetên xwedî ramanên postkolonyal, G. Spivak û Tejaswini Niranjana derdixe pêş ku em ê li jêr bi kurtî neql bikin. Ji wan Spivak xwedî vê angaştê ye ku zimanên hegemonîk ên wekî Îngilîzî xwedî roleke hegemonîk in li ser çand û zimanên gelên metîngeh. Ev hegemonya di pêvajoya wergerê de jî xuya dibe û xasyetên çand û zimanên gelên metîngeh dema ku wergera wan bi zimanên hegemonîk çê dibe piranî wînda dibin an jî tîr veşartin. Ji hêla din ve, bi rêya wergerên ku ji zimanên hegemonîk ber bi zimanên gelên bindest çê dibin jî werger dibe navgîneke kolonîzasyonê. Niranjana jî wergerê di çarçoveya tîkiliya hêzê de dinirxîne û rola wergerê ya di sazûna pergala kolonyal de dikirpîne. Li gor wê etnograf û zimannasên endamên gelê serdest bi rêya wergerandina berhemên gelên bindest îmajêke cîhana Rojhilatê ya li gor xwe afirandine. Niranjana lêkolînên heyî yên wergernasiyê jî rexne dike ku heya niha newekheviya hêzê û rengvedana wê ya di wergerê de li ber çav negirtiye.

1.2. Biwarê Wergernasiyê

Paşxaneyê dîrokî ya wergerê û kulîyata wê ya fikrî nîşan dide ku sînorê biwarê wergernasiyê li dor wateya peyva wergerê kifşe bûye. Peyva wergerê beramberî peyva latînî "translatio" û "translatum" e (Etymonline, d.t.) ku ew jî wateya veguhestinê (transfer) dide. Di çalakiya wergerandinê de jî tiştê ku pêk tê ev veguhestin e ku ji zimanekî ber pê zimanê din çê dibe. Catford veguhestinê wekî hevwateriya wergerê (translation), Reiss û Vermeer jî wergerê wekî cureyeke

taybet a veguhestinê dibînin (Shuttleworth, 2014: 177). Di pênaseya têgiha wergerê de du xalên diyarker hene ku yek ji wan pêvajoya ye û ya din jî berhem e. Peyva wergerê, li gel peyva *wergêran* a Soranî û peyva *açarnaye* ya Zazakî, di Kurdî de hem berhema wergerandî û hem jî biwarê giştî yê wergerê bi nav dike, û forma lêkerî –*wergerandin*– jî çalakî û pêvajoya wergerê terif dike.

Her çi *wergernasî* (translation studies) ye, ev têgih piştî salên 1970yan bêtir ket rojê akademîk. Her wekî Holmes (1988 [1975]: 69-71) destnîşan dike, di nav demê de termên cuda ji bo wergerê û wergerandinê hatin bikaranîn. Termên wekî *Translatology* ya bi Îngilîzî ya ku Roger Goffin pêşniyaz kiribû û *Translatistics* a Îngilîzî ji bo demekê di rojevê de man. Terma *Übersetzungswissenschaft* (Zanista Wergerê) a ekola Alman hîn jî tercîha lîteratura Almanî ye. Dîsa jî, li roja îro binavkirina wekî *Translation Studies* (Xebatên Wergerê) êdî cihê xwe girtiye. Têgiha *Translation Studies* cara ewil di sala 1972an de ji aliyê James S. Holmes ve hate pêşniyazkirin. Di xebata xwe de ya bi navê *The Name and Nature of Translation Studies* (Nav û Taybetiya Xebatên Wergerê) Holmes navê *Translation Studies* li disîplîna wergerê kir.

Qadên cur bi cur ên lêkolînê hene di wergernasiyê de ku li gor pêşekiyên spesîfîk ji hev cuda dibin. Williams û Chesterman (2002: 7-27) 12 qadên lêkolînê yên wergernasiyê pênase dikin. Yek ji wan lêkolînan "tekst-analîz" e ku tê de xebatên wekî *analîza teksta jêder, berawirdkirina wergeran bi tekstên wan ên jêder, berawirdkirina wergeran û tekstên ne-werger tîn meşandin*. Qadeke din a lêkolînê "nirxandina kalîteya wergerê" ye ku li gor helwesteke *ber pê jêder* (target-language oriented) an jî *ber pê armanc* (source oriented) lêkolîner kalîteya wergerê şirove dike. "Wergera cureyan" jî qadeke din a lêkolînê ye ku werger li dor xasyetên cureyî yên tekstan tîn nirxandî. "Dîroka wergerê", "pîvanên etîk ên wergerê", "lêkolînên derbarê termînolojî û ferhengan", "lêkolînên derbarê pêvajoya wergerandinê" û "perwerdehiya wergêran" qadên din ên lêkolîna ku Williams û Chesterman balê pê didin.

James S Holmes sînore wergernasiyê li gor qadên lokolînê diyar kiriye û ew çarçoveya ku wî xêz kiriye di vî warî de hîn jî referanseke esasî ye. Holmes (1988;1975: 66-80) di bin sernavê wergernasiyê (translation studies) de du şaxên sereke destnîşan dike: xebatên teorîk û xebatên sepîner (applied). Xebatên teorîk jî xwedî du binbeşan e ku yek lêkolînên teorîk û ya din jî lêkolînên şayeser

(descriptive) digire nav xwe. Di lêkolînên teorîk de lêkolîner an bi giştî li ser teoriyê radiweste an jî bi awayekî qismî xebata xwe bi faktorên wekî navgîn, qad, cureya tekstê, demê an jî bi kêşeyeke wergerê sînordar dike. Lêkolîna şayeser jî li ser sê pîvanan dişixule û ew jî *ber pê berhem* (product oriented), *ber pê pêvajoyê* (process oriented) û *ber pê fonksiyon* (function oriented) e. Di bin şaxê lêkolînên sepîner de Holmes sê jêrqadên xebatê diyar dike, ku ew jî bi dorê *perwerdehiya wergêran*, *alîkarên wergerê* û *rexneya wergerê* ye. Bassnett (2002: 18) jî lêkolînên têkildarî wergernasiyê bi çar kategoriyan ve dabeş dike ku bi dorê ew in: *dîroka wergerê*, *werger di zimanê armanc de*, *werger û zimannasî*, û *werger û poetîka* ne.

Wergernasî wekî qadeke zanistî ji nêzik ve bi xebatên edebî û zimanî re têkildar e. Jixwe beriya ku wekî qadeke serbixwe bê nasîn, wergernasî di nav sînorê lêkolîna zimannasiyê de cih digirt û di edebiyata berawirdî de jî wekî têgiheke giring dihat nirxandin. Ji nêveka duyem a sedsala 20an û pê de wergernasî bi teorî û têgihên xweserê xwe zêdetir di nav lêkolînên zimanî û edebî de cih girt. Gelek xebatên berawirdî, analîzên teksên edebî û têkiliyên çandî yên bi rêya wergerê derketin holê. Lêkolînerên qada teorîk a wergerê bêtir bi teoriyan û bi model û stratejiyan mijûl dibin, û carinan jî hin analîzên wergernasî li gor teorî û têgihên wergernasiyê bi awayekî berawirdkirina tekstan pêk tînin. Di lêkolînên wergernasiyê de qadên xebatê li gor pêşkekiyên lêkolîneran ji pêwendên zimanî, edebî û çandî bigire ta dîroka wergerê, pêwendên înterdîsîplîner, medya û qada bazirganiyê berfireh dibe. Helbet lêkolîner li kêleka tercîha xwe ya qada xebatê bi awayekî xwe dispêrîn tercîheke teorîk jî.

Qadeke lêkolînê ya di wergernasiyê de jî wergera nav-zimanî (interlingual) digire nav xwe. Werger zêdetir çalakiyeke navbera du zimanan e, an ku navber-zimanî ye. Lê hin zimanên ku dîyalektên wan ji ber sedemên dîrokî, erdnîgarî, civakî û zimanî ji hev dûr ketine di nav demê de pêwîstî bi wergerê dibînin. Ji vê cureya wergerê re wergera nav-zimanî tê gotin. Di wergera nav-zimanî de jî bi giştî qayde û stratejiyên wergera navber-zimanî yên wekî kategoriyan Holmes ên navborî tînin şixulandin, lê dîsa jî hin cudatîyên berbiçav hene. Di hin rewşan de werger zêdetir dibe lêanîna nivîskî, lê di hin nimûneyên wergernasî de rewş hin bêtir aloz dibe û pêwîstî bi modelên taybet çê dibe da ku hevtayîya navbera her du

deqan pêk were. Bi taybetî jî eger tîpguhezî wekî parçeyeke wergerê bibe mijar, wê demê wergêr xwe di nav kêşeyên tekst-spesîfik de dibînin.

Gottlieb (2005: 3-4) wergera navzimanî bi çar kategoriyan ve dabeş dike: 1) Wergera Dîakronîk (diachronic translation) ku di nav qonaxên dîrokî yê heman zimanî pêk tê. 2) Wergera Dîyalektî ku di navbera varyantên erdnîgarî, civakî û nifşî yê heman zimanî pêk tê. 3) Wergera Dîamesîk (diamesic translation) ku tê de guherîna moda zimên çêdibe, wekî mînak wergera ji gotinê ber bi nivîsê. 4) Tîpguhezî (transliteration) ku tê de guherîneke elfabeyî çê dibe. Shuttleworth (2014: 87-88) balê dikişîne ser kêşeyeke din a wergera nav-zimanî û diyar dike ku wergera nav zimanî her çî qas di hin rewşan de bi awayekî rasterast werger nebe jî, gelek caran karekî dijwar e ku mirov kifşe bike bê ka ew veguhestina deqên navbera dîyalektên ji hev dûr an jî veguhestina navbera dem û cihên ji hev dûr wekî wergera nav-zimanî (intra-lingual) an jî wekî wergera navber-zimanî (inter-lingual) bê binavkirin.

1.3. Teoriyên Wergerê

Teoriyên wergerê bi awayekî giştî wekî teoriyên lînguîstîk û teoriyên çandî ji hev cuda dibin. Her çî qas berî teoriyên lînguîstîk nêrînên cihê hebin jî, ew nêrîn nebûne teoriyên sistematîk ên wergerê. Teoriyên lînguîstîk ên ku di salên 1950yan de geş bûne, roleke navendî didan zimên û di çarçoveya zanyariyên zimannasiyê de dahûrîn û pênaseya wergerê dikirin. Piştî salên 1990an bi teoriyên çandî û fonksiyonel teoriyên wergerê ji lînguîstîkê bêtir azad bûn û li gor ranêzikî û têgihên xwe yê xweser werger şirove kirin. Di qada wergerê de ranêzikiyên giştî, teoriyên kifşe yê hev girtî û ekolên dîrokî wekî sê stûnên fikrî barê teorîk hildigirin ser milên xwe.

Ji hêla pêşekiyên fikrî û dîsîplînî ve, wergernas hin ranêzikiyên sereke pênase dikin ku di bin şaxê hinekan de model û fikrên dîtir jî hene. Ranêzikiya Sosyolînguîstîk peywenda civakî derdixe pêş û angaştî wê ya sereke ew e ku konteksta civakî çarçoveya wergerê diyar dike. Bijartina berhemên wergerandinê, sînorkirin û sansura di wergeran de tev li gor lihev kirina civakî çê dibe. Wergêr jî, di ranêzikiya Sosyolînguîstîkê de, di bin bandora nîrxên civaka xwe de dimînin û ew nîrx di wergerên wan de xuya dibin. Ekola Tel Avivê û akademîsyenên wê Itamar Even-Zohar û Gideon Toury tevkariyên giring kirine ji bo ranêzikiya

Sosyolînguîstîk. Hûrgiliyên fikrên wan kesayetan di beşa teoriya polisîstem a vê xebatê de hatin ravekirin.

Ranêzikiya Ragihanî giringiyê dide veguhestina wateyê. Teoriya sereke ya têkildarî vê ranêzikiyê, an ku teoriya wateyê (théorie du sens), ji hêla Danica Seleskovitch û Marianne Lederer ve hatiye avakirin. Her du teorisyenan (Seleskovich û Lederer: [1984] 1993) di xebata xwe ya hevpar de ya bi navê *Interpréter Pour Traduire* mijarên wekî 'werger çi ye?', 'werger û ziman', 'rêgez û rêbazên raguhistinê' nirxandine û fikrên xwe yên sereke pêşkêş kirine. Angaşt wan a sereke ew e ku di şert û mercên ragihandinê de ziman bi tenê navgînê veguhistinê ye, lewre ziman bi qasî peyamê ne giring e. Divê wergêr zimanê tekstan ji hev veçirîne, bala xwe bide ser wateyê û peyameke gerdûnî ji teksta jêder derxîne holê.

Ranêzikiya Hermenutîk a derbarê wergerê bi fikrên George Steiner teşe girtiye û di pirtûka wî ya bi navê *After Babel* de bi hûrgilî hatine ravekirin. Steiner (1998: 7) nêrîna xwe ya wergerê wekî dewama fikrên felsefî û fenomenolojîk ên kesên wekî Seneca û Walter Benjamin derpêş dike. Ew di çarçoveyê felsefî de wergerê dinirxîne, wergerê wekî çalakiyê watedarkirinê û wekî karekî hunerî dibîne. Steiner tevgera hermenutîk a di wergerê de wekî têderxistina wateyê û neqilkirina vê ya bi rêkûpêk dibîne (1998: 287) û vê yekê jî di çar qonaxan de şirove dike. Steiner (1998: 287) qonaxa yekem wekî "pêbawerî" bi nav dike ku wergêr di vê baweriyê de ye ku teksta ew werdigerîne xwedî wateyê hevgirtî ye ku bê raguhistin. Qonaxa duyem "êrîş" (aggression) e ku di vê qonaxê de, li gor şiroveya Steiner, wergêr êrîşê tekstê dike, wateya di nav de zêft dike û dike malê xwe (1998: 288). Qonaxa sêyem "tevlêkirin" (incorporation) e ku di vir de êdî wateya di teksta jêder de bûye malê zimanê armanc û bi peyv û wateyên nû xemiliye. Li gor Steiner (1998: 289) di vê qonaxê de tekst an bi temamî kedî dibe an jî her çi qas hatibe wergerandin jî wekî berhemeke marjînal û biyanî dimîne. Qonaxa çarem "telafîkirin" (compensation) e ku bi nêrîna Steiner (1998: 290) berhema resen her çi qas piştî çalakiya wergerandinê ji xwe hin tiştan winda bike jî, bi rêya wergerê dibe xwedî wateyên nû û berfirehtir dibe.

Ranêzikiya Lînguîstîk bi giranî li dor nêrînên J. C. Catford teşe girtiye. Catford (1965: 1) destnîşan dike ku werger çalakiyek e ku li ser zimanan dimeşe, lewre jî çi teoriyê wergerê hebe divê xwe bispêre teoriyê giştî ya

zimannasiyê. Jixwe Catford (1965: 20) xwedî vê nêrînê ye ku teoriya wergerê têkiliyeke kifşe ya navbera zimanan ji xwe re dike mijar û lewma jî wê wekî şaxeke *zimannasiya berawirdî* dipejirîne. Catford bi têgih û kategoriyên zimannasiyê li ser kêşeyên hevtayî û guherînê radiweste, têgihên wekî wergera qismî, wergera tam û wergera sînorkirî berawirdî hev dike.

Popović (1987: 13) teoriya wergerê wekî qadeke zanistî ya ku wergerê bi awayekî sistematîk lêkolîn dike bi nav dike. Pênaseya Shuttleworth (2014: 185) jî bi heman awayî diyar dike ku teoriya wergerê hewldaneke spesîfik e û bi awayekî sistematîk xuyangên (phenomena) têkildarî wergerê rave dike. Li gor Newmark (1981: 19) teoriya wergerê hem zanyariyên derbarê wergerê û hem jî zanyariyên derbarê pêvajoya wergerandinê digire nav xwe. Di vê çarçoveyê de teoriya wergerê armanc dike ku rêbazên kêrhatî yên wergerê kifşe bike û çarçoveyeke rêgez, pîvan û qaydeyan dabîn bike ji bo wergerandina tekstan û rexneya wergeran. Chesterman (1997: 20) diyar dike ku lêgerînên teorîk ên derbarê wergerê bi pirsê '*em çi vediguhêzin?*' dest pê kiriye û bi bersiva '*wateya nav zimên*' a serdemên antîk bingeha fikrî ya teoriyan saz bûye. Di dawiya sedsala 19an de li Ewropayê hewldanên teorîk yên wergerê li dor niqaşên têkildarî têgiha hevtayiyê çê dibin, û piştî nîveka duyem a sedsala 20an êdî werger li dor teoriyên zanistî yên xweser tê nirxandin.

Pym (2010: 1-2) jêderka teoriyên wergerê bi pêvajoya wergerandinê ve têkildar dike, û dibêje ku "wergêr her tim karê xwe teorîze dikin", lewre ew timî rastî kêşeyan tên û di nav çend vebijêrkên de divê biryarê li ser yekê bidin. Bi vê pêwîstiya biryardayînê, pêvajoya teorîzekirinê dest pê dike û di encamê de navekî li nêrînê dike. Bi vê binavkirinê jî modelên wergerê û pê re jî teoriyeke wergerê dedikeve holê. Pym (2010: 5) teoriyên wergerê ji pratîka wergerandinê û ji kêşeyên sereke yên wergerê cuda nake û diyar dike ku teorî dema ku ji bo çareserkirina kêşeyên wergerê bînan bikaranîn, wê demê bêtir kartêker û kêrhatî dibin. Pym (2010: 6-159) di xebata xwe de têgih û ranêzikiyên wekî *hevtayî*, *armanc*, *pênasekirin*, *nediyarbûn* (uncertainty), *niştecihkirin* (localization) û *wergera çandî* dike sernavên giştî ji bo senifandina teoriyên wergerê.

Di bin sernavê hevtayiyê de Pym (2010: 6-42) li ser teoriyên ku hevtayî ji xwe re kirine mijar radiweste, formulasyona Eugene Nida ya hevtayiyê ya wekî hevtayiya formel û hevtayiya dînamîk şirove dike û cih dide teoriya wateyê û

teoriya t kiliy . Sernav  armanc  (Pym, 2010: 43-63) qala teoriya skopos, teoriya  alakiy  u n r n n C. Nord  dike ku tev j  bala xwe didin ser armanca werger . Di bin sernav  p nasekirin  de Pym (2010: 64-89) cih dide n r n n Even-Zohar u Gideon Toury ku wek  p şeng n ekola Tel-Aviv  hewl dane  awaniya werger  Őirove bikin, norm n w  diyar bikin u qaydey n gerd n  y n werger  ter f bikin.

Sernav  ku Pym (2010: 90-119) li dor t giha nediyariy  rave dike, derbar  p kaniya wergerandin  de Őikberiy  derdixe p ş. Di v  beş  de n r n n kes n wek  Willar Van Orman Quine, Andrew Benjamin, Jacques Derrida u Roman Jakobson  n derbar  werger  cih digirin. Pym (2010: 120-142) di beş  niştecihkirin  de behs  t ne ser k şey n n jen  n werger  u werger  wek  navg neke sereke ya dan standina gerd n  p nase dike u t kiliya werger  u teknolojiy  u bazara werger  Őirove dike. Di bin sernav  wergera  and  de j  Pym (2010: 143-164) cih dide n r n n Homi Bhabha u Gayatri Chakravorty Spivak ku niqaş n li dora rewşa kolonyal u postkolonyal, postmodern  u durehiy  digire nav xwe.

Yek ji teor syen n werger  y  ku li ser teoriyan xebat kirine u ew senifandine Jeremy Munday e. Munday (2001: 18-29) pişt  ku li ser teoriya werger  ya ber  sedsala b stan u fikr n sereke y n kes n wek  Martin Luther, J. Dreyden, E. Dolet u y n din radiweste, cih dide teoriy n werger  y n sedsala b stan. Di bin beş  teoriy n fonks yonel  n werger  de Munday (2001: 72-88) cih dide teoriya skopos u teoriya  alakiy , n r n n Katharina Reiss   n ku *cureya tekst * dike navenda fikr n xwe y n werger  u *anal za werger-navend* a C. Nord  Őirove dike. Di bin sernav  teoriy n s steman de j  Munday (2001: 108-124) qala teoriya polis stem u ekola man pulasyon  dike u n r n n Gideon Toury y n ku wek  *xebat n werger  y n Őayeser* t n zan n Őirove dike. Munday (2001: 126-138) t kiliya zayend  u werger , teoriya werger  ya postkolonyal u t kiliya werger  u veniv sin  di bin sernav  guhertoy n xebat n  and  y n t kildar  werger  de kom dike. Munday (2001: 162-173) n r n n G. Steiner, W. Benjamin u E. Pound j  di bin beş  teoriy n felsef  y n werger  de dinirx ne.

1.3.1. Teor  u Ekol n Sereke

Di v  binbeş  de em   bi kurt  teoriy n werger  y n ku ji h la wergernasan ve bi awayek  hevpar wek  teoriy n serbixwe u s stemat k t n qeb lkirin bidin

nasîn. Ev jî bi dorê *teoriya wateyê*, *teoriya têkiliyê*, *teoriya polîsîstem*, *teoriya skopos* û *teoriya çalakiya wergerandinê* ne. Teoriya skopos û teoriya çalakiya wergerandinê di nav teoriyên fonksiyonel de tîne qebûl kirin, û wekî tîne zanîn, modela C. Nordê ya bi navê *translation-oriented text analysis* jî kêliya dawî ya wan teoriyan e. Her wiha em ê bi kurtî qala *ekola Leipzigê* û *ekola manipûlasyonê* (manipulation school) jî bikin ku di çavkanî û ferhengên wergernasiyê de ne wekî teorî lê wekî ekol derbas dibin. Wan her du ekolan jî bi tevkariya fikrên wergernas û lêkolînerên cihê di nav teoriyên wergerê de cihekî berbiçav bi dest xistine.

1.3.1.1. Teoriya Wateyê (Theory of Sense)

Her wekî me berî niha jî destnîşan kiribû, teoriya wateyê di çarçoveya ranêzikiya ragihanî de ji hêla Danica Seleskovitch û Marianne Lederer ve wekî bertekek fikrî ya li dijî teoriyên lîngûstîk hatiye avakirin. Pym (2010: 18-19) jî balê dikişîne ser cudabûna vê teoriyê ya ji qebûlên lîngûstîk û dibêje ku teoriya wateyê veqetîneke berbiçav a ji lîngûstîkê ye û xudanên wê teoriyê zanyariyên derûnasiyê û bi taybetî jî nêrînen derûnasê Fransî Piaget ji xwe re kirin bingeh. Baker (2001: 112-114) navê ekola Parîsê jî li vê teoriyê dike û wekî danerên wê jî navên akademîsyenên wekî M. Lederer, D. Seleskovitch, F. Herbulot û J. Delisle rêz dike. Bingeha vê teoriyê dawîya salên 1960an li ser bingeha lêkolîneke li ser Wergera Konferansê hat avêtin û piştê wergera tekstên nivîskî jî girt nav xwe.

Hûrgiliyên vê teoriyê di xebata wan a hevpar a bi navê *Interpréter Pour Traduire* de (Seleskovich û Lederer: ([1984] 1993) hatine ravekirin. Ranêzikiya vê teoriyê ya diyarker ev e ku bala xwe dide ser pêvajoya wergerê. Ev teorî giringiyê dide veguhestina wateyê, lê belê wateyê bi wateya peyvê ve sîncard nake. Ji bo veguhestina wateyê jî zanyariyên kesên ku dikevin nav têkiliyê, qest û îmayên di nav peyaman de û xalên nediyar ên nivîs û axaftinan di pêvajoya wergerê de bêtir dibin xwedî giringî. Li gor teoriya wateyê, di pêvajoya ragihanê de ziman bi qasî peyamê ne giring e, an ku ziman bi tenê erka ragihanê pêk tîne. Divê wergêr di gava yekem de zimanê teksta jêder ji hev veçirîne. Ji bo vê yekê jî divê xasyetên teşeyî yê zimanê tekstê dane hêlekê û yekser bala xwe bide ser wateyê. Armanca dawî ya wergêr divê ew be ku bi rêya derbirîneke nû peyameke gerdûnî ji teksta jêder derxîne holê. Baker (2001: 113) qala tevkariya akademîsyena Kanadayî Jean Delisle jî dike ku ew jî giringiyê dide analîza tekstê ya ji hêla kontekstê û dîskorsê ve. Delisle jî wergerê bi sê pêvajoyan

(fêmkirin, veformulekirin û rastandin) ve dabeş dike ku di her sê qonaxan de jî wergêr bi wergerê re têkiliyeke hişmendî û afirîner çê dike.

1.3.1.2. Teoriya Têkiliyê (Relevance Theory)

Teoriya Têkiliyê li dor nêrînên zimannasê Alman Ernst-August Gutt ava bûye. Her wekî ji navê teoriyê jî diyar dibe, têkiliya navbera zimanê jêder û zimanê armanc pîvana sereke ya vê teoriyê ye. Gutt di xebata xwe ya bi navê *Translation and Relevance - Cognition and Context* de di çarçoveya ragihanê û kontekstê de bi hûrgilî behsa wergerê dike û di beşa duyem a bi navê "Ranêzikiya Teoriya Têkiliyê" de nêrînên xwe yê esasî pêşkêş dike. Gutt di xebata navborî de (2010: 22-46) berî her tiştî wergerê wekî cureyeke ragihanê dibîne û konteksta ragihanê dixê navenda teoriya xwe. Li gor wî, wate bi tenê bi rêya ziman saz nabe, heta ziman temsîleke lawaz a wateyê dike, lê berevajî vê, tiştê ku wateyê saz dike têkiliya zimanî ya di nav konteksteke berbiçav de ye.

Pym (2010: 35) di Teoriya Têkiliyê de giringiya têgihên *wergera rasterast* (direct translation) û *wergera nerasterast* (indirect translation) destnîşan dike. Bi têgiha wergera rasterast mebest ev cure werger e ku wergêr konteksta zimanê jêder ji xwe re wekî pîvan digire û hewl dide li gor vê kontekstê peyamê ragihîne. Ji hêla din ve, di wergera nerasterast de giringiya konteksta resen tune. Wergêr hewl dide ku li gor konteksta armanc tekstê ji nû ve biafirîne. Palumbo (2009: 101) jî di Teoriya Têkiliyê de wekî armanca sereke çêkirina têkiliyeke têginer a di navbera zimanê jêder û zimanê armanc de destnîşan dike û ji bo vê yekê jî bikaranîna hin stratejiyên wergerê yê wekî ravekirin, lêzêdekirin an jî kêmkirinê pêwîst dibîne.

1.3.1.3. Teoriya Polîsîstem (Polysystem Theory)

Di destpêka 1970yan de akademîsyen Itamar Even-Zohar li ser esasê xebatên xwê yê têkildarî wêjeya Îbranî teoriya Polîsîstem ava kir. Baker destnîşan dike ku (2001: 176) paşxaneyê fikrên Teoriya Polîsîstemê ji angaştên Formalîstên Rûs tê û têgiha bingehîn a vê teoriyê, an ku "sîstem", aîdî Tyjanovê Formalîst e. Berhema Even-Zohar a sereke *Polysystem Studies* ji beşên Teoriya Polîsîstem, Xebatên Polîsîstem, û Sîstem û Repertuvar di Çandê de pêk tê. Even-Zohar nêrînên xwe yê esasî yê derbarê teoriya xwe di beşa yekem de rave dike

û balê dikişîne ser mijarên wekî 'sîstema edebiyatê', 'cihê edebiyata wergerê ya di nav sîstema edebiyatê de', 'werger û veguhestin'ê.

Even-Zohar (1990: 9-94) çandê wekî sîstemeke pirqetmanî dibîne ku tê de gelek sîstem ketine nav hev. Werger jî wekî jêrsîstemek di nav sîstema edebî de cih digire û rola wê jî li gor têkiliyên faktorên nav sîstemê diguhere. Even-Zohar li ser cih û rola edebiyata wergerê ya di nav polîsîstema edebiyatê jî radiweste û diyar dike ku ew rol û cih an yeke navendî ye yan jî roleke li kêlekê û negiring e di nav polîsîstema edebiyatê de. Eger ku cihê wergerê di polîsîstemeke edebiyatê ya neteweyekê de li navendê be, wê demê werger bandorê li ser hemû sîsteman dike, cure û şêwazên nû dixê nav edebiyatê, norm û qaydeyan ava dike û tiştên heyî vediguherîne. Lê belê, eger ku pozîsyona wergerê kêlekî (peripheral) be, wê demê bandoreke berbiçav a wergerê li ser sîstemên din çê nabe. Di sîstema edebiyatê de rola wergerê jî li şûna ku temsîla tiştên nû bike, bêtir bi kêrî parastina kevneşopî û şêwazên kevn tê. Li gor Even-Zohar werger di edebiyatên xudan sîstem ên Ewropî de xwedî cihekî kêlekî ye, lê rola wergerê di edebiyatên ku di pêvajoya çêbûnê de ne roleke navendî ye, lewre jî ew edebiyatên periferîk bi rêya têkiliyên di ser wergerê re bi awayekî dînamîk diguherin.

1.3.1.4. Ekola Leipzigê (Leipzig School)

Di salên 1960an de li Zanîngeha Leipzigê komeke akademîsyen bi pêşengiya Otto Kade û Albrecht Neubert di çarçoveya fikrên xwe yên lînguîst de bîngeha fikr û ramanên nû yên derbarê wergerê çê kirin ku bandor li ser nêrînên di salên pêş de çê kir (Shuttleworth, 2014: 91). Ekola Leipzigê xwedî ranêzikiyeke lînguîstîk e û wergerê wekî ragihandineke duzimanî dibîne. Di vê çarçoveyê de wergêr jî wekî navbeynkar peyama şander digihîne wergir. Her wisa, vê êkolê têgiha hevtayiya fonksiyonel derxist pêş ku li gor vê nêrînê fonksiyona teksta jêder û teksta armanc hem ji hêla wateyî ve û hem jî ji hêla pragmatîk û avaniyê ve yekser wekî hev nabin. Yek ji hokarên ku fonksiyona tekstekê diyar dike jî cureya tekstê ye ku ev êkol li ser radiweste (House, 2018: 32). Li gor agahiya ku Shuttleworth (2014: 92) dide, xebatên teorîsyenên vê êkolê piranî li ser wergera zanistî û tekstên teknîk bû. Ev yek jî sînordariyeke qada lêkolînê nîşan dide û angaşên sereke yên vê êkolê ancax ji bo hin qadên zanistî derbasdar dike. Ekola Leipzigê kêliyeke giring e di qada wergerê de, lewre tevkarîya wê di pêvajoya zanîstbûnê ya wergerê de gelek e.

1.3.1.5. Ekola Manîpulasyonê (Manipulation School)

Ev tevger wekî Ekola Manîpulasyonê an jî wekî Koma Manipulasyonê tê zanîn û angaştên wê yê sereke di berhema bi navê *The Manipulation of Literature: Studies in Literary Translation* de cih digire (Munday, 2001: 120). Ev berhem jî nivîsên wergernasên wekî Gideon Toury, Susan Bassnett, Jose Lambert, Andre Lefevere û yê din pêk tê û mijarên wê bi giştî derbarê kêşeyên wergera edebiyatê ne. Edîtor Theo Hermans ku yek jî tevkarên vê ekolê ye di beşa destpêkê de nêrînên hevpar ên vê ekolê rave dike. Her çî qas Hermans navê ekolekê lê neke jî qala helwest û fikrên hevpar dike.

Li gor Hermans ([1985] 2014: 7-15) wergera edebiyatê di xebatên têkildarî wergerê de zêde cih negirtiye û berhemên werger ên edebî jî bi qasî berhemên resen qîmet nedîtine. Rexneya Hermans ew e ku analîzên heyî yê têkildarî wergerên edebî jêder-navend in û hewl didin qîmeta berhema resen nîşan bidin. Hermans sempozyûmên li ser wergerê wekî bingeha çêbûna vê ranêzikiya hevpar nîşan dide. Wergernasên ku di vê komê de cih digirin her çî qas xwedî fikrên cuda bin jî, li ser hin xalên sereke li hev dikin. Ev kesayet xwedî ranêzikiyeke pênasaker, armanc-navend, fonksiyonel û sistêmîk in. Li gor wan, divê nêrîneke serbixwe ya wergera edebiyatê hebe û modelên teorîk û xebatên li ser mijarên şênber di vê çarçoveyê de pêk were. Ji bilî vê jî, normên giştî yê ku rê didin hilberîn û xwendina wergerê û normên ku têkiliya edebiyatê di nav xwe de û bi edebiyatên din ên navnetewî re saz dikin jî fikrên wan ên hevpar in. Ji wan nêrîn û danasînên Hermans ên li jor jî tê fêmkirin ku Ekola Manîpulasyonê bertekek fikrî ye bi ser navê edebiyatê û li hember helwestên lînguîstîk. Helwesta vê ekolê armanc-navend e, an ku wergerê ber pê teksta armanc dinirxîne û têgihên wekî norm, venivîsîn û polisîstema edebî têgihên sereke yê wê ekolê ne.

1.3.2. Teoriyên Fonksiyonel

Ji ber ku referansa teorîk a vê xebatê, an ku modela C. Nordê ya bi navê *analîza tekstê ya werger-navend*, di nav teoriya fonksiyonel a giştî de cih digire, em ê di bin sernavekî serbixwe de fikrên sereke yê ekola fonksiyonel bi awayekî giştî pêşkêş bikin. Li salên 1970 û 1980yan di qada wergernasiyê de dîrketinek jî tîpolojîyên lînguîst ên wergerê pêk tê û li şûna wê li Almanyayê ranêzikiyeke fonksiyonelîst û ragihîner a dahûrîna wergerê derdikeve pêş (Munday, 2001: 73).

Di nav teoriyên fonksiyonel de Ekola Alman xwedî cihekî taybet e û ji çend ranêzikiyên hevtemamker ên teorîk pêk tê. *Skopostheorie* (teoriya armancê) ya Hans J. Vermeer û Katharina Reissê, teoriya Justa Holz-Mänttâri ya ku wekî *Çalakiya Wergerandinê* (Translational Action) tê zanîn, xebatên Katharina Reiss ên li dor rexneya wergerê ya fonksiyonalîst û modela C. Nordê ya girêdayî rêbaza fonksiyonalîst bingeha vê êkolê ava dikin.

Çend taybetiyên hevpar ên teoriyên fonksiyonel hene ku di nav wan de fonksiyona tekstê û cureya tekstê du xalên giring û hevpar in. Her wisa teoriyên fonksiyonel pêşekiyê didin rewşa ragihanê, armanca wergerê û bendewariyên wergir û xwînerên armanc. Nord (2007: 4-6) ranêzikiyên fonksiyonel wekî îcadên sedsala 20an nabîne, berevajî vê, hem di nêrînên Cicero û St. Jerome de û hem jî di nêrînên wergêrên serdema navîn de şopên helwesta fonksiyonel destnîşan dike ku hemû jî qala wergereke li gor şert û mercên ziman û çanda armanc dikin. Nord (2007: 5) bi heman awayî, di nêrînên Eugene Nida de, bi taybetî jî têgiha wî ya bi navê *hevtayiya dînamîk* (dynamic equivalence), giringiya ku ew dide armanca wergerê wekî helwestek ber pê-fonksiyonel dibîne. Ranêzîkî û teoriyên ku wekî fonksiyonalîst tên binavkirin hemû jî wergerê wekî çalakiyeke ragihanê dibînin û mijara wergerê li gel faktorên civakî û çandî lêkolîn dikin (Palumbo, 2009: 50). Li gor Palumbo (2009: 51) yek ji xasyetên bingeîn ên teoriyên fonksiyonel ew e ku rewş û konteksta zimanê armanc dike pîvan û kêşeyên wergerê li gor vê çareser dike.

1.3.2.1. Teoriya Skoposê (Skopos Theory)

Teoriya Skopos yek ji teoriyên sereke yên ekola fonksiyonel e. Peyva *Skoposê* bi zimanê Grekî ye û tê wateya armancê. Danerên wê teoriyê Hans J. Vermeer û Katharina Reissê di salên 1970yan de fikrên xwe yên wergerê di pirtûka xwe ya bi navê *Ber Bi Teoriyeke Giştî ya Wergerê* (*Grundlegung einer allgemeine Translationstheorie*) de pêşkêş kirin. Di vê xebata xwe ya hevpar de Vermeer û Reiss ([1984] 2014) li ser mijarên wekî, têkiliya ziman, çand û wergerê, werger wekî navgîneke pêşkêşkirina agahiyan, teoriya skoposê û fikrên wê yên bingeîn, giringiya fonksiyonê, xasyetên çalakiya wergerê, cureya tekstê û giringiya wê ya ji bo wergerê radiwestin. Her ku tevkarîya Vermeer derbarê armanca wergerê de ye, Reiss bêtir li ser cureya tekstê û bandora wê ya li ser wergerê hûr dibe.

Kakilê Teoriya Skoposê armanca wergerê ye û ji nêzik ve bi çalakiya wergerê re têkildar e. Teoriya Skopos wergerê wekî cureyeke çalakiyê dibîne û wekî hemû cure çalakiyên mirovî wergerê jî bi armanckê ve têkildar dike. Her wekî Munday (2001: 79) destnîşan dike li gor Teoriya Skoposê du tiştên sereke hene ku wergêr divê bala xwe bidê: Ya yekê divê bê zanîn bê ka teksta jêder bi çi armancê tê wergerandin û ya duyem jî divê biryareke wergêr hebe bê ka fonksiyona teksta armanc dê bibe çi. Vêca stratejî û taktîkên wergerê jî li gor armanca kifşekirî ya wergerê û li gor fonksiyona wê ya nû ya wekî teksta armanc diyar dibin. Hevdayî di Teoriya Skoposê de jî pîvaneke giring e, lê hevtayiya di vê teoriyê de yeke zimanî û formel nîn e. Berevajî vê, tiştê ku tê payîn hevtayiya fonksiyonê ye ku di nav fonksiyona teksta jêder û teksta armanc de hevtayiyê tam nebe jî hebûna ahengekê pêwîst dibîne.

Vermeer û Reiss (2014: 90-91) rêgeza herî bilind a wergerê wekî *rêgeza armanckê* (skopos rule) bi nav dikin. Li gor vê rêgezê çalakiya wergerê bi armanca wê ve diyar dibe. Wergêr an jî kesayet û saziya ku wergerê dide kirin li gor rewş û bendewariyên xwîner armanckê kifşe dikin ji bo wergerê. Piştî ku armanca wergerê diyar bû, wergêr li gor armanca diyarkirî taybetiyên teksta jêder ji nû ve dinirxîne û agahiyên tê de ji hêla fonksiyona wê û li gor bendewariyên xwînerê teksta armanc neql dike. Vermeer û Reiss (2014: 92-93) destnîşan dikin ku armanca wergerandina hin beşên tekstê an berhemekê dibe ji hev cudatir be, vêca di rewşeke wiha de li gor giringiyê hîyerarşiyêke armancan derdikeve holê. Heta dibe ku armanca nivîsîna teksta jêder û armanca wergerandina teksta armanc jî cîyawaz bin, lewre fonksiyon û armanca afirandina tekstekê û her wisa wergerandina wê jî li gor şert û mercên cuda diyar dibin.

Teoriya Skoposê wergerê wekî cureyeke spesîfik a veguhestina peyam û agahiyan dibîne û ji bo ku ew veguhestin bi awayekî birêkûpêk bi cih were, divê wergêr qaydeya ahengê jî li pêş çav bigire. Vêca li gor Vermeer û Reiss (2014: 98-9) eger ku wergirê peyamekê ji peyamê fêhm bikin, mirov ancax hingê dikare qebûl bike ku peyam bi awayekî serkeftî hatiye veguhestin. Ji bo vê yekê jî divê peyama ku wergêr vediguheze hem li gor şert û mercên wergêr be û ji bo wergir têgîner be û hem jî divê di navbera peyama teksta jêder û ya armanc de jî ahengek hebe ku ew jî nîşaneyêke dilsoziya wergêr a ji bo nivîskar û niyeta wî/ê ye.

Di Teoriya Skoposê de teksta jêder wekî kereste ye ji bo hilberandina teksta armanc û xwedî qîmeteke talî ye. Nord (1997:12) jî vê yekê derdixê pêş û dide xuyakirin ku giringiya teksta jêder a di nav Teoriya Skoposê de, li gor giringiya wê ya di teoriyên din ên berpê-hevtayî (equivalence-based) de, ne ewqas zêde ye. Munday (2001: 81) jî balê dikişîne ser lihevnehatina tam a fikrên Vermeer ên derbarê çalakiya bi armanc a wergerê û nêrînên Reiss ên derbarê cureya tekstê. Ev rexne bi berhema wan a hevpar de jî dupat dibe, lewre mijarên wan di beşên cuda de û bi awayekî ji hev veqetiyayî cih digirin.

1.3.2.2. Teoriya Çalakiya Wergerandinê (Translational Action Theory)

Teoriya Çalakiya Wergerandinê piştî Teoriya Skoposê tevkeriya sereke ya Ekola Fonksiyonel e di qada wergerê de. Ev teorî jî her wekî Teoriya Skoposê, armanca wergerandinê datîne navendê û çalakiya wergerandinê jî bi armanca veguhestina peyaman a navbera çand û zimanan ve girê dide. Danerê vê teoriyê, Justa Holz-Mänttâri, akademîsyen û wergêreke hemwelatîyê Alman e ku bi eslê xwe Fînlandî ye. Holz-Mänttâri teoriya xwe di berhema xwe ya bi navê *Translatorisches Handeln: Theorie und Methode* de rave kiriye, lê belê ji ber nebûna çapeke berdest a vê berhema navborî em ê nêrînên wî ji çavkaniyên duyem ragihînin.

Munday (2001: 77-78) dide zanîn ku li gor ranêzikiya vê teoriyê, werger çalakiyek e ku ji zimanê jêder dest pê dike û di vê pêvajoya çalakiyê de hin rol û aktor hene ku bi biryar û tevgerên wan pêvajoyê sergihayî dibe. Ji wan aktoran yek *destpêşxer* (initiator) e ku pêwîstî bi wergerê dibîne. Destpêşxer dibe ku takekesek an jî şîrketek be. Yê duyem *navbeynkar* (commissioner) e û ew jî têkiliyê bi wergêr re datîne. Aktorek din jî *hilberînerê teksta jêder* e ku li şûna nivîskarê teksta resen digire. *Hilberînerê teksta armanc* jî beramberî rola wergêr e. Aktorên dawî jî *bikarînerê teksta armanc*, an ku yê ku teksta armanc ji bo armancekê bi kar tîne, û *wergirê teksta armanc* e ku ew jî xwînerê wergerê ye. Ji vê pênasekirinê jî diyar e ku werger wekî berhem di encama têkiliya wan rol û aktoran de derdikeve holê.

Nord (1997: 13) jî derbarê Teoriya Çalakiya Wergerandinê de balê dikişîne ser kargînî û rola beşdarên çalakiyê û sê faktoran derdixê pêş. Ew jî bi dorê ji faktorên wekî *pêvajoya wergerandinê*, *erk û rolên ku beşdarên çalakiya*

wergerandinê digirin ser milê xwe û şert û mercên ku çalakiya wergerandinê tê de dimeşe pêk tên. Mebesta wê bi beşdarên çalakiyê destpêşxer (kesê ku karê wergerê dide destpêkirin), wergêr û wergir/xwîner e. Şert û mercên çalakiya wergerandinê jî dem, cih û navgîn e. Pym (2010: 50-51) têkiliya nêzik û sedemgîr a fonksîyon, çalakî û armancê ya di vê teoriyê de şirove dike û diyar dike ku li gor Teoriya Çalakiyê werger pêkanîna ragihana nav-çandî ye ku ji ber armancekê û bi destê pisporên karê ragihanê pêk tê. Wekî encam, ji wan nêrînan jî diyar dibe ku Teoriya Çalakiya Wergerandinê wergerê li dor taybetiya çalakiyê û armancê pênase dike û li gor pêwîstiyên civakî û hêviyên derbarê wergerê jî fonksîyona wergerê destnîşan dike.

1.4. Têgih û Stratejiyên Sereke yê Wergerê

Di vê binbeşê de em ê bi kurtî qala hin têgih û stratejiyên wergerê bikin ku bi awayekî rasterast an jî nerasterast têkildarî mijara me ya xebatê û çarçoveya wê ya teorîk in. Di lîteratura wergernasiyê de li gel teoriyên sereke, hin têgihên giring hene ku bi awayekî bûne mijarên hemû teorî û ranêzikiyên têkildarî wergerê. Têgihên wekî hevtayî, guherîn, herikbarî, wergera serbest û wergera dilsoz û yê din hem di dîroka wergerê de û hem jî di niqaşên teorîk de timî derdikevin pêş. Her wisa hin stratejiyên hevpar jî hene, yê wekî bîyanîkirin, kedîkirin, lêanîn, deynkirin û yê din, ku wekî çareseriyên hevpar ên kêşeyên wergerê hatine pejirandin. Têkiliyeke nêzik di navbera têgih û stratejiyan de heye û hin têgih di heman demê de wekî stratejî jî tên qebûl kirin.

1.4.1. Têgihên Sereke

1.4.1.1. Hevtayî (Equivalence)

Têgiha hevtayiyê hem bi giştî ji bo ranêzîkî û teoriyên wergerê û hem jî bi taybetî ji bo çarçoveya teorîk û referansên fikrî yê wê xebatê têgiheke gelek giring e, lewre berevajî yê din, em ê li ser vê têgihê bêtir hûr bin. Hevtayî di wergerê de hem di asta tekstê de û hem jî di asta yekeyên biçûktir de ji bo pênasekirina taybetiyên têkiliya navbera teksta jêder û teksta armancê tê bikaranîn (Shuttleword, 2014: 49). Derbarê têgiha hevtayiyê de gelek wergernasan nêrînan xwe diyar kirine, lê belê em ê mijarê bi fikrên E. Nida, W. Koller, H. J. Vermeer, K. Reiss û M. Bakerê ve sînordar bikin, lewre ranêzîkî û nêrînan wan kesan bûne xîmê niqaş û şiroveyên kesên dîtir.

Nida (1964: 159-160) diyar dike ku her çî qas hevtayiyek yekser mimkun nebe jî, wergêr divê hewl bide ku bi qasî mimkun be di pêvajoya wergerê de bergindên hevta peyda bike. Nida du cureyên hevtayiyê bi nav dike ku yek ji wan *hevtayiya formel* (formal equivalence) e û ya din jî hevtayiya dînamîk (dynamic equivalence) e. Hevtayiya formel bala xwe dide ser peyamê û hem naverokê hem jî teşeyê li ber çav digire. Wergêr armanc dike ku peyama bi zimanê armanc bi awayekî rast û li gor tercîhên peyv, hevok û şêwaza nivîskarê berhema resen bigihîne zimanê armanc. Ji hêla din ve, hevtayiya dînamîk ji neqilkirina rast a peyamê bêtir bala xwe dide ser tîkiliya wergir/xwîner û peyamê. Wergêr di vê rêbazê de hewl dide ku xwînerê berhema werger jî wekî xwînerê berhema resen bikare berhemê bi heman awayî bixwîne û têbigihîje, û ji bo vê yekê jî li gor taybetiyên zimanê armanc wergerê dike. Bi rêya hevtayiya dînamîk werger li ber çavê xwîner wekî teksteke fêambar û nebiyanî xuya dike.

Li gor Vermeer û Reiss (2014: 128) hevtayî cureyeke tîkiliyê ye di navbera teksta jêder û teksta armanc de û ev tîkilî fonksiyona ragihanî ya berhemekê di her du çandan de û di heman astê de pêk tîne. Vermeer û Reiss têgiha hevtayiyê di asta tekstê de û di çarçoveya teoriya xwe ya bi navê Skopos de şirove dikin. Li gor wan, dema ku teksta jêder û teksta armanc heman fonksiyonê bi cih bibin, wê demê mirov dikare qala berhemeke wergerê ya hevta bike. Nord (1991: 25) ji bo hevtayiyê diyar dike ku têgiha hevtayiyê di wergernasiyê de yek ji wan têgihan e ku wateya wê yekser nediyar e û sedema nediyarbûna wateyî ya wê têgihê bi hêviyên cuda yên ji hevtayitîyê re girê dide. Nord (1991: 25-26) balê dikişîne ser nêrînên cihê yên derbarê hevtayiyê û destnîşan dike ku li gor hin angaştan divê teksta jêder û teksta armanc xwedî heman fonksiyonê bin û ev yek jî tîkildarî taybetiya pragmatîk a têgiha hevtayiyê ye. Her wisa hevtayî wekî teqlîdkirina teksta armanc a bi teksta jêder tê dîtîn ku ew jî faktoreke girêdayî naverok û teşeyê ye. Hêviyeke din a ku bi rêya hevtayiyê ji wergerê tê kirin ew e ku teksta armanc wate, nirx û bandora aîdî teksta jêder ji nû ve biafirîne. Hevtayî bi taybetî di nêrînên wergerê yên lînguîstîk de xwedî roleke navendî ye. Her wekî Nord destnîşan dike di ranêzikiyên lînguîstîk de ya giring teksta jêder bû ku diviya xasyetên wê di teksta armanc de bihata parastin (1997: 7). Niqaşa sereke ya li ser têgiha hevtayiyê de ew e ku alîgirên hevtayiyê nebûna wê her wekî pêknehatina wergerê dibînin, an ku li gor wan hevtayî tunebe werger jî nebûye.

Dîsa jî di nav demê de gelek wergernas qanîh bûn ku hevtayî di her şert û mercan de pêkan nabe.

Koller (2004: 159-272) cihekî berfireh ji têgiha hevtayiyê re (bi Almanî Äquivalenz) terxan kiriye û di pênc sernavan de ev têgih dabeş kiriye: hevtayiya denotatîf (denotative Äquivalenz), hevtayiya konotatîf (konnotative Äquivalenz), hevtayiya cureyî (textnormative Äquivalenz), hevtayiya pragmatîk (pragmatische Äquivalenz), hevtayiya formel (formal-ästhetische Äquivalenz). Mebesta Koller a bi hevtayiya denotatîf (denotative Äquivalenz) (2004: 228-240) neqilkirina naveroka tekstê ya rasterast e ku di ser peyv û gotinan re ev yek pêk tê. Hevtayiya Konotatîf (rr. 240-247) di navbera teksta jêder û teksta armanc de li gor tercîhên afirînerê tekstê, li gor wateyên xweserê berhemê û li gor hêmanên zimanî yên çandî, civakî û herêmî hewl dide hevsengiyekê çê bike.

Hem hevtayiya denotatîf û hem jî hevtayiya konotatif di asta peyv û gotinê de têkiliyeke hevta di navbera teksta jêder û teksta armanc de çê dikin. Pêkanîna hevtayiya denotatîf li gor a konotatîf hêsantir e, ji ber ku ya yekem bi wateya peyv û gotinan a eşkere re mijûl dibe, lê ya duyem bi mecazê û hêmanên çandî re eleqedar e. Koller (2004: 247-248) destnîşan dike ku hevtayiya cureyî li dor cureya tekstê kêşeya hevtayiyê dinirxîne û armanc dike ku cureyeke hevtayê teksta jêder di zimanê armanc de biafirîne. Ji bo ku hevtayî çê bibe pêwîstî bi parastina xasyetên cureyî yên teksta jêder heye. Hevtayiya pragmatîk (rr. 248-252) ji bergeha wergir/xwîner mijara hevtayiyê dinirxîne û bala xwe dide ser taybetiyên çandî û konteksta ragihandinê. Wergêrê ku armanc bike hevtayiyeye pragmatîk pêk bîne, lazim e şert û mercên ragihanî ji hêla zimanê armanc û xwînerên wê ve li ber çavan bigire. Hevtayiya formel (rr. 252-254) ji hêla taybetiyên estetîk ên berhemê û tercîhên şewazî yên afirînerê berhemê mijara hevtayiyê dinirxîne. Di cureyên edebî yên wekî helbestê de taybetiyên mîna serwayê û formên din dibin mijara hevtayiya formel.

Baker (1992: 17-228) jî li ser kêşeyên hevtayiyê radiweste û wan wekî kêşeyên hevtayiyê yên di asta peyvê de, kêşeyên di asta hevokê de û kêşeyên di asta tekstê de û wekî kêşeyên pragmatîk dabeş dike. Di asta peyvê de li ser lihevnegirtina wateya peyvan, li ser hevşûn (collocation) û biwêjan, bandora cudatiyên çandî û zimanî ya li ser wateyên peyvan û li ser fonksiyona peyvan a ku dema wergerandinê diguhere radiweste. Di asta hevokê de bala xwe dide ser

kêşeyên rêzimanî yê hevtayiyê ku ji cihêbûna zimanê jêder û zimanê armanc derdikevin holê. Di asta tekstê de Baker li ser cureya tekstê, bastûra tematîk û xasyetên pêşkêşkirina agahiyan radiweste û balê dikişîne ser giringiya însîcamê ku ji bo hevtayiya teksta jêder û teksta armanc hokareke giring e.

1.4.1.2. Guherîn (Shift)

Di pêvajoya wergerandinê de gelek caran yeke, heman û xasyetên din ên zimanê jêder li zimanê armanc nayên. Di rewşên wiha de wergêr pêwîst dibîne ku bi peyv, hevok û qalibên zimanî yê cihê peyama resen ji nû ve formule bike. Di encama wan tercîhên wergêr de jî bivê nevê hin guherîn çê dibin, heta di hin rewşan de ew guherînên navborî ne tercîh in, lê belê wekî neçarî derdikevin holê. Wergernas J. C. Catford (1965: 73-75) têgiha guherînê di çarçoveya lînguîstîk de pênase dike û wê wekî *guherîna astê* (level shift) û *guherîna kategoriyê* (category shift) dike du beş. Di guherîna astê de peyama zimanê jêder bi rêya guhertina asta zimanî tê ragihandin. Wekî mînak, dema hêmaneke rêzimanî ya zimanê jêder bi hêmaneke bêjeyî (lexical) were wergerandin guherîneke astê çê dibe. Guherîna kategoriyê jî têkildarî guherînên avaniya zimanî, komên peyvan û yekeyên zimanî ne. Di wan guherînan de qalibê rêzimanî yan jî cureya peyvê ya bi zimanê jêder di zimanê armanc de diguhere.

Popoviç (1987: 34-35) di ferhenga xwe ya termên wêjeyê de di bin sernavê guherînê de cih dide pênç cureyên guherînê û wan wekî: *guherîna takekesî*, *guherîna avaniyê*, *guherîna mijarê*, *guherîna neyînî* û *guherîna cureyî* pênase dike. Guherîna takekesî ji ber tercîh û şewaza wergêr çê dibe. Guherîna avaniyê tê wateya guherîna navbera şewaza berhema resen û şewaza berhema werger. Guherîna mijarê jî, her wekî ji navlêkirinê jî diyar dibe, têkildarî guherînên mijarî yê her du tekstan e. Guherîna neyînî ji ber têgihîştina xelet a naverokê diqewime ku wekî kêmasiyeke wergêr tê qebûlkirin. Guherîna cureyî têkildarî cureya berhemê ye, an ku cureya jêder di pêvajoya wergerê de rastî guherînên cureyî tê.

1.4.1.3. Rastbûnî (Accuracy)

Ev têgih di wergerê de tê wateya veguhestina rast a naveroka teksta jêder. Rastbûnî pîvanek e da ku mirov bizane bê ka naveroka wergerekê çi qas bi teksta resen re li hev dike (Shuttleworth, 2014: 3). Veguhestina tam û rast her tim di rojewa wergerê de cih girtiye, mijara rastiyê hem ji hêla rêbazê ve û hem jî ji hêla

dilsoziya wergêr û etîka wergerê ve hatiye niqaşkirin. Di pratîka wergerê de bi rêya têgiha rastbûniyê bala me diçe ser naveroka agahiya li nav teksta jêder û radeya parastin û neqilkirina wê ya rast. Di wergera serbest de pêwîstiya bi guhertinan û azadiya wergêr a nediyar rastbûniyê dike têgiheke şêlû. Ji ber vê çendê Newmark (1997: 77) rexneyê li helwesta serbest dike û dibêje ku werger çalakiyeke esîl û rastgo ye û lewma jî di karê xwe yê veguhestinê de divê girêdayî rastiye be. Rastbûnî wekî têgih bêtir di çarçoveya wergera rastîne de tê nixandî, ji ber ku bi wergereke girêdayî teksta jêder parastina naveroka berhema resen bêtir gengaz e.

1.4.1.4. Herikbarî (Fluency)

Herikbarî di wergerê de tê vê wateyê ku divê teksta werger her wekî teksta resen be, an ku xwînerên tekstê divê wisa hest bikin ku ew berhemeke werger dixwînin. Herikbarî her çî qas jî bo berhemekê bi giştî taybetiyeke erênî be jî, di qada wergerê de her tim wekî xaleke erênî nayê pejirandin. Di têkiliya berhema resen û berhema werger de herikbariya di zimanê armanc de gelek caran bi berdêla windabûn û jêbirina hin xasyetên teksta jêder pêk tê û xala ku tê rexnekirin jî ev e. Li gor Venuti ([1995] 2008: 12-13) herikbarî kevneşopiyeye desthilatiya Anglo-Saxon e û xwedî vê îdealê ye ku wergêr nedîtbar bike û bi vî awayî jî bi xwîneran bide hestkirin ku ew teksteke resen ê bi zimanê xwe dixwînin. Di vê tespîta Venuti de rexneya helwesteke emperyal heye, lewre wergerên ku ber bi Îngilîzî tînin kirin bi ser navê herikbariyê xasyet û zanavê xwe wînda dikin. Ji bo ku herikbarî pêk were xasyetên berhema jêder, hêmanên berhemê yê çandî tev tînin paşguhkirin û di encamê de jî berhema resen wekî xwe di zimanê armanc de xuya nabe.

Helwesta li hember herikbariyê li gor ranêzikiya jêder-navend û armanc-navend diguhere. Alîgirên jêder-navendiyê parastina rêbaza nivîskar û xasyetên berhemê yê resen giring dibînin û ji ber vê çendê jî qîmeteke talî didin herikbariya berhemê. Ji hêla din ve, teorî û ranêzikiyên armanc-navend afirandina berhemeke têkûz jî xwe re dikin armanc û ji bo pêkanîna vê armancê jî herikbariya berhemê dibê pîvaneke sereke. Wekî encam, herikbarî jî wekî gelek têgihên din ên wergerê, li gor ranêzîkî û pêşekiyan qîmetên cihê dibîne. Di ranêzikiyên armanc-navend de û li gor pîvana wergera serbest ew wekî xasyeteke

erênî tê dîtin, lê belê li gor pîvanên jêder-navendiyê û wergera dilsoz jî herkebarî bi xwe re gumanên rastbûna derbarê berhema wergerandî de çê dike.

1.4.1.5. Wergera Dilsoz (Loyal Translation) û Wergera Serbest (Free Translation)

Ev her du têngihên dijber di seranserê dîroka wergerê de bi navlêkirin û watedarkirinên cihê hatine niqaşkirin. Ji ber ku wate û pênasekirina wan her du têngihan bi têngiliya hev û din de têngîner e, em ê di bin yek sernavê de qala wan bikin. Girêdana bi berhema resen û nivîskarê wê re di lîteratura Îngilîzî de bi peyvên wekî *fidelity*, *faithfulness* û *loyalty* hatine pênasekirin û di navbera wan peyvyan de hin nuansên wateyî hene. Ev nuans jî bi piranî girêdayî şêwe û radeya dilsoziyê ne, lewma jî me di vê xebatê de dilsozî di wateya herî berfireh û tevgir de bi kar anî. Niqaşên li ser wan têngihan jî hem ji hêla etîkê ve û hem jî derbarê radeya dilsoziyê û serbestiyê de çê bûne.

Wergera dilsoz girêdana wergêr a bi nivîskar û berhema resen re destnîşan dike, an ku wergêr hem ji peyam û şêwaza nivîskar re û hem jî xasyeta berhemê re dilsoz e û tercîhên xwe yê di pêvajoya wergerandinê jî bi vî awayî dike. Berevajî vê, wergera serbest pabendî şêwaz û teşeya berhema resen nîn e û bêtir hewl dide ku naverok û peyama berhemê ragihîne xwînerê armanc (Palumbo, 2009: 49). Têgiha dilsoziyê (*loyalty*) di gelek çavkaniyan de beramberî têngiha wergera rastîne (lîteral) tê bikaranîn, lê belê Nord fonksiyoneke din li vê têngihê bar dike. Li gor Nordê (2011: 33) wergêr, wekî navbeynkarê du çand û zimanên cihê, hem li hember berhema resen û nivîskarê wê, û hem jî li hember xwînerên berhema werger ên ku li hêviya teksteke têngîner û herikebar in xwedî berbirsîyarî ye. Ji vê helwesta wê jî diyar dibe ku ji bo Nord dilsozî û girêdana wergêr ne bi tenê ji bo berhema resen û nivîskarê wê ye, lê belê wergêr divê daxwaz û hêviyên xwînerê wergerê jî li ber çav bigire, an ku jê re dilsoz be.

1.4.1.6. Jêder-navendî (Source-oriented) û Armanc-navendî (Target-oriented)

Di dîroka wergerê de û di gelek teorî û ranêzikiyan de jêder-navendî û armanc-navendî wekî du fikr û helwestên dijber bûne mijara niqaşan. Gelek fikr û teorî bi wan her du têngihan ji hev cuda dibin. Jêder-navendî û armanc-navendî di ranêzikî û teoriyên cihê de bi navên têvel hatine binavkirin, lê belê timî heman

helwestê tilnîşan dîkin. Wekî mînak, di serdema Romayê de wekî dijberiya *verbum verbo* û *sensum sensoyê*, di ranêzikiyên lînguîstîk de wekî *hevtayiya formel* û *hevtayiya dînamîk* hatiye binavkirin. Di nêrînên J. Houseê de *wergera vekirî* (overt translation) û *wergera girtî* (covert translation), di teoriya C. Nordê de *wergera belgeyî* û *wergera navgînî*, di ranêzikiya L. Venuti de *kedîkirin* û *biyanîkirin* tev bi têgihên jêder-navendî û armanc-navendiyê re têkildar in. Jêder-navendî di teoriyên wergerê yên lînguîstîk de bêtir cih digire û dibe pîvana wergerandinê û rexneya wergerê. Ji salên 1970yan û pê de, bi bandora teoriyên çandî yên wergerê êdî armanc-navendî wekî helwest zêdetir tê pejirandin. Ranêzikiya Pênaseker, Teoriya Polîsîstem û Ekola Manîpûlayonê temsîlên xurt ên armanc-navendiyê ne.

1.4.2. Stratejiyên Wergerê

Stratejiyên wergerê ji hin rêbaz û teknîkan pêk tên ku di pêvajoya wergerandinê de ji wergêran re dibin alîkar. Stratejiyên wergerê wekî qayde û pîvanên giştî ne û wergêr ji bo ku armanca xwe ya wergerandinê pêk bîne ji wan sûd werdigire. Di wateya xwe ya teng de stratejî ji bo rêbaz û teknîkan tê bikaranîn ku wergêr bi alîkariya wan kêşeyên di pêvajoya wergerandinê de çareser dike (Palumbo, 2009: 132). Rola stratejiyên wergerê di pêvajoya wergerandinê de giring e. Li gor Chesterman (1997: 89-91) stratejî helwesta wergêr û biryarên wî/ê yên di pêvajoya wergerandinê de kifşe dîkin, an ku wergêr bi stratejiyên ku bijartine têkiliyekê navbera teksta jêder û teksta armanc çê dike. Stratejiyan wekî berpê-armanc (target oriented), berpê-kêşe (problem-oriented) dike du çiqên sereke ku her yek ji wan li gor pêşekiyên wergêr di pêvajoya wergerandinê de dibin xwedî erk. Chesterman (1997: 92-112) xwedî vê fikrê ye ku stratejiyên wergerê ji ber pêwîstiya çêkirina guhertinê ya di teksta jêder de derketine holê û lewre jî li gor cure û asta guhertinê senifandina stratejiyan wiha dike: 1) stratejiyên têkildarî hevoksaziyê, 2) stratejiyên têkildarî watenasiyê, 3) Stratejiyên pragmatîk. Stratejî û teknîkên wergerê ji hêla hejmarê ve gelek in, ji ber vê çendê li jêr em ê bi kurtî qala hin stratejiyên sereke bikin ku hem di vê xebatê de û hem jî bi giştî di qada wergerê de kartêker û kargîn in.

1.4.2.1. Wergera Rastîne (Literal Translation)

Di stratejiya rastîne de wergêr li gor forma ku di zimanê resen de heyî wergereke hevta çê dike. Di vê stratejiyê de hem forma zimanê resen û hem jî taybetiya rêzimanê tê parastin û ew taybetî di zimanê armanc de tê nîşandan (Palumbo, 2009: 70). Wergêr dema ku pêşekiyê bide teşeyê, an ku armanc bike ku teşeya berhema resen nîşanî xwîner bide, vê stratejiyê tercîh dike. Her çî qas neyê heman wateyê jî, wergera rastîne wekî têngî ji nêzik ve bi têngîha wergera dilsoz re têngildar e. Wergera dilsoz wekî têngî derbarê helwesta wergêr de ye, lê belê têngîha wergera rastîne bêtir wekî teknîk û tercîheke rêbazê tê dîtin.

1.4.2.2. Deynkirin (Borrowing)

Dema ku di zimanê armanc de hevtayê peyveke zimanê jêder tune be, wê demê bi rêya deynkirinê peyv an jî gotin bi şiklê resen wekî deyn tê standin û wisa tê bikaranîn (Palumbo, 2009: 14). Tiştê ku deynstandinê pêwîst dike dûrahiya çandî ya zimanan e, lewre di hemû ziman û çandan de tiştên ku wergera wan nepêkan an jî dijwar hene û ew jî gelek caran ji hêla zimanê wergir ve deyn tînin standin.

1.4.2.3. Libergirtin (Calque)

Libergirtin wekî teknîkeke wergerê dişibe deynkirinê, lê belê li şûna deynstandina gotina resen, di vê teknîkê de teşeya peyvê an jî gotinê dibe mînak ji bo ku di zimanê armanc de hevtayê vê bê çêkirin. Bi rêya teknîka libergirtinê hem gotin hem jî hevok di zimanê armanc de dibe bîr çêkirin (Palumbo, 2009: 15). Ji bo ku di zimanê armanc de hevner û hevwatera peyvê bê peydekirin tekst peyv bi peyv tê wergerandin.

1.4.2.4. Eşkerekirin (Explicitation)

Ev teknîk di teksta armanc de ji bo zelalkirina agahiyên sergirtî yê li nav teksta jêder tê bikaranîn (Baker, 2001: 80). Eger wergêr pêwîst bibîne ku hêmaneke teksta jêder ji bo xwînerê armanc bike tiştê têngîner, wê demê vê teknîkê bi kar tîne. Dema ku biryara vê yekê digire, wergêr hin tiştên teksta jêder jê kêmkirî dike û tiştên nû li teksta armanc zêde dike. Di çarçoveya eşkerekirinê de wergêr carinan pêwîst dibîne ku di teksta jêder de serî li rêbaza kêmkirinê (omission) bide an jî di teksta armanc de jî tiştê lê zêde (addition) dike.

1.4.2.5. Telafikirin (Compensation)

Di pêvajoya wergerê de bivê nevé hin hêmanên teksta jêder winda dibin, ji ber vê çendê wergêr li şûna hêmanên windabûyî di teksta armanc de hin hêmanan wekî berdêl li tekstê zêde dike (Palumbo, 2009: 21). Wekî mînak, di helbestê de li şûna alîterasyona di teksta jêder de wergêr serwayê bi kar tîne da ku taybetiya şiklî ya berhema resen heta radeyekê biparêze. Di telafikirinê de jî, her wekî eşkerekirinê, teknîkên kêmkirin û zêdekirinê dibe bèn bikaranîn.

1.4.2.6. Modulasyon (Modulation)

Modulasyon wekî teknîk guhertinên têkildarî şêweya ragihanê ku di pêvajoya wergerê de çê dibe destnîşan dike. Guhertinên bi rêya modulasyonê çê dibin ji peyv û rêzimanê bêtir guhertinên têkildarî şêwe û bergeha vegotinê ne (Shuttleworth, 2014: 107-108). Wekî mînak, hevoka erênî ya teksta jêder di teksta armanc de wekî hevokeke neyînî dibe bê wergerandin û ew jî dibe modulasyon. Dîsa wergerandina hêmaneke razber a bi tiştêkî şênber, wergera teşeya lebatî ya hevokekê ya bi hevokeke tebatî mînakên modulasyonê ne.

1.4.2.7. Lêanîn (Adaptation)

Wergêr di pêvajoya wergerandinê de ji ber sedemên zimanî, çandî an jî ji ber armancên cihê yên bikaranîna teksta wergerê di hin mînan de guhertinên berbiçav pêk tînin ku wekî lêanîn tê binavkirin. Li gor pênaseya Shuttleworth (2014: 3-4) adaptasyon ew teksta jêder e ku bi stratejiyê wergera serbest hatiye wergerandin. Baker (2001: 6) lêanînê wekî stratejiyê wergerê bi nav dike û diyar dike ku dema berginda konteksta teksta jêder di teksta armanc de tune be, wê demê pêwîstiya veafirandinê xuya dibe û ev yek jî dibe lêanîn. Eger ku guhertin di asta hêmanên biçûk an jî beşên biçûk ên tekstê de çê bûbe, wekî teknîkê wergerê tê qebûlkirin, lê belê dema ku guherîn têkildarî armanc, fonksiyon an jî bandora tekstê be, wê demê wekî stratejî tê qebûlkirin (Palumbo, 2009: 6-7). Ev têgih dide kifşê ku di tekstê de guherînên bingeîn hatine çêkirin da ku tekst li rewş û bendewariyên wergirên spesîfîk (wekî mînak ji bo zarokan) bigunce an jî ji ber armanceke din ew guherîn tînin kirin. Pêwîstiya bi lêanînê ji ber daxwaz û pêşekiyên wergiran û qaydeyên nivîskî û edebî yên zimanê armanc derdikeve holê.

1.4.2.8. Biyanîkirin (Foreignization) û Kedîkirin (Domestication)

Ev her du têgih hem wekî stratejiyeke wergerê tên bikaranîn û hem jî wekî helwesteke li hember teksta jêder di qada wergernasiyê de cih digirin. Li gor pênaseya Palumbo (2009: 48) biyanîkirin stratejiya dîtbarîkirina teksta jêder a di teksta armanc de ye. Kedîkirin jî ji hêla ziman û şêwazê ve afirandina teksteke şefaf û herikbar e ku di encamê de teksteke kedîbûyî derdikeve holê (Palumbo, 2009: 38). Di wergereke kedîkirî de teksta jêder li gor nirx û pîvanên zimanê armanc teşe digire. Ev têgih jî bi xebatên Venuti ketiye rojeva wergernasiyê. Venuti (1995: 5-20) têgihên biyanîkirin û kedîkirinê wekî du helwestên wergerê yê dijberî hev di çarçoveyeke çandî û îdeolojîk de nirxandiye.

Di stratejiya biyanîkirinê de wergêr xwîner ber bi nivîskar dibe. Di teksta wergerandî de haya me bi hebûna wergêr çêdibe, û lewre jî wekî xwîner em dizanin ku ew metna li pêş me ne metna orîjînal e. Wergêr di vê rêbazê de xuya dibe û ji bo ku vê yekê pêk bîne, wergêr hin qalib, peyv, taybetmendiyên ziman û çanda jêder di metna armanc de diparêze û wan dide xuyakirin. Xasyetên tekstê û xasyetên çand û zimanê teksta resen di wergerê de tên parastin. Kedîkirin li gor biyanîkirinê bêtir dibe tercîha wergêran û wekî stratejî jî zêdetir derdikeve pêş. Bi rêya kedîkirinê wergêr hewl dide ku mesafeyên çandî nêzikî hev bike. Di kedîkirinê de armanca wergêr ew e ku tekstê wisa wergerîne ku dema xwendevan metnê dixwîne, nizanibe ku ew metna dixwîne werger e. Wergêr metnê nêzî ziman û çanda armanc dike, qalib û peyvên çanda armanc bi kar tîne û bi her awayî wergerê dike malê wî zimanî. Wekî encam jî wergêr di metnê de ji holê radibe, an ku nedîtbar dibe.

1.5. Wergera Edebî

Pênasekirina wergera edebî di ser berhema werger re, bi şêwaza wergerandinê ya edebî û bi cureya nivîsê ya ku tê wergerandin tê kirin. Baker (2001: 127) wergera edebî wekî berhema wergêrên edebî pênase dike û xwedî vê angaşê ye ku divê ravekirina wergera edebî ji vê pênaseyê dest pê bike. Toury (1995: 175) wergera edebî (literary translation) wiha disenifîne: a) wergera berhemekê ya ku teksta jêder wekî berhemeke edebî hatiye qebûlkirin û b) wekî şêwazeke wergerê ku, teksta jêder bi çî cureyê be jî, di encamê de teksta armanc wekî teksteke edebî tê qebûlkirin. Ji pênaseya Toury diyar dibe ku wergera edebî

hem wergera bi şêwaza edebî û hem jî wergera berhemên edebî digire nav xwe. Di mijara wergera edebî de wergernas timî li ser cudatiya wê ya ji wergera tekstên din radiwestin û vê yekê jî bi taybetmendiya tekstên edebî yên ji hêla zimanê edebî û sazûna teşeyî û naverokî ve rave dikin. Li gor Ghazala (2015: 135) wergera edebî şêweyêke taybet a wergerê ye ku bi tenê ji wergera cure û jêrcureyên edebî re têkildar e û hemû xasyetên edebîtiyê û şêwaza afirîner a berhema resen li ber çav digire. Niqaşên derbarê wergera edebî li ser pênaseya wê kêmtir in, lê belê kesên ku di vê mijarê de nêrînên xwe diyar kirine bêtir taybetiyên wergera edebî, fonksiyona wê û kêşeyên wê derdixin pêş.

Riffaterre (1992: 204-206) diyar dike ku bingeha cudabûnê ya wergera edebî ya ji wergera giştî ew e ku bikaranîna zimên a di edebiyatê de ji bikaranîna gelemperî cihêtir e, û têkildarî vê cihêbûnê jî Riffaterre behsa hin peywîr, pêwîstî û pêşmercên dike ku em ê bi kurtî şirove bikin. Peywireke wergera edebî, her wekî berhema resen, bi rêya teknîkên dubarekirinê dîtbarkirina teşeyê û dangan e. Peywira duyem jî ew e ku wergera edebî hem wateyê û hem jî taybetmendiya tekstê neql bike. Ew her du peywîr jî didin kifşê ku di wergera edebî de divê kodkirineke nû ya hem li gor avaniyê û hem jî li gor hêmanên naverokî çê bibe. Riffaterre pêşmercên wergera edebî derdixe pêş da ku pêwîstiyên wergerê bide xuyakirin. Pêşmercê wergerê hebûna teksteke jêder e. Di nav vê teksta jêder de taybetiyên edebî li gor xwe hin pêşmercên çê dikin. Pêşmercê berhema edebî hebûna nivîskarekî ye. Pêşmercêkî din jî şêwaz û mijar e û ew her du jî bi pêşmercê cureyêke edebî û bi zimanê civakê li hev diguncin. Îcar, wergera edebî bi hevtayîya wan pêşmercên pêk tê, lê divê bê zanîn ku hevtayî di heman astê de pêk nayê. Di hevtayîkirina teksta jêder û ya armanca de Riffaterre balê dikişîne ser xaleke giring ku tercîha wergêr dide kifşê. Wergêr an dê pêşmercên teksta jêder rasterast neql bike, an jî ew ê barê pêşmercên biqelibîne ser parçeyêke din a tekstê. Di tercîha yekem de wergêr li şûna ku pêşmercêkê nû biafirîne, pêşmerca teksta jêder werdigerîne, lê di tercîha duyem de wergêr ji bo hemû an hin pêşmercên yên nû diafirîne.

Nêrînên Walter Benjamin (1992: 71-76) ên ku em ê li jêr bi kurtî qala wan bikin, rêya niqaş û nirxandinan vekirîye derbarê wergera berhemên edebî de. Li gor Benjamin werger taybetiyêke teşeyî ye û ji bo ku mirov wergerê wekî teşe fêhm bike divê mirov bala xwe bide ser berhema resen. Wekî pirsên sereke divê

mirov wan bipirse: 'gelo ew berhem a wergerandinê ye? û 'ji ber çi sedemê wergera wê pêwîst dike? Eger armanca wergerê bi tenê şibandina bi berhema resen bûya, hingê tiştêkî wekî wergerê pêkan nedibû, lewre hem jiyana berhema resen piştî ku tê afirandin diguhere, hem jî wergera heman berhemê wekî xwe namîne, an ku xitabî hemû deman nake. Berhema resen di çarçoveya wergerê de derdikeve asteke bilind û saf, lê belê hemû xasyetên xwe nikare biparêze, an ku hin tiştan ji xwe winda dike. Benjamin di vê fikrê de ye ku berhemên edebî dema ku tên afirandin, xwîneran li ber çav nagirin û di nav wan de jî kêma agahî hene ku bîna ragihandin. Lewre eger wergerê hewl bide agahiyan neqîl bike xwîneran û karê xwe bi tenê ji bo xizmeta xwîner bike, wê demê ew dibe wergera xirab.

Taybetiyên teksta edebî li gor xwe hin pêwîstî û peywiran jî derdixin holê. Li gor Devy (1999: 183) werger wekî berhemên resen nayên dîtin, ji ber vê yekê estetîka wergerên edebî jî tê paşguhkirin. Lê belê, her ku berhema edebî nivîseke aşopî ye û sêwirîna nivîskar di hewîne, bi heman awayî wergera wê berhemê jî divê wan xasyetan li ber çav bigire. Li gor House (2018: 15) di berhemên edebî de teşeya zimanî (linguistic form) bi awayekî rasthatinî xuya nabe, an ku xwedî armanceke estetîk e, lewma jî di wergerandina wan berheman de teşeya berhemê divê bibe faktoreke esasî ya wergerê. Di wergera edebî de wergerê û şiyana wî/ê ya hunerî di navendê de ye û tiştê ku wergera edebî ji wergerên din cuda dike ew e ku di teksta edebî de forma zimanî û naveroka tekstê ji hev nayên veqetandin.

Wergera edebî bi derengî bûye qadeke lêkolîna wergernasan. Hermans (2014: 7) rexneya vê yekê dike û dibêje ku di berhemên derbarê teorî û rexneya wergerê de mijara wergera edebî hatiye paşguhkirin. Göktürk (2004: 37) balê dikişîne ser keşîfkirina dereng a berhemên edebî ya ji hêla lêkolînên wergerê û wekî sedema vê yekê jî diyar dike ku lêkolînên wergerê ku wekî qadeke zimannasiyê dihatin pêkanîn zêde bala xwe nedidan ser tekstên edebî. Li gor wî, zimanê berhemên edebî bi peyamên xwe û bi xasyetên xwe yê zimanî nedibûn mijara pîvanên zanistî û di wan de teqezî tune bû. Göktürk (2004: 38-39) li ser taybetiya teksta edebî û kêşeyên wergera wan radiweste ku bi kurtî nêrînên wî wiha ne: Teksta edebî bi çalakiya afirîner a xwîner wateya xwe bi dest dixe. Lewre nabe ku teksta edebî bi pîvanên teqez bê nirxandin. Tekstên edebî bi piranî li şûna wateyên rasterast ji wateyên kêlekî çê dibe û ew watedayîn jî gelek caran xweserê şewaza afirînerê tekstê ne, an ku girêdayî hin qalibên edetî nîn in. Di

encamê de jî, du pirsgirêkên sereke di wergera tekstên edebî de derdikevin holê: Di tekstên edebî de wateyên mecazî li gor wateyên heyî yên zimanê edetî çê nabin, lewre bi tenê bi şiroveyê wateya wan zelal dibe. A duyem jî, têgihîştina pirwateyî û têkilhev a teksta jêder divê di zimanê armanc de jî bi awayekî bê afirandin. Lewre pirsgirêka sereke ew e "ka gelo wateyên mecazî yên di zimanê jêder de dê bi heman bandora edebî bên hilberandin?".

Landers (2001: 10-11) xwedî vê fikrê ye ku temenê wergereke edebî 40-50 sal e. Piştî demekê wergera ku hatiye kirin piraniya jîndariya xwe winda dike, şiyana wê ya ragihanî ji holê radibe û di encamê de jî pêwîstiya ji nû ve wergerandinê derdikeve holê. Her çî qas zimanê teksta jêder zimanekê mirî be, an jî di teksta jêder de êdî guherîn çê nêbe jî, zimanê armanc timî diguhere, lewre em wergereke heyî îro wekî yeke baş bipejirînin jî, siberoj ew ê wekî tişteke kevn xuya bike. Dîsa jî, ew wekî mînakên awarte destnîşan dike ku hin wergerên serkeftî hene ku qîmeta xwe ya ragihanî winda nakin û her tim eleqeyê ji xwînerên edebiyatê dibînin. Landers (2001: 118-131) derbarê taybetiyên wergera edebî de balê dikişîne ser sê xalan ku di wergera edebî de dibin sedemê hin kêşeyan. Yek ji wan wergera tekstên kevn e ku wergêr di zimanê armanc de ji bijartina peyv û gotinan bigire heya kêşeyên bi anakronîzm û arkaîzmê re têkildar, neçar dibe ku gelek tiştan çareser bike.

Xala duyem ku Landers qal dike hebûna jêrtekst (subtext) an e di berhemên edebî de. Jêrtekst wateya sergirtî ya berhemên edebî didin kifşê, lewma jî giring e ku wergêr jêrtekstê, an ku wateya sergirtî ya berhemê, li ber çav bigire dema ku berhemê bi zimanê armanc ji nû ve diafirîne. Landers (2001: 130-131) behsa wergera nerasterast (indirect translation) jî dike ku ji ber hin şert û mercên taybet û ji hin neçariyan derdikeve holê. Ew têgihên wergera nifşê yekem (teksta werger) û wergera nifşê duyem (wergera ji wergerê) bi kar tîne û diyar dike ku xeletiyeye muhtemel a di wergera nifşê yekem de rasterast derbasî wergera nifşê duyem dibe û di ser de jî bi rêzewergeran reseniya teksta resen her ku diçe qelstir dibe (2001: 131). Ji nêrînên Landers jî diyar dibe ku hem ji ber xasyeta zimanê edebî û hem jî ji ber faktorên çandî, civakî û demkî wergera edebî mijareke têkilhev e û xwedî angaştên dînamîk e.

1.5.1. Wergera Cureyên Edebî

Di lêkolînên wergera edebî de *cureya edebî* (genre) û *cureya tekstê* (text type) du têgihên giring in. Her ku qesta bi wergera cureya edebî wergera cureyên wekî helbest, çîrok, roman û y.d. ne, cureya tekstê berhemên ku edebî nîn in jî digire nav xwe. Di vê xebatê de em li ser cureyên edebî radiwestin, lê belê ji ber têkildariya bi mijarê re em ê bi kurtî qala cureya tekstê jî bikin. Ev her du têgih di heman demê de ji bo kifşekirina tîpolojiya teksta wergerê jî kartêker in, lewre wergernas hem di pênasekirina kêşeyên wergerê de û hem jî di pêvajoya wergerandinê de ji bo bijartina stratejiyên guncav giringiyê didin tîpolojîyê.

Di nav teoriyên fonksiyonel de, bi taybetî di nêrînên K. Reiss, H. J. Vermeer û C. Nordê de têgiha cureya tekstê xwedî cihekî navendî ye. Vermeer û Reiss (2014 [1984]) li gor fonksiyonên wan, tekstan dabeş dikin û sê tîpolojîyên sereke destnîşan dikin: *tekstên agahîdêr* (informative), *tekstên derbirînî* (expressive) û *tekstên kartêker* (operative). Ew tekstên edebî dixin bin sernavê tekstên derbirînî ku berhemên bi vê cureyê xwedî hêmanên estetîk in û bi armanca bandoreke estetîk hatine nivîsandin. Li gor Nordê (1997: 27-31) armanca nivîsîna tekstekê, xwînerên armanckirî yên wê tekstê û armanca wergerandina wê tev ji nêzik ve bi cureya tekstê re têkildar in. Dema ku mirov di vê çarçoveyê de li ser cureya tekstê bifikire, cureya tekstê hem xasyeteke têkildarî niyeta nivîskar û berhemê ye, hem bandorê li ser xwîner çê dike û hem jî helwesta aktorên wergerê kifşe dike.

Reynolds (2011: 62) derbarê cureyan de diyar dike ku ew azmûneke hevpar a xwendinê ji girseyên berfireh ên xwîneran re dabîn dikin û vê yekê jî bi qalib û gotinên hevpar pêk tînin. Ev rastîya cureyan a ku Reynolds qal dike di wergerê de hem tercîhên wergêr ên raguhestinê û bijartina wergêr a peyv û gotinan diyar dike, û hem jî derbarê fonksiyona tekstê û bandorên muhtemel de fikrekê dide wergêr da ku mod û tona pêwîst bide tekstê. Armanca û fonksiyona tekstekê cureya tekstê diyar dike û lewma jî wergêr divê di pêvajoya wergerandinê de wan hokaran li ber çav bigire. Ji hêla wergerê ve, giringiya esasî ya teksteke cureya edebî ew e ku bê ka bandoreke çawa li ser tercîh û stratejiyên wergerandinê dike û kêşeyên çawa yên berbiçav derdixe holê.

Kêşeyeke sereke ya têkildarî cureya tekstê jî ew e ku carinan berginda cureyeke aîdî çand û edebiyata jêder di çand û edebiyata armanca de peyda nabe.

Li gor Woodstein (2022: 6-9) wergêr ne bi tenê nivîskar û teksta wî/ê radiguhezîne, lê di heman demê de cureyêke edebî jî radiguhezîne û ji bo vê yekê jî divê wergêr hem di çanda jêder de û hem jî di çanda armanc de ji cureyan beled be, da ku stratejiyên guncav ên wergerandinê bikare bibijêre. Her çî qas sînorên diyar hebin jî yê ku cureyên edebî ji hev cuda dikin, hin caran nivîskar wan sînoran jî xasyetên cureyî binpê dikin, lewre wergêr divê bala xwe bide ser dibetiyên bi vî rengî jî.

Em ê di çarçoveya sê sernavan de bala xwe bidin ser wergera cureyên edebî ku ew jî bi dorê wergera cureyên pexşanî yê wekî çîrok, roman û cerebe, wergera helbestê û wergera şanonameyan e. Jixwe tekstên ku me ji bo dahûrandinê bijartin di bin wan sernavan de kom dibin. Di nav cureyên edebî de herî zêde li ser cureya helbestê niqaş çê bûne, ji ber ku têkiliya helbestê ya bi ziman û çandê re li gor cureyên pexşanî bêtir girifdar û taybet e û ji hêla kompozîsyon û hêmanên din ve kêşeyên wê jî zêdetir in. Ev kêşe ew qas zêde ne ku pêkaniya wergera helbestê jî gelek caran hatiye bilêvkirin. Bi vê xasyeta xwe ya niqaşbar û kompleks, wergera helbestê hêjayî qalkirineke berfirehtir e li gor cureyên din. Di cureya şanonameyan de nîvenga niqaşan li ser wergirê tekstê ye. Di cureyên pexşanî de jî hevoksazî, bastûra giştî û gewdeya tekstê dibe mijara dahûrandinê.

1.5.1.1. Wergera Cureyên Pexşanî

Cureyên pexşanî cureyên edebî digire nav xwe yê wekî roman, çîrok, cerebeya edebî, vegotin, mesel û yê din ên ku derveyî nezmê ne. Cureyên pexşanî, berevajî nezmê, bi piranî berhemên dirêj in û ji hêla mijar û naverokê ve jî berfirehtir in. Di nav berhemên pexşanî de agahiyên berfireh ên çandî û dîrokî hene. Cureyên wekî pexşana edebî û cerebe ji bilî edebîtiyê gelek caran hêmanên fikrî û îdeolojîk jî dihewînin û ev yek jî ji bo wergêr pêwîstiya zanyariyêke berfireh derdixe holê. Roman, çîrok, mesel û fabl li dor çîrokekê vegotina xwe saz dikin û ji ber vê çendê jî di wergera wan berheman de neqilkirina çîrokê dibe xala herî giring. Her ku cureyên pexşanî ji aliyê cihêrengiya cureyan ve dewlemend û pirhêl e, di wergera berhemên pexşanî de ji bilî zanyariyên berfireh ên çandî pêwîstî bi zanîna şêwazgerî û taybetiyên zimanî jî çê dibe.

Wergernasan ji hêla teorîk ve bi qasî cureya nezmê bala xwe nedane ser cureyên pexşanî û ji ber vê yekê jî di lîteraturê de stratejî an jî modelên teqez ji bo

cureyên pexşanî nîn in. Wisa xuya ye ku zimanê pexşanî bi qasî zimanê helbestê dijwar nehatiye dîtî ku di wergerê de kêşeyên spesîfik derxîne holê. Her wisa, kêşeyên di wergera şanoyê de tînin dîtî, bi taybetî jî cudatiya metna şanoyê ya xwendinê û lîstinê ji bo cureyên wekî roman û çîrokê derbasdar nîn in. Bassnett (2002: 114) kêmbûna nêrîn, stratejî û lêkolînên derbarê cureyên pexşanî bi du faktoran ve girê dide. Ya yekem, helbest li gor pexşanê di asteke bilintir a edebî de hatiye qebûl kirin û ji ber vê çendê jî bêtir bûye mijara lêkolînê. Ya duyem jî, zimanê pexşanî bi qasî zimanê helbestê dijwar xuya nekiriye li pêş çavên wergernasan û lewma jî pêwîstî bi lêkolînên zêde nedîtine. Barslund (2011: 104) jî xwedî vê fikrê ye ku wergera cureyên pexşanî ji ber nûbûna cureya romanê û çîroka modern di wergera wêjeyê de mijareke nû ye.

Di gel vê yekê jî hin wergernasan, bi awayekî gelemperî be jî, derbarê wergera pexşanê de nêrînên xwe diyar kirine. Belloc (1931: 11-14) derbarê wergera pexşanê de qala 6 rêgezên dîke ku divê wergêr bi taybetî bala xwe bidinê:

- 1) Divê wergêr naverok û wateya berhemê ne hevok bi hevok bes di çarçoveya beşekê de an jî qet nebe di çarçoveya paragrafê de binirxîne û wisa veguhezîne.
- 2) Divê biwêja zimanê jêder bi biwêjeke ji zimanê armanc bê wergerandin, lê eger ev ne pêkan be jî, pîvana hevoka bê lêker rêbazeke kêrhatî ye.
- 3) Divê gotinên qalib ên biyanî li gor niyeta tê de bînin wergerandin, eger bi tenê li gor wateya rasterast bê wergerandin, wê demê encamên sosret derdikevin holê.
- 4) Dema ku berhemeke aîdî serdemeke din a dîrokî tê wergerandin, wergêr divê bala xwe bide ser peyvên ku di nav demê de wateya wan guheriye. Lazim e wergêr vê pîvanê hem ji bo zimanê jêder û hem jî ji bo zimanê armanc pêk bîne.
- 5) Eger ji bo ragihandina wateya rast pêwîst bike, divê wergêr ji zêdekirina peyvên netirse û bi awayekî wêrek hêmanên pêwîst daxilî wergera xwe bike.
- 6) Lê belê, divê wergêr hewl nede berhema pexşanî bi dilê xwe bineqîşîne û divê tiştên estetîk li ba xwe lê zêde neke.

Newmark (1988: 171) di wergera cureyên pexşanî de wergera du cure peyvên giring dibîne ku yek ji wan *leitmotif* (motîfa sereke) e û ya din jî peyvên sereke ne ku şêwaza nivîskar didin nîşan. Leitmotif taybetiyeke cureya çîrokê ye û karakterekî an jî rewşekê nîşan dide ku bi piranî di çîrokê de dubare dibe. Peyvên sereke yê ku nivîskar wekî destnîşana xwe bi kar tînin parçeyekê nivîskariya wan e. Wergêr divê di wergera wan de baldar be û di wergerê de hindî ji dest hat wan

hêmanan dîtbar bike. Newmark (1988: 171-172) derheqê wergera romanê de li şûna rêgezên giştî yên wergerê, analîza şêwaza romanûs û analîza taybetiya edebî ya romanê derdixe pêş ku divê wergêr wan mijaran ronî bike, berî ku dest bi wergerandinê bike. Haque (2012: 97-98) derbarê kêşeyên wergera cureyên pexşanî de diyar dike ku naverokên çandî yên berheman, eger ku zimanê jêder û zimanê armanc ji hêla çandî ve ji hev dûr bin, kêşeyên dijwar çê dikin ji bo wergêr. Her wisa xasyetên mîzahî, zimanê argo û navê berheman jî bi çanda xweser re têkildar in ku berhem tê de hatiye afirandin. Gelek caran navê roman û çîrokan ji bo wergêran dibe kêşe, lewre navên berheman jî bi awayekî bi çanda jêder re têkildar in û ihtimal heye ku bergindeke guncav ji bo wan neyê peydakirin di zimanê armanc de.

Çawa ku di wergera helbestê de xasyetên teşeyî dibin faktorên giring, di cureyên pexşanî de jî hevoksazî ji hêla wergerê ve giring e, lewre raguhestina bûyerê û avakirina konteksta çîroksaziyê di ser hevokê re çê dibe. Her wekî Barlund (2011: 104) jî destnîşan dike, wergera cureya pexşanî ya edebî veguhestina çîrokekê ya bi zimanekî din e. Bi vî awayî jî dibe danûstandina çîrokekê ya navbera du zimanan. Nemaze di roman û çîrokê de ragihandina bi rêkûpêk a bûyerê ji bo veguhestina naverokê û ji bo nîşandana taybetiya berhemê jî pêwîst e. Tercîhên wergêr ên têkildarî dema bûyerê, cureya lêkerê, biker û bervêderê bûyerê tev bandorê li ser têgihîştina xwîner dikin. Wekî mînak, eger hevoka aktîf wekî hevokeke pasîf were wergerandin, an jî eger di raweya deman de guhertin çê bibe, ev yek tev bandorê li ser fonksiyona tekstê û hevtayiyê dikin. Her ku cureyên pexşanî wekî derbirîna rasterast a raman û hestan tînin dîtîn, di wergera cureyên pexşanî de gelek caran wergêr şêwaza vegotinê paşguh dikin. Tona vegêr, atmosfera rewşê û tîkiliya bûyer û karakteran bi piranî di ser şêwaza vegotinê re saz dibe, lewma jî wergêr divê xwe bi naverokê ve sînardar neke û bala xwe bi taybetî bide faktorên têkildarî şêwaza vegotinê.

1.5.1.2. Wergera Helbestê

Wergera helbestê di dîroka wergernasiyê de bûye mijara niqaşên cihêreng û zêdetir jî li ser pêkanî û nepêkaniya wergera helbestê gengeşî çê bûne. Angaştên ku nepêkaniya wergera helbestê derdixistin pêş di nav demê de lawaz bûn, lê belê kesên ku pêkanbûna wergera helbestê red dikirin dîsa jî xwedî îdîayên xurt bûn. Angaştên sereke her wekî Shi (2012: 3) destnîşan dike ew e ku helbest bi

destkariyê bedewiya xwe winda dike, lewre werger jî cureyeke destkariyê ye. Di pratîkê de ew angaşt nebû astengî ji bo wergera helbestê, lê bû sedemek giring ku wergera helbestê ji wergera cureyên din cudatir bê dîtin. Shi bi xwe jî di vê baweriyê de ye ku estetîka helbestê dikare bi zimanekî din ji nû ve bê hilberandin, bi şertê ku wergêr bi awayekî serkeftî bikare deqa jêder bi zimanê armanç biguncîne, wê demê xwîner dê tahmeke nêzikî ya resen wergerin. Li gor Shi (2012: 4) wergêr divê di nav hemû fonksiyonên teksê de fonksiyona estetîk li ser yê din bigire û eger di wergerê de ew fonksiyona estetîk pêk neyne hingê wergereke xirab derdikeve holê.

Di warê nîqaşên têkildarî nepêkaniya wergera helbestê de nêrînên Bassnettê hêjayî qalkirinê ne. Bassnett (1998: 57-58) balê dikişîne ser nêrînên neyînî yê derbarê pêkaniya wergera helbestê ku di nav wan de gotina navdar a Robert Frost heye her ku dibêje 'helbest ew tişt e ku di proseya wergerê de winda dibe'. Bassnett wan fikrên ku helbestê wekî 'tişteki ku dest lê bikeve dê xirab bibe' û helbestvan jî wekî 'kesekî xwedî xasyetên bijarte' dibînin rexne dike. Li gor Bassnettê (1998: 58) baweriyê ku helbestê wekî tişteki 'nayê wergerandin' qebûl dike ji wê pîrozî û hêjabûna pirolekirî ya statuya helbestvan a di serdema romantîk de tê. Helbestvan wê demê xwedî gelek rol û qîmetên din ên bilind bûn û gotina wan jî dibû tişteki giran û neguherbar. Bassnett (1998: 66) taybetiya zimanê helbestê înkâr nake, lê tiştê ku li dijî disekine mîtolojiya nepêkaniya wergerandina helbestê ye. Ew bi xwe jî taybetiya zimanê helbestê destnîşan dike, her ku dibêje helbestvan bi ziman dileyize û bi vê leyîstinê zimanekî taybet saz dike ku neyê guhertin û şikandin. Ji hêla din ve jî peywîra wergêr ew e ku zimanê ku helbestvan saz kiriye ji hev cuda bike û piştî jî bi zimanekî din dîsa bi ser hev de bîne.

Wechsler balê dikişîne ser berhemên têkûz ên edebî ku sînoren zimanan nas nakin û dibêje ku "Rast e ku berhemeke hêja piştî wergereke normal jî dîsa şewq dide, lê eger ew berhem helbest be, hingê dibe ku piştî wergerandinê bi qasî berê wekî berhemeke gewre şewq nede" (1998: 19). Ew gotin rewşa hesas a helbestê ya li hember wergerê nîşan dide. Estetîka helbestê di pêvajoya wergerandinê de bêtir tûşî xeterên xirabûnê tê li gor berhemên pexşanî. Ev yek jî ji ber xasyeta zimanê helbestê tê. Li gor şayesandina Baker (2001: 171), helbest di nav cureyên edebî de ya herî yekgirtî, tîr û bilind e. Di vê cureya nivîsa edebî de

ziman bi şikleki nerastrast tê bikaranîn, û şikl û naverok bi awayekî ku ji hev neqetin bi hev re pêwendîdar in. Shi jî balê dikişîne ser heman mijarê her ku xasyetên helbestê yên bijarte dikirpîne. Li gor Shi (2012: 51) helbest ne bi tenê peyv in û ne jî bi tenê kêşsazî ye. Helbest musîqaya peyvane, şêwazeke nêrîna li cîhanê û tecribeya me ya jiyane ye. Helbestnûs vê nêrîna xwe û tecribeya xwe ya jiyane bi peyv û metaforên wisa taybet radigîne ku gotinên edetî dikevin nav qalibên formel.

Li hember vê taybetiya hesas a wergera helbestê, di qada wergerê de lêgerîna çareseriyên her tim çê bûye. Baker di çareserkirina kêşeyên wergera helbestê de du helwestên sereke destnîşan dike. Ji wan helwesta pragmatîk ranêzikiya wergêran nîşan dide û zêdetir têkildarî karên pratîkî yên wergerê ye. Helwesta teorîk jî girêdayî modelên teorîk in ku piranî ji hêla zimannasan ve hatine pêşxistin (Baker, 2001: 171). Têkildarî çareseriyên pratîkî Babler peywira sereke ya wergêrê helbestê wiha destnîşan dike: "Ji aliyekê ve wergêr divê ji helbesta bi zimanê jêder helbesteke nû bi zimanê armanc biafirîne, û ji aliyê din ve jî hindî ku ji dest hat divê wate, deng û musîqaya helbesta resen biparêze" (1970: 194). Her çî qas destnîşankirina peywirê bi vî awayî karekî hêsan xuya bike jî, pêvajoya pêkanîne ew qas hêsan nîn e. Lewre Babler (1970: 194-195), ê ku ev peywir destnîşan kiriye, diyar dike ku di pêkanîna vê peywirê de dê gelek guherîn çê bin û wergêr dê ji ber hin tercîh û pêşekiyên xwe hin taybetiyên berhema resen jî bike qurbanî. Lewre pêwîst e ku wergêr divê hem rexnegirê edebî be, hem bi têra xwe zimannas be û hem jî bi têrê şair be da ku berdêl û qurbanîkirinên wî/wê jî kêmtir bin.

Derbarê helwesta di pêvajoya wergerandinê de û ji bo çareseriyên kêşeyên wergerê Landers (2001: 98) hin pêşniyazan dike û dibêje ku beriya ku wergêr dest bi wergera helbestê bike, pêwîst e ku hin biryaran bide û hin tiştan derbarê deqa jêder kifşe bike. Berî her tiştî divê biryarê bide ka gelo ew ê wergereke bi serwa bike an jî na, kîjan qalibên metrîk li gor reseniya helbestê ye û heviyên xwînerên armanc çî ne? Biryar her çî be jî, li dawiyê divê helbesteke hêjayî xwendinê derkeve holê. Dijwarî û xasyetên wergera helbestê her çî û çawa bin jî, wergêrên helbestê di gel dijwariya karê xwe ji wergêrên din zêdetir rastî rexneyan tên. Vanderauwera (2014: 202) di gotareke xwe de ji hêla bendewariyên xwîner/rexnegir ve nêzikî mijara rexneyê dibe. Li gor wê, rexneyên derbarê

wergerên wêjeyî piranî têkildarî hêsanî/dijwariya xwendina deqa wergerandî ne. Xwîner û rexnegir berî her tiştî lê dinêrin bê ka werger bi awayekî hêsan û têngîner tînan xwendin an jî na. Gelek çar xwîner û her wisa rexnegir jî derbarê guherînên zimanî û derbarê qalibên ku li zimanê armanc nayên, pir hesas in û li hember tiştên nestandart û edetî bertekan nîşan didin.

Nêrînên Holmes (1970: 90-97) ên derbarê wergera helbestê di lîteratura wergera edebî de li cihekî taybet disekine. Holmes rêbazên wergerandina helbestê bi çar kategoriyan ve dabeş kirine. Ev kategorî ji bo nirxandina asta teorîk a wergerekê û ji bo dahûrandina helwesta wergêr çarçoveyêke teorîk çê dikin û ji bo analîzên wergerê jî sîdewer in. Ew çar kategoriyan ku em ê li jêr bi kurtî qal bikin ev in: *mîmetîk, analojîk, organîk û der-edetî*.

1) Mîmetîk: Di vê rêbazê de forma resen a helbestê tê parastin. Lê Holmes (r. 95) bi xwe jî dijwariya parastina forma resen qebûl dike, bi taybetî jî dema ku du ziman û du çandên pir nêzikî hev bi rêya wergerê têkildar dibin. Tê zanîn ku di navbera zimanan de hevtayîya formên zimanî yekser gengaz nîn e. Dîsa jî bi hewldana wergêr a parastina forma helbestê tişteki nû ji wêjeya jêder dikeve nav nerîta wêjeya armanc.

2) Analojîk: Ji ber ku parastina forma resen a helbestê ji bo wergêran kêşeyêke mezin bû, wergernas li çareseriyekê geriyan ku rêyêke nîvekê peyde bikin. Li gor rêbaza analojîk wergêr li fonksiyona forma helbestê dinihêre û formeke manendî wê di nav wêjeya armanc de lê diguncîne. Hem rêbaza analojîk û hem jî rêbaza mîmetîk her du jî li gor Holmes (rr. 90-95) rêbazên teşe-darîştî (form-derivative) ne ku hewl didin di zimanê armanc de berhemêke hevtayê helbesta resen çê bikin.

3) Organîk: Di vê rêbazê de li şûna formê naveroka berhema resen derdikeve pêş. Holmes vê rêbazê wekî naverok-darîştî (content-derivative) bi nav dike. Wergêr wekî xala destpêkê teşeya helbesta resen ji xwe re nabijêre, lê naveroka helbestê bi helwesteke mîmetîk an jî analojîk vediguhezîne zimanê armanc. Tiştê ku di vê rêbazê de pêk tê neqilkirina naveroka helbestê ye û tê hêvîkirin ku di pêvajoya wergerandinê de werger formeke helbestî ji xwe re peyda bike (Holmes: 96).

4) Der-edetî (Deviant/extraneous): Di vê rêbazê de forma helbestê ya ku hatiye adaptekirin bi tu awayî forma resen nagire nav xwe. Li şûna teşe û naveroka berhema resen, wergêr meta-poemeke li gor pîvanên xwe diafirîne û bi vî awayî jî ew rêbaz ji her sê rêbazên li jor cudatir e û der-edetî ye (Holmes: 97). Ev rêbazên navborî yên ku Holmes wekî çar kategorî destnîşan dike hem bûne mijara niqaşên teorîk û hem jî di karê pratîkî de ji bo wergêran bûne bingeha hin stratejî û teknîkên wergerandina helbestê.

Andre Lefevere di sala 1975an de xebata xwe ya li ser wergera helbestê pêşkêş kir û ew xebat ji hingê ve bûye referanseke giring di vê mijarê de. Lefevere di vê xebata xwe de 7 stratejî kifşe kirin ji bo wergera helbestê. Ji wan heft stratejiyan her yek giringiyê dide hêleke taybet a helbestê. Ew stratejî bi awayekî teqez ji hev venaqetin û têkiliya wan bi hev re heye. Lewre wergêr dikare ji wan stratejiyan hinekan bi hev re bi kar bîne. Li jêr em ê bi kurtî hin taybetiyên stratejiyên Lefevere rave bikin:

1) Wergera Dengane: Di wergera dengane (fonemîk) de armanca wergêr çêkirina hevtayîyeke dengane ye di navbera teksta jêder û teksta armanc de. Li gor Lefevere (1975: 19) dilsoziya bi deqa jêder tê wateya dilsoziya bi dengê hundirê helbestê. Pirsgirêka sereke di wergera dengane de ew e ku wergêr nikare heman dengê di teksta jêder de heyî di teksta armanc de bi dest bixe, ji ber vê yekê jî li şûna wê dengê nêzikî wê bi kar tîne. Wergêr carinan mecbûr dimîne ku xwe bispêre devokekê an jî rêzbûna sentaktîk têk bibe ji bo xatirê bidestxistina dengê (Lefevere: 20). Di hevsenga deng û wateyê de, eger deng giraniyê li ser wateyê bike, wate şêlû dimîne, lê eger wate giraniyê li ser deng bike, wê çaxê têkiliya dengane ya deqa jêder û deqa armanc bi awayekî ji hev dûr çê dibe (Lefevere: 21). Wergêr di hin nimûneyan de bi kêmtirînkirina ciyawaziyên dengî dikare encameke serkeftî ya hevtayîyê bi dest bixe û wergereke fonemîk a helbestê çê bike.

2) Wergera Rastîne: Wergera rastîne, an ku wergera peyv bi peyv di seranserê sedsala 19an de pîvana hevtayîyê ya sereke bû ku ji wergerê dihat hêvîkirin û vê hêviyê di sedsala 20an jî domand (Lefevere: 27). Eger beramberî her yek peyva jêder bikaranîna peyveke armanc wekî pêşekî bê qebûlkirin, hingê mirov divê ta ku wê peyva hevta peyde bike bikeve nav lêkolînê û wekî mecbûriyet jî xwe bispêre peyvên arkaîk. Peyvên arkaîk her çî qas wekî çareserî

xuya bikin jî, piranî kargîniya xwe ya ragihanî winda kirine û rastî guherînên wateyî hatine (Lefevere: 28-29). Xetereya peydekirin û bikaranîna peyvên arkaîk ew e ku peyv dibe ku ji mêj ve xwedî wateyeke wisa be ku êdî wê wateyê nahewîne, an jî ew wate êdî wateya peyvê ya naskirî nîn e (Lefevere: 29). Eger pirsgirêkên di asta sentaksê de derkevin pêşberî wergêrê ku dil dike wergereke peyv bi peyv bike, hingê rewş hîn diwartir dibe.

3) Wergera Metrîk: Wergera metrîk wekî şeweyeke dilsoziyê ya bi teksta jêder re xuya bike jî, pêkanîna wê dibe sedemên hin arîşeyan. Eger wergêr di teksta armanc de hevtayek guncav nebîne, wergêr hin peyvan seqet dike da ku bi pîvana rêzîkê re li hev bîne. Carinan wergêr peyveke biyanî bi kar tîne. Ji bo ku wergêr peyvekê seqet neke dikare serî li bikaranîna gotinên klîşe bide, an jî du peyvên wateya wan nêzik bi hev re bi kar bîne. Di rêbaza wergera metrîk de wergêr bala xwe bi tenê dide taybetiyê deqa jêder, an ku taybetiya metrîk. Xuya ye ku bidestxistina vê yekê jî dibe bibe sebebê windabûna wateyê, qîmeta ragihanî ya berhemê û xirabûna sentaksê (Lefevere: 37-42). Rêbaza metrîk ji bo helbestên ku kêşazî xasyetên wan ên bingehîn e rêbazeke sûdewer e, da ku wergêr wê xasyetê bikare veguhezîne, lê belê bikaranîna wê ya bi tenê serê xwe encamên pêbawer nade.

4) Wergera Nezmê ya Pexşanî: Wergera bi şeweya nesrê ya helbestê naverokê rastir vediguhezîne û ji bo wergêr hewce nake ku di asta peyvan û sentaksê de guhertinan çê bike. Dîsa jî, wergera bi şiklê nesrê ya nezmê çî car nekarî şeweyê pejirandî ya wergerê di navbera wan her du cureyan de çê bike, lewre bi têra xwe eleqe jî nedît (Lefevere: 42). Ji ber ku wergêr şewaza tekstê diguherîne, ji bo pêkanîna qîmeta gotinê divê balê bikişîne li ser hin peyvan. Wergêr ji hêlekê ve bi şeweya pexşanî helbestê werdigerîne û ji hêla din ve jî bi tercîhên xwe yê hin peyvên cihê dixwaze qîmeta gotinê biparêze. Dibe ku ji bo wê cihêbûnê, peyva jêder di teksta armanc de bi kar bîne, an jî wekî çareyeke din peyveke nû çê bike (Lefevere: 43-45). Ev rêbaz di roja îro de pêr kêr dibe tercîha wergêran û bi piranî jî ji bo hin armancên sînordar, an jî ji bo danasînê tê bikaranîn.

5) Wergera Bi Serwa: Wergêr dema ku biryara wergera bi serwa dide, di pêvajoya wergerandinê de hem rastî pirsgirêkên serwayê û hem jî pirsgirêkên metrîk tê. Wergêr divê kombînasyoneke kêş û serwayê çê bike û lewre jî di

tevahiya helbestê de divê bi vê baldariyê tevbigere. Gelek caran wergêr nikare serwayeke xurt saz bike, ji ber vê yeke jî serwayeke wekî dubarekirina dengdêran (assonance) an jî serwayeke lawaz a bi şibandina hin dengên çê dibe (Lefevre: 49). Wergêr ji bo ku xwe ji asonansê an jî ji serwaya lawaz rizgar bike, hin rêbazan diceribîne. Ji wan yek tawîzdayîna ji nîrxê ragihanî yê vegotinê ye ku wergêr serî li bikaranîna peyvên arkaîk dide ji bo xatirê lihevhatina serwayê. Rêyeyeke din jî xirabkirina taybetiyên morfolojîk ên peyvên e. Her wisa, bikaranîna bêjeyên klîşe jî çareseriyeyeke din e. Ev rêbaz her çî qas di hin rewşan de encamên sosret û nepejirandî derxe holê jî, di esasê xwe de zirareke mezin nadin tekstê. Lê hin caran wergêr ji bo pêkanîna serwayê mudaxaleyê li tevahiya hevokê/malikê dike û heta carinan wateyê jî diguherîne (Lefevre: 50-51). Wergêr di rêbaza xwe ya wergera bi serwa de her çî qas malîkekê bi şîkî lihevhatî sergîhayî bike jî, gelek caran arîşeya kirpandina rast a peyv û komên peyvên nayê çareserkin. Di dawiyê de jî, di zimanê armanc de berhemeke edebî ya kemilî dernakeve holê.

6) Nezma Bê Serwa: Wergêrên ku helbestên nezma bê serwa (blank verse) werdigerînin bi giştî tûşî du kêşeyan dibin. Kêşeya yekem çareserkirina kêşeyên têkildarî teşeya metrîk e. Ya duyem jî lihevanîna wergerê ya bi tevahiya helbestê ye ku bi sistemeke teqez hatiye honandin û yekser dubare dibe. Ji ber ku nivîskar peyv û bêjeyên bijartî di helbesta xwe de bi kar anîne, tercîhên wergêr bêtir sînordar dibin. Nezma bê serwa ji ber ku ji hêla teşeyê ve helbestek navbera kêşsazî û serbestiyê de ye, wergêr jî gelek caran di navbera wê kêşsazî û serbestiyê de dimîne (Lefevre: 61-62). Ev rêbaz bi taybetî di rêbazên teşe-darîştî de dibe kêşe ji bo wergêr, lê belê ji ber ku ev cure xwedî xasyeteke dîrêz a şêwazî ye, bi awayekî jî derfetên afirîneriyê ji bo wergêran çê dike.

7) Şirovekirin: Rêbaza wergera şirovekirî ji hêla hin wergernasan wekî wergera serbest hatiye binavkirin û tê de *teqlîd* û afirandina *versiyoneke* nû ya helbestê heye. Tiştê ku teqlîd û versiyonê ji hev cuda dike jî radeya şirovekirina tekstê ya ji hêla wergêr e. Di teqlîdê de wergêr îlhamê ji teksta jêder werdigire û helbesteke nû daifirîne. Di versiyonê de radeya şirovekirinê li gor teqlîdê kêmtir e û wergêr ji aliyekê ve hêmanên helbesta resen diparêze û ji aliyê din ve jî versiyoneke nû li gor pîvanên zimanê armanc û teknîka adaptasyonê saz dike. Di şêwaza wergera şirovekirî de teksta jêder ji holê radibe û wergêr bi şêweyekî azad helbesteke nû li gor qalib û qaydeyên zimanê armanc diafirîne. Wergêr formeke

nû ji bo helbestê diafirîne. Di vê şeweyê de, piranî jî eger wergêr bi xwe jî helbestvan be, carinan helbest li gor şewaza wergêr ji nû ve tê nivîsandin. Hêmanên teksta jêder di teksta armanc de xuya nabin, lewre helwesta wergêr bi temamî armanc-navend e (Lefevre: 82-95). Di nav wan heft stratejiyan de, herî zêde rêbaza şiroveyê azadiyê dide wergêr û ji bo afirandina helbesteke nêzikî nerîta edebiyata armanc û bendewariyên xwînerê armanc derfetan ji wergêr re çê dike.

1.5.1.3. Wergera Şanonameyan

Wergera şanoyê binbeşeke wergera cureyên edebî ye. Bi qasî cureya helbestê nebe jî, wergernasana taybetiyên wergera şanoyê şirove kirine û hin qayde destnîşan kirine. Dîsa jî nêrînên derbarê wergera şanoyê di bin bandora cureyên din mane û her wekî Lefevre (1980: 153) diyar dike, analîzên tekstên dramayê piranî li ser teksta nivîsandî hatine kirin û vekoleran hêla performansê û taybetiyên pragmatîkî paşguh kirine. Ji ber taybetiya cureyî ya şanonameyan wergera wan berheman jî bi çend xasyetên xwe ve ji cureyên din cuda dibe. Cudatiya sereke ya wergera şanoyê ji hêla xasyeta dîtbarbûnê ya ziman û konteksta ragihanî ve diyar dibe. Şanoname hem berhemeke edebî ye û hem jî beşeke navxeyî ya hilberandina şanoyê ye. Lewma jî her wekî Baker (2001: 71) diyar dike, ev taybetmendiya dualî ya hunera şanoyê wergera şanoyê ji wergera romanê û helbestê cudatir dike. Ji ber vê xasyeta cureyî pêwîstî pê heye ku zimanê şanoyê li gor temaşevan be û bi îmajên dîtbarî û akûstîk bîrînê nîşandan.

Di wergera şanoyê de berî her tiştî wergêr divê faktora pêkanîne (performance) li ber çavan bigire. Her ku şanoname ji bo lîstinê tîr nivîsandin, nivîskarên wan berheman wekî şewaz ji pênasekirinê bêtir nîşandinê tercîh dikin. Bi heman awayî, Steiner (2004: 363) jî diyar dike ku tîkiliya tekstê ya bi temaşevan an jî guhdar re ji tîkiliya nivîskar û xwîner cudatir e. Wergêr jî divê vê taybetiya şanonameyan li ber çav bigire û di tercîhên xwe yê zimanî de armanc bike ku berhemeke dîtbar di zimanê armanc de biafirîne. Landers (2001: 104) di wergera şanonameyan de wekî pîvana sereke ya tekstê axaftinbariyê (speakability) derdixe pêş. Helbet ev pîvan bi taybetî dema ku tekst ji bo lîstinê hatibe wergerandin derbasdar e. Li gor Baker (2001: 72) eger şanonameyek li gor zaravayekê hatibe nivîsîn, wergêr divê biryarê bide bê ka zaravayek guncav heye di zimanê armanc de ku wergerê li gor wê çê bike.

Windle (2011: 113-115) derbarê pêwîstiyên wergera şanoyê û wergêra wê cureyê de xwedî tespîtên giring e ku me bi kurtî li jêr ew rave kirin. Windle destnîşan dike ku ji bilî qabiliyetên zimanî divê wergêr ji şanoyê fêhm bike, haya wî/ê bi zimanê axaftinê hebe û bikare adaptasyonê bikê. Li gor wî, zimanê wergerê divê têgîner û xwezayî be. Wergera şanonameyekê dema ku bi deng hat xwendin, divê dîyalogên tê de wekî zimanekî resen û edetî li ber guhê temaşevan bikeve. Ji ber vê pêwîstiyê ye ku gelek caran di wergera şanonameyan de du wergêr bi hev re dixebitin. Ji wan yek wergêrê pisporê ziman e û yê duyem jî wergêr û dramatîst e, lê belê rola yê duyem piranî wekî roleke alîkar e. Windle her wisa xwedî helwesteke armanc-navend e û dibêje ku di wergera berhemên şanoyê yên modern de bi giştî tê armanckirin ku teksteke kedîkirî ya ku bi çand û pêwenda zimanê armanc li hev hatiye, derkeve holê. Lewre xwîner an jî bîner dûrî teksta jêder in û di mînakê şanonameyan de lîstikvan, temaşevan, rexnegirên şanoyê tev di çarçoveya ziman û çanda armanc de derheqê teksta wergerandî dibin xwedî hêvî û armanc.

Aaltonen (1996: 455-459) bi helwesteke rexneyî wergêrên ku li gor teksta jêder tekstekê diafirînin wekî kesên bêxudan bi nav dike û pisporên şanoyê yên ku wekî derhêner an nivîskar ji teksta wan adaptasyonê nû diafirînin û dibin xwediyê berhemê jî wekî hosta bi nav dike. Wergêr xwe bi teksta jêder ve digire û dilsoz e, lê pisporê ku adaptasyonê dike an ku teksteke nû diafirîne jî li gor ziman û çanda armanc tevdigere û hindî ku bixwaze serbest e. Bi vî awayî jî di cîhana şanoyê de werger gelek caran wekî têgiheke neyînî tê dîtîn, ji jêla din ve adaptasyon jî dibe karekî pisporiya hunerî. Her wekî di wergera cureyên din de, di wergera şanonameyan de jî cudatîyên çandî bandorê li ser wergerê dikin, û ji ber cudatîya pozîsyona xwîner û temaşevanê şanoyê rîska xeletî û şaşfamkirinê zêdetir e (Baker, 2001: 72). Gostand (1980: 1-9) jî behsa kêşeyên çandî yên di pêvajoya wergera şanonameyan dike û lihevnehatina biwêj, zimanê argo, ton û şêwazê wekî mînak nîşan dide. Wergera berhemeke aîdî serdemeke din jî bi xwe re kêşeyên çandî yên wergerandin û lêanîne derdixe holê.

Wekî encam, di wergera şanoyê de dîtbarî û armanc-navendî faktorên diyarker in û wergêr ji ber qutbûna tîkiliya ziman û çanda jêder ya bi ziman û çanda armanc hewl didin ku di zimanê armanc de berhemeke têgîner biafirînin. Ji ber vê taybetîya cureya şanoyê lêanîn di wergera şanoyan de wekî stratejiyeke

berbelav tê bikaranîn. Lêanîn di wergera şanoyê de bi hin awayan ji wergerê cudatir tê dîtîn. Lêanîn wekî têgih û binavkirin di hin nimûneyan de li şûna wergerê tê bikaranîn, di hin nimûneyan de jî ji bo teksteke nû ya ku bi awayekî nerasterast ji teksta jêder hatiye dariştin tê bikaranîn. Di vê babetê de şêweya lêanînê û sînorê wê giring dibe da ku mirov bikare karê ku pêk hatiye pênase bike. Her wisa, di wergera şanonameyan de wergêr divê armanca nivîsîna berhemê jî wekî hokareke bandorker li ber çavan bigire. Hin şanoname bi tenê ji bo lîstina li ser sehnê tîn nivîsîn, hin şanoname jî hem ji bo lîstinê û hem jî ji bo xwîneran tîn nivîsandin û wergerandin.

BEŞA DUYEM

WERGERA KURDÎ

2.1. Paşxaneya Dîrokî ya Wergera Kurdî

Destpêka wergera edebî ya Kurdî berî sedsala 20an bi çend çavkaniyên sereke û qonaxên edebî ve dikare bê destnîşankirin. Li serdema edebiyata klasîk a Kurdî lêanîn û wergerên bi destê şairên Kurd, wergerên ku pêşengê wergera Kurdî Mela Mehmûdê Bazidî kirine, wergerên li nav koleksiyonên rojhilatnasan, wergerên kitêbên pîroz ên bi destê mîsyoneran hatine çêkirin û nimûneyên wergeran ên li Stenbolê yê li destpêka sedsala 20an ji wan çavkanî û qonaxên sereke ne. Her çî qas hin lêkoler çend nimûneyên wergerê yê kevn ên wekî wergera du berhemên Kurdî bi elfabeya Masî es Soratî ya aîdî Îbn Wehşîye (Yıldırım, 2013: 28) û wergera ji Kurdî bo zimanê Osmanî ya du stranên Kurdî yê ku behsa wan di *Seyahetnameya* Evliya Çelebi de derbas dibe (Bruinessen, 1985: 21) destnîşan bikin jî, destpêka wergera Kurdî serdema edebiyata klasîk a dereng e ku beramberî sedsala 18 û 19an tê.

Şopa wergerên edebî yê bi Kurdî li gor belgeyên berdest di serdema klasîk a edebiyata Kurdî de diyar dibe. Di serdema klasîk a wêjeya Kurdî de werger û ve-nivîsîna mesnewiyên Farsî yê şairên wekî Nizamî, Mele Camî, Firdewsî û yê din ku ji hêla şairên Kurd ên wekî Sewadî, Selîmê Hîzanê, Elmas Xan, Xanay Qubadî hatine wergerandin nimûneyên wan xebatan in. Dîsa Eqîdename û Mewlûdnameyên ku ji hêla Mela û Şairên Kurd ve hatine wergerandin mînakên wergerê yê cureyên wêjeya klasîk a Kurdî ne. Zeraq (2022: 257) Menzûmeyên Feqiyê Teyran ên bi navê Şêxê Senan û Bersîsê Abid jî li gor rêbaz û teknîkê wekî nivîsên lêanînê bi nav dîke û wan berhemên wekî nimûneyên pêşîn ên wergera Kurdî bi nav dîke. Ev şêwe berhemdayîn ku di nav berhemên şairên klasîk ên Kurd de mînakên wê peyda dibin, cureyeke wergerê ye ku Dreyden (1992) wê rêbazê wekî *Metaphrase* bi nav dîke. Di nav wan berhemên de nimûneya herî berbiçav a wergerê wergera *Xosro û Şirîna* Nizamiyê Gencewî ye ku Xanay Qubadî di sedsala 18an wergerandiye. Li gor agahdariyên ku Menbari û Farahzad (2024: 19) didin, Qubadî ev berhem di sala 1740an de wergerandiye û bi vî awayî jî yek ji wergerên herî kevn e di dîroka wergera Kurdî de.

Di nîveka Sed sala 19an de wergerên Mela Mehmûdê Bazidî mînakên giring in di wergera Kurdî ya edebî de. Mela Mehmûdê Bazidî *Şerefnameya Şerefxanê Bidlîsî* ji Farsî wergerandiye Kurdî. Li gor agahiyên ku Ehmed (1997: 44-45) dide, cilda yekem a *Şerefnameyê* ji aliyê Mela Mehmûdê Bazidî ve di salên 1858-1859 de, bi handana Aleksander Jaba hatiye wergerandin. Destnivîsa vê nusxeya kurdî ya *Şerefnameyê* di Kitêbxaneyê Giştî ya Lenîngradê de hatiye parastin. Wergereke din a Mela Mehmûdê Bazidî beşek ji *Îskendernameya Nizamî* ye (Dost, 2009: 37). Li gor agahiyên ku Öztürk (2018: 34) dide di nav Koleksiyona Aleksandre Jaba ya Destnivîsên Kurdî de nusxeyên bi hejmara Kurd 42 û Kurd 43 wergera 84 çîrokên Farsî bo Kurmancî hene ku wergêrê wan Mela Mehmûdê Bazidî ye. Di heman koleksiyonê de hejmara Kurd 41 wergera Leyla Mecnûn e ku Bazidî ji Tirkî wergerandiye Kurdî. *Mem û Zîna* pexşanî ya ku Mela Mehmûd nivîsandiye, nimûneyeke giring a wergera navzimanî ye ku di vê wê xebatê de Bazidî hem zimanê berhemê hêsan kiriye û hem jî cureya berhemê guhertiye ser çîrokê. Dîsa li heman serdemê wergera çîrokên Farsî ya bi navê *Dûrrû'l-Mecalis* a ku ji hêla Mela Mûsa Hekarî ve hatine wergerandin hêjayî qalkirinê ye. Li gor ku Omer (2022: 5-15) destnîşan dike, berhem di nav koleksiyona Jaba de bi sernavê Kurd 40 hatiye tomarkirin û Mela Mûsa jî hem wergêrê 32 çîrokên Farsî ye û hem jî nivîskarê çîrokên mayî ye ku wî bi xwe lê zêde kirine û berhem bi tevahî kiriye 58 çîrok. Di vê berhemê de wergêr Mela Mûsa pend û îbretên çîrokan jî bi kurtî rave dike.

Di dîroka wergera Kurdî de tevkarîya rojhilatnasan giring e û wergerên ku wan kirine di nav nimûneyên pêşîn ên wergerên Kurdî de cih digirin. Rojhilatnasên wekî Maurizio Garzoni, Martin Hartmann, Maximilian Bittner, Albert Le Coq, Aleksandre Jaba, Hugo Makas û y.d. wergera berhemên li nav koleksiyonên xwe kirine. Di nav koleksiyonên Berlîn, St. Petersburg, Vîyana û bajarên din ên Ewropî de nimûneyên wan wergeran hene. Di wan koleksiyonan de berhem bi beşên danasînê, bi nusxeyên resen û bi wergerên tam an jî kurtkirî cih digirin. Maurizio Garzoni di pirtûka xwe ya navdar *Grammatico e Vocabulario Della Lingua Kurd* (1787) de du duayên Xirîstiyaniyê wergerandiye Kurdî (Serfiraz, 2014: 57-58). Du berhemên pîroz ên Êzidiyan, Cilwe û Mishefa Reş, ji aliyê Rojhilatnasê Avusturyayî Maximilian Bittner ve hatine wergerandin. Ew berhem bi navê *Die beiden heiligen Bücher der Jeziden im Lichte der Textkritik* û

li gel hin tēbiniyên zimanî di sala 1913an de li Vîyanayê çap bûne. Albert le Coq di pirtûka xwe ya bi navê *Kurdische Texte* (1903) de cih daye du wergerên ji Kurmancî bo Zazakî û ew werger wekî nimûneyên wergerên Kurdî yên navzimanî yên destpêkê dikare bên nîşandan (Şanlı, 2022: 108). Her wisa, rojhilatnasekî din ê Avusturyayî Hugo Makas jî hin çîrokên ku li herêma Mêrdîne berhev dike werdigerîne Almanî û bi navê *Kurdische Texte im Kurmanji Dialekte aus der Gegend von Mardin* li St. Petersburgê diweşîne (Alakom, 1991: 74). Kurdnas J. S. Musaelyan li ser berhevkarîyên A. Jaba xebitiye û gelek stranên Kurdî wergerandin zimanê Rûsî. Dîsa li gor agahiyên ku Alakom (1991: 98) dide, Rojhilatnas F.B. Charmoy, ê ku demek li Rûsyayê xebatên xwe domandiye, Şerefname wekî çar cild wergerandiye zimanê Rûsî.

Di nav xebatên Rojhilatnasê Rûs Peter J. A. Lerch de em rastî wergerên ji Kurdî bo Almanî tên ku tê de wergerên çîrokan, gotinên Kurmancî û biwêjên Kurdî û Zazakî hene û heta Lerch cih dide wergera Kurmancî ya beşa destpêkê ya berhema Sadî Şîrazî *Gulistan* jî (Kuriş, 2014: 93-108). Berhema rojhilatnas Hugo Makas *Kurdische Texte Und Kurdische Studien* koleksiyoneke berhemên devkî yên ji herêma Mêrdîne ye û çapa Heidelbergê ya 1990an bi beşên wergera Almanî yek ji nimûneyên destpêkê yên wergera Kurdî ye. Yek ji rojhilatnasên Rûs M. B. Rudenko di sala 1962yan de berhema E. Xanî *Mem û Zîn* li gel xebata xwe ya lêkolîna zanistî ya wekî tez wergerand zimanê Rûsî û da çapkirin. Rûdenko di heman demê de berhemên şairên Kurd ên serdema klasîk ên wekî Sewadî, Selîm Silêman û Feqiyê Teyran jî wergerandine Rûsî (Alakom, 1991: 120). Nikitine bi alîkariya Major Soane Çîroka *Sûto û Toto* (The Tale of Suto and Toto) wergerandiye Îngilîzî û tevî Kurdiya wê bi tîpên Erebi çap kiriye (Bulletin of School of Orient and African Studies, 1923: 69-88.) Thomas Bois li gel Mîr Kamûran Bedirxan di salên 1940an de li ser wergerandina Methelokên Hezretî Silêman û Încîla Yohannes xebatên wergerê kirine.

Wergerên Kitêbên pîroz jî nimûneyên destpêkê yên wergerên Kurdî ne. Di sedsala 19an de hewldanên wergerên Încilê bo Kurdî hene ku pîranî ji ber armanc û karên mîsyonerî çê bûne. Her wekî Sayim (2024: 2-8) destnîşan dike, xebatên wergera Încilê ya bi zimanê Kurdî, ku di sedsalên 19 û 20an de zêde dibin, bi tîpên Ermenî û bi zimanê Kurdî tên çêkirin, ji ber ku li hin deveran Ermenên ku di nav Kurdan de dijiyan zimanê xwe jî bîr kiribûn û bi zimanê Kurdî diaxivîn. Ji ber

vê rastiya civaka Ermen, mîsyoneran ev xebat meşandine û berê xwe dane herêmên wekî Wan û Bidlîsê da ku di ser zimanê Kurdî re xwe bigihînin Ermenan. Di nav nimûneyên pêşîn ên wergerên pirtûkên pîroz de wergerên Încîlê hene. Di sala 1856an de Incîla Ezîz Matthew li Stenbolê ji hêla komeleya Brîtanî ya Pirtûka Pîroz ve bi elfabeya Ermenî bo Kurmancî hat wergerandin (Hassanpour, 2005: 298). Isaac Grout Bliss, Endamekî Civaka Încîlê ya Amerîkî, di 1872yan de bi elfabeya Ermenî Peymana Nû werdigerîne Kurmancî û Peymana Nû jî bi awayekî tam di sala 1872yan de li Stenbolê ji aliyê A.H. Bohaijan ve bi elfabeya Ermenî tê çapkirin. Încîla John di sala 1894an de ji aliyê Yahya Khan Kirmanshahi ve ji Farsî bo Kurdî tê wergerandin û piştê jî ew werger tê serastkirin û temamê beşên Încîlê yê mayî jî ji aliyê W. Claire Tisdall û Mirza Îsmail ve tê wergerandin. Ludvig Olsen Fossum di 1919an de Peymana Nû werdigerîne ser zaravayê soranî (Url 1).

Wergerên Qur'anê, çî wekî beşên ayetan û çî jî wekî wergerên tam, di dîroka wergera Kurdî de xwedî cihêkî taybet in. Kırkan (2020: 310) destnîşan dike ku wergerên Qur'anê yê Kurdî wekî meal û tefsîr li destpêkê wekî beşên ayetan çê bûne, wergereke tam ancax di sedsala 20an de xuya bûye û sedemê vê derengmayîne jî bi pîroziya zimanê Erebî ya li ba alimên Kurd ve girê dide. Özdaş (2016: 341) jî ji bo sedema wergerên dereng ên Qur'anê dibêje ku li serdemên destpêkê pêwîstî bi wergera Qur'anê çê nebûye, ji bo demeke dirêj wergera Qur'anê hatiye niqaşkirin û her wisa şert û mercên civakî û siyasî yê Kurdan tev bûne asteng ji bo wergerên zûtir. Wergera Kamiran Elî Bedirxan bi navê *Tefsîra Quranê* di kovarên Hawar û Roja Nû de tê weşandin û beşên ku di kovara Hawarê de li nav hejmarên 27-54 hatine weşandin di sala 1971yan de ji hêla Enstîtuya Kurdî ya Parîsê ve bi sernavê *Ji Tefsîra Quranê* dîsa çap bûye. Taybetiyeke vê wergerê ev e ku navên sûreyan bi wergera wan a Kurdî tê de cih girtine (Özdaş, 2016: 342). Egîd (2018: 12) radigihîne ku wergera çend ayetên Qur'anê ya bi zaravayê Soranî di 1920an ji hêla Major Soane ve hatiye çêkirin û li heman salê di hejmara 25an a rojnameya *Pêşkewtin* de hatiye weşandin. Mele Mihemed El Pencewînî di sala 1932yan de wergera Qur'anê ya 2171 rûpel bi zaravayê Soranî çê kiriye. Li gor agahiyên ku Kırkan (2020: 311-314) dide, li Iraqê di navbera salên 1930 û 1970yan de bi dehan tefsîrên Kurdî yê Qur'anê çê bûne. Li Îranê sala 1979an du wergerên Qur'anê yê Kurdî çap bûne ku yek ji wan ji hêla Hejar

Mukriyanî ve hatiye wergerandin. Li Tirkiyê wergera tam a Qur'anê ji hêla Mela Abdullah Varlı ve hatiye tamamkirin û di sala 1994an de çap bûye.

Ji bilî Qur'anê, wergera hin berhemên dînê Îslamê jî di dîroka wergera Kurdî de nimûneyên hêjayî qalkirinê ne. Şêx Huseynê Qazî di 1860an de mewludnameya Îbnî Hacer Haytemî ji Erebî wergerandiye. Şêx Marûfê Nodeyî jî berhemên dînî wergerandine Kurdî (Taştan, 2019: 29). Xelîfe Yûsuf (1885-1965) Eqîdeya Îmanê ya Îslamê ji Erebî wergerandiye Kurmancî (Yıldız, 2020: 129). Nehcûl-Enama Mela Xelîlê Sêrtî bi awayekî menzûm bi destê Seyyid Tahir Geylanî ve di 1950yan de ji bo Tirkî hatiye wergerandin, lê di 1992yan de çap bûye (Adak, 2015: 102). Mewlûda Mela Huseynê Bateyî di sala 2014an de bi wergera Xalid Sadînî ji nav weşanên Wezaretê Çandê çap bû. Di nav berhemên dînî de wergerên berhemên Bediuzzeman Seîdê Kurdî yên ji *Kullîyata Rîsaleyên Nûr* jî balê dikişînin. Wergerên bi destê kesên wekî Abdulqadîr Badilli, Sabah Kara, Süleyman Çevik, Ayhan Meretowar (Ayhan Yıldız), Aydın Üneşi û Aziz Samur ji Tirkî bo Kurmancî hatine çêkirin, nimûneyên berbiçav in ku ji aliyê weşanxaneyên Nûbihar, Zehra û Hizmet Vakfı Yayınları ve di navbera salên 1992 û 2018an de hatine çapkirin. Her wisa li gor agahdariyên ku Kırkan (2022: 32) dide, Serdar Bedirxan sê berhemên ji Kullîyata Seîdê Kurdî werdigerîne Zazakî û ev berhem di sala 2014an de ji aliyê weşanxaneya Zehrayê ve tîne çapkirin.

Li Stenbolê di destpêka sedsala 20an de hin nimûneyên pêşîn ên wergerên Kurdî xuya dibin. Mihemed Mihrî û Suleymaniyelî Tewfîq helbestên şairên wekî Nalî, Mistefa Begê Kurdî, Melayê Cizîrî werdigerînin Tirkî. Xelîl Xeyalî di rojnameya Rojî Kurd û Hetawî Kurd de helbestên şairên Tirk ên wekî Mehmet Akif Ersoy wergerandine (Serfiraz, 2014: 58-63). Li gor daneyên lêkolîna Çeçen (2017: 57) Xelîl Xeyalî du wergerên edebî jî kirine: *Hewar û Fîzar(a) Misilmanî* (Rojî Kurd, 1913-2: 32) û *Ey Şairê Şêrîn Zimanî Rûmî Tahiru'l Mewlewî* (Hetawî Kurd, 1914-10: 14-15). Ya pêşîn ji Mehmed Akîf Ersoy e, ya duyem jî ji Tahir Mewlewî ye. Di kovara Jînê de (h. 6 û 12) Suleymaniyelî Tewfîq (Pîremêrd) ji Nalî û Mihemed Axay Derbendfeqereyî çend helbest wergerandine.

Ji nîveka sedsala 20an heya salên 2000an hin hewldanên wergerê çê dibin û nimûneyên pêşîn ên wergera edebî xuya dibin. Ev hewldanên navborî domdar nebûne, lê belê ji bo nifşên li pey xwe bûne jêdera îlhamê. Piştî salên 2000an bi xebatên şexs, weşanxane, kovar, sazî û dezgehên çandî wergerê hem ji hêla

hejmarê ve û hem jî bi awayeki bêtir pisporane wekî pêvajoyeke domdar di nav çand, ziman û edebiyata Kurdî de cihê xwe girtiye. Di sedsala 20an de li herêmên cuda û bi dîyalektên Kurdî em rastî zêdetir nimûneyên wergerên edebî tîn ku di nav wan de berhemên bi zimanê Îngilîzî, Almanî, Rûsî, Erebî û zimanên din hene. Wergerên destpêkê bi xasyetên xwe yê wergerandinê û bi helwestên wergêran jî pîvanên hemdem ên wergernasiyê dûr xuya dikin. Helbet ew wergerên navborî jî wekî nirxên zimanî, edebî û çandî divê bi nêzîkbûneke li gor rastiya wan a serdemî bîn lêkolandin.

Di Kurmancî de bi awayekî bêtir rêkûpêk û pisporane, rasterast ji zimanê jêder û bi danûstandinên navbera wergêran, wergerên edebî piştî salên 2000an tîn kirin. Daneyên ku Öpengin (2011: 6) bi par ve dike jî vê yekê piştrast dikin. Ji sala 1843yan heta 1923yan, bi tevahî 30 pirtûk, ji 1923yan heta 1980yan bi tenê 20 pirtûk hatine çapkirin ku hemû jî piştî sala 1965an derketine. Ev hejmar di navbera salên 2002 û 2009an de jî bi qasî 126 berhem e. Piştî salên 2000an wergera navzimanî ya navbera zaravayên Kurdî jî geş bû. Di salên 1970 û 1980yan de Hejar Mukriyanî bi wergera Soranî ya Mem û Zînê û Ziya Avcî jî bi wergera romana Pêşmerge ya Rehîm Qazî û Janî Gel a Îbrahîm Ehmed bûn mînakên desteya ewil. Piştî salên 2000an bi dehan wergêran di navbera zaravayên Kurmancî, Soranî û Zazakî de dest bi wergerandina berhemên edebî kirin û ev çalakîyên wergerê berdewam in.

Di gel ku meyla ber bi wergerê di serdema edebiyata modern a Kurdî de zêde bûbe jî, du berhemên Kurdî yê ku wergera wan a ji bo zimanên biyanî zêdetir çê bûne, yê berî serdema modern in. Mem û Zîna E. Xanî û berhema Mela Mehmûdê Bazidî *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye* hem di dema xwe de û hem jî di sedsala 20an de bi çendîn zimanan ve hatine wergerandin. Serboriya wergerê ya Mem û Zînê bi wergerên Tirkî yê ji hêla kesên wekî Ehmed Faîq, Zulfiqar Fethî û Ebdulezîz Xalis ve (Adak: 2015) hatine çêkirin dest pê dike û di nav demê re wergerên wê yê bi zimanên wekî Rûsî, Îngilîzî Almanî, Fransî, Azerîkî û Ermenî jî hêla wergêrên wekî Şamil Esgerov, M. Emin Bozarlan, Cemal Nebez, Feryad Fazil Omar, Akif Hasan, Salah Sadallah ve hatine çêkirin. Wergereke bi zimanê Suryanî ya Mem û Zînê bi navê *Mam wa-Zîn* di Pirtûkxaneyê Bajêr a Berlinê de bi koda Sachau 344 qeyd kiriye û destxet di 1885an de hatiye nivîsandin û nûser ne diyar e. Mem û Zîn herî dawî jî bi zimanê

Danîmarkî sala 2022yan bi sernavê *Mem og Zîn* û bi wergera Orhan Dogru çap bû. Ji bilî wergera Fransî ya bi destê A. Jaba, li gor agahiyên ku Yıldız, (2020 :131) dide berhema Bazidî *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye* bi Muhemed Ezîz Pûr ji bo Farsî, bi wergera Şukriye Resûl a sala 1982yan ji bo Soranî û bi wergera J. Dost û Muhsîn Seyda sala 2003yan ji bo Erebî hatiye wergerandin û çapkirin.

2.1.1. Wergerên Kurdî li Tirkîyê

Li Tirkîyê weşandina berhemên Kurdî û her wisa wergerên Kurdî ji ber qedexeyên qanûnî ji bo demeke dirêj pir bisînor bû, lewma hejmara berhemên ji pir kêma. Di salên 1967-71 û 1975-80an de hin derfet ji bo weşanên Kurdî çê bûne ku ew dem jî wekî heyamên qeyranê û pêngavên liberal tînan zanîn (Hassanpour, 2005: 334). Li gor daneyên ku Malmisanij (2006: 14-21) dide, heya sala 2006an 67 pirtûkên werger li Tirkîyê bi Kurdî hatine çapkirin û piranî ji berhemên edebî yê wekî helbest, roman û çîrok pêk tînan. Nêzikî nivê wan ji Tirkî û yê mayî jî ji zimanên wekî Îngilîzî, Erebî, Farsî û yê din hatine wergerandin. Di nav wan de hin wergerên navzimanî yê ji Soranî bo Kurmancî û hin transkrîpsiyonên elfabeya Latînî ya pirtûkên bi elfabeyên Kirîlî û Erebî jî hene. Di serdema Dewleta Osmanî de piranî bi elfabeya Erebî 30 pirtûk çap bûne û ji avabûna komara Tirkîyê ta salên 1990an jî hejmara pirtûkên Kurdî yê çapbûyî 20 e. Piştî ku qedexeya li ser zimanê Kurdî rabû hejmara berhemên Kurdî di navbera salên 1990 û 1999an de bûye 212 pirtûk.

Ji ber qedexeya demdirêj li Tirkîyê hin werger bi salan piştî wergerandinê derfetên çapkirinê bi dest xistine. Wekî mînak Seyîd Tahir Geylanî di salên 1946-1950yan de *Nehcu'l-Enama* Mela Xelîlê Sertî werdigerîne, lê belê ev werger ancax di sala 1992yan de çap dibe (Adak, 2015: 102). Gelek rewşenbîrên Kurd ji bilî xebatên din dest avêtine karê wergerê jî. Ji wan kesayetên M. Emin Bozarslan wergera *Mem û Zînê* ya bo Tirkî di sala 1968an temam kir û weşand. Di kovara *Özgürlük Yolu* de, ku di sala 1975an de dest bi weşanê dike, em rastî wergerên Kemal Burkay û Ihsan Aksoy tînan. Wergera helbestên Nazım Hikmet û Ahmed Arif ji aliyê Burkay ve hatine wergerandin û di hejmarên 7 û 8an de (*Özgürlük Yolu*: 1975) hatine weşandin. Ihsan Aksoy jî çîroka Samed Behrengî *Masiyê Reş ê Biçûk* wergerandiye û di hejmarên 25, 26 û 26an de hatiye weşandin (*Özgürlük Yolu*: 1977). Her wekî hemû qadên rewşenbîrî û civakî, ji salên 1940an heya

1990an di warê wergerê de jî bêdengiyek hebû û ji bilî çend xebatên takekesî em rastî mînakên wergeran nayên.

Piştî salên 1990an zêdetir wergerên edebî yên Kurdî xuya dibin. Wekî nimûne, berhema Richard Bach *Qaqlibaz* bi wergera Osman Özçelik di sala 1994an de ji weşanên Fîratê derçû. Romana Aziz Nesin *Fîl Hemdî* bi wergera Mustafa Aydoğan ji hêla weşanxaneya Dozê ve di 1999an de çap bû. Romana Aleksandr I. Soljenitsin *Rojeke Ivan Denîsoviç* bi wergera Osman Özçelik di sala 2000an de ji aliyê weşanxaneya Avestayê ve hat çapkirin. Yek ji nimûneyên wergerên şanoyê ya wan salan berhema Moliere *Tartuffe*, *sofiyê sextekar* bi wergera Yakup Karademir ji nav weşanên Günê di sala 2001an de derçû. Ji salên 1990an û pê de, ji bilî weşanxaneyên navborî ku di nav weşanên xwe de cih dan wergeran, kovarên edebî yên Kurdî bûn qadên giring ji bo wergeran. Kovara *Rewşenê* di salên 1990an de rêyek vekir ji bo wergerê û piştî wê jî kevneşopîya wergerê di kovarên *Jiyana Rewşen*, *Rewşen-name* de domand.

Kovarên *Rewşen*, *Jiyana Rewşen* û *Rewşen-nameyê* di hemû hejmarên xwe de cih dan wergeran. Di 23 hejmarên kovara *Rewşenê* de (1992-1996) bi tevahî 23 werger hene. Wekî mînak çîroka V. Solojub *Xelek* ji Farsî ji hêla Perwîz Cîhanî ve, çîroka Samed Behrengî *Lawikê Silkfiroş* ji hêla Felat Dilgeş ve, du helbestên Charles Baudlaire yên bi navê *Lihevûn* û *Albatros* ji hêla Cemil Denli ve hatin wergerandin. Kovara *Jiyana Rewşen*, wekî berdewama kovara *Rewşenê*, di navbera salên 1996-2001an de 50 hejmar derket û tê de bi tevahî 199 werger hene. Ev kovar bêtir cih dide nivîsên edebî û lewma jî wergerên edebî jî zêdetir in. Berhemên ji wêjeya Îngilîzî yên nivîskarên wekî T.S. Eliot, Derek Walcott, Edgar A. Poe, P. S. Buck, ji hêla wergêrên wekî Kawa Nemir û Samî Hêzil cara yekem ber bi Kurdî hatin wergerandin, û her wisa berhemên ji wêjeya Fransî û Swêdî yên nivîskarên wekî C. Baulaire, Per Lagerkvist û yên din jî bi destê wergêrên wekî Cemil Denli û Serkan Birûsk ve hatin wergerandin. Kovara sêyem a vê zencîreyê *Rewşen-Name* di sala 2003yan de bi tenê 3 hejmar çap dibe, lê belê cih dide 31 wergeran ku li gor 3 hejmaran rêjeyeke bilind e, û her wisa ji aliyê cureyên nivîsan û zimanên ku jê hatine wergerandin jî berfirehtir e ji kovarên pêş xwe. Wergerên wekî Dilawer Zeraq, Kawa Nemir, Azad Rêbiwar, Xecê Perîzad û berhemên nivîskarên wekî Emily Dickinson, Sait Faik Abasıyanık, Percy B.

Shelley, Fûrûxî Ferûxzad, Ehmedî Şamlû çend nimûneyên wan wergeran in ku di kovarê de cih girtine.

Kovara W, ku di salên 2004 û 2016an de bi tevahî 53 hejmar çap bû, kevneşopiya wergerê ya kovarên li pêş xwe şopand û cih da wergerên çîrok û helbestan. Wekî mînak di hejmarên cihê de berhemên Bertolt Brecht, Xelîl Cibran, Hilda Doolittle, Rainer Maria Rilke, William Saroyan, Ulrich Schaffer, Charles Baudelaire, Langston Hughes, bi destê wergerên wekî Jan Dost, Sebrî Silêvanî, Cemîl Denlî, Aydin Rengîn, Luqman Ehmed, Tengezarê Marînî, Kawa Nemir hatine wergerandin. Kovara Tabularasa ku di sala 2012an de hejmara xwe ya yekem derxist kovareke Kurdî ya wergerê bû û bi tevahî 4 hejmar derket. Di vê kovarê de ji cureyên edebî yên wekî çîrok, helbest, cerebe, bîranîn û parable/metelok nivîs ji zimanên wekî Îngilîzî, Erebî, Almanî, Rûsî û Tirkî hatine wergerandin. Di wan çar hejmaran de berhemên nivîskarên wekî D. H. Lawrence, Fuad Kehil, Ivan Bunin, Octavio Paz, Roald Dahl, Tezer Özlü, John Steinbeck, Siegfried Lenz, Khalil Gibran û yên din bi destê wergêrên wekî Konê Reş, Samî Hêzil, Rezoyê Osê, A. Rahman Çelik, Huseyn Heyder, Nurten Demirbaş, Aydin Rengîn, Salih Badilî û yên din hatine wergerandin.

Kovara *LEWeger* (2022: h.1) wekî kovareke wergerê ya helbestê ya çarmehane, di sala 2022yan de li meha Rezberê hejmara yekem derxist. Di vê hejmarê de 41 wergêran bi qasî 57 helbest û sê jî nivîsên pexşanî yên derbarê wergera helbestê ji 12 zimanên jêder li Kurmancî, Soranî û Kirmanckî wergerandine. Wergera helbestên ji zimanên Îngilîzî, Fransî, Almanî, Erebî, Farsî, Swêdî, Rûsî, Norwecî, Bûlgarî Ermenkî, Yûnanî û Îtalî tê de cih digirin. *LEWegerê* di sala 2024an de hejmara 6em derxist û wekî kovareke wergera helbestê weşana xwe didomîne. Kovara *Bar Helbest* (2022, h. 5-6) piştî hejmarên 5 û 6em bêtir cih daye wergera helbestên ji zimanên Îtalî, Îngilîzî, Fransî, Rûsî, Almanî, Erebî, Yewnanî, Farsî ku di nav de berhemên helbestvanên wekî Gianni Rodari, Frederick Douglass, Langston Hughes, Jack Kerouac, Gerard de Nerval, Aleksandr Blok, Ingrid Hertha Dewring, Menahîl Es-Sehwî, Sara Teasdale, Kavafîs, Blaise Cendrars, Ehmedê Şamlo hene. Ew helbest ji hêla wergêrên wekî S. Nalî Gulfiraz, Şafî Muhammed, Azad Rêbiwar, Sidîq Gorîcan, Kemal Savci, Gulîçka Omerovna, Ceylan Doxan, Qedrî Sipranî, Rizgar Elegez, Suat Baran, Yeqîn H., Baran Amed-Abdullah Îdare hatine wergerandin.

Kovara *Nûbiharê* di temenê xwe yê sih salî borî de ji destpêkê ta hejmara xwe ya dawî cih daye wergeran. Wegerên helbest û çîrokan ji Farsî, Tirkî, Almanî û Îngilîzî, wergerên ayetên Qur'anê di nav wan de yên sereke ne. Bi navê *Çend Ayetên Ji Qur'ana Mecîd* rêzewergerek heye ku bi destê Azad Zelal ji hejmara 2yan ta hejmara 7an didome (Nûbihar, 1992). Dîsa di hejmara 90an de du gotarên derbarê wergera Qur'anê hene: *Nivîsa Zimanê Kurdî û Welgerandina Gobîdeyên Pîroz* a Ebdullah M. Varlı (Nûbihar, 2003: 10-11) û nivîsa *Li Ser Wergera Qur'ana Pîroz* a Mela Suleyman Şoreş (Nûbihar, 2003: 25-30). Nimûneyên ji edebiyata rojhilat jî di Nûbahirê de hatine weşandin. Ji wan çend nimûne ew in: *Dubeytiyên* Baba Tahirê Uryan ji Lorî bi destê Sabah Kara (h. 20 û 21, 1994); wergerên ji *Mesnewiya* Mewlana C. Romî yên ji zimanê Farsî û dîsa bi destê Sabah Kara (h.22, 1994); wergerên ji *Rubaiyata* Omer Xeyam ji zimanê Farsî bi destê Sabah Kara (h.24, 1994); wergera hin nimûneyên ji *Gulîstana* Sadîyê Şîrazî bi destê Muhemed Garisî; wergerên ji zimanê Tirkî wekî berhemên Yunus Emre ya bi wergera Hozan Oflaz (h. 18, 1994); helbestên Oktay Rifat bi destê Hozan Oflaz (h. 20, 1994); û berhemeke Migirdîç Margosyan bi wergera Hayrullah Acar.

Di kovara *Nûbiharê* de nimûneyên ji edebiyata rojava jî hene, wekî mînak çîrokeke La Fontaine bi destê Irşad Seyda (h. 9, 1993), *Gustîlka* Knut Hamsun ji zimanê Norwêcî bi wergera Hilmi Yeşiltaş, helbesta Xelîl Cibran *Zarokên te* ji Almanî bi wergera M. Seîd Cubeyr (h. 66-67, 1998), *Hûtê Xwebîn* a O. Wilde bi wergera Kawa Nemir (h. 97, 2005), Berhema Katherine Mansfield *Li Ber Pencere Starana Berî Nivîne* bi wergera Xurşîd Rûşen (h. 98, 2006), *Soneyên* W. Shakespeare bi wergera Ali Karadeniz (h. 102, 2007 û h.104, 2008), helbesta W. Wordsworth *Gupegupa Dilê Min* bi wergera Sidîq Gorîcan (h. 107, 2009) ji wan wergeran çend nimûne ne.

Ji bilî wan Kovarên edebî yên li jor kovarên edebî û rexneyî yên wekî Nûpelda, Dilop, Tîroj, Vate, Pêngav, Çirûsk, Wêje û Rexne, Kurdeçîrok û yên din jî cih dane wergeran. Kovarên edebî yên Kurdî ji bilî weşandina wergerên edebî, di heman demê de lêkolîn û hevpeyvînên derbarê wergerê de jî ji xwe re kirine mijara dosyeyê û cih dane nivîsarên cur bi cur. Wekî nimûne kovara *Tîrojê* (2009, h. 40.) bi sernavê "werger lê çawa" cih daye 8 nivîsan. Kovara *Wyê* (2006, h.12) derbarê rola wergerê û kêşeyên wê de bi pênc wergêran re hevpeyvîn çê kiriye.

Kovara Şermola (2020, h. 8) bi sernavê "Bizava Wergera Wêjeyî li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê" cih daye pênc nivîs û hevpeyvînên derbarê wergerê de.

Li Bakur û li Ewropayê serpêhatiya wergerên bi zaravayê Zazakî jî kêr zêde wekî ya Kurmancî çê bûye, lê belê derfetên weşandinê û hejmara wergêrên Zazakî bi qasî Kurmancî zêde nebûye û ev rewş îro jî bi heman awayî berdewam e. Berhemên Zazakî yê nivîskî bi Mewlîda Ehmedê Xasî (1899) û Mewlîda Osman Efendî dest pê dîke, lê berhemên nivîskî ta salên 1980yan xuya nabin (Varol, 2015: 40). Kırkan (2022: 30) wergera çîroka *Lwî û Kerg*, a ku ji hêla Şêx Evdîrehîm hatiye wergerandin, wekî nimûneya yekem a wergera ji Kurmancî bo Zazakî destnîşan dîke. Ev werger di kovarên Hêvî, Çira û Vateyê de tê weşandin. Di salên 1980yan de di hin kovaran de wergerên Zazakî tên weşandin, wekî mînak di kovara Tîrêj (1979, h.1) de du helbestên Nazim Hîkmet ji aliyê Malmisaniy ve û çîrokeke Sabahattîn Ali bi navê *Estaneka Mêşna* bi înzeya Tadayox: M. Dewij cih digire. Wergêr wekî *tadayox* derbas dibe, lê belê li salên paş bi Zazakî êdî *açarnayox* bêtir dibe tercîh ji bo peyva wergêr. Piştî salên 1990an hejmara berhemên edebî yê zazakî jî zêde dibin û di nav wan de em rastî wergeran jî tên. Her wekî di lêkolîna Varol (2015: 39-54) de diyar dibe, li gel roman û çîrokên Zazakî, bi awayekî hevdemî wergerên Zazakî yê roman û çîrokan jî tên weşandin.

Hin nimûneyên wergerên edebî yê Zazakî ew in ku Varol (2015: 42-54) di xebata xwe de destnîşan dîke: Maksim Gorki, *Karkerê Noni*, wergêr Kemal Akay, Weşanên Tîj, Stenbol, 1999; Berhemeke Samed Behrengî "*Jû Şeftaliye Hazar Şeftali*" bi wergera Hawar Torneçengî Weşanên Tîj, Stenbol, 2001; Daniel Defoe, *Robinson Crusoe*, wergêr J. İhsan Espar, Stockholm 2005; Victor Hugo, *Notre Damea Parîsî* wergêr J. İhsan Espar, Stockholm 2005; Antoine de Saint, *Şazadeo Qickek*, wergêr Mesut Keskin, Almanya 2009; Franz Kafka, *Bedilîyayîş*, wergêr Jêhatî Zengelan, Weşanên Vate, Stenbol, 2014. Di sala 2007an de weşanxaneyê APEC li Stockholmê bi wergera J. İhsan Espar 7 pirtûkên Gunilla Wolde çap kir ku tev jî pirtûkên zarokan in, Heman weşanxaneyê APECê di salên 2008 û 2009an de jî dîsa bi wergera J. İhsan Espar, hin pirtûkên, Thommas Tidholm, Anna Clara, Lotta Olsson û Maria Jönsson ên zarokan yê bi wêne çap kir ji zimanê Swêdî. Ömer Xeyam, Rubaiyat, wergêr Gulê Mayêra, Weşanên Do, Stenbol, 2013.

Wergerên Zazakî yên ji zimanên biyanî bi qasî Kurmancî bi îstiqrar nebe jî di roja îro de jî çap dibin û heta wergerên ji Zazakî bo Kurmancî jî tên kirin. Wekî nimûne wergera berhema *Of Mice and Men* a J. Steinbeck bi destê wergêr Sezgin Firat bi navê *Merreyî û Merdîmî* û wergera romana Nadîre Guntaş Aldatmaz a bi navê *Piltane* bi destê Roşan Lezgîn ve ji bo Kurmancî çend nimûneyên wan wergerên edebî yên navberzimanî û navzimanî ne. Şanlı (2022: 111-114) wekî nimûneyên berbiçav ên wergerên Zazakî, wergerên berhemên wêjeya zarokan ên bi destê wergêrên wekî J. Îhsan Espar û Heyder Diljen hatine çêkirin, wergera Mem û Zînê ya bi destê Mûrad Canşad, wergerên berhemên sînema û şanoyê yên ku Esat Şanlı û Deniz Gündüz ji Tirkî wergerandine destnîşan dike û giringiya wan berheman a ji bo standardîzasyon û vejandina Zazakî derdixîne pêş. Her wisa, di kovara LEWergerê û Bar Helbestê de wergerên zazakî yên berhemên şairên wekî Bertolt Brecht, Heinrich Heine, Sohrab Sepehrî, Furux Ferruxzad, Sylvia Plath bi destê wergêrên wekî Seyîdxan Kurij, Newzad Valêrî, Şade Agon û y.d. hatine wergerandin.

Li Tirkîyê roja îro bi kovarên wergerê, bi bernameyên demdirêj ên wergera berhemên edebiyata cîhanê yên weşanxaneyên Kurdî, bi dersên wergerê yên li beşên ziman û edebiyata Kurdî, bi komxebat û kargehên wergerê, bi piştgirî û sponsoriya saziyên çandî yên ji bo çalakîyên wergerê êdî werger bûye xwedî pozîsyon di nav sîstema çand û edebiyata Kurdî de. Di gel van geşedanan jî, wergera Kurdî ya edebî hîn jî bi arîşeyên bingehîn re rû bi rû ye, wekî nebûna beşên wergera Kurdî yên di zanîngehan de, nebûna saziyên parastina mafên wergêran û kêmasiyên mafên pîşeyî û telîfê yên wergêran.

2.1.2. Nimûneyên Wergeran Li Iraq, Îran û Sûriyeyê

Di vê binbeşê de em ê bi gelemperî behsa hin nimûneyên destpêkê yên wergerên Kurdî yên li nav sînorê Iraq, Îran û Sûriyeyê bikin û navê kovarên ku cih dane wergeran bînin. Ji ber ku xebata me armanc nake ku hemû xebatan destnîşan bike, em ê hin nimûneyên sereke yên wergerê bi awayekî temsîlî bidin da ku derbarê cihê wergerê ya di weşangeriya Kurdî de fikrekê bide. Her çî qas rewşa siyasî û civakî ya li wan herêmên navborî ji hin hêlan ve cîyawaz be jî, nimûneyên wergerê, cureyên berhemên wergerandî û qadên ku berhemên werger tê de derfetên weşanê peyda dikin kêm zêde wekî hev in. Dîsa jî Hassanpour (2005: 282) balê dikişîne ser rewşeke taybet a li Başûr û diyar dike ku rewşa li

başûr ji bo çapkirin û wergerê ji qedexeya ziman bêtir rewşa aborî û derfetên çapkirinê re têkildar e. Navbera salên 1920-1977an li Başûr 1122 pirtûk çap bûne û rêjeya berhemên edebî li dora % 36 û %51ê diguhere (Hassanpour, 2005: 309-310). Ev daneyên li jor nîşan didin ku ji bilî hokarên siyasî, derfetên aborî jî di weşangeriyê de kartêker in û bivê nevē bandorê li ser weşandin û çapkirina wergeran jî dikin.

Li destpêka salên 1930an du kesayetên bi navê Kurdî û Merîvanî li Bexdayê karê weşangeriyê dikin ku di nav wan de wekî mînakeke pêşîn a wergerê, wergera berhema Conan Doyle *A Shot in the Dark* (1935) çap dibe (Hassanpour, 2005: 314-315). Li gor agahdariyên ku Avcî (2021) dide, Pîremêrd ji zaravayê Hewramî Dîwana Mewlewî bi navê *Esîl Ruh* û helbestên Bêseranî wergerandiye zaravayê Soranî. Abdulla Goran jî yek ji pêşengên wergerê ye li Başûr. Li gor lêkolîna Ahmed (2017: 70-71) Abdulla Goran ji bilî berhemên Farsî wergera berhemên ji edebiyata Erebi, Tirkî, Îngilîzî û Rûsî jî kiriye ku di nav wan de berhemên nivîskarên wekî Percy Bysshe Shelley, Yevgeniy Yevtushenko, Nazım Hikmet, Xelîl Cibran, Jamil Sedqî Zahawî hene. Ebdulah Goran edebiyata Îngilîzî ji nêzik ve şopandiye û bandora helbesta romantîk a Îngilîzî li ser helbestvaniya wî çê bûye. Reng e ku ew bandor bi rêya tecribeya wî ya wergerandinê jî pêk hatiye. Di navbera helbesta wî ya bi navê "Bo Bulbul" - بول ب و - (Gelawêjî Nwê, 1997, h.3) û helbesta Percy Byshe Shelley "To a Skylark" xasyetên şêwazî yên berbiçav hene. Goran di xebatên xwe yên wergerê de pêşekî daye edebiyata Farsî û xezelên Hafîz û Naser Xosrow û rûbaiyên Xeyam wergerandine.

Cemal Nebez yek ji wergêrên ewilî ye li Başûr û di sala 1955an de berhema W. Shakespeare *Çîrokî Gerdawekî* (The Tempest) û di sala 1958an de jî ji N. Gogol *Palto* wergerandiye û ev berhem li Bexdayê çap bûne. Her wisa Nebez gotarek bi navê *Wergerandin Huner e* li ser rêbaza wergerê nivîsiye ku Îzedîn M. Resûl di sala 1972yan pêşgotinekê jê re dinivîse û vê berhemê ji bo beşa ziman û wêjeya Kurdî ya zanîngeha Bexdayê ji nû ve çap dike. Ev berhem di sala 1986an de li Swêde û di sala 2021an de jî bi Kurmancîkirina ji zaravayê Soranî ya ji hêla Muhsîn Ozdemir-Brahîm Ronîzer ve di nav weşanên Sîtavê de çap bûye. Di 1967an de Şakir Fettah berhema Homeros bi navê *ئودیسه* (Odêse) li Silêmaniyê çap dike. Werger bi destnivîsa Ş. Fettah ji 32 rûpelan pêk tê û wisa xuya ye ku kurteya destanê ye an jî hin beşên wê hatine wergerandin. Şakir Fettah di heman

salê de berhema J. J. Rouseau ya bi navê *Emil* jî wekî destnivîs werdigerîne û kopîyeke vê xebatê di pirtûkxaneyâ Înstîtuya Kurdî Parisê de berdest e.

Li Başûr di salên 1980yan de berhemên nivîskarên Tirk ên wekî Yaşar Kemal, Nazım Hikmet û Aziz Nesin hatine wergerandin. Şukur Mustafa pirtûkên wekî *Ağrı Dağı Efsanesi* (176), *Orta Direk*, *Şeyh Bedrettin Destanı* (1981), û Abdullah Hasanzade jî *İnce Memed* wergerandine. Şukur Mistafa berhema Nazım Hikmet *Dastanî Şêx Bedredîn Kurî Qaziy Simawne* wergerandiye û ev werger di 1981an de li Bexdayê çap bûye. Dîsa di wan salan de kesên wekî Ezîz Gerdî û Nacî Abbas pirtûkên Îngilîzî yên ku derbarê jinên Kurd de hatine nivîsandin wergerandine. Ezîz Gerdî wekî wergêrekî berhemdar bi dehan berhem wergerandine Kurdî ku di nav wan de koleksiyonên wekî *Efsaneyên Hindî* û *Efsaneyên Îranî*, berhema Oriana Fallaci ya bi navê *Heft Guftûgo* yên berbiçav in. Abdurahman Hacı Maruf, Muhamed Mela Kerim, Maruf Xeznedar û Kerim Husamî ji zimanên Rûsî, Erebî û Farsî gelek berhem wergerandine (Alakom, 1991: 173). Pîyesa M. Gorkî, *Dujminan*, ji hêla Ewrahman Hacı Marif û Mihemedê Mela Kerîm hatiye wergerandin û di sala 1981an de Bexdayê çap bûye.

Şêrko Bêkes di sala 1980yan de romana E. Hemingway *Pîremêrd û Zerya* ji zimanê Erebî wergerand (Uzun, 1995: 103). Şêrzad Hesên ji J. Osborn şanonameya “*Be Turreiy awirr Bo dûawe Bidewe*” wergerand û berhem di 1985an de li Bexdayê çap bû (Pîrbal, 1995: 296-297). Enwer Mayî jî ji wan kesan e ku ji Kurdî bo Erebî werger kirine. Berhema Şêx Hesînê Dasînî *Mijdeha Roj Li Ser Dînê Êzdiyan* wergerandiye Erebî. Letîf Helmet ji Erebî çîrokên zarokan bi navê *Minal û Baran* wergerandine Kurdî (Dihokî, 1995: 150). Şerqawî piyesa Bertholt Brecht bi navê *Jiyanî Galîleo* di sala 1982yan de li Bexdayê wergerandiye û berhem ji hêla wezareta çand û agahdariyê ve bi destê îdareya çand û weşanên Kurdî li Bexdayê hatiye çapkirin. Wergêrên wekî Celal Teqî û Ewrehman Hacı Marif ji zimanên Rûsî werger kirine. Teqî ji Anton Chekhov du berhem bi navê *Xanim û Segekey* û *Xalle Sava* wergerandina Soranî. Hacı Marif jî berhemeke Mikhaîl Sholokhov bi nave *Çarenûsî Mirovêk* wergerandiye Soranî. Ferşîd Şerîfî berhema Samuel Beckett *Waiting for the Godot* bi sernavê *Çemerray Godoîne* wergerandiye Kurdiya Hewramî, û Zahîde Qelender jî berhema navdar nivîskarê

Fransî Antoine de Saint-Exupéry bi sernavê *Şezade Bûçig* wergerandiye Kurdiya Kelhorî. Balkêş e ku her du berhem jî di ser zimanê Farsî re hatine wergerandin.

Her wekî li Bakur, li Başûr jî kovarên edebî ji bo berhemên werger bûne qadên sereke yê weşandinê. Di gelek kovaran de nimûneyên berhemên werger ên ji zimanên cihê hatine weşandin, wekî kovarên *Gelavêj*, *Hîva*, *Ronahî*, *Nûserî Kurd*, *Gelawêjî Nwê*, *Pêro*, *Çiya* û yê din. Li gor agahiyên ku Hassanpour (2005: 607) dide, kovara *Gelawêj* (1939-49) 105 hejmar derdikeve û tê de bi tevahî 114 çîrok tên weşandin ku 82 hebên wan werger in. Wergerên berhemên nivîskarên Ewropî yê wekî Guy de Maupassant, Moliere, A. Çehov, O. Wilde, H. de Balzac, L. Tolstoy, M. Gorkî û y.d. di hejmarên têvel ên *Gelavêjê* de hatine wergerandin.

Yeketiya Nûseranî Kurd di sala 1970yan bi navê *Nûserî Kurd* kovarek derxist û tê de çîrok û helbest weşandin û di sala 1981an de jî kovara *Pêro* ya Yekîtiya Nûseranî Kurd derket û di vê kovarê de wergera berhemeke Samed Behrengî jî cih girt (Hassanpour, 2005: 319-320). Di kovara *Gelawêjî Nwê* de wergerên ji wêjeya cîhanê hene. Her çî qas weşana kovarê di salên 1990an be jî, em dîsa rastî wergera ji zimanê sêyem tên. Wekî nimûne di hejmara yekem de (*Gelawêjî Nwê*, 1997:145-146) Ebubekir Xoşnav ji nivîskara Îtalî Natalia Ginzburg (1916-1991) *Pêlawî Draw* ji Farsî werdigerîne. Di heman hejmarê de Dîlawer Qeredaxî ji Anton Çehov şanonameya *Jûrî Jimare Şeş* adapte dike bo Kurdî bes di kovarê de tê diyarkirin ku ji deqên Erebi û Farsî sûd wergirtiye. Her wisa Blau (2017: 38) vê agahiyê dide ku kovara *Wergêran* li Hewlêrê û *Serdem* li Silêmaniyê bi rêkûpêk cih didan berhemên werger.

Li gor agahiyên ku Taha (2006: 146-183) dide, li devera Bahdînan jî li salên 1960an di kovara *Ronahî* de nimûneyên wergerê yê berhemên A. Puşkin, V. Hugo û yê din tên weşandin. Li salên 1980yan û 1990an li devera Behdînan kesayetên edebî yê wekî Hesen Silêvanî, Mueyed Teyîb, Enwer Mihemed Tahir, Mihemed Emîn Doskî, Tehsîn Îbrahîm Doskî, Arif Hîto, Fazil Omer, Ehmed Şerefxanî, Lezgîn Çalî, Ehmed Şerefxanî, Salah Sadallah û yê din berhemên edebî wergerandine. Salah Sadallah romana James Aldridge a bi navê *The Diplomat* di sala 1984an de ji Îngilîzî wergerandiye Kurmancî. Hesen Silêvanî jî Erebi, Mueyed Teyîb jî Erebi û Swêdî tekstên edebî wergerandine. Mihemed Emîn Doskî berhema *Hezar û Yek Şev* û *Kelîle Dimne* jî erebi wergerandiye

Kurmancî û ji weşanxaneyê Spîrezê daye çapkirin. Arif Hîto çîrokên Zekerîya Tamil ji Erebî wergerandine. Tehsîn Îbrahîm Doskî helbestên ji dîwana Mihemed Îqbal ji Erebî wergerandine. Ehmed Şerefxanî *Mesnewîya* Mewlana Celaledînê Rûmî ji Farsî bo Kurmancî wergerandiye.

Piştî salên 2000an li Başûr hem bi Soranî û hem jî bi Badinî bi dehan wergerên ji zimanê cihê bi taybetî jî ji zimanên Ewropî hatine çêkirin ku weşanxaneyên wekî Spîrez, Balinde, Dîwan, Karwan, Bender û yê din pêşengiya vê tevgera wergerê dikin. Wergêrên wekî Jiyar Homer ji çend zimanan jî Kurdî û ber bi Kurdî gelek berhem wergerandine. Wekî nimûne Jiyar Homer ji zimanên Îngilîzî, Îspanyolî, Portekîzî, Erebî û Farsî wergeran dike. Di nav wergerên wî de berhemên nivîskarên wekî Juan Carlos Onetti û Carlos Ruiz Zafón jî hene û wî di heman demê de berhemên Ferhad Pîrbal û Bextiyar Elî wergerandine zimanê Îspanyolî jî. Her wisa wergerên klasîkên Îngilîzî jî sal bi sal zêdetir dibin. Wekî nimûne berhema *Peyamber* a Cîbran Xelîl Cîbran bi destê Jîbar Ebdulhekîm ve, şanomeya William Shakespeare *Macbeth* ji hêla Şêrzad Şefîh Barzanî ve, şanomeyeke din a W. Shakespeare bi navê *Tîmonê Atînayî* ji hêla Enwer Mihemed Tahir ve, berhema navdar a Oscar Wilde bi sernavê *Mîrê Bextewar* jî hêla Ebdulah Pîr ve hatine wergerandin. Wergêr Mihemed Cemîl jî çîrokên Joseph Sheridan, Rudyard Kipling û Edward Frederic ji Îngilîzî wergerandine Soranî. Her wisa berhema navdar a nivîskarê Amerîkî Jack London a bi navê *The Call of the Wild* bi sernavê *Gaziya Çolê* ji hêla Nojîn Ebdulla ve bi dîyalekta Behdînî hatiye wergerandin.

Li Rojhilat yekem pirtûka Kurdî di sala 1885an de çap bûye û ew jî ferhenga Kurdî-Farsî ye. Li gor zanyariyên ku Hassanpour (2005: 288) dide di serdema Xanedaniya Pehlevî de (1925-79) weşanên bi zimanên Tirkî, Kurdî, Belûcî û Tirkmenî qedexê bû. Menbarî û Farahzad (2024: 9) didin zanîn ku di serdema yekem a rêveberiya Pehlewî de (1925-1941) bi tenê yek pirtûk bi Kurdî hatiye wergerandin. Di serdema duyem de (1941-1979) pênc pirtûk jî bo Kurdî hatine wergerandin û heşt pirtûk jî ji Kurdî bo Farsî hatine wergerandin. Pirtûka ku di serdema Pehlewî ya yekem de hatiye wergerandin wergera Încilê ya bi navê *Nazani Mezgani* ye û bi dîyalekta Hewramî hatiye wergerandin. Di nav wergerên ji Kurdî bo Farsî de kelimên Yarsanan ên dînî yê bi wergera Mashallah Soori

(1965), *Sheikhi San'an* (1967) û *Bahram u Golandam* (1968) bi wergera Ghader Fattahi Ghazi cih digirin (Menbari û Farahzad, 2024: 15-18).

Ji ber astengiyên weşandinê hin xebatên wergêrên ji Rojhilat li herêmen din çap bûne, wekî mînak Kerim Husamî romana M. Gorki *Dayîk* wergerandiye Kurdî û berhem di 1978an de li Bexdayê çap bûye. Di sala 1978an de heman berhem li rojhilat ji nû ve çap bû (Hassanpour, 2005: 332). Abdullah Hasanzade di sala 1986an de romana Yaşar Kemal *İnce Memed* bi navê “Hemedok” wergerand Kurdî û ew jî li Bexdayê çap bû (Alakom, 1991: 187). Dîsa li gor agahdariyên ku Hassanpour (2005, 332-333) dide di navbera salên 1978-1985an de li Rojhilat rewşeke azad hebû û wê demê nêzikî 120 pirtûk çap bûn ku di nav wan de wergera Kurdî ya pirtûka William Eagleton *The Kurdish Republic of 1946* jî hebû.

Hejar Mukriyanî ji bilî xebatên xwe yê rewşenbîrî, bi wergerên xwe jî bandor li ser edebiyatvanên Rojhilat kiriye. Wergerên wî yê ji zimanê Farsî bo Kurdî yê wekî *Şerefname*, Çarînên O. Xeyyam, wergera Qur'anê, wergera Mem û Zînê ya ji Kurmancî nimûneyên giring in di tradîsyona wergera Rojhilat de. Ehmedê Qazî di sala 1981an de helbesteke Z. Obeydî ya bi navê *Kit û Mişk* wergerandiye Kurdî û li Tehranî çap bûye. Wergera berhema Claudius James Rich, *Geştî Rich Bo Kurdistan, 1820*, bi wergera Mihemed Heme Baqî nimûneyeke balkêş a wergera li Rojhilat e (Mihemedpûr & Rizaî, 2017: 103). Piyeseke şanoyê ya bi navê *Xermanî Xem û Pejare* ya N. Navidî ji Farsî ji aliyê Celîl Gadanî ve hatiye wergerandin û li Mahabadê di çapxaneyê Aso de li sala 1981an çap bûye (Kovara Hêvî, 1983). Kovarên Sirwe û Awêne ku di salên 1980yan de dest bi weşanê kirin, xwedî roleke giring in ji bo ziman û edebiyata Kurdî. Ji bilî nivîsên edebî di wan kovaran de nimûneyên wergeran jî xuya dibin (Mihemedpûr & Rizaî, 2017: 130). Her wisa berhemên Bextiyar Elî yê ku bi zimanê Farsî hatine wergerandin, wekî mînak *Axerîn Enarê Donya* (Hinara Dawî ya Dinyayê), *Girûbê Perwane* (Êvara Perwaneyê), *Qesrê Ferendeganê Xemgîn* (Qesra Balindeyên Xemgîn) û *Şehrê Sefîdê Mûsîqîdanha* (Bajarê Mûzîkjenên Spî) jî wekî nimûneyên wergera Kurdî bo Farsî hêjayî qalkirinê ne. Di van salên dawî de du berhemên Elî Eşref Derwîşyan ên bi navê *Abşûran* û *Demsala Nan* ji aliyê Cafer Açar ve ji Farsî bo Kurdî hatin wergerandin û di nav weşanên Nûbiharê de li Tirkiyê çap bûn.

Li Rojava heya dawiya Duyem Şerê Cîhanê rewşeke erênî hebû ji bo weşanên bi zimanê Kurdî, lê belê piştî avabûna Komara Suriyê ya di 1946an de bikaranîna zimanê Kurdî ya di qada weşangeriyê de ji bo demeke dirêj qedexe bû. Ji ber vê çendê, berhemên nivîskarên rojava yê çapkiri kêm in û yê heyî jî li Başûr û Lubnanê hatine çapkirin. Li gor agahiyên ku Malmisaniy (2006: 6) dide, di maweya desthilatiya Fransî de destûra weşanên Kurdî hebû lê ev derfet dema ku Suriye bû dewleteke serbixwe ji holê rabû. Wergerên yekem ên li Rojava jî rastî wê serdemê tên ku ji nav Kitêbxana Hawarê bi destê Celadet Bedirxan hatine çapkirin. Çelik (2019: 291-301) xebatên wergerê yê ku bi însiyatîfa Celadet Bedirxan dest pê dike wekî hewldanên çêkirin û meşrûkirina nasnameyeke çandî şirove dike: Celadet Bedirxan ji aliyê ve nivîsên Kurdnasên Ewropî yê wekî Martin Hartmann, Helmuth von Moltke û yê din ên derbarê Kurdan de werdigerîna Kurdî da ku nêrînên Ewropiyî ragihîne Kurdan, ji aliyê din ve jî berhemên Kurdî werdigerîna Fransî ji bo ku temsîliyeteke çand û nasnameya Kurdî li ba Ewropiyî çê bibe û pîreyek di navbera Kurdî û çanda Ewropî de ava bibe. Wergera strana bi navê *Delalê Eysê*, destana *Memê Alan* a ber bi Fransî bi vê armancê pêk hatine.

Malmisaniy (2006: 12-13) diyar dike ku ji salên 1930yan heya 2006an li rojava bi zimanê Kurdî 220 pirtûk çap bûne û cara yekem pirtûkên nivîskarên niştecihê Rojava jî piştî salên 1980yan çap bûne. Navbera salên 1925 û 1950yan bi destê Celadet û Kamiran Bedirxan û rewşenbîrên li dora wan bi qasî 31 berhem çap bûn û ji wan 3 berhem werger in (Hassanpour, 2005: 335). Di nav koleksiyona tekstên Kurdî ya Stig Wikander Recueil de textes kourmandji, Almquist & Wiksells, Boktryckeri Aktiebolag, Uppsala (1959: 94-100) de em rastî sê wergeran jî tên: *Evangile de Luc XV, 11-32 Încîla Lûqa*, Bêrûd 1953, wergêr diyar nekiriye. *Keçika Kibrîtîfiroş* a H. C. Andersen bi wergera Bişarê Segman a ku ji kovara Ronahî, (1943, h. 19) hatiye wergirtin, û *Xénophona Anabasis beşa Kardûx û welatê Kardûxan* bi wergera Herekol Azîzan ji Hawarê (h. 32) hatine wergirtin.

Kovarên ku Celadet û Kamiran Bedirxan li Şamê derdixînin giringiyê didin wergeran. Her wekî Cewerî (1996: 97) destnîşan dike, di her çar kovaran de navbera salên 1932-1946 ji aliyê heft-heşt nivîskaran bi qasî 187 kurteçîrok hatine nivîsandin û ji wan nêzikî 20 heb werger û adaptasyonên ji zimanên cihê ne. Di

kovara Hawarê de Celadet Bedirxan ji bilî wergera yekem a bi navê *Conî û Cimêma*, wergera berhemên H. C. Anderson û Guy de Maupassant kirine. Kamuran Bedirxan wergera *Ayetên Qur'anê û Hedîsên Pêxember*, wergera *Încilê û Çarînên Omer Heyyam* çê kirine. Nûredîn Zaza jî çîrokên nivîskarên wekî Alphonse Daudet, Maurice Bouchor, Frank Stockten ji Fransî wergerandine û ji hejmarên têvel ên Hawarê hatine weşandin. Di kovara Ronahiyê di hejmara 15an (1943) de wergera çîrokek bi navê *Cankêş -Le Diable de Guy Maupassant-* (Şeytan Ji hêla Guy De Maupassant) bi ser navê Bişarê Segman derçûye. Dîsa di heman kovarê de (1944) di bin sernavê "Ji Edebiyata Farsî" hin beşên *Gulistana Sadiyê Şîrazî* û ji *Dîwana Hafîzê Şîrazî* çend şîir hatine wergerandin û nasnavê wergêr jî wekî "Farsîxwîn" derbas dibe. Qedrîcan çend beş ji romana Fînî ya Grigoriy Petrov a bi navê *Di Welatê Zembeqê Gewir De* wergerandiye û di Roja Nû de weşandiye.

Li gor agahiyên ku Konê Reş (2013: 37-38) dide, di sala 1968an de, an ku 23 sal piştî kovarên Hawar û Ronahiyê, Cegerxwîn kovareke xwerû Kurdî bi tîpên latînî bi navê *Gulistan* derxist. Di vê kovara çandî û edebî de wergerên Cegerxwîn ên ji pirtûkên V. Minorsky û çîrokek Mihail Solohov *Hînbûna Kîne û Gir* a ku wergêr wekî A.D. (Ezîzê Dawê) hatiye nivîsandin cih girtine (Konê Reş, 2013: 37-38). Wergêr û nivîskar Keça Kurd wergera çîrokên bijartî yên Aziz Nesin kiriye û ev berhem li Beyrûtê di 1990an de çap bûye. Her wisa Şahîn B. Soreklî yek ji wan kêman kesane ku ji Îngilîzî û Almanî werger kirine. Di nav wergerên wî de romanek ji Heinrich Böll û çîrokên ku wî ji zimanê Almanî û Îngilîzî wergerandine hene (Uzun, 1995: 195). Deham Evdîlîfetah, ji bilî xebatên din, wergera *Destana Gilgamêş* ji zimanê Erebî kiriye.

Piştî salên 2000an derfetên weşana ser medyaya civakî li rojava çê bû û bi vî awayî nivîskarên rojava berhemên Kurdên li deverên din bi dest xistin û berhemên xwe jî bi awayekî online weşandin (Malmisaniy 2006: 27). Wekî mînak Sîrwan H. Berko ji zimanê Almanî ji Karl Kraus helbesta *Man frage nicht* -Gerek kes nepirse- (Url 2); helbesta şairê Alman C. J. Heinrich Heine *Ich glaub nicht an den Himmel* -Baweriya min bi ezmên nayê- (Url 3); ji Bertolt Brecht *Şewitandina Pirtûkan* - Die Bücherverbrennung (Url 4); ji zimanê Îngilîzî ji Harold Pinter *Death* -Mirin- wergerandine û li ser malpera navborî weşandine. Her wisa wergerên berhemên Selîm Berekat ên wekî *Şikeftên Haydrahodahosê* (2013) û

Mirîyên Sade (2014) ku ji hêla wergêrê rojavayî Ebdelah Şêxo ve hatine çêkirin, mînakên dawî yê wergera edebî ya li Rojava ne.

2.1.3. Nimûneyên Wergeran li Kavkazê

Li gor agahiyên ku Hassanpour (2005: 335-340) dide, li serdema Sovyetê navbera salên 1921 û 1980yan li dora 377 berhemên Kurdî çap bûn. Di nav wan de hejmara berhemên edebî, bi taybetî jî piştî salên 1960an gelek bûn ku werger jî tê de hene. Tiştê balkêş ku Hassanpour (2005: 338) destnîşan dike ew e ku li kêleka wergerên ber bi Kurdî yê ji bo avakirina hişmendî û îdeolojiya nû ya komunîst, qet berhemên Marks, Engels, Lenin an jî Stalin nehatin wergerandin û vê yekê jî bi armanca astengkirina hişmendî û fikrî ya Kurdî ve girê dide. Lê belê Boyik (2019: 13-25) di nav wergerên Kurdî de behsa berhemên fikrî jî dike û dide zanîn ku li gel berhemên edebî, wergerên pirtûkên îdeolojîk û siyasî jî hatine kirin û wergerên pirtûkên Stalin yê ji aliyê Wezîrê Nadir ve hatine wergerandin wekî nimûne nîşan dide.

Çavkaniyên wergerên Kurdî yê li Kavkazê ji neşrîyatên dewleta Ermenistanê, pirtûkên serbixwe û almanakên (berhevok) *Bahara Teze*, *Bahar* û rojnameya *Riya Teze* pêk tên. Kurdên Kavkazê zêdetir wergerên berhemên nivîskarên Ermen û Rûs kirine, lê belê kêm be jî berhemên ji zimanê Azerî jî hene ku em dikarin wergera Ahmedê Hepo ya berhevkarîya helbestan a helbestvanê Azerî Suhrab Tahir bi navê *Du Evîn*, *Du Gulle* wekî mînak nîşan bidin. Kesayetên wekî Ereş Şemo, Heciyê Cindî, Casimê Celîl, Cerdoyê Gêncî, Fêrikê Êsif û Têmûrê Xelîl û y.d. gelek berhemên nivîskarên wekî H. Tumanyan, A. Araratyan, H. Koçar, L. Tolstoy û yê wê wan wergerandine Kurmancî. Her çî qas piraniya nivîskar û rewşenbîrên Kurd ên Kavkazê xwe dabin ber barê wergêrê jî, her wekî Eşo (2018: 48) destnîşan dike, hin kesên wekî Mîkayîlê Reşîd, Memê Eylaz, Emerîkê Serdar û Îşxanê Esko bi taybetî wekî wergêr kar kirine. Wergerên berhemên nivîskarên Ermen xwedî hejmareke zêde ne, lewre têkiliya dîrokî ya navbera şairên Kurd û Ermen û jiyana hevpar a wan her du gelan peywenda wergêrê ya civakî jî bi xwe re çê kiriye. Her wekî Îbrahîm (1990: 88-95) destnîşan dike, keda Xaçatûr Abovyan di vê têkiliya nêzik de gelek e. Her wisa di berhemên nivîskarên Ermen ên wekî P. Proşyan, Raffînin, Migirdîç Armen, Hraçya Koçar, Stepan Zoryan û y.d. de çîrokên lehengên Kurd hene ku vê nêzikiya civakî û dîrokî nîşan didin.

Erebê Şemo şanoya nivîskarê Ermen Alexander Araratyan *Koçekê Derewîn* di 1930an de werdigerîne Kurdî û dide weşandin (Boyik, 2019, r. 130). Heciyê Cindî gelek berhemên edebî ji zimanên Rûsî û Ermenî, bi taybetî yên derbarê jiyana Kurdan û derbarê lehengên Kurd, û berhemên nivîskarên cîhanê ên mezin wergerandine Kurdî (Eşo, 2018: 182). Emînê Evdal û Heciyê Cindî bi hev re berhemeke Hovhaness Tumanjan bi navê *Gîkor* wergerandine. Berhema ku yekemcar li Rewanê ji hêla Hikumeta Şewra Ermenistanê çap dibe di sala 2012an de jî li Wienê ji hêla Înstîtuta Kurdzaniyê dubare çap dibe. Qaçaxê Mirad ji L. Tolstoy *Plêne Kavkazê* wergerandiye. Di 1937an de Casimê Celîl ji A. S. Puşkin *Çîroka Masîgir û Masiya Zêrîn* werdigerîne û ew werger li Yêrêvanê çap dibe. Berhema Yêxîşê Çarênts bi navê *Lênîn û Elî* ji hêla Mîkaêlê Reşîd û Sehîdê Îbo ve tê wergerandin û di sala 1957an de li Rewanê bi pêşgotineke Heciyê Cindî ya derbarê jiyana û berhemên helbestvanan tê çapkirin. Dîsa li gor agahiyên Konê Reş (2013: 76) di sala 1943 de ji bo bîranîna 150 saliya jidayîkbûna A. S. Puşkin, Casimê Celîl komê helbestên wî wergerandine ser zimanê kurdî û çap kirine.

Di pirtûka *Efirandinêd Nivîskarê Kurdê Sovêtê* de Heciyê Cindî ji A. Isahakyan berhema *Di Nava Stêrka Elegezê* û ji Sarmên berhema bi navê *Latîfa*, Emînê Evdal ji A. Isahakyan *Keça Cimaeta Ermeniyana*, Casimê Celîl ji H. Tumanyan *Maro* wergerandine. Emerîkê Serdar ji nivîskarê Ermen Hraçya Koçar berhema bi navê *Hisret -Kerîk-* di sala 1972yan de wergerand. Li gor lêkolînên Alakom (2023: 31) Mîkaêlê Reşîd, Babayê Keleş, Emerîkê Serdar, Wezîrê Eşo, Hesênê Uso ji zimanên Rûsî, Ermenî, Fransî gelek nivîs wergerandine Kurdî û di Rêya Teze de weşandine. Di nav wan wergeran de ji bilî lêkolînên derbarê dîroka edebiyata Kurdî, nimûneyên berhemên edebiyata cîhanê jî hene (Alakom 2023: 50). Wekî mînak Heciyê Cindî bi alîkariya Tîtalê Mûradov berhema M. Gorkî *Makar Çudra* werdigerîne Kurdî û di çend hejmarên Rêya Teze de tê weşandin.

Ji bilî berhemên nivîskarên Rûs û Ermen, wergerên berhemên din jî çê bûne. Cerdoyê Gêncî berhema Daniel Defoe a navdar bi navê *Robînzon Krûzo* di sala 1936an de werdigerîne û ew werger di sala 2012an de li Wienê ji hêla Înstîtuta Kurdzaniyê ve dubare tê çapkirin. Çend beşên *Othelloyê* ji hêla Fêrikê Ûsiv ji wergera Masehyan a bi zimanê Ermenî hatiye wergerandin. Fêrikê Ûsiv çend helbestên Lord Byron û hin nimûneyên *Soneyên Shakespeare* jî wergerandine. Dîsa di Rêya Teze de sala 1964 hejmar 23 de ji bo 400 saliya rojbûna Shakespeare

rûpelek taybet hatiye terxankirin bi navê *Nivîskarê Şanoyê yê Herî Navdar ê Dinê*. Alakom (2023: 116) mîna keke din a wergera edebiyata Ewropî dide ku ew romana Klaus Peter Wolf a bi navê *Die Abschiebung oder Wer tötete Mahmut Perver* e û beş bi beş di rojnameya Rêya Teze de tê weşandin.

Her wisa berhemên nivîskarên Kavkazê bi xwe jî, di serî de zimanê Rûsî û Ermenî, ber bi zimanê din hatine wergerandin. Her wekî agahiya ku Eşo (2018: 181) dide romana Heciyê Cindî *Hewarî* ji bo zimanên Rûsî û Ermenî hatiye wergerandin û Îsmail Hesaf heman berhem li Dîmeşqê wergerandiye Erebi. Dîsa Eşo (2018: 191) diyar dike ku bi wergerên wan ên Rûsî berhemên nivîskarên Kurd ên li welatê Sovyetê bêtir dihatin nasîn û mînaka helbesta Casimê Celîl a bi navê *Lenîn* dide ku di sala 1957an de wergera wê dide rojnameya Pravda de tê weşandin.

Kurdên Kavkazê yê Êzdî berhemên xwe yê dîni jî wergerandine zimanên Ermenî û Rûsî, wekî mînak Çerkezê Reş her du berhemên Ezdîtiyê, *Mishefa Reş* û *Cilwe*, ji zimanê wan ê resen werdigerîne zimanê Rûsî û wergerê li gel pêşgotineke zanistî çap dike (Eşo, 2018: 264). Yek ji wergêrên berhemdar ê êvra Kavkazê jî Mirazê Cemal e. Di nav wergerên Mirazê Cemal de bîranînên Şergo Yarisyan, helbestên Hakob Harut û çîrokên Jelena Asiland hene. Pêla wergerê ya êvra Kavkazê di roja îro de jî, di gel derfetên kêr, bi têkildarbûna bi weşanên Kurdî yê li herêmên din re berdewam e. Bi destê wergêrên wekî Prîsko Miho, Karîna Osêyan, Seyrana Celad, Dildar Şeko, Vrezh Kosayan, Bessam Mer'ê bi taybetî berhemên nivîskarên Rûs û Ermen tîne wergerandin û weşandin.

2.1.4. Li Ewropayê Wergerên Kurdî

Bajarên Ewropayê yê wekî Stockholm, Parîs, Berlîn û y.d. bi taybetî piştî salên 1980yan bûn stargeh ji bo nivîskar û vekolerên Kurd ên penaber. Wan kesayetên derfetên welatên Ewropî bi kar anîn û dest bi xebatên rewşenbîrî û weşangeriyê kirin. Ji bilî komele û sazîyên çandî û zimanî, Kurdên penaber weşanxane damezrandin û kovarên edebî û çandî derxistin. Hassanpour (2005: 341) wekî weşanxaneyên sereke navên Roja Nû (Swêd, Kurmancî) Binkey Çapemenî Azad (Swêd, Soranî), Jîna Nû (Swêd, Kurmancî), Weşanxana Deng (Swêd, Kurmancî), Komkar Press, Verlag Dengê Komal (Almanya, Kurmancî) dide. Di serî de kovarên wekî Hêvî, Azadî, Nûdem û Nûdem Werger û

weşanxaneyên wekî Welat, Roja Nû, Deng, Nûdem, giringiyeke mezin dan wergerê û vê yekê bandor li ser pêngava wergerê ya li Tirkîyê ya salên 1990an û bi wê de çê kir. Li jêr em ê navê hin wergêr û weşanan û nimûneyên wergeran bidin ku li bajarên sereke yê Ewropayê hatine çêkirin.

Wekî nimûneyeke destpêkê ya wergera edebî ya helbesta modern, wergerek bi sernavê *Der Schnee Des Lichtes, Kurdische Gedichte des Prinzen Kamuran Ali Bedir Khan* cih daye hin helbestên Kamiran Bedirxan a bi wergera Curt Wunderlich û berhem di sala 1935an de li Berlînê hatiye weşandin. Ev berhem di pirtûkxaneyê Însîtuya Parîsê berdest, lê belê weşanxane nediyar e. Di salên 1970yan de jî nimûneyên wergeran hene li Ewropayê, wekî mînak wergereke çîrokên Kurdî bi navê *Kurdische Marchen* (Çîrokên Kurdî) ji hêla Eugen Diederichs Verlag ve li bajarê Kölnê di sala 1978an de hatiye çapkirin (Azadî, 1978: h. 4).

Di Salên 1980yan de hejmara wergerên çapbûyî zêde dibe. Wergera helbesteke B. Brecht bi destê Ş. Bekir Soreklî hatiye çêkirin û di Kovara Hêviyê de hatiye weşandin (Hêvî, 1985: h. 3). Medenî Ferxo di sala 1986an de pirtûkek ji helbestên Cegerxwîn bi navê *Poezie uit Koerdistan* wergerandiye zimanê Holandî (Uzun, 1995: 410). Di heman salan de li Swêdê hin pirtûkên zarokan ji bo Kurdî hatine wergerandin. Berhema Gunilla Bergström bi navê *Alfons û Cinawir* û berhema Astrid Lindgren a bi navê *Keça Şerrût Lotta* ji weşanên Kurdiska Förlaget li Stockolmê sala 1981an çap bûne (Hêvî, 1984: h. 2). Di sala 1991an de li Stokholmê ji Weşanên Welat berhemeke Dostoyevsky bi navê *Merivên Reben* bi wergera Hesenê Metê çap bû.

Helbestên Feryad Fazil Omar bi Kurdî û Almanî bi navê *Dengi şî're namoyek* (Stimme eines fremden Gedichts) di sala 1993yan de li Berlînê ji aliyê VWB - Verlag für Wissenschaft und Bildung hatiye çapkirin. Helbestên Kurdî hem bi elfabeya Latînî û hem jî bi elfabeya Erebi tê de cih digirin û di pirtûkê de nirxandineke dirêj a edebî ji aliyê Burkhard Tewes hatiye nivîsandin ku tê de behsa jiyana Fazil Omar û mijarên helbestên wî dike û pê re jî balê dikişîne ser bêhaybûna Almanan a ji edebiyata Kurdan û bi giştî ya ji edebiyata rojhilat (Omar, 1993: 140-140). Reng e ku çapkirina vê berhemê bi awayekî armanc dike ku vê nezanîne kêmtir bike û helbesta Kurdî bigihîne xwînerên nû yê biyanî. Ew wergerên jêr ên Kurdî jî li Swêdê ji hêla weşanên Kulturföreningen Sverige-

Kurdistan hatine çapkirin: Berhema Alexander Pushkin bi navê *Gashtêk Bo Erzarom* ji hêla Maruf Khaznadar ve; berhema Boris Pasternak, *Evgeni Pasternak* ji hêla Ferhad Shakely ve; heşt çîrokên Anatole France û Saki bi navê *Halbizharda la Chîrok-î Kurt-î Bêgana, Anatole France, Saki* ji hêla Ebdullah Goran ve hatine wergerandin.

Di Kovara Hêvî de (1992, h. 8) wergera berhemeke Henry Lawson bi navê *Jina Şivên* ji aliyê Şahînê B. Sorekli ji zimanê Îngilîzî hatiye wergerandin. Dîsa di heman hejmarê de wergereke helbestvanê Îngilîz T. S. Eliot a bi navê Goranî Xoşewîstî (*The Love Song of J. Alfred Prufrock*) bi wergera Nezend Begî Xanî cih digire. Wergêr her wisa derbarê jiyana Eliot, helbestvaniya wî û taybetiyên helbestên wî jî agahiyan pêşkêş dike. Kovara Nûdemê di navbera edebiyata cîhanê û edebiyata Kurdî de kêliyeke giring e. Kovar ji aliyekê ve cih dide berhemên edebî yên Kurdên ji beşên cihê û hem jî bi wergerên ji zimanên cîhanê romanûs, şair û çîroknûsên navdar li gel berhemên wan pêşkêşî xwînerên Kurdî dike.

Hin mînakên wergerê yên di Kovara Nûdemê de cih girtine ew in: Kovar di hejmara 2yem de (Nûdem, 1992) cih dide çîroka Yaşar Kemal a bi navê *Dara Hinarê A Li Ser Girik* bi wergera Dr. Poloço; *Şevên Spî* ya Dostoyevski bi wergera Firat Cewerî; helbesta Ahmed Arif *Sê û Sê Gule û Keçika Kibrîtfiroş* a H. C. Andersen bi wergera Bişarê Segman ku wekî têbinî tê diyarkirin ku ew werger cara yekem di sala 1943yan de di hejmara kovara Ronahî ya 19an de derçûye. Di hejmara 3yem de ji Esmâ Ocak *Nameya Ku Hate Gund* bi wergera Husên Duzen; ji Anton Çehov *Yên Serxweş* bi wergera Firat Cewerî; ji Heinrich Böll *Bîranîna Kiralekî Ciwan* hatiye weşandin. Di hejmara 5em (1993) de ji F. Nietzsche *Gotina Pêşî Ya Zerdeşt* bi wergera Firat Cewerî; ji O. Paz *Çame* bi wergera E. Huseynî; di hejmara 6em de (1993) ji Henry Miller *Madmazel Claude* bi wergera F. Cewerî; ji A. S. Exupery *Mîrê Biçûk* bi wergera Şahînê B. Soreklî; di hejmara 9em de (1994) ji J. Paul Sartre *Dîwar* bi wergera F. Cewerî; ji Suzan Samanci *Evîndara Ji Helepçeyê Hatî* bi wergera Mehmed Uzun hatiye weşandin. Kovara Nûdem Wergerê jî ku bi tenê yek hejmar derket cih da wergerên gelek berheman.

Hin wergerên berhemên klasîk ên wêjeya cîhanê ku tê de berhemên Îngilîzî yên wêjekarên Amerîkî û Îngilîz jî hene di nav weşanên Nûdemê de çap bûne. Wekî mînak Mustafa Aydoğan *Zaroka Şevê* ya Jack London (1995); Fawaz Husên berhema *Biyani* ya Albert Camus (1995) û *Mîrzayê Biçûk* a A. De Saint-Exupery

(1995), Firat Cewerî şanonameya *Li Benda Godot* (1995) a Samuel Becket, *Mişk û Mirov* (1993) a John Steinbeck, *Şevên Spî* (1993) ya F. Dostoyevsky, Şahîne B. Soreklî *Şerefa Wendabûyî ya Katharina Blum* (1997) a Heinrich Böll wergerandine. Her wisa romanên Yaşar Kemal ên ku Mustafa Aydoğan wergerandine jî ji weşanên Nûdemê derçûne. *Çîrokên Hezar û Şevê* bi wergera Rojan Lezgîn ji Nûdemê derketiye. Di salên 2004 û 2005an de 29 pirtûk ji aliyê Saziya Çandî ya Kurdî li Stokholmê hatine çapkirin ku tê de wergerên pirtûkên zarokan jî hene (Malmisanij 2006: 24). Xelîl Dihokî yek ji wan wergêran e ku pirtûkên zarokan ên nivîskarên Swêdî yên wekî Lars Klinting, Sven Zetterlund, Mats Rehnman di salên destpêka 2000an de wergerandiye Kurdî.

2.2. Xebat û Lêkolînên Derbarê Wergera Kurdî de

Di vê binbeşê de em ê behsa hin xebatên vekolerên Kurd ên derbarê wergerê de, nemaze wergera edebî, binirxînin û bala xwe bidinê bê ka werger bi çi awayî, di kîjan çarçoveyan de û bi kîjan pêşekî û ranêzikiyan bûye mijara wan. Dîsa em ê bala xwe bidin ser têkiliya wan xebatên lêkolînî ya bi pêvajoya wergerê re û bi rêya wan lêkolîn, analîz û rexneyan em ê hewl bidin ku helwesta rexnegiran a li hember werger û wergêran şirove bikin û bergeha rexneya wan kifşe bikin. Di vê binbeşê de jî, bi heman awayî armanc pêşkêşkirina hemû lêkolîn û xebatên analîtîk bêtir, bi rêya binavkirina hin xebatên nimûne nîşandana dîmeneke giştî ya lêkolîn û analîzan e.

Yek ji xebatên destpêkê yên derbarê wergerê gotara Cemal Nebez ([1958] 2021) a bi navê *Wergêran Huner e* ye. Nebez ev gotar di sala 1958an de nivîsiye û gotar ji çar beşan pêk tê û tê de qala mijarên wekî 'Kurd û werger', 'werger divê çawa be', 'cure û teknîkên wergerê' dike. Di vê xebata xwe de Nebez pêwîstiya wergerê û armanca wê wiha diyar dike: "...Ev demek e me kurdan jî karwanê şaristaniyê li cih hiştiye. Em neçar in ku sûdê ji zanyarî û pêşketinên gelên din werbigirin. Ji ber vê yekê divê em berhemên ramanên wan wergerînin ser zimanê xwe" ([1958] 2021: 23). Gotara Nebez her çi qas bi awayekî hûrgilî werger û mijarên têkildar lêkolîn nekiribe jî, di qada xwe de nimûneyeke seretayî ye û pêwîstî û arîşeyên giştî bi awayekî zelal destnîşan kiriye û bi wan taybetiyên xwe jî nivîsareke giring e. Gotara Ferhad Pîrbal (2002) a bi navê *Mêjûy Wergêran le Edebîyatî Kurdî da: Konewe ta 1932* lêkolîneke destpêkê ye li ser dîroka wergera Kurdî ya edebî. Lêkolîna Pîrbal ji dîroka qedîm ta destpêka sedsala 20an

nimûneyên wergerê pêşkêş dike û qonaxên giring ên dîrokî, nimûneyên tekstên werger û kesayetên ku tevkarîya wan bi wergera Kurdî çê bûye tilnîşan dike. Pîrbal bi mînakên dîrokî dest pê dike û serpêhatiya wergerê ya Kurdî bi qeydên Evlîya Çelebî, bi xebatên Xanay Qubadî û yê serdema klasîk, bi xebatên Mela Mehmûdê Bazidî û yê rojhilatnasan û bi nimûneyên wergerê yê pirtûkûn pîroz derpêş dike.

Di Kovara Bîr de (2005, h.3) bi navê *Tercume û Aversîyayîşê Ziwanî De Rola Tercumeyî* gotareke Rojan Lezgîn bi zaravayê Kirmanckî derçûye ku nivîskarê gotarê behsa hin rêgez û pîvanên wergerê dike, têkiliya wergerê ya bi ziman û çandê, giringî û bandora wergerê û taybetiyên wergerandinê rave dike. Di nivîsa xwe de piranî ji berhema Akşit Göktürk a bi navê *Çeviri Dillerin Dili* referans girtiye. Ev nivîs ji aliyekê ve dike ku pênaseya çawaniya wergerê bide û ji aliyê din ve jî balê dibe ser bandor û giringiya wergerê ya ji bo ziman û çandê. Ew her du hêlên wergerê, an ku pênasekirina wergerê û teknîkên wê û meseleya bandor û giringiyê ku têkildarî fonksiyona çandî û civakî ye, du qadên cuda ne û nirxandina wan a bi hev re fokûs û însîcama nivîsê xirab dike. Dîsa di heman hejmarê kovarê de wergêr Husên Duzen (2005: 37-39) di nivîsa xwe de ya bi navê *Pira di Navbeyna Ziman û Çandên Cihê de: Wergera Wêjeyî* behsa serpêhatiya xwe ya wergerandina çîrokeke Bavê Nazê û romana Mehmed Uzun a bi navê *Siya Evîne* ya ber bi zimanê Almanî dike, ji ezmûnên xwe mînakên dide û fikrên xwe yê derbarê wergera wêjeyî bi par ve dike. Duzen xwedî wan nêrînan e ku divê wergera wêjeyê ne peyv bi peyv, li belê wate bi wate be, lewre wergera wêjeyî ne wergera peyvane û pêwîstiyê bi hunermendên wergêr dibîne.

Mijara dosyeyê ya hejmarê 40an a kovara Tîrojê werger e. Di kovarê de Dawud Rêbiwar (2009: 28-30) bi gotara xwe bi navê *Di pêşketina ziman, çand û ramanê de rola wergerê* destnîşan dike ku di standartkirin û pêşxistina zimanê kurdî de pêdiviyê mezîn bi wergerê heye. Rewşa kurdan a pir-zimanî hewcehiya kurdan a bi wergerê pir kêr dike. Heta ku siyasethêder, rewşenbîr û xwendeyên kurd xwendinên xwe bi zimanekî din bikin mesela wergerê çareser naba. Seferberiyek ji bo wergerê û seferberiyê xurt jî ji bo vegera kurdan a li Kurdî lazim e. Dilawer Zeraq (2009: 33-34) di nivîsa xwe de ya bi navê *Em werdigerînin an Werdigerin?* pênaseya wergêr dike: "wergêr; ew kes e ku, kesekî jêhatî ye û xwedî paşxaneyê xurt a zanîne ye, bi metodeke hevgerî dixebite,

xwedî ezmûndariyeke berfireh e û di zimanê xwe de bi qasî nivîskara/ê ku berhema (an jî teksta) wî/ê werdigerîne, xwedî vegotîneke xurt e." Di berdewama nivîsê de jî dipirse: "Kesên ku em bi rehetî karibin bêjin 'wergêr' hene? Gelo ev peyt û agahiyên zanistî yên der heqê wergeranê de çi qas pêk tên?" Zeraq jî di jwariya bersiva vê pirsê qebûl dike û xwe ji bersiveke demildest dûr digire û wekî kêşeyên sereke yên li pêş wergera Kurdî jî 'nebûna pergaleke perwerdehiyê û aloziya têkildarî cihê devokan' destnîşan dike.

Cîhan Roj (2009: 35) di heman dosyeyê de bi gotara xwe ya *Çeviri, dilin sınırlarını genişletir*, qala tevkariya wergerê ya ji bo zimanê Kurdî dike û dibêje ku werger dê zimanê me bêtir pratîk bike, derfetên nû yên vegotinê bidê û peyvên nû bi me bide naskirin, û her wisa werger dê bibe alîkar ku zimanê Kurdî bibe zimanekî bajarî jî. Jan Dost (2009: 36-37) di nivîsa xwe de ya bi navê *Pêşengê wergera bi kurdî: Mela Mehmûdê Bayezîdî*, hin angaştan derbarê wergerê de derdixe pêş û dibêje ku ziman bi rêya wergerê îmtihan dibin. Werger dide kifşê bê ka gelo zimanek heta kîjan radeyê bi hêz e û dikare bersiva dijwariyên zimanî bide. Bi rêya wergerandinê ziman mecbûr e ku pêş bikeve, ziman yan jî yên ku dinivîsin mecbûr in li termên nû, li peyvên nû, li ferhengan, li nava xelkê li gotinan bigerin û qeyd bikin.

Mustafa Aydoğan (2001: 114-143) di gotara xwe ya bi navê *Werger Hinerek e* de, ji bo destnîşankirina giringiya wergerê ya di edebiyata Kurdî de xwe dispêre tecribeya wergerê ya wêjeya Tirkî û çalakiyên wergerê yên di wêjeya welatên Swêd û Norwecê de. Nivîskar bi mînakên navdariya edebî ya August Strindberg û Knut Hamsun hewl dide bandora wergera ji zimanên cîhanê ya erênî ya li ser wan edebiyatan bide xuyakirin. Di gotara xwe de M. Aydoğan ji bilî giringiya wergerê, li ser kategoriyên wergerê radiweste û wekî wergera pragmatîk, wergera poetîk û estetîk, wergera etnografîk û wergera lînguistîkî û dîdaktîkî çar kategoriyan rave dike. Aydoğan li ser wergera edebî û cudatî û dijwariyên wergera helbestî û pexşanî jî radiweste, bala xwe dide ser qusûrên wergerê û wan wekî qusûrên normal û qusûrên ku nayên qebûl kirin ji hev cuda dike. Aydoğan li gor taybetiyên zimanê Kurdî hin xalên nirxandina wergerên Kurdî diyar dike, wekî ergatîvî, xasyetên lêkerên gerguhêz û negerguhêz, zayend û pirjimariya navdêran, qaydeyên hevoksaziya Kurmancî û hin rêgezên din ên giştî destnîşan dike û wan wekî pîvana wergera baş û nebaş nîşan dide. M. Aydoğan her wisa li

ser wergera biwêjan, gotinên pêşyan jî disekine û qala hin rêbazên wergera biwêjan dike.

Ergin Öpengin (2011) bi navê *Bizava Wergerê di Kurmanciyê de* lêkolînek li ser dîroka wergera Kurdî pêşkêş dike ku tê de hin daneyên jimaryarî jî hene derbarê hejmara çapên pirtûkên werger de. Gotar bi perspektîfeke dîrokê bala xwe dide ser geşedana dîrokî ya wergerê ya di Kurdî de û piştî ku mînakên destpêkê dide kifşê, li ser pêşveçûnên piştî salên 2000an radiweste û behsê tîne ser wergêr û weşanxaneyên bi wergerê re têkildar. Nivîskarê gotarê di têbiniyeke xwe de diyar dike ku di gotarê de cih nade rexneya wergerê, lê xwe bi lêkolîna dîroka wergera Kurdî û pêşkêşkirina nimûneyên dawîn sînordar dike (Öpengin, 2011). Öpengin destnîşan dike ku berhemên nivîskarên Rûs, Îngilîz, Alman û Fars ên wekî Tolstoy, Dostoevsky, Jack London, Bertolt Brecht, Nietzsche, Elî Şerîetî, Samed Behrengî ji Tirkî hatine wergerandin û xwedî vê angaştê ye ku Tirkî îro bûye dergehê ku tê re berhemên edebiyata cîhanê dikevîne nav zimanê Kurdî. Ev tespîta Öpengin bêtir ji bo pirtûkên beriya salên 2000an derbasdar e, lê kêm be jî wergera ji zimanê sêyem car caran xuya dibin. Piştî salên 2000an êdî wergera ji zimanê resen ê berhemên bûye pîvanekî sereke ji bo wergêr û weşangeran.

Î. Seydo Aydogan (2013: 267-283) bi sernavê *Hin Pirsgerêkên Wergerê Di Kurdî De* nivîseke balkêş derbarê wergerê de nivîsiye. Nivîskar hem behsa mijarên sereke yên di wergera edebî de dike û hem jî tê de argûmanên subjektîf, polemîkên nebinavkirî û nirxandinên derbarê wergerên Kurdî cih digirin. Eger em nêrînên subjektîf ên wekî "...heke mirov pîraniya pirtûkên me wergerîne zimanekî din kesek dê nexwîne" û "wergera berhemên Kurdî bi tenê dikare ji bo reklama şexsan be" (S. Aydogan: 271) danin li aliyekê, di berdewama gotarê de qala hin mijarên wergerê yên cihê çê dibe ku ji bo nirxandinên têkildarî rewşa wergera Kurdî ya îroyîn angaştên hêjayî niqaşê ne. S. Aydogan wergerê ji bo zimanê Kurdî wekî derfet dibîne û li gor qenaeta xwe armanca wergerê wekî "...em dikarin bi wergera biyanî ve zimanê xwe li hin celebên vegotinê biceribînin ku di wêjeya me de nehatine bikaranîn" (r. 272.) diyar dike. S. Aydogan reng e ku ziman û edebiyata Kurdî li hember zimanên Ewropî wekî paşdemayî dibîne, lewma ranêzikiya wî ya wergerê jî jêder-navend e: "Wergera ku bi kurmancî hatiye çapkirin, bê şik, divê weha be ku him zimanê wê wergerê (wisa xuya ye ku mebesta nivîskar teksta jêder e) û him jî şewaza nivîskarê wê di kurmancî de were

parastin (rr. 272-273)". S. Aydogan vê pêwîstiyê jî wekî pîvana wergera serkeftî dibîne, lê belê di rastiyê de jêder-navendî bi tenê tercîhek e ji bo wergêr ne ku pîvaneke sabît a wergera baş e.

Nivîsa S. Aydogan her çî qas xwe nede ber nirxandinên kûr û bihûrgilî jî, bergeha nivîsê fireh girtiye û bi vî awayî jî di qada wergera Kurdî de nimûneyên wê kêr in. S. Aydogan bi kurtî be jî hin nêrînên xwe yê derbarê bijartina berhemê û pîvanên wê, taybetmendiyan wergêr û pêvajoya wergerê û fînasmana wê ya ji hêla sazî û weşanxaneyan pêşkêş dike (r. 274). S. Aydogan balê dikişîne ser wergerên ji zimanên sêyem jî û ji hêlekê ve wergera ji zimanê sêyem rexne dike: "Hin berhemên ku ji fransî û îngilîzî û zimanine din hatine wergerandin, ji aliyê kesên ku bi wan zimanan nizanin ve hatine kirin. Ma qey kesekî ku bi vi van zimanan zanibû tune bû?" (r. 275). S. Aydogan derbarê bandor û pêdiviya wergerê de jî du xalan diyar dike û wan wekî pîvanên giştî yê wergerê dibîne. Ya yekem, divê ew werger bi kêrî zimanê kurdî û derfetên wî were. Duyem jî, divê bandora wî nivîskarî li ser berhemên wêjeya Kurdî were hesibandin (r. 277). S. Aydogan derbarê taybetmendiyan wergereke baş de jî nêrînên xwe tîne ziman. Di nav wan taybetmendiyan de ku nivîskar destnîşan dike hin xasyetên hevpar ên pejiwandî hene. Lê du taybetmendiyan ku S. Aydogan wekî taybetmendiyan wergereke baş nîşan dide rasterast dijî hev in: "Ji aliyê tevî, şêwaz, estetîka tekst û zimanê berhemê û nivîskariyê ve sadiqî berhema orjînal be" (r. 283) ku ev qebûleke jêder-navend e, û taybetmendiya din a wekî "divê mirov fahm neke ku ku werger e" (r. 283) ev jî armanc navend e û ji bo vê yekê jî wergêr divê hin xasyetên tevî, şêwaz estetîka teksta jêder dayne aliyekê û yê nû biafirîne, an jî bi cih bike.

Gotara Zafer Açar (2020: 83-103) *Wergera ji Tirkî bo Kurdî û Bikaranîna Hin Peyv û Qalibên Girîng ên Kurdî di Wergêrê de*, her wekî ji nav jî diyar dibe, wergera ji Tirkî bo Kurdî ji xwe re dike mijar û bala xwe dide ser kêşeyên li dor hin peyv û qalibên zimanî. Wergêr bi kurtî mijara hevtayiyê dinirxîne û di têkiliya Tirkî û Kurdî de -Tirkî wekî zimanê teksta jêder û Kurdî jî wekî zimanê teksta armanc- di asta peyv û hevokê de ji bo pêkanîna hevtayiya zimanî hin çareseriyên jî pêşkêş dike, wekî "...dema ji Tirkî bo Kurdî werger hat kirin divê navdêrandin bê fêmkirin û berdêla lêkernav, daçek û gihanekên Tirkî di Kurdî de rast bîn bikaranîn" (2020: 87). Gotar di ser hin mînakên re ji bo wergerandina hevokên kompleks, gihaneka *ku* û gihanekên din û wergera dîyalogan, bikaranîna gotinên

pêşiyana a di wergerê de, hin pêşniyazên pratîk pêşkêşî xwîneran dike. Gotara Açar li dor qebûlên teoriyeke spesîfîk a wergerê mijara xwe nanirxîne, li şûna vê, di asta bikaranîna zimanî de û bi xasyetên formel û di çarçoveya hin taybetiyên kultur-spesîfîk de wergera Tirkî-Kurdî dinirxîne, û bi vî awayî jî kêşeyên pratîkî yên wergera Tirkî-Kurdî analîz dike.

Gotara Yakup Aykaç *Kêşeya Wergera Biwêj û Gotinên Pêşiyana Di Navbera Tirkî û Kurdî De* (2022: 69-83) li ser kêşeyên wergerandina biwêjan radiweste û balê dikişîne ser faktora çandê û giringiya zanîna wergêr a bi hêmanên çandî û analîza rast a teksta jêder derdixe pêş. Aykaç di çarçoveya çar stratejiyên Mona Baker de *-hevtayîya tam, hevtayîya qismî, wergera bi parafreyz, wergera bi jêbirinê*) mînakên biwêjan ên Tirkî û şeweya guncav a wergerandinê pêşkêş dike. Ayhan Yıldız (2020: 115-137) bi navê *Tevgera Wergera Kurmancî li Sûrî û Tirkîyeyê* gotarek li ser wergerê nivîsiye. Piştî ku bi awayekî gelemperî qala mijarên wekî têgih û termên têkildarî wergerê, rabirdûya dîrokî ya wergerê, karîgeriya wergerê ya li ser zimanên neteweyî dike, îcar behsê tîne ser wergera Kurdî. Yıldız bi giranî li ser nimûneyên wergerên ji Kurdî ber bi zimanên din û ji zimanên cîhanê ber bi Kurdî mînakan dide. Her wisa di lêkolîna xwe de derbarê nimûneyên wergerên navzimanî û întersemîyotîk de jî agahiyên dide.

Lêkolîner Güneş Kan (2024: 33-49) di gotara xwe de ya bi navê *Ji Perspektîfa Teoriya Polîsîstemê Rol û Karîgeriya Wergêranê di Geşadana Edebiyata Kurdî da* hewl dide ku angaştên sereke yên teoriya polîsîstemê rave bike û di vê çarçoveyê de dike ku bandora wergerê ya li ser edebiyata Kurdî ya modern di nimûneya çend wergêrên nivîskar de destnîşan bike. Kan bi ser mînakên edebiyata Tirkî û Farsî re temasa edebiyata Kurdî ya bi edebiyata Rojava û rola wergerê ya di vê temasê de şirove dike. Lêkolîner di mînaka hin wergêrên nivîskar de li ser bandora wergerê ya li ser teşegirtin û geşbûna nivîskariyê jî radiweste. Xebata Kan wekî nimûneyeke lêkolînê ya berbiçav e ku teoriyeke wergerê bi tecrîbeyê wergera Kurdî ya edebî amaje dike mînakeke berbiçav e, lê belê lêkolîna derbarê wergera Kurdî sînordar maye û di encamê de jî têkiliya mijara lêkolînê ya bi teoriya polîsîstemê bi awayekî pêwendîdar û têgîner nehatiye diyarkirin.

Her wisa gelek rojname, kovar û malperên torê yên çandî û edebî yên wekî, Kovara Zend, Zarema, Rûdaw, Diyarname, Çandname, Wer-ger û yên wekî wan

cih dane nivîsên derbarê wergerê. Lêkolerên wekî, Simko Amed *Çend Pirsgirêkên Wergera Kurdî* (2009, diyarname.com), Huseîn Muhamed *Wergerandina Ji Wergeran Ji Dibe* (diyarname.com, 2010), Haşim Ahmedzade *Wergêran wek Diyardeyeke Ferhengsaz* (Zarema, h.2, 2016), Diako Haşimî *Wergernasî* (Zend, 2017), Şemal Akreyî *Wergerandin Di Navbera Wergêr û Wergir De* (çandname.com, 2016), Besam Mistefa *Ji Bo Wêjeya Kurdî Girîngiya Wergerê* (rudaw.net, 2017), Evdal Baqî *Helbest û Werger* (wer-ger.com, 2020) di wan qadên weşanê de derbarê mijarên cihê yên wergerê de nivîsîne.

Li zanîngehên Başûr vekoleran gotarên cihê derbarê wergerê de nivîsîne ku em ê ji wan çend mînakên bidin. Hadî Ebdulqadir Qasim û Silêman Îsmâil Receb (2018: 6-15) di gotara xwe ya bi navê *Stratîjîyeta Wergêrana Îdîyoman Di Navbera Zimanê Kurdî û Farsî* de bi mînakên îdîyomên Farsî û Kurdî li dor teoriya havtayıyê ya E. Nida a hevtayıya formel û hevtayıya dînamîk û li dor nêrînên M. Baker mijarê dinirxînin. Gotar kêşeyên îdîyoman li gor senifandinên teorîk ên wekî arîşeyên peyvî (lexical), arîşeyên rêzimanî û binyadî, arîşeyên kulturî û arîşeyên şewazî dinirxîne û bi dorê bi mînakên Farsî û Kurdî dahûrîna wan dike. Gotara Pexşan Sabîr Hemed (2019: 89-110) *Wergêran û Çalakkirdinî Alugorî ye Roşenbîrîyekan lê Nêwan Zmanî Kurdî û Erebi da* bala xwe dide ser rola wergerê ya di têkiliya zimanê Kurdî û Erebi de. Hemed wergerê wekî navgîneke sereke ya veguhestina peyv, têgih û gotinan a navbera her du zimanan dibîne û her wisa diyar dike ku bi rêya wergerê transfera fikr û ramanên rewşenbîrî jî çê dibe. Bi mînakên termên hevpar ku bi rêya danûstandinên çandî di her du zimanan de cihên xwe girtine, Hemed vê fikrê jî berevajî dike ku bandora yekser a Erebi li ser Kurdî heye. Hemed destnîşan dike ku di navbera Erebi û Kurdî de veguhestineke dualî ya peyv û têgihan heye ku bi rêya çalakiya wergerê çê dibe.

Her wisa li ser wergera Kurdî nimûneyên gotarên bi Îngilîzî jî hene. Gotara Abdul-Nafî Khidir Hasan (2020: 174-180) ya bi navê *Difficulties in Translating Culturally Bound Conversational Words and Phrases in English and Kurdish* yek ji wan e û li ser arîşeyên wergerandina peyv û gotinên kultur-spesîfik radiweste ku di wergera navbera zimanê Îngilîzî û Kurdî de derdikevin holê. Gotara Haneen Islam Saleem û Hakar Hazim M. Ameen (2021: 1-7) a bi navê *Problems Students Face in Translating Discourse Markers from English into Kurdish* li ser nîşanên

rabêjê (discourse markers) radiweste û arîşeyên ku ew di wergerê de derdixin holê analîz dike. Gotar çar wergerên cuda yên teksteke Îngilîzî, ku çar wergêrên Kurdên cuda wergerandine, analîz dike û bikaranîna nîşanên rabêjê berawirdî hev dike.

Kovara Şermola (2020, h. 8) a ku li Bakur û Rojavayê Sûriyeyê çap dibe, cih dide çend nivîsên derheqê wergerê. Yek ji wan nivîsa Berzo Mehmûd (2020: 15-25) e bi navê *Pirsgirêka Têrmsazîyê Di Pêvajoya Wergêrana Kurdî De* û balê dikişîne ser kêşeyên term û gotinan ku di pêvajoya wergerê de derdikeve holê. Mehmûd ji bo çareserîya vê kêşeyê jî hin pêwîstî û pêşniyazan destnîşan dike. Li gor wî, divê wergêr di leksîkolojiya zimanê dayîkê de zana be, peyvên piraniya şêwezaran ji ber kiribe, gelek babetan û berhemên nivîskarên xudan temen û jêhatî bixwîne, wergêr divê zimanvan be, kurdîzan be, bingeha morfolojî ta bingeha watesazî û ristesazî û felsefeya jîman baş bizanibe. Bi vî awayî wergêr dikare metodên zimannasiyê di danîna têrm û peyvên de bi kar bîne. Mehmûd pirsgirêkeke din a têkildarî terman a ku di pêvajoya wergerê de derdikeve holê wekî "çendtêrmî" bi nav dike ku ji çavkaniyên ciyawaz û tercîhên peyvên ciyawaz û ji nebûna ferhengên Kurdî yên pisporiyê ve girê dide. Di heman hejmarê de Aram Hesên (2020: 12-14) di nivîsa xwe ya bi navê *Wergêr* de û Nêçîrvan Evdilezîz (2020: 26-30) jî di nivîsa bi navê *Bizava Wergêrê li Rojavayê Kurdistanê* de balê dikişînin ser giringiya wergerê ya ji bo ziman û edebiyata Kurdî û qala armanca wergerê dikin. Nivîskar her wisa hin kêşeyên rojane yên wekî nebûna perwerdehiyê, derfetên kêmtir ên çavkaniyan û xwendina kêmtir jî derdixin pêş.

Her wisa du tezên ku di beşên ziman û çanda Kurdî û ziman û wêjeya Kurdî yên Enstîtuyên Zimanên Zindî de hatine nivîsandin werger ji xwe re kirine mijar. Teza masterê ya Ziyattin Yıldırımçakar (2016; 2021) *Wergêr Wekî Kirineke Çandî* di sala 2016an de li Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê ji hêla Enstîtuya Zimanên Zindî ve hatiye pejirandin. Ev xebata ku di sala 2021an de wekî pirtûk çap bû, cihê wergerê yê di Kurdolojiyê de analîz dike û her wisa qala paşxaneyê wergernasiyê û teoriyên wergerê jî dike. Teza masterê ya Yusuf Taştan (2019) a bi navê *Dîroka Wergêrê û Xebatên Wergêra Kurdî* di sala 2019an de li Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê Enstîtuya Zimanên Zindî hatiye pejirandin. Xebata Taştan ji du beşan pêk tê. Beşa yekem ji bo dîroka wergerê ya bi giştî terxan kiriye û beşa

duyem jî derbarê dîroka wergera Kurdî ye ku tê de nimûneyên pêşîn ên wergerê hatine pêşkêşkirin.

Xebata Perwîn Osman Mustefa Elalef (2009) *Wate û Wergêran, Lêkolîneweyekî Watesazîye* jî wekî xebateke masterê hatiye pêşkêşkirin û weşanxaneyê Mukriyanî di sala 2009an de çap kiriye. Di vê xebata xwe de Elalef mijarên wekî çemk û teoriyên wergerê, stratejiyên wergerê, têgiha hevtayiyê û kêşeyên wergerê dinirxîne. Di çarçoveya zimannasiyê de li gor têgih û kategoriyan zimanî lêkolîna wergerê dike û rola wergerê ya di pêkhatina wateyê de destnîşan dike. Lêkoler di asta peyv û hevokê de li ser hin nimûneyên wergerên Erebî-Kurdî analizê dike û kêşeyên veguhestina wateyê destnîşan dike.

Segvan Ebdulrahman Taha bi navê *Wergêrana Edebî û Bizava Wê li Devera Bahdînan* tezeke masterê di sala 2006an de pêşkêşî Zanîngeha Duhokê kiriye. Di vê xebatê de lêkoler piştî ku qala teoriya wergerê dike, agahiyên derbarê dîroka wergera Kurdî, rola wergerê ya ji bo jîman û edebiyata Kurdî dike û bi ser hin mînakên jî girift û kêşeyên wergera Kurdî destnîşan dike. Taha (2006) qonaxên wergerê yên li devera Bahdînan wekî qonaxa 1930-1950, qonaxa 1950-1991 û qonaxa piştî 1991an dabeşî sê qonaxên dîrokî dike û nimûneyên wergerên wekî pirtûk çapbûyî û yên di rojname û kovaran de hatine weşandin bi daneyên jîmarî dide. Xebata Masterê ya Qadir Egîd (2018) a bi navê *Wergera Kurdi Ji Destpêkê Ta Salên 1950 "Dîrok, girîngî û alozî"* a ku pêşkêşî Zanîngeha Rojava kiriye agahiyên derbarê dîroka wergera Kurdî dide û nimûneyên wergeran pêşkêş dike. Her wisa giringiya wergerê ya ji bo ziman û edebiyata Kurdî û arîşeyên giştî ên li pêş wergerê jî di xebata xwe de destnîşan dike.

Ji wan nimûneyên lêkolînan ku me li jor behsa wan kir diyar dibe ku werger ji çend hêlan ve bûye mijara lêkolînê. Lêkoleran berî her tiştî armanc kirine ku dîroka wergera Kurdî li gel nimûneyên destpêkê destnîşan bikin. Ji xebatên heyî yên têkildarî dîroka wergerê jî diyar dibe ku ji bo pêşkêşkirina perspektîfeke tam a dîroka wergera Kurdî pêwîstî bi zêdetir lêkolînan heye, lewre di navbera pardeman de valahiyên mezin ên agahiyên hene. Her wisa lêkolîner li ser cihê wergerê yê di edebiyata Kurdî mijûl bûne û hewl dane rola wergerê terîf bikin. Xaleke din a ku lêkolînerên wergera Kurdî bal pê dane jî kêşeyên wergerê ne ku piranî li ser kêşeyên peyv û rêzimanê rawestiyane. Hin lêkolîneran jî bi awayekî bisînor qala rêgezên wergerê û hin pîvan û têgihan kirine û di vê

çarçoveyê de hêvî û rexneyên xwe diyar kirine. Kêm be jî lêkolînên di çarçoveya teoriyên wergerê de jî çê bûne û lêkolîneran li gor ranêzikiyên teorîk mijarên wergerê analîz kirine. Ji hêla lêkolînê ve, di roja îro de pêwîstiyê berbiçav ji bo xebatên teoriya wergerê, pênaseya rol û fonksiyona wê û nimûneyên sepanî heye. Ancax bi wan xebatan dê mimkun bibe ku werger di nav sîstema edebiyata Kurdî de bibe xwedî pênaseyê berfireh.

2.3. Cihê Wergerê di Edebiyata Kurdî de: Armanç û Fonksiyon

Di destpêka sedsala 20an de werger bi destê xwendeyên Kurd ên wergêr û nivîskar bû navgîneke keşîfkirina wêjeya cîhanê. Wergêr û nivîskaran li gor zanyariyên xwe yên zimanî, û bi taybetî jî bi navbeynkariya zimanên Tirkî, Erebi û Farsî, dest bi keşîfkirina nivîskar, berhem û cureyên nûjen ên wêjeya cîhanê kirin. Di vê qonaxê de ku beramberî edebiyata modern a Kurdî tê, li pardemên cuda û li bajarên wekî Silêmanî, Şam, Erîvan, Stenbol û Stokholmê hin pêngavên wergerê çê bûn. Berhemên ji zimanên têvel ên cîhanê bi awayekî tamam an kurtkirî, ji zimanê resen an jî ji zimanekî sêyem û piranî jî wekî karekî nepisporane hatin wergerandin. Bi vî awayî jî, werger di destpêka edebiyata modern a Kurdî de bû parçeyê giring a hewldanên keşîfkirina edebiyata cîhanê û geşkirina edebiyata Kurdî ya bi rêya temsîla cureyên nû yên edebî.

Ji hêla aktorên wergerê ve, rola derketina ji welêt û rasthatina bi ziman, edebiyat û çandên biyanî di geşedana wergera Kurdî de giring e. Her wekî Scalbert Yücel (2018: 178-179) diyar dike, nivîskariya profesyonel a Kurdî li Swêdê derket holê. Ji ber ku bi rêya koçberiyê ew azad bûn, dema wan a xebat û fikrandinê çê bû û zimanên biyanî hîn bûn. Ew şert û mercên ku Schalbert Yücel destnîşan dike ku nivîskariya Kurdî li Swêdê hat teşwîq kirin, ji bo xebatên wergerê jî derbasdar in û di nimûneya wergêrekî Kurd de ku Scalbert di hevpeyvînekê de dide xuyakirin "Ez hatim vir (Swêd) û cîhana min guherî, min *Miere* li vir xwend, min jê hez kir û ew wergerand Kurdî" (Scalbert Yücel, 2018: 180) tê peyitandin. Ev taybetmendiyên motîvasiyona nivîsîna bi Kurdî yên ku Scalbert Yücel destnîşan dike çalakiya wergera ber bi Kurdî jî digire nav xwe, lewre hem wergêrên wê demê di heman demê de nivîskar bûn û hem jî wergera ber bi Kurdî di esasê xwe de çalakiyêke bi Kurdî bû.

Di edebiyata nûjen a Kurdî de wergera tekstên edebî yê edebiyata cîhanê li Bakur, bi taybetî piştî salên 2000an, wekî çalakiyeke edebî zêdetir tûşî eleqeya civaka xwîneran jî bû. Li salên 1980 û 1990an nimûneyên wergeran wekî destpêşxeriyên şexsî, bi azweriyên romantîk û bi helwesteke ceribîner û bi hêskirin û kurtkirinên li ser tekstan derdikevin pêş me. Li wan salan ji ber kêmaniya derfetên danasîn û belavkirinê berhemên werger zêde nehatin zanîn û negihîştin komên xwîneran da ku bi xwe re eleqeyeke girseyî çê bikin. Piştî salên 2000an komên xwîneran li dor wergêr û berhemên wergerandî ava bûn. Di vê pêvajoyê de handan û destegên weşanxaneyan jî sûdewer bûn. Wergêrên ku klasîkên navdar ên cîhanê wergerandin Kurdî rastî eleqeyên xwîneran hatin û para xwe ya populariteyê ya wekî wergêr ji navdariya wan berheman û navdariya nivîskarên wan wergirtin.

Dînamîzma ku li dor berhemên werger û wergêrên populer çê bû bandoreke erênî li ser wêjeya Kurdî çê kir. Çalakiyên wergerandinê bi tenê bi berhemên wêjeyên neteweyên din sînordar nema, berevajî vê, hewldanên wergerê ber bi keşifkirina berhemên Kurdên ji parçeyên din jî berfireh bû. Piştî salên 2000an li kêleka keşifkirina edebiyata cîhanê faktorên din jî derketin pêş. Ji wê demê û pê de, ji bilî armancên wekî bilindkirina prestîja edebî û berfirehkirina pirtûkxaneya Kurdî, ceribandîna şexsî yê têkildarî çêja edebî ya wergêr û xwîneran, bendewariyên xwîneran û faktorên din ên qada edebiyatê jî di pêvajoya wergerê de bûn xwedî rol. Her wisa bi wergêr û edîtorên nû wergera edebî bi awayekî bêtir pisporane û bi berhemên cihê geş bû. Wekî mînak rola wergêr Kawa Nemir û wergerên wî ji bo geşedan û dînamîzma wergera Kurdî ya piştî salên 2000an giring e. Nemir di dawiya salên 1990an de di kovara *Jiyana Rewşenê* de dest bi wergera berhemên edebî kiriye û di maweya bîst û pênc salan de bi dehan berhemên wekî helbest, çîrok û şanoname wergerandine Kurdî. Ji bilî berhemên nivîskarên Amerîkî û Îngilîz ên wekî Walt Whitman, Ezra Pound, William Blake, Emily Dickinson, T. S. Eliot, Herman Melville û yê din, wergerên wî yê Sone û Şanonameyên William Shakespeare ku me du tekst ji wan ji bo dahûrandina vê xebatê bijart û romana James Joyce a bi nave *Ulysses* ên herî berbiçav in. Reng e ku hejmara zêde ya wergerên wî û xebatên wî yê domdirêj ên bi salan tesîreke erênî û hewesa wergerê li ser wergêrên ciwan çê kiriye. Nemir di pêşgotina wergera *Macbethê* (2021: 49) de armanc û azweriya xwe ji bo wergerê tîne ziman

û dibêje ku ew wergera klasîkên edebî yê cîhanê hem wekî berpirsariya xwe ya ji bo ziman û edebiyata Kurdî dike û armanc dike ku barê nîfşên nû sivik bibe; û hem jî bi wergerandina wan berheman wekî takekesekî Kurd bêhna xwe fireh dike û deriyên li ser edebiyata Kurdî dadayî piçek be jî dehf dide.

Di nav nimûneyên wergeran ên piştî salên 2000an de hin nimûneyên balkêş jî hene ku di çalakiyên wergera edebî de kêmpêyda ne. Wekî nimûne, wergêr Husein Muhammed (2012) bi navê *Bo Te Ji Welatekî Dûr Dinivîsim* koleksiyoneke helbestên ji edebiyata cîhanê amade kiriye. Taybetiya vê wergerê ew e ku wergêr Husein Muhammed bi xwe wekî tekane wergêr ji zimanên Îngilîzî, Erebi, Farsî, Fînî rasterast û ji zimanên Fransî û Almanî jî bi navbeynkariya Îngilîzî nêzikî 200 helbest wergerandine. Di nav vê koleksiyonê de mînakên berhemên helbestvanên Îngilîz û Amerîkî yê wekî W. Shakespeare, W.B. Yeats, E. Pound, E. Dickinson, W. H. Auden, G. Chaucer, D. Thomas û y.d. jî hene. Her ku çalakiya wergerê piranî di navbera du zimanan de pêk tê û wergêr jî bêtir xwe didin ber wergera navbera du zimanan, ev xebat dibe nimûneyeke ciyawaz ku wergêrekî ji yekî jêdetir zimanî bo Kurmancî werger kirine û xebata xwe wekî yek berhem çap kiriye. Xuya ye ku motivasyona Husein Muhemed ji daxwaza wî ya Kurdîkirina helbestvanên cîhanê û berhemên wan tê ku di refên pirtûkxaneyên Kurdî de hejmara wan kême û ne temam in.

Di hewldanên wergera edebî ya Kurdî de em rastî wergerên cureyên edebî yê cihê tî, wekî roman, çîrok, helbest, şanoname, fabl, mesel, haîkû û y.d. Ev yek jî nîşan dide ku hatiye armanckirin ku temsîla cureyên edebî yê nûjen bi zimanê Kurdî çê bibe, lewre wergêran, weşanxane û kovaran hewl dane ku berhemên cureyên cuda bi rêya wergerê bikin Kurdî û zimanê Kurdî bibe xwedî temsîleke berfireh a vegotin û şêwazên edebî. Taha (Segvan:90-91) derbarê fonksiyona wergerê ya ji bo edebiyata Kurdî dibêje ku bi rêya wergerê nivîskar, xwîner û lêkolerên Kurd rastî şêwaz û vegotinên nû tî û haya wan bi berhemên cîhanê çê dibe û her wisa berhem û nivîskarên Kurd li cîhanê tî naskirin. Di vê nêrîna Taha de xala balkêş ev e ku xudanê angaştê wergera ber bi Kurdî bêtir ji bo naskirina şêwaz û vegotinên edebî pêwîst dibîne û wergerên ji Kurdî bo zimanê din jî di çarçoveya danasîna Kurdan û îspata hebûna wan a edebî de dinirxîne.

Werger herî zêde wekî navgîneke pêşxistina ziman û edebiyata Kurdî hatiye dîtin, wekî nimûne Mueyed Teyyîp ji bo bersiva pîrsa ‘ji bo pêşxistina edebiyata

Kurdî çî pêwîst e?' dibêje ku li gel nasandina edebiyata Kurdî ya kevn û ya nû, wergerandina eserên nemir ji edebiyata cîhanî pêwîst e ji bo geşkirina edebiyata Kurdî (Uzun, 1995: 386). Emerîkê Serdar (2011: 45) wergera edebî ya li serdema Sovyetê wekî rêyeke pêşdebirin û dewlemendkirina edebiyata Kurdî dibîne û giringiya wergera baş derdixe pêş. Li gor wî qîmeta wergerê ew e ku bê ka wergêr çî qas kariye xasyeta berhemê bigihîne xwîneran. Zanîna baş a her du zimanên ku wergerê dike wekî şert datîne pêş wergêr. Ranêzikiya wergêr Husein Muhammed (2012: 17-20) jî bi heman awayî ye, her ku derbarê armanca xwe ya wergerandina koleksiyona helbestan de dibêje wî xwestiye ku piralîtiya hunera helbestên cîhanê yên ji serdemên cihê, ji neteweyên cihê û yên bi şêwazên cihê diyar bike. Her wisa wî xwestiye ku deriyên fireh li ber wergerandina Kurdî veke û nîşan bide ku bi rêya wergerê em dikarin xwe bigihînin berhemên hêja.

Nureddîn Zaza di nameyekê de ku ji Firat Cewerî re dişîne (Nûdem, 1995, h. 16) her çî qas armanca wergerê ya wekî naskirina edebiyata cîhanê bipejirîne jî, kêmasî û xetereyekê jî dikirpîne. Zaza di nameyê de wiha dinivîse: "Di kovara Berbang de, te gotinên hin peyayên mezin wergerandine kurmançî. Ev xebateke ne xirab e. Min jî, di Hawarê de, hin nivîsarên biyaniyan wergerandine Kurdî" û pê re jî pêwîstiyekê destnîşan dike "...Tevê vê xebata ha, divê ku em gotinên mezinên kurd jî ji kurdan re bidin naskirin." Ji vê nameyê jî diyar dibe ku Zaza wekî kesayetekî xwedî tecrûbeya edebî, bi qasî wergera berhemên cîhanê giringiya wergerandin û danasîna berhemên Kurdî jî derdixe pêş da ku veguhestina du alî ya bi rêya wergerê pêk were ku ew jî wergerên berhemên Kurdî yên ji bo zimanên din û wergerên navzimanî tilnîşan dike. Hesenê Metê li ser pirsê Cewerî (1996: 190-191) ya "Ji bo pêşdexistina edebiyata kurdî rola wergerê çiyê?" di bersiva xwe de wiha diyar dike: "Gotineke mamoste Celîlê Celîl heye. Dema ku peyv tê ser wergerê hertim ev gotina wî tê bîra min. Digot: 'Kubariya her miletekî ye ku Shakespeare bi zimanê wî hebe.' Metê, di ser vê mînakê re dibêje ku "bi rêya wergerê Ziman tê dapejinandin, ziman li bêjîngên zimanê biyanî dikeve, bi wan zimanan re dikeve qayîşê û di edebiyata biyanî de dibe xwedî par, peyvikên jîbîrbûyî an jî nû tene pey dakirin... ev hemû tiştên ha bi rola wergerê dibe".

Li gor tespîta Yıldırımçakar (2021: 109) rola wergera Kurdî digel xurtkirina zimanê Kurdî wekî hewleke polîtîk û hewlek ji bo îspatkirina Kurdî û îspatkirina şiyana zimanê Kurdî jî tê dîtin û ev yek bandorê li ser hilbijartina

wergêr a cureyê berheman jî dike. Ji bo hin wergêr û lêkolîneran jî werger navgîneke geşkirina derfetên zanyariya neteweyî ye û di nêrîna wan de ji hêviyên şexsî bêtir pêwîstiyên civakî derdikevin pêş. Wergêr Ebdilrah Şêxo (2020: 40-43) xwedî vê nêrînê ye ku "zimanekî ku nû bi ser hişê xwe ve tê û hîn hewl dide ku xwe ji toza qedexekarî, bişaftin û piçûkkirinê dawêşîne, ancax dikare bi rêya wergerê rêya xwe xweş bike û bingeha xwe deyne" (2020: 41). Şêxo (2020: 43) dibêje ku berhemên wergerê divê li gor pêdivîya pirtûkxaneya Kurdî bîn bijartin, an ku divê wergêr berhemên herî bikêrhatî, giring û pêwîst wergerînin Kurmanciyê, ji ber ku rewşa Kurdî ne ew çend baş e ku wergêr tiştên li gor dil û hezkirina xwe wergerînin. Aram Hesen (2020: 12-14) jî di heman hejmarê de wergerê wekî navgîneke sereke ya ji bo pêşketina civaka Kurd dibîne û diyar dike ku "hemû civakên ku dixwazin bi pêş bikevin giringiyê mezin didin wergerê û hemû nivîs û pirtûkên girêdayî teknoloji, pîşesazî, wêje û zanistên curbecur bi rêya wergerê vediguzînin zimanê xwe" (2020: 13). Hesen (2020: 14) derbarê giringî û rola wergera edebiyatê de jî dibêje ku wergera wêjeyî çanda neteweyan nêzikî hev dike û di vesazkirina diyaloga navbera çandan de jî xwedî roleke giring e.

Kovarên edebî û kovarên wergerê yên Kurdî dema dest bi weşangeriyê kirine di nav armancên xwe de cihêk taybet dane xebatên wergerê, ranêzikiya xwe ya derbarê wergerê eşkere kirine û hewl dane ku bi rêya nivîs û hevpevînan cihê wergerê ya di nav edebiyata Kurdî de pênasê bikin. Edîtorê kovara *Nûdemwergerê* Firat Cewerî di nivîsa destpêkê ya kovara navborî de derbarê armancên weşanê de dibêje ku kovara me ya nû dixwaze bi rêya wergerandina berhemên cîhanê zimanê Kurdî ji kirasê folklorî yê teng derxîne, bi riya peyda kirin û avakirina formulasyonên edebî, dewlemendiyekê bigihîne zimanê Kurî yê edebî û Kurdan bike şîrkên edebiyata cîhanê. Her wisa Cewerî di heman nivîsê de diyar dike ku xebata dê ew bikin karekî cidî ye û berpirsiyariyê dixwaze, lê belê bi hêviya piştgiriya ji xwîneran û bi baweriya bi hêza xwe ew ê ji zora kêşe û gelemşeya bibin.

Jiyana Rewşenê her wekî Scalbert Yücel (2018: 184) destnîşan dike, wêjeyê nû kiribû armanc û ji bo vê yekê jî diviya hem klasîkên Kurdî hem jî edebiyata cîhanê bi wergeran bida naskirin. Dema ku mirov armanca edebî ya kovara Jiyana Rewşenê ya wekî "Jiyana Rewşen wê bibe neynika edebiyata Kurdî

(Jiyana Rewşen, 1996: 4, h. 1) û tespîtên Zeraq (2022: 235) ên wekî "ranêzikîya kovara Jiyana Rewşenê li ser bilindkirina asta wêjeya dinyayê ye" û "Jiyana Rewşen li xwe dike armanc ku di biwara wêjeya neteweyî de bigihîje qonaxa wêjeya gerdûnî" (2022: 237) bi hev re binirxîne, diyar dibe ku hem polîtîkaya weşanê ya kovarê û hem jî hewldanên kesên têkildarî kovarê xwedî armancên hevpar ên sereke ne, ew jî: bi rêya vekeşîfîkirina edebiyata Kurdî û berawirdkirina wê ya bi edebiyata cîhanê, pêşxistin û bilindkirina asta wê ya edebî ye. Di vê çarçoveyê de, rola wergerê rasterast bi berawirdkirina edebiyata Kurdî ya bi edebiyata cîhanê re têkildar e, û bi awayekî nerasterast jî bi keşîfîkirina potansiyelên çandî û zimanî re jî eleqedar e ku di meydanxwestina çalakiya wergerê de derdikeve holê. Her wekî Zeraq (2022: 259-260) destnîşan dike kovara Jiyana Rewşenê bi armanca nîşandana cihêtiya çanda Kurdî dest bi wergerê dike û bi vê çalakiya wergerê jî doz û daxwaza 'ez ji çand û zimanên din cihê me' derdixe pêş.

Di kovara W de (2006: 3-21) dosyeyê nivîsan li ser wergerê bi destê Dilawer Zeraq û Fatma Savci ve hatiye amadekirin ku tê de amadekar 8 pirsên têkildarî wergerê li 5 wergêran dikin. Ew 5 wergêr, Husên Duzen, Tengezarê Marînî, Yaqob Tilermenî, Sebrî Silêvanî û Samî Hêzil, bersiva wan pirsan didin wekî: 1 "Werger çi ye, hunereke çawa ye? Em dikarin wergera herî baş çawan bidin pênasandin?"; 2 "Wergêr kî ye, xwedîya/ê çi hunerê ye?"; 3 "Pêwîstiya wergerê ji çi sedeman derketiye holê, destpêka wergerê çawan û ji kîjan demê dest pê dike?" 4 "Rist û rola wergerê di pêşxistina wêje û civakê de, di hevnasîna netewe û çandên cuda de çi ye?"; 5 "Di paşeroja kurdan de têkiliya nivîskar û civakê bi wergerê re çi qas bû û hûn niha rewşa wergerê di çi astê de dibînin?"; 6 "Gelo wergera di nava zaravayên kurdî de çi qas cihê wê heye?" ; 7 "Bi dîtina we ferqa navbera wergêrê/a baş û serkeftî û yê/ya kê û qels çawan diyar dibe?"; 8 "Dema hûn dest bi wergerandina berhemekê dikin, hûn alîkariyê ji çi û ji kê digirin?". Kovar bi wan pirsan armanc dike ku cihê wergerê ya di edebiyata Kurdî de, helwesta wergêran, kêşeyên wergera Kurdî û mijarên têkildar zelal bike.

Kovara Tabularasa (2012, h. 1: 2-3) bi nivîseke edîtoriyê ya du rûpel perspektîfa xwe ya weşanê û armanca kovarê wiha diyar dike: Li salên 2000an nivîseke nivîskaran bi saya weşanên bi kurdî derket holê û wê nifşê hem bi kurdî dinivîsî û hem jî ji wêjeya cîhanê nivîs werdigerand zimanê Kurdî. Bi wan

wergerên ji wêjeya cîhanê fikreke tevgera wergerê çê bû û her wisa baweriyek çê bû ku pêwîst e klasîkên cîhanê bên wergerandin û Kurd karibin klasîkan bi zimanê xwe yê zikmakî bixwînin. Ji ber vê sedemê kovareke wergerê wekî pêdiviyekê derket holê û *tabularasa* ji bo ku wergeran ji zimanên biyanî bo kurdî bike saz bû. Di heman nivîsa editoriyê de helwest û ranêzikiya kovarê ya derbarê wergerê wekî "Ji bo kovara tabularasayê werger, ji zimanekî, bêyî ku şikl û ruhê nivîsê, rezm û bezma nivîsê bête xerakirin, derbaskirina zimanekî din" û armanca kovarê jî wekî "*tabularasa* dê bibe cihokeke ziravik û ji deryaya nivîskariya cîhanê, dê biherike nav gola nivîskariya bi zimanê kurdî. Ji her celebên nivîsê wergeran bo Kurdî bike û bi vê xebata xwe ji kelepura cîhanê wê nimûneyan ragihîne ber destê me" hatiye diyarkirin.

Edîtoriya kovara LEWergerê di pêşgotinê de armanca derxistina kovarê wekî "Karê me bi xwe werger e û mebesta me kovareke kurdewar a wergera helbestê ye" destnîşan dike (2022, h.1) û diyar dike ku kovar dê nekeve nav niqaşên derbarê pênaseyên teorîk ên wergerê û wan mijaran ji pispor û şarezayan re bihêle. Kovara LEWerger derbarê armanca xwe ya rasterast a wergerê li jor kurt bibire jî, terciha kovarê ya wekî wergera yek cureyê -helbest-, wergera ji gelek zimanan û wergera ber bi sê zaravayên Kurdî nîşan dide ku lijneya kovarê û destpêşxer û edîtorên wê xwedî hin pêşekî û fikrên nû ne. Wergera bi cureyekê sînorkirî kovarê dike weşaneke spesîfîk û nîşan dide ku bala lijneya weşanê ne li ser mijarên teorîk û lêkolînî yên wergerandinê ye, lê berevajî vê, ew qîma xwe bi hunera wergerê tînin û dikin ku bibin pireyêke weşangeriyê ji bo wergera edebî û estetîk a ber bi Kurdî. Kovara Bar Helbest jî di nivîsa *Ji Edîtor* (2022, h. 6: 5) de hem wekî armanca kovarê û hem jî wekî pêwîstiyêke edebî diyar dike ku lazim e helbesta Kurdî zêdetir bi helbesta dinyayê re hevnas bibe. Ji bo vê hevnasînê jî wergera ji zimanên cîhanê wekî derfet destnîşan dike ku bi vê rêyê helbesta Kurdî dê ji helbesta cîhanê sûdê wergire û bikeve nav lêgerînên nû. Kovar wergerê wekî armanca datîne pêş xwe û agahiya wergerên helbestan ên di hejmarên pêşerojê de wekî pîlansaziya xwe ya weşanê eşkere dike.

Her ku nimûneyên wergerê di qada edebiyata Kurdî de xuya dibin, wergêrên wan berhemên û tekstên ku wan wergerandine jî rastî rexneyan tînin. Di wergerên edebî yên Kurdî de berê rexneyan bi giştî li ser xalên wekî pisporî û şiyana wergêran, zimanê berhemên werger, herikbarî û rastiya naverokê ye. Rexneyên li

dor teorî û têgihên wergerê kêman in û rexnegir di gelek nimûneyan de bi awayekî subjektîf an karê wergêr reş dikin an jî pesnê wergêr didin. Di hin nimûneyên wergeran de wergêran bi xwe qala kêmasiyan kirine û li kêmasiya karên xwe miqur hatine. Di pêşgotina wergera berhema H. Tûmanyana a bi navê *Gîkor* de wergêr Heciyê Cindî û Emînê Evdal behsa kêmasiyên wergera xwe dikin. Wergêr armanca xwe ya wergerandinê wekî "Tûmanyana Gîkor nivîsîye derheqa wê zelûlîyêda ya ku wî çaxî bûye û zarongê nola Gîkor mezin bûne... Lema jî me layîq dît, wekî eva kitêba bikeve destê zarê kurmancê xebatçiyê Zakavkazê" diyar dikin û piştê jî gotinê tînin ser kêmasiyên berhemê û dibêjin ku "Me cî cî xeber nivîsîne bi herfa B û cî cî jî bi herfa V. Cîya jî cûmle awqa nêtlî nehatine nivîsarê. Ji vê yekê heval gere bibaxşînin, çimkî têrmînê zimanê kurmancî awqa jî vê gavê nayêne xebatê, tunene" (Tumanyan, 2012 [1932]: 4).

Berê hin rexneyan yekser li ser pisporî û şiyana wergêran e û di hin mînakên de jî li şûna rexneyê pesna wergêr û teksta wî tê dayîn. Emerîkê Serdar rexneyê li kalîteya hin wergerên li Kavkazê dike û dibêje ku "Gelek cara nava lîteratûra me da usa qewimiye yanê diqewime, wekî mezinayê lîteratûrîyê dinêeyan, gava kurdî hatine tercmekirinê, gelekî sist bûne" (2011: 46). Emerîkê Serdar fikrekê derbarê helwest û ranêzikiya nîfşê xwe nîşan dide dibêje ku "...borcê her tercmekî baş e, wekî bi xebata xweye helalva dha karê bide pêşdaçûyîn û dewlemendbûna lîteratûra wetenî, wê yekêra tevayî ew usa jî komekê bide dha belabûn û masayîbûna lîteratûra cimêdê bira û dha qewînkirina pevgerdanê wane lîteratûrî (2011: 47). Wezîrê Eşo (2018: 265) jî pesnê wergerên Çerkezê Reş ên çarînen Xaçatur Abovyan dide û diyar dike ku "Gava tu wan dixwînî tu hew zanî, ku ew ne werger in, lê bi Kurdî û bi destê şayîrekî Kurd ê wekî Melayê Cizîrî hatine nivîsandin" û bi vê şiroveya xwe jî qasidiya hêviyeke binas dike ku gelek kes vê yekê ji deqa werger hêvî dikin, an ku divê bibe tekstek wisa ku her wekî bi zimanê armanca hatibe nivîsîn. Sîrwan H. Berko bi sernavê *Wilo werdigerînim; wilo dixapînim; wilo heme!*" (Url 5) rexneya wergera çîrokeke F.Kafka "Gibs auf!" ya ji hêla Tengezarê Marînî dike. Berko rexneya xwe li ser kêmasiya wergêr a lêkolîna deqa jêder ava dike û her wisa ji ber neşarezabûna wergêr a bi zimanê Almanî nimûneyên veguhêstinên xelet ên naverok û wateyê û xeletiyên rêzimanê pêşkêş dike.

Rexneya Malmisaniy (2006: r. 14-15) li ser kalîteya wergeran e û vê yekê jî bi nebûna rexneyên têkildarî wergeran ve girê dide. Ji bilî vê jî, li ser rewşa bazara wergera Kurdî radiweste û diyar dike ku weşanger piranî li şûna pere bi pirtûkan heqê wergêran didin. Wergêrî karekî profesyonel nîn e lewre wergêr bi karên din re jî mijûl dibin. Hêzil (2021) destnîşan dike ku nêrîn û rexneyên derbarê wergeran ji paşxaneyên teorîk bêpar in û piştta xwe nadin lêkolînên berfireh. Fikr û angaşt zêde caran xav dimînin û bi xebatên pratîkî nayên çespanandin. Xwînerên wergeran bi bendewariyên teksteke resen berhemên werger dixwînin û ji ber vê yekê jî rexneya wekî 'tahma wergerê jê tê' gelek tê îfadekirin. Dema ku wergerên Kurdî li gor taybetiya tekstê, pêşekiyên fonksiyonel û tercîhên wergêr di çarçoveyê teorîk de hatin nirxandin, hingê mirov dê bikare behsa rexneyê saxlem bike. Evdilezîz (2020: 26-30) wekî rexne qala kêmbûna pisporiyê dike, ji ber ku wergêrî wekî karê sereke nayê dîtin. Ji hêla bazara wergerê û rewşa xwendinê ve jî diyar dike ku werger kêmtên xwendin, lewma jî wergêr ji karên xwe sar dibin û her wisa ji ber hejmara kêmtir a firotinê jî weşanxane nikarin karê wergerê finanse bikin. Hesên (2020: 12-14) jî dide zanîn ku karê wergerê li gor tercîhên şexsî ne, an ku li gor pêwîstiyên demê û civakê çê nabin. Pirtûkên ku ji bo civakê ne pêwîst in tînin wergerandin, lê yê pêwîstiya wan kêmtir jî nayên wergerandin. Divê pirtûk li gor pêwîstiyên pirtûkxaneyê Kurdî bi giştî bêne hilbijartin û wergerandin.

Ji bo diyarkirina pozisyona wergerê ya di nav sîstema edebiyata Kurdî de pêwîstî bi xebatên ciyawaz hene ku hin ji wan dikevin nav qadên disîplînên dîtir û ji çarçoveya lêkolîna me wêdetir in. Diyarkirina pozisyona wergerê bi rola wergerê, bi pêşekiyên aktorên wergerê, bi armanên giştî û spesîfîk ên wan aktorên û bi helwesta xwînerên Kurdî dê mimkun be. Rewşa wergera Kurdî ya îro, ji hêla amarên cihê ve, hem beramberî rewşeke erênî tê û hem jî hin diyardeyên nerînî jî xwe didin kifşê. Wekî rewşeke erênî ji bo pêşeroja wergera Kurdî, em dikarin diyar bikin ku berhemên werger di rojê edebiyata Kurdî de sal bi sal zêdetir rastî eleqeya xwîneran tînin, her ku hejmara wergerên tînin çapkirin yek ji nîşaneyên vê yekê ye. Navdariya berhemên resen û nivîskarên wan û xebatên wergêrên nivîskar ên populer bandoreke erênî li ser eleqeya xwîneran çê dîkin. Werger di qada netewî û navnetewî de atmosfereke hêvîdar ji bo pêşeroja edebiyata Kurdî û prestîja wê diafirîne. Di gel vê yekê jî, kêşeyên domdar ên derbarê derfetên

wergerê, helwestên weşangeran, kêşeyên telîfê, pîsporiya wergeran û asta rexne û nirxandinê ya xwînerên berhemên werger hîn jî di rojevê de ne û reng e ku dê bibin mijarên lêkolînên dîtir.

BEŞA SÊYEM

MODELA *DAHÛRANDINA TEKSTÊ YA WERGER-NAVEND A* CHRISTIANE NORDÊ Û DAHÛRANDINA NIMÛNEYÊN WERGERÊN KURDÎ

3.1. Modela *Dahûrandina Tekstê ya Werger-Navend a Christiane Nordê*

Fikrên teorîk ên C. Nordê di nav teoriyên wergerê yên Ekola Fonksiyonel de cih digirin û wekî modeleke resen tê binavkirin. Nord modela xwe ya bi navê *analîza tekstê ya werger-navend* (translation-oriented text analysis) di nav ekola fonksiyonel de pênasê dike. Fikrên Nordê yên derbarê wergerê xwedî xalên hevpar in li gel Teoriya Skopos û Teoriya Çalakîyê yên Ekola Fonksiyonel. Nord nêrînên xwe yên teorîk û modela xwe ya navborî di 2 berhemên xwe de rave dike. Berhema yekem, *Text Analysis in Translation. Theory, Methodology, and Didactic Application of a Model for Translation-Oriented Text Analysis* (Analîza Tekstê di Wergerê de. Teorî, Metodolojî û Sepandineke Hînkê a Modeleke ji bo Dahûrandina Tekstê ya Werger-Navend) (1991), bi hûrgilî hemû nêrînên Nordê yên derbarê wergerê û modela wê de digire nav xwe. Berhema duyem, *Translating as a Purposeful Activity* (Wergerandin Wekî Çalakîyeke Xwedî Armanç) (1997) li ser teoriya fonksiyonel bi giştî radiweste û her wisa nêrînên wê yên derbarê teoriyên din ên Ekola Fonksiyonel jî parve dike. Nord di vê berhema xwe de xasyetên fonksiyonel yên wergera edebî û mijara hevtayîtiyê jî dinirxîne.

Nord di berhema *Text Analysis in Translation* (Analîza Tekstê di Wergerê de) de, li destpêkê behsa pêwîstiya bi modeleke dahûrîna tekstê dike da ku werger bi vê modelê arîşeyên têgihîştina bi teksta jêder çareser bikin. Nord (1991: 1-2) sazîkirina modeleke analîza tekstê ya werger-navend gengaz dibîne. Li gor wê, modeleke wiha divê bi tenê girêdayî referansên zimanên jêder an jî zimanê armanç nebe, lê di heman demê de jî ji bo her du hêlen wergerandinê (ji zimanê yekem ber bi yê duyem û berevajî) kêrhatî be. Her wisa divê ev model bibe çarçoveyeke teorîk ji bo xebatên wergerê, perwerdehiya wergerê û çalakîya wergerandinê. Lewre jî, divê modela ku tê qalkirin bi têra xwe gelemper be da ku li her deqê bê sepandin û bi têra xwe jî spesîfîk be da ku kêşeyên wergerê yên cur bi cur bikare li ber çavan bigire. Modela Nordê di heman demê de erka senifandina tekstan û nirxandin û rexneya kalîteya wergeran jî digire nav xwe.

3.1.1. Wergera Fonksiyonel û Rewşa Ragihanî

Nord çend xalên bingehîn destnîşan dike ku di modela wê de xwedî rolên giring in. Ew xalên bingehîn jî wekî 1) rêgezên wergerzaniyê (translatological foundations) û 2) rêgezên tekst-lînguîstîk dabeş dike. Di bin sernavê rêgezên wergerzaniyê de cih dide *hokar û hêmanên pêvajoya wergerandinê, rola destpêşxer (initiator) û rola wergêr*. Di bin sernavê rêgezên tekst-lînguîstîk de jî cih dide sernavên wekî *hevbandoriya ragihanî (communicative interaction), pêvajoya wergirtina tekstê (text reception) û tîpolojiyên tekstan (1991: 5-24)*. Nord dide zanîn ku (r. 6) werger pêvajoya veguhêstina tekstê ya navberçandî ye. Ev pêvajo bi çalakiya destpêşxerekî/ê dest pê dike. Destpêşxer serî li wergêrekî/ê dide ji ber ku dixwaze tekstekê ji nû ve bide hilberandin ji bo wergir an jî ji bo bikirên zimanê armanc. Ev tekst jî bi zimanê jêder ji hêla hilberînerê/ê ve hatiye nivîsandin, an jî şanderek ev tekst ji bo wergerandinê dabîn kiriye. Di vê pêvajoyê de hokar û hêmanên sereke li gor rêza demkî bi dorê ew in: *hilberînerê teksta jêder, şanderê teksta jêder, teksta jêder, wergirê teksta jêder, destpêşxer, wergêr, teksta armanc, wergirê teksta armanc*. Hilberînerê teksta jêder (nivîskar) û şanderê teksta jêder gelek caran heman kes in. Wergirên teksta jêder û teksta armanc xwînerên wan tekstan in.

Nord (r. 9) rola destpêşxer giring dibîne, lewre çalakiya wergerê bi însiyatîfa wî/wê dest pê dike. Destpêşxer dibe ku ne şexs bes sazî be jî. Gelek caran destpêşxer û wergêr jî heman kes in. Destpêşxer ji bo armancekê dixwaze tekstek bê wergerandin, vêca ev armanc pêwîstiyên wergerandinê diyar dike û bandorê li ser şêweya wergirtina teksta armanc dike. Armanca wergerandinê ya ku destpêşxer diyar dike hem dibe pîvanên wergêr û hem jî ev heman armanc fonksiyona raguhestina tekstê ya navberçandî diyar dike (Nord, rr. 10-11). Her çi wergêr e, ew di navenda çalakiya wergerandinê de ye û her wekî Nord (rr. 11-12) diyar dike, wergêr hem yekem wergirê teksta jêder e û hem jî hilberînerê teksta armanc e. Wergêr teksta ku dê wergerîne, wekî kesekî du-ziman û du-çand, bi tecribeyên xwe yê pês û bi çavekî rexneyî dixwîne, hewl dide armancên wergerandinê yê destpêşxer û hêviyên xwîneran li ber çav bigire.

Nord (rr. 13-17) di mijara rêgezên tekst-lînguîstîk de tekstê wekî hevbandoriyeke ragihanî rave dike û wergerê jî wekî çalakiyekê dibîne ku di çarçoveya rewşeke ragihanî de li ser esasê tekstan (teksta jêder û teksta armanc)

pêk te. Di transfera navberçandî ya tekstê de du ziman û du çand beşdarî çalakiya ragihanê dibin. Tekst hem wekî yekeyek (unit) lînguîstîk hêmaneke binyadî ye û hem jî tê de rewşa ragihanê diyar dibe. Tekst bi rêya nîşandekên ragihanê çalakiyeke ragihanê pêk tîne ku ew hem hêmanên zimanî û hem jî hêmanên derveyî-gotinê yên wekî kirpandin û întonasyonê digire nav xwe. Ji ber ku tekst çalakiyeke ragihanî ye, bi qasî şert û mercên ragihanê rola beşdarên nav ragihanê jî giring dibe.

Nord (rr. 17-19) balê dikişîne ser pêvajoya wergirtina (reception) tekstê û dibêje ku tekst kombînasyoneke nîşaneyên ragihanî ye û beramberî rewşeke ragihanî tê, ji ber vê çendê jî em dikarin tekstê an ji bergeha nêrîna hilberînerê tekstê an jî ji bergeha nêrîna wergir/xwîner analîz bikin. Wergirtin, an ku têgihîştina bi tekstê, girêdayî hev û bendewariyên takekesî yên wergir e. Wergir li gor paşxaneya xwe ya civakî, li gor zanîna xwe û li gor pêşekiyên xwe bi wateya tekstê têdigihîje. Her çî qas şertê yekem ê wergirtina tekstekê fêmkirina niyet û peyama şander/nivîskar be jî, di her rewşê de niyeta nivîskar û têgihîştina wergir/xwîner li hev nayê. Tam di vê nîqteyê de giringiya rola wergêr diyar dibe, lewre wergêr ji bo ku têgihîştina peyama şander/nivîskar û têgihîştina wergir/xwîner nêzikî hev bibe, çend erkên giring digire ser milê xwe. Wergêr wekî wergirekî zimanê jêder li gor rewşa ragihanê ya teksta jêder tekstê dixwîne û peyamê jê digire û piştê jî xwe dixê şûna wergirê zimanê armanc û hewl dide ku li gor şert û mercên wî/ê peyama nivîskar bisêwire. Nord fikara wergirtina wergêr a şexsî û kêfî tîne ziman û ji bo çareserîya vê têgihîştin û neqlkirina şexsî jî pêwîstiya modeleke teqez a analîza taybetmendiyên tekstê derdixe pêş.

Nord (rr. 19-23) derbarê tîpolojîya tekstan de diyar dike ku her çî qas taybetiyên tekstan ên cureyî û peyama ku ew tekst radigihînin piranî girêdayî hev bin jî, fonksîyona tekstekê ya ragihanî û taybetiyên wê yên binyadî her tim û yekser li hev nagirin. Qaydeyên cureyî yên ku komên tekstan ava dikin bêtir aîdî çandêke xwemalî ne, an ku qaydeyên gerdûnî nîn in. Normên cureyên tekstan li gor çandên cuda diguherin û heta di nav demê de jî hin cureyên tekstan diguherin an jî ji holê radibin. Di tekstên edebî de hêmanên edetî hene ku xasyetên wan berheman nîşan didin û ew tekst piranî bi etîketan wekî roman, çîrok, helbest û hwd. ji hev cuda dibin. Tekstên edebî bi xasyetên naverokî, bi qewareya xwe ya

wekî kurtî û dirêjî û bi xasyetên şewazgerî tên senifandin. Di gel wan taybetiyan jî, tekstên edebî berhemên afirîneriya takekesî ne û xwedî peyameke xweser in.

Di mijara tîpolojiya tekstan de xala giring ew e ku wergêr bizane ka kîjan taybetiyên tekstê xasyetên edetî û cureyî ne û kîjan ji wan jî wekî tercihên nivîskar derketine holê. Bi vî awayî, eger wergêr wekî armanc di wergera xwe de hevtayiya teksta jêder û teksta armanc bide pêş xwe, hingê diyarkirina tîpolojiya tekstê û fonksiyona wê ya ragihanê giringtir dibe. Lê belê Nord (r. 23) di vê nêrînê de ye ku diyarkirina tekstekê ya li gor cureyeke kifşe pirsgirêkên wergerandinê bi temamî çareser nake. Li şûna vê ew (r. 24) modela dahûrîna tekstê ya li gor hokarên dermetnî û navnetnî pêşniyaz dike da ku wergêr bikare *fonksiyona-nav-çandî* (function-in-culture) ya teksta jêder kifşe bike. Piştî vê jî, wergêr dê li gor armanca wergerandinê biryarê bide ka ji bo fonksiyona nav çandî ya teksta armanc kîjan ji wan hêmanên teksta jêder bên parastin û kîjan jî li derve bên hiştin.

3.1.2. Fonksiyona Teksta-jêder û Armanca Wergerê

Nord (rr. 25-39) cihekî esasî dide analîza teksta jêder û li ser têkiliyên cur bi cur ên navbera teksta jêder û teksta armanc radiweste. Ew jî, her wekî gelek wergernasan, bala xwe dide ser têgihên wekî *dilsozî* (fidelity), *serbestî* (liberty) û *hevtayiyê* (equivalence) û şiroveyên xwe yên derbarê wan têgihan pêşkêş dike. Di piraniya teoriyên wergerê de niqaşên esasî li ser wan têgihan çê dibin û li gor pênase û ravekirinên wan têgihan xetên cudaker navbera teoriyan de kifşe dibin.

Lê Nord (rr. 25-30) di vê baweriyê de ye ku niqaşên li dor têgihên *dilsozî*, *serbestî* û *hevtayiyê* bê encam dimînin, ji ber ku ne mimkun e ku ew têgih bi zelalî bên terîfkirin, û pêkanîna wan a di wergerê de jî xwedî qîmeteke talî ye. Armanca wergerê ya sereke, ne ku armanca tekane, pêkanîna teksteke fonksiyonel e û têgihên wekî hevtayî, *dilsozbûn* û *serbestbûna wergêr jî* di vê çarçoveyê de watedar dibin. Nord (r. 32) dide zanîn ku divê di navbera teksta jêder û teksta armanc de têkiliyek hebe û taybetiya vê têkiliyê jî bi armanca wergerê xuya dibe. Li gor armanca wergerê wergêr biryar dide bê ka kîjan hêmanên teksta jêder di teksta armanc de bên parastin û kîjan divê li teksta armanc bên adaptekirin. Bi vî awayî jî, di encamê de armanca wergerandinê ya teksta armanc û taybetiya teksta

jêder li hev tèn. Di vê çarçoveyê de mirov dikare qala dilsoziya wergêr hem ji bo niyet û peyama nav teksta jêder û hem jî ji bo rewşa teksta armanc bike.

3.1.3. Qonaxên Wergerandinê di *Analîza Tekstê ya Werger-Navend* de

Nord di pêvajoya wergerandinê de xwedî formulasyoneke xweserê xwe ye. Pêvajoya wergerandinê bi giştî bi du modelan, modela du-qonax û modela sê-qonax, tê ravekirin. Modela du-qonax her wekî ji nav jî kifşe ye ji du qonaxan pêk tê. Nord (r. 34) destnîşan dike ku qonaxa yekem analîz û ya duyem jî sentez e û ew her du qonax jî li pey hev tèn. Di qonaxa analîzê de wergêr teksta jêder dixwîne û hemû hêmanên wê analîz dike. Di qonaxa duyem de wan hêmanên derbarê wateyê û gotinê bi zimanê armanc ji nû ve saz dike, an ku ji wan sentezeke nû çê dike. Modela sê-qonax jî (r. 35) her wekî ya du-qonax, ji pêvajoyên analîz û sentezê pêk tê, lê pêvajoya ku wekî *çalakiya transferê* tê binavkirin wekî qonaxa sêyem di navbera pêvajoya analîzê û sentezê de cih digire, an ku wergêr çalakiya wergerandinê bi dorê di sê qonaxan de pêk tîne: Analîz-Transfer-Sentez.

Modela ji bo qonaxên wergerandinê ya ku Nord (r. 36) li şûna wan her duyan pêşniyaz dike *modela bazneyî* (looping model) ye. Nord her çî qas modela sê-qonax li gor ya du-qonax bêtir nêzikî rastiya wergerê bibîne jî, li gor wê ew model jî wergirtin û têgihîştina teksta jêder a ji hêla wergêr û neqlkirina wê ji xwe re dike pîvana esasî û bi vî awayî jî nikare rastiya çalakiya wergerandinê û pêvajoya wê rave bike. Her ku Nord giringiyeke esasî dide daxwaz û armancên derbarê wergerandinê, vê faktorê dike xaleke sereke ya pêvajoya wergerandinê. Nord (rr. 37-38) di modela xwe ya bi navê modela bazneyî de, wekî gava yekem, analîz û şirovekirina skoposa (armanca) teksta armanc derdixe pêş. Îcar, di çarçoveya armanca wergerê de wergêr dê li şert û mercên veguhestina ber bi zimanê armanc binirxîne û li ser rewşa ragihanî ya teksta armanc mijûl bibe. Di gava duyem de analîza teksta jêder pêk tê. Wergêr dêna xwe didê bê ka veguhestina hêmanên di teksta jêder de li gor armaca wergerê pêkan e yan na. Her wiha di vê gavê de wergêr hemû hêmanên teksta jêder analîz dike. Piştî ku analîz pêk hat wergêr dê hêman û taybetiyên teksta jêder ên ku li armanca wergerandinê diguncin kifşe bike. Wergêr dê biryarê bide bê ka kîjan hêmanên potansiyel ên bi zimanê armanc ji bo pêkanîna teksta armanc a fonksiyonel guncav in. Di gava sêyem de jî wergêr halê dawî ya teksta armanc derdixîne holê. Di van her sê

gavan de, wergêr gelek caran di navbera pêvajoya analîza teksta jêder û senteza teksta armanc de bi paş de û bi pêş de diçe, an ku pêvajoya wergerê bi awayekî bazneyî pêk tê.

3.1.4. Hokarên Dahûrandina Teksta-jêder

Nord fonksiyona ragihanî wekî pîvana sereke ya tekstê dibîne û li gor wê taybetiyên sentaktîk û semantîk ji hêla giringiyê ve di pileya duyem de ne (r. 41). Ji ber vê qebûla xwe jî Nord hokarên ku rewşa ragihanê (communicative function) diyar dikin wekî hokarên herî giring ên ji bo analîza teksta jêder destnîşan dike û wan wekî hokarên dermetnî (extratextual) bi nav dike. Hokarên dermetnî ên ku li gor Nordê rewşa ragihanê diyar dikin ew in: *şander (sender)*, *niyeta şander*, *wergir (xwîner)*, *navgîn/kanal*, *cihê ragihanê*, *dema ragihanê*, *motîva ragihanê* û *fonksiyona tekstê*.

Nord (r. 42) rola wan hokaran a di rewşa ragihanê de wiha zelal dike: Nivîskar, an ku şanderê tekstê, bersiva (**kî?**) yê ye. Niyeta şander bersiva pirsê (**ji bo çi?**) dide. Xwînerê tekstê dibe bervêder, an ku beramberî bersiva (**ji bo kê?**) ye. Navgîn û kanala ku tekst pê tê ragihandin bersiva (**bi kîjan navgînê?**) dide. Cih (**li ku?**) û dem (**kengê?**) derbarê zeman û mekanek berbiçav ên ragihanê ne ku tê de tekst hatiye hilberandin û wergirtin. Motîv (**çima?**) jî sedema ragihanê nîşan dide. Bi bersiva wan pirsan tev jî bersiva hokara dawî, an ku fonksiyona tekstê (**bi kîjan fonksiyonê?**) derdikeve holê.

Nord (rr. 87-142) ji bo analîzkirin û têgihîştina xasyeta peyama nav tekstê li gel wan 8 faktorên dermetnî yên li jor, 8 faktorên navmetnî jî destnîşan dike. Hokarên navmetnî ew in: *mijar*, *naverok*, *feraziye (presupposition)*, *kompozîsyona tekstê*, *hêmanên ne-peyv (non-verbal elements)*, *peyvsazî*, *hevoksazî*, û *taybetiyên raparçeyî (suprasegmental features)*. Hokarên navmetnî jî bi dorê mijara tekstê (**derbarê çi?**); agahî û naveroka nav tekstê (**çi?**); zanyariyên ku nivîskar wekî ferazî dihesibîne (**tiştên dîtir**); kompozîsyon û avaniya tekstê (**bi çi rêzê?**); hêmanên ne-zimanî (non-linguistic), kêlek-zimanî (paralinguistic) ku di nav tekstê de cih digirin; (**bikaranîna hêmanên ne-peyv**); xasyetên bêjeyî (**bi kîjan peyv?**); avaniya hevoksaziyê (**bi hevokên çawa?**) ya tekstê digire nav xwe. Taybetiyên raparçeyî yên întonasyon û prozodiyê (**bi kîjan tonê?**) diyar dikin.

Nord (r. 42) destnîşan dike ku beriya xwendina teksta jêder hokarên dermetnî tîn analîzkirin da ku rewşa ku tekst tê de hatiye bikaranîn bê dîtîn. Bi vî awayî derbarê tekstê de li ba wergir/xwîner hin bendewarî/hêvî çê dibin. Dema ku xwîner teksta jêder xwend jî, îcar xwîner wan hêvî û bendewariyên xwe yên pêşxwendinê bi taybetiyên navmetnî yên tekstê berawirdî hev dike û bandoreke taybet a tekstê jî hingê li ser wergir/xwîner çê dibe. Bandora tekstê jî (**ji bo çi bandorê?**) bi girêdayî faktorên dermetnî û navmetnî bi hev re derdikeve holê. Wergêr û rexnegir di analîza wergerekê de dikare wan hokaran tev li ber çav bigire, an jî pêşekiyê bide hinekan. Di analîza hin berheman de jî, ji ber taybetiyên tekstê, hin hokar dibe ku qet bi kêrî analîzê neyên.

3.1.4.1. Hokarên Dermetnî

Nord diyar dike ku (1991: 43-44) kesên wekî K. Reiss, W. Koller, W. Wills û G. Thiel jî qala hokarên rewşa ragihanê yên wekî şander, niyeta şander, wergir û fonksiyona tekstê kirine, lê bi angaştên cuda û ne zêde bi hûrgilî. Beriya Nordê wan kesên li jor piranî şander û niyeta şander wekî heman tişt qebûl dikirin, lê wê ew her du wekî du hokarên cuda nirxandine. Nord ji bo ku rewşa tam a tekstekê bê fêmkirin da ku bi kêrî modela analîzkirinê ya li gor skoposeke wergerê were, vê pîrsa giring derdixîne pêş: 'Kîjan agahiyên derbarê wan faktorên dibe ku bi wergerê re têkildar be?' (r. 45). Wekî bersiv, Nord (r. 46) balê dikişîne ser xasyetên sereke ku rewşa tekstekê diyar dikin. Ji wan a yekem dem û cih e ku rewşa dîrokî kifşe dikin. Ya duyem rewşa çandî ye ku tekst jî parçeyeke wê çanda heyî ye, lewre analîza tekstekê divê têkildarî hêmanên kultur-spesîfik be. Ya sêyem jî derbarê fonksiyona tekstê ye. Fonksiyon ew taybetî ye ku bi saya wê tekstualîte çê dibe.

3.1.4.1.1. Şander

Nord (rr. 47-52) li gel peyva *şander*, peyva *hilberînerê tekstê* jî bi kar tîne. Her çî qas bi piranî her du heman şexs bin jî, cudatiya rola wan a di wergerê de bi şiklekî berbiçav şirove dike. Li gor pênaseya Nordê (r. 48) şanderê tekstekê ew şexs e ku bi rêya tekstê dixwaze peyamekê bi yên din re bişîne an jî bandorekê li ser wan çê bike. Hilberîner jî li gor telîmatên şander û li gor pîvanên afirandina tekstekê yên bi ziman û çanda navborî tekstê dinivîse. Nord (r. 49) rewşa wergêr dişibîne rola hilberînerê tekstê. Wergêr ji aliyekê ve divê li gor telîmatên kes an jî

saziya ku çalakiya wergerandinê dide destpêkirin tevbigere û bala xwe bide ser taybetiyên ziman û çanda armanc, ji aliyê din ve jî xwedî serbestiyê ye ku afirîneriya xwe û tercîhên xwe bike parçeyeke karê xwe.

Nord agahiyên derbarê şander ên ku têkiliya wan bi niyeta şander û bi daxwaza afirandina tekstê hene, agahiyên derbarê dem û cihê ku tekst hatiye afirandin û rewşa çandî rave dikin giring dibîne (r. 50). Navê nivîskar bi xwe, hûngiliyên di nav tekstê de, daneyên derbarê weşandina tekstê tev dikarin agahiyên derbarê şander/nivîskar dabîn bikin. Nord (r. 52) çend pirsên wekî ‘Şander kî ye?’, ‘Şander û hilberînerê tekstê heman kes in?’, ‘Derbarê şander agahiyên çawa di tekstê de peyda dibin?’ ‘Faktorên din ên tekstê û rewşa ragihanê derbarê şander de kîjan agahiyan didin kifşê?’ pêşkêş dike da ku ji bo bidestxistina agahiyên derbarê şander bibin alîkar.

3.1.4.1.2. Niyeta Şander

Li gor Nordê (r. 53) ji bo ku em bi awayekî baş ji niyetê beled bin, divê em li xwe bipirsin bê ka şander dixwaze tekst kîjan fonksiyonê pêk bîne û gelo şander bi rêya tekstê dixwaze li ser wergiran bandoreke çawa çê bike. Nord di vê niqteyê de nakokiyekê dide xuyakirin û dibêje ku her çi qas niyet li gor şander bê pênasakirin jî, niyet bi tena xwe armanca şander pêk nayne. Ancax bi wergirtina tekstê ya ji hêla xwîner a bi fonksiyoneke kifşe niyet hasil dibe. Bi cureya tekstê mirov nikare niyeta şander kifşe bike, û mînak helbestên epîk dide ku em îro wan berhevan bi fonksiyoneke ji niyeta şairên wan cudatir dixwînin.

Li gor Nordê (rr. 54-55) niyeta şander giring e, lewre niyet bandorê li ser biryarên wergêr çê dike, dema ku ew ji hêla naverok û formê ve teksta wergerandî saz dike. Nord têkiliya niyeta şander bi prensîba dilsoziyê re jî çê dike û dibêje ku fonksiyona tekstê biguhere jî wergêr nikare li dijî niyeta şander tevbigere. Nord ji bo fêmkirina niyeta şander giringiya kifşekirina rola wî/ê ya nav tekstê jî destnîşan dike û diyar dike ku eger kesê dahûrîner rola şander baş têbigihîje, wê demê dê karibe derbarê niyeta wî/wê de encaman derbixîne. Nord dide zanîn ku niyeta şander bi taybetî di tekstên edebî de bêtir giring dibe, lewre peydakirina têkiliyeke rasterast a di navbera cureya edebî û niyeta nivîskar de ne karekî hêsan e. Ji bo vê yekê jî, divê wergêr jiyan û paşxaneya nivîskar baş lêkolîn bike, dêna xwe bide bûyerên giring ên ku tesîr lê kirine ji bo ku bibe xwedî fikr derbarê

niyeta nivîskar de. Ji bo têgihîştina bi niyeta nivîskar, mirov dikare bala xwe bidê bê ka faktorên dermetnî û navnetnî çi agahiyan didin, gelo nivîskar bi xwe hin tiştan eşkere dike û rewşa ragihanê derbarê niyeta nivîskar de kîjan agahiyan berdest dike.

3.1.4.1.3. Wergir

Wergir, ê ku muxatabê peyamê ye, di tekstê de kesê xwîner e û di peyama devkî de jî kesê guhdar e. Nord (rr. 57-58) dide xuyakirin ku di piraniya nêrînên derbarê wergerê de wergir, an ku xwînerê tekstê, wekî hokareke pir giring hatiye dîtin. Di pêvajoya analîza teksta jêder de wergêr rewşa ragihanî ya wergirê teksta jêder li ber çav digire û wê rewşê li gor wergirê pêşerojê yê teksta armanc ji nû ve dinirxîne da ku lê biguncîne. Bi awayekî xwezayî jixwe wergirê teksta armanc dê jî wergirê teksta jêder cudatir be, lewre ew her du wergir aîdî çand û zimaneke cuda ne. Ji ber vê çendê jî teksta ku tê wergerandin tu car jî hêla xwîner ve bi heman awayî nayê xwendin û têgihîştin.

Nord (rr. 59-61) diyar dike ku wergêr dema ku analîzê derbarê wergir de dike, dikare wergirê teksta jêder û teksta armanc li gor pîvanên wekî zayend, temen, statuya civakî, paşxaneya civakî, perwerdehî û tiştên din rûberî hev bike. Zanyariyên wergêr ên derbarê zanyariyên xwîneran ên giştî û spesîfik pir giring in, lewre bi wan zaninan wergêr dê zanibe ka kîjan hêmanan derxîne pêş, kîjanan qut bike û kîjan tiştan wekî pêzanînên xwîneran qebûl bike. Zanyariyên derbarê xwîner de dibe ku hin palpiştan derheqê niyeta nivîskar jî dabîn bikin. Tekst û hêmanên tekstê çavkaniyên zanyariyê ne ku mirov derheqê wergir berhev bike. Faktorên wekî dem û cihê nivîsîna tekstê, navgîn, sernavê tekstê an jî motîvasiyona nivîsînê ya nivîskar jî agahiyên derbarê wergir didin kifşê.

3.1.4.1.4. Navgîn

Li gor pênaseya Nordê (rr. 63-64) navgîn di teoriya ragihanê de ji wê kanal an amrazê re tê gotin ku bi rêya wê peyam ji wergir re tê şandin. Di ragihana nivîskî de tiştê ku tê çapkirin û di ya devkî de jî deng beramberî kanala ragihanê ye. Di ragihana nivîskî de pirtûk, kovar, rojname, ansîklopedî, wekî navgînên sereke ne. Qeware û kalîteya çapkirinê û taybetiyên din ên navgînê derbarê xwînerên ku tê armanckirin, derbarê niyeta nivîskar û derbarê dem û cihê çapkirinê de fikr û agahiyan dide mirov. Her çi qas têkiliya navgînê bi hêviyên

wergir û niyeta nivîskar re hebe jî, navgîn yekser niyeta nivîskar û hêviyên xwîneran kifşe nake, an ku di têkiliya wan faktorên de dibe ku nakokî hebin. Di gel vê yekê jî, navgîn hêvî û bendewariyên xwîner ên derbarê fonksiyona tekstê de diyar dikin. Nord (rr. 66-67) giringiya analîzkirina taybetiyên navgînê yê têkildarî form û naverokê destnîşan dîke û pêwîstiya senifandina wan a wekî xasyetên kultur-spesîfîk û gerdûnî pêwîst dibîne. Di analîza navgînê de xalên giring ew in ku wergêr divê lê binêre bê ka tekst ji axaftin an vegotinekê hatiye sazîkirin an jî hîn li destpêkê jî wekî tekst hatiye nivîsandin. Her wisa, wergêr dikare ji faktorên din hin agahiyan derheqê navgînê de peyda bike û bala xwe bidê bê ka agahiyan derbarê navgînê ji bo niyeta nivîskar û motîva nivîsandinê, ji bo hêviyên wergir û fonksiyona tekstê kîjan derfetên şiroveyê dabîn dikin.

3.1.4.1.5. Cihê Ragihanê

Nord (r. 67) hokara cih li gel faktora demê wekî kategoriyeke têkildarî rewşa dîrokî bi nav dîke û hem di çarçoveya cihê hilberandina tekstê de hem jî wekî cihê wergirtina tekstê hokara cihê dinirxîne. Li gor Nordê (rr. 69-70) di analîza hokara cih de xasyetên cih ên çandî û polîtîk jî dibin xwedî giringî, lewre tekst li gor wan xasyetên cihê çê dibin. Hokara cih agahiyan derbarê niyeta şander, derbarê motîv û navgînê de jî dabîn dîke. Agahiyan derbarê cih di hawirdora tekstê de peyda dibin. Cihê çapîkirinê, navê weşanger û agahiyan nav tekstê yê têkildarî cih tev çavkaniyên zanînê ne ji bo hûrgiliyên faktora cih. Wergêr dema analîzkirina hokara cih pêk tîne, divê bala xwe bidê bê ka tekst li ku hatiye hilberandin, gelo di nav tekstê de kîjan agahiyan derbarê cih hene û têkiliyeke çawa di navbera hokara cih û hokarên din de heye.

3.1.4.1.6. Dema Ragihanê

Nord (rr. 70-71) destnîşan dîke ku di nav demê re ziman tev tûşî guherînan dibin û bandora guherînên dîrokî û civakî jî li ser wan guherînên zimanî çê dibin. Ji ber vê rastiya guherînê jî, tekst dibin wekî nîşaneyên zimanî û çandî yê serdemekê. Guherîn di qada cureyên tekstan de jî çê dibe, an ku hem cure diguherin û hem jî şeweyên wergirtina wan diguherin. Li gor Nordê, têgihîştin û hêviyên wergir/wergêr a derbarê tekstekê li gor temenê tekstê diyar dibe. Hokara demê derbarê paşxaneya ragihanê de jî fikrekê dide û bi vî awayî jî dibe alîkar da ku mirov hin encaman têkildarî nivîskar û xwînerê ku armanc dîke bi dest bixe.

Li gor Nordê (rr. 72-74) hokara demê ne tenê têkildarî dema hilberandin û wergirtina teksta jêder e, her wisa têkildarî wergerandinê û wergirtina ji hêla xwînerê armanc e jî. Nord balê dikişîne ser hokara demê ya di wergera klasîkan de û diyar dike ku wergêr dikare binêre ka di nav demê re wergêrên cuda stratejiyên çawa bi kar anîne û gelo hewl dane ku tekstê rojane bikin, an jî gelo xwestine tekstê wekî teksteke dîrokî bihêlin. Dîroka çapkirina tekstê, zanyariyên di nav tekstê de û çavkaniyên din agahiyan derbarê demê didin. Ji bo wergêr dîroka çapkirina tekstê, têkiliya hokara demê ya bi hokarên din û cudatiya dîrokî ya rewşa ragihanê ya navbera teksta jêder û teksta armanc û arîşeyên têkildarî vê ferqa dîrokî tev xalên giring in di analîza hokara demê de.

3.1.4.1.7. Motîva Ragihanê

Nord (rr. 74-77) motîvê wekî xaleke giring dibîne di pêvajoya hilberandin û wergirtina tekstê de û vê hokarê di çarçoveya pirsê 'ji ber çi sedemê tekst hatiye nivîsandin' de dinirxîne. Têgihîştina bi motîva nivîsandina hin tekstên ku bi armanca agahdarkirinê hatine nivîsandin hêsan e, lê belê diyarkirina daxwaz an sedema nivîsîna gelek tekstan kareke têkilhev û niqaşbar e. Motîva nivîsîna hin tekstan ji daxwaza nivîskar çê dibe û hin tekst jî bi hêvî û bendewariyên wergiran re têkildar in. Wergêr di analîza xwe ya hokara motîvê de dikare motîva nivîsîna teksta jêder û motîva hilberandina teksta armanc berawirdî hev bike da ku biryarên xwe yê derbarê pîvan û pêşekiyên raguhestinê bide. Wergêr bi pirsên wekî 'tekst çima hatiye nivîsîn?', 'çi agahî derbarê motîva nivîsînê hene?' û "hokarên din ên dermetnî û navmetnî derbarê motîvê çi agahiyan didin?" dikare hokara motîvê zelal bike û bala xwe bide ser arîşeyên ku ji ber cudabûna motîva hilberîna teksta jêder û teksta armanc derketine holê.

3.1.4.1.8. Fonksiyona Tekstê

Nord (r. 77) fonksiyona tekstê wekî fonksiyona wê ya ragihanê dibîne ku tekst vê fonksiyonê di pêvajoya hilberandin û wergirtinê de pêk tîne û ew jî bi sazûn û têkildarbûna bi hev re ya hemû hokarên dermetnî çê dibe. Têkiliyeke nêzik di navbera fonksiyona tekstê û cureya tekstê de heye, lê belê her du ne heman tişt in, an ku fonksiyona tekstê têkildarî taybetiya wê ya ragihanê ye û ji hêla din ve jî cureya tekstê têkildarî bastûr û teşeya teksta xwedî fonksiyon e. Nord (rr. 77-78) edebîtiyê wekî fonksiyoneke tekstê dibîne û xasyetên wê

fonksiyonê rave dike. Tekstên edebî ji hêla nivîskarên edebî ve tîn hilberandin û ne bi niyeta şayesandina rastiyeke bes bi helwesteke afirandina cîhaneke sêwirandî tîn nivîsîn. Wergirên tekstên edebî jî ew kes in ku li gor tecrîbeyên xwe yê xwendina edebî li benda xasyetên edebî ne.

Her wekî Nord (r. 79) destnîşan dike, navgîna sereke ya neqilkirina tekstên edebî piranî nivîs e. Hokerên rewşê yê wekî cih, dem û motîv jî di wergera tekstên edebî de roleke giring dileyzin, lewre ew taybetiya kultur-spesîfik a rewşa jêder û rewşa armanc kifşe dikin. Nord her wisa xaleke giring a fonksiyona tekstên edebî jî bi taybetiya wan a pragmatîk ve girê dide û dibêje ku eger em niyeta şander/nivîskar û bendewariyên xwîner wekî faktorên sereke bibînin ku bandorê li ser fonksiyona tekstê dikin, hingê em ê bizanin ku edebîtiyê taybetiyeke pragmatîk a tekstê ye ku bi têkiliyeke şander û wergir a di rewşeke spesîfik de çê dibe. Ranêzikiya Nordê ya bi vî rengî giring e, lewre tê dîtin ku Nord fonksiyona edebî ya tekstê bi xasyetên zimanî ve girê nade. Ew edebîtiyê di çarçoveya hêvî û bendewariyên xwîner ên ji tekstê û zanyariyên derbarê şander de wekî taybetiyeke kultur-spesîfik dibîne, an ku xwîner bi hêviya xwendina teksteke spesîfik nêzikî tekstê dibe. Xwîner dizane ku tekst bi navê nivîskarê xwe û bi cureya xwe soza hin nirxên tekstî dide wî/wê.

Di mijara fonksiyona teksta werger de Nord (rr. 80-81) qala du têgihan dike ku têkiliya wan bi niqaşên derbarê fonksiyoneliyê re heye. Nord wan her du têgihên têkildarî şêweya wergerandinê, *wergera belgeyî* û *wergera navgînî*, di çarçoveya niqaşên derbarê wergera dilsoz û wergera serbest de dinirxîne ku ji destpêka serpêhatiya dîrokî ya wergerê heya îro timî di navenda niqaşan de bûne. Nord wergera belgeyî wekî çêkirina teksteke werger a wekî belgeyeke ragihanê ya navbera nivîskar û wergirê zimanê jêder dibîne. Wergera navgînî jî xwedî xasyeteke ragihanî ye û peyama nivîskarê teksta jêder rasterast digihîne xwînerê armanc. Di wergera belgeyî de taybetiyên teksta jêder û rewşa ragihanî ji bo wergirên teksta armanc tîn ve-hilberandin, ji ber vê çendê jî wergirê teksta armanc çavdêriya rewşeke ragihanî dike ku ew ne tê de ye. Di wergera belgeyî de wergêr bêtir bala xwe dide ser veguhestina taybetiyên morfolojîk, bêjeyî û hevokî yê teksta jêder. Nord cureyên wergera belgeyî wekî *wergera peyvî*, *wergera filolojîk* û *wergera egzotîk* rêz dike.

Wergera navgînî peyamê di konteksta nû ya ragihanî de digihîne xwînerê teksta armanc bê ku wî/wê ji rewşa ragihanî ya teksta jêder haydar bike. Nord vê cureya wergerandinê di sê sernavan de dabeş dike. Ya yekem *wergera hevta-fonksîyon* (equi-functional) e ku di vê şêweya wergerê de teksta armanc xwedî heman fonksiyona teksta jêder e. Ya duyem *wergera hetero-fonksîyonel* e ku di vê şêweyê de fonksiyona teksta jêder li cem xwînerê teksta armanc cihê xwe nabîne, lê wergêr fonksiyoneke nû adapte dike ku bi awayekî têkildarî niyeta nivîskar e jî. Ya sêyem ji hêla Nord ve wekî wergera *homolojî* (hevcureyî) tê binavkirin ku wergêr di vê şêweyê de li gor konteksta edebî ya teksta jêder fonksiyoneke manend di kontekstekta edebî ya teksta armanc de diafirîne. Ev form piranî di wergera helbestan de derdikeve pêş me.

Nord (r. 82) destnîşan dike ku her wekî hokarên din ên dermetnî, ji bo agahiyên derbarê fonksiyona metnê de jî çavkaniya sereke tekst bi xwe ye. Eger fonksiyona tekstê bi cureya wê nehatibe diyarkirin, hingê analîza hemû hokarên dermetnî dibe ku fikrekê derbarê fonksiyona teksta jêder dabîn bike. Ji ber vê çendê, fonksiyona tekstê divê piştî analîza hokarên din pêk were. Nord derbarê kifşekirina fonksiyona tekstê de dibêje ku têkiliyên pragmatîk ên navbera şander, wergir, navgîn û motîvê di hişê wergêr de derbarê fonksiyona tekstê fikrekê diafirîne ku ew jî kêm zêde fonksiyona heyî ya tekstê ye.

3.1.4.2. Hokarên Navmetnî

Nord ji hêla bergeha şander ve nêzikî hokarên navmetnî dibe, lewre li gor wê bi însîyatîfa şander pêvajoya ragihanê dest bê dike (rr. 88-89). Bi vî awayî, Nord bi daxwaza şander a ragihana peyamekê pêvajoyê dide destpêkirin û diyar dike ku şander biryara xwe ya mijara peyamê dide û ew jî dibe naveroka tekstê. Dema ku şander peyama xwe wekî tekst saz dike, divê zanyariyên muhtemel ên wergir –feraziye– li ber çav bigire da ku tiştên ku tînan zanîn dubare neke. Piştî ku mijar, naverok û feraziye çareser bû, şander dest bi karê sazkirina rêz û şêweya pêşkêşkirina naverokê dike ku ew jî kompozîsyonê pêk tîne. Şander bi alîkariya peyvan û hevoksaziyê peyama xwe digihîne wergiran, lewre rola wan her du hokaran jî pir giring e.

Nord (rr. 90-92) derbarê analîza hokarên navmetnî de dibêje ku li gor armanca wergerê dibe ku analîza bi hûrgilî ya hokarên navmetnî pêwîst neke, lê di

hin şert û mercan de jî analîzeke kûr hewce dike. Di hin cureyên tekstan de jî analîz zêdetir li dor hin hokarên kifşe çê dibe. Hokarên dermetnî yên wekî mijar, naverok û feraziye aîdê qada semantîk in û di asta tekstê de tînan analîzkirin. Ji hêla din ve jî, kompozîsyon, hêmanên ne-peyv, peyv sazî, hevoksazî û taybetiyên raparçeyî jî tînkildarî şewaza tekstê ne. Şewaz jî di vî kontekstê de şeweya pêşkêşkirina agahiyên a ji wergiran re ye û taybetiya şiklî ya tekstê dide nîşan. Hokarên navmetnî jî her wekî hokarên dermetnî di nav xwe de ji nêzik ve tînkildar in, lewma jî analîza wan bi hev re girêdayî çê dibe.

3.1.4.2.1. Mijar

Nord (rr. 93-96) giringiya analîza mijarê ya ji bo wergir di çend xalan de rave dike. Bi analîza mijarê wergêr dizane bê ka gelo di tekstekê de yek an jî zêdetir mijar hene. Dîsa kifşekirina konteksta çandî ya mijarê derfetê dide wergêr da ku derbarê feraziyan bibe xwedî fikr. Her wisa analîza mijarê agahiyên kêrhatî yên tînkildarî termînolojîyê dide wergêr. Wergêr guncaviya armanca wergerê li gor mijarê ji nû ve dikare binirxîne û derbarê sernavan de jî biryara xwe li gor analîza mijarê dikare li ber çav derbas bike. Agahiyên tînkildarî mijara tekstê ji cureya tekstê, ji pêşgotinê, an jî ji hevokên bingehîn kifşe dibe. Lê belê, eger ku mijar bi wan şiklan eşkere nebe, wergêr bi rêya derxistina kurteyêke tekstê dikare mijarê zelal bike. Çareyêke din a zelalkirina mijarê jî analîzkirina hokarên din e ku mimkun e daneyên kêrhatî dabîn bikin ji bo mijarê. Nord rêyêke din a ji bo diyarkirina mijarê jî di analîza îzotopîk de dibîne. Peyv û bêjeyên ku wekî îzotopiyan di nav tekstekê de belavbûyî bi hev re tînkildar in û ew tîkilî jî li dor mijarekê çê dibe. Her wisa tîgihên derbarê temayan jî fikrekê derbarê mijarê dide kesê analîzker.

3.1.4.2.2. Naverok

Nord (rr. 99-100) naverokê wekî tîkiliya tekstê ya bi objeyan re bi nav dike û dide zanîn ku ew tîkilî jî bi bastûrên hevokî û bêjeyî çê dibe, lewre li despêkê lazim e analîzker bala xwe bide ser tîkiliyên wateyî yên ku bi hêmanên lînguîstîk saz bûne. Nord ji bo hêskirina karê tîgihîştina bi naveroka tekstê, wekî rêbaz şiroveya tekstê ya bi kurtî pêşniyaz dike û diyar dike ku wergêr bi rêya şiroveyê dikare hem baştir bi naverokê tîbigihîje û hem jî dikare hevgeriya (coherence) tekstê jî bibîne. Di analîza naverokê de Nord (rr. 104-105) balê dikişîne ser rewşa

hundirîn a tekstê û destnîşan dike ku lazim e wergêr bizane ka tîkiliya tekstê ya bi rastiya derveyî çi ye, an ku gelo tekst pevbestî (fiction) ye an jî rasteqîn e û gelo li rastiyan cihana derve tê an jî nayê. Ji bo diyarkirina zelal a naverokê, wergêr dikare zanyariyên şênber ên nav tekstê kifşe bike, bala xwe bide ser hokarên dermetnî yên nav tekstê, rewşa nav metnê û rastiya derveyî metnê bide ber hev.

3.1.4.2.3. Feraziye

Nord (rr. 105-106) balê dikişîne ser dijiwariya pênasekirina feraziyeyê û diyar dike ku mebesta wê ya bi vê peyvê feraziyeya pragmatîk e û ew jî tîkildarî rewşa ragihanê ye. Feraziye aîdê çanda nivîskar in û nivîskar tiştên ku li ba xwe wekî tiştên zanînê dihesibîne xwînerên xwe jî wekî xwe zanayê wan qebûl dike. Nord pêwîstiya kifşekirina îmayên nivîskar a ji bo xwînerên teksta werger qebûl dike, lê vê hişyariyê dide ku kifşekirina hemû cure îmayan, bi taybetî jî di helbestê de, bandoreke zêde li ser tekstê çê dike. Nord ji bergeha nivîskar ve nêzikî feraziyan dibe û bingeha wan jî girê dide jînenîgariya nivîskar, cureyên hevpar ên tekstan, hûrgiliyên mijaran, motîva nivîsînê, xasyetên serdemî yên edebî, rewşa îdeolojîk, medya, dîn, felsefe û hokarên dîn.

Nord (r. 107) di analîza hokara feraziyê de, wekî arîşeya sereke tespîtîkirina wan dibîne û destnîşan dike ku peydakirina tiştên ferazî ne hêsan e, lewre feraziye jixwe ew tişt in ku bi awayekî eşkere nayên nivîsandin. Ji ber vê yekê jî divê wergêr berî her tiştî kifşe bike bê ka tekst aîdî kîjan çandê ye û tîkiliya tekstê ya bi rastiyan çi ye, an ku cihana tekstê li ser esasê cîhaneke rasteqîn e an jî cîhaneke pevbestî ye. Wergêr dema ku di analîza xwe de hin feraziye tespît kirin ku bêyî zanîna wan xwîner dê tekstê tam fêm neke, vê çaxê bi hin lêzêdekirinan dikare rewşê ji bo xwîner rave bike. Dîsa jî, Nord (rr. 109-110) vê hişyariyê dide ku lêzêdekirin çêja edebî ya tekstê dixê nav rîskê. Wergêr dikare bi dûrahiya çandê ya navbera teksta jêder û wergirên armanc îhtimala hebûna feraziyan kifşe bike. Bi analîza faktorên dermetnî û navmetnî wergêr dê bikare valahiyên agahiyan û arîşeyên ragihanê yên ji ber feraziyan tespît bike û eger pêwîst bike dikare şûna wan dagire.

3.1.4.2.4. Kompozîsyona Tekstê

Nord (rr. 110-118) kompozîsyona tekstê bi tîgehên avaniya makro û avaniya mîkro rave dike û giringiya wan a ji bo analîza werger-navend a tekstê şirove

dike. Li gor Nordê ew avaniyên makro û mîkro ji ber çend sedeman giring in. Bi wan hokaran mirov dizane gelo tekstek ji rewşên ragihanê yên cuda pêk tê da ku stratejiyên wergerê li gor wê xasyetê bîn bijartin. Her wisa, beşên taybet ên destpêk û dawiya teksteke şanoyê divê li gor wan hokaran bîn analîzkirin ji bo ku bandora wan a li ser wergir û li ser tevahiya tekstê bê dîtin. Hin cure jî xwedî avaniyên xwe yên taybet ên makro û mîkro ne, lewre analîza kompozîsyona tekstê ji bo cureya tekstê agahiyên kêrhatî berdest dike. Avaniya makro têkildarî gewdeya sereke ya tekstê ye ku bala mirov dibe ser destpêk û dawiya tekstê, organîzekirina beş û paragrafan, hebûna tekstên-hundirîn û jênotan û hwd. Avaniya mîkro jî bêtir li ser esasê rêxistin û têkildarbûna hevok û bêjeyan û hêmanên aîdî wan e. Wergêrê ku analîza kompozîsyona tekstê dike, divê kifşe bike bê ka tekst xwedî kompozîsyoneke serbixwe ye an jî parçeya yekeyeke din e, her wekî gotarek nav pirtûkekê an jî pirtûkek aîdî rêz an sêyaneyekê be. Dîsa wergêr divê bizane bê ka teksta navborî xwedî kompozîsyoneke edetî û cureyî ye yan na.

3.1.4.2.5. Hêmanên Ne-peyv

Nîşane, kod, wêne, logo û şiklên taybet ên çapkirinê ku peyama tekstê xurt dikin ji hêla Nordê ve wekî hêmanên ne-peyv tên binavkirin. Nord (rr. 118-120) rola wan a di tekstê de wekî kargîneke temamker dibîne. Tablo an jî grafîkên ku agahiyên ji bo tekstê dabîn dikin wekî hêmanên ne-peyv nayên qebûlkirin. Wêneya nivîskaran, xêzkirinek derbarê mijarê de, teknîka akrostîşê ya helbestê tev mînakên hêmanên ne-peyv in ku Nord rêz dike. Ji ber ku hêmanên ne-peyv bandorê li ser şêweya wergirtina tekstê dikin, ji bo pêkanîna armanca wergerê ya hevtayiyê divê wergêr hêmanên ne-peyv li ber çav bigire. Analîza hêmanên ne-peyv agahiyên derbarê hokarên din ên navmetnî berdest dike. Her wekî Nord (rr. 121-122) destnîşan dike, hêmanên ne-peyv jî kultur-spesîfik in, lewre divê wergêr biryarê bide ka kîjan ji wan hêmanan di teksta armanca de biparêze, an jî di kîjanan de hin guherînan çê bike. Hêmanên ne-peyv, berevajî feraziyeyan, bi awayekî hêsan tên tespîtkirin. Di analîza hêmanên ne-peyv de wergêr divê tespît bike bê ka kîjan ji wan di tekstê de hene, fonksiyona wan çi ye, gelo hebûna wan têkildarî cureya tekstê ye û têkiliya wan rasterast bi çanda jêder re heye.

3.1.4.2.6. Peyvsazî

Nord (rr. 122-125) diyar dike ku peyvên di nav tekstekê de derbarê hokarên dermetnî û navmetnî agahiyên didin me û faktorên wekî mijar, naverok û şewazê zelaltir dikin. Peyv û bêjeyên nav tekstekê hem li gor hokarên navmetnî û hem jî hokarên dermetnî diyar dibin. Di nav hokarên navmetnî de mijar û naverok zêdetir bandorê li ser tercîha peyvên dikin. Hokarên dermetnî jî her yek li gor xwe bandorê li ser bijartina peyvên dikin. Hokarên dermetnî ne bi tenê çarçoveya bijartina peyv û bêjeyan diyar dikin, lê di heman demê de ew bi xwe jî bi awayekî rasterast an jî nerasterast di nav tekstê de cih digirin. Peyv û bêjeyên nav tekstê zanyariyên derheqê nivîskar dabîn dikin û têkiliya wê/î ya bi tekstê û niyeta wê/î nîşan didin. Nord ji bo kifşekirina niyeta nivîskar pêşniyaz dike ku wergêr di analîza xwe ya tekstê de bala xwe bide ser reseniya peyv û bêjeyan. Mecaz, şibandîna ku nivîskar bi kar tîne, devok û şewezarên taybet dibin palpiştên niyeta nivîskar. Wergêr bi analîza peyvsaziyê dikare taybetiya şewazgerî ya tekstê jî derxîne holê û li gor armancên xwe yê wergerandinê ji wan sûd wergire. Analîza hokara peyvsaziyê dê hem derfeta kifşekirina taybetiyên tekstê yê naverokî û şewazî bide wergêr û hem jî dê jê re bibe alîkar bê ka kîjan ji wan taybetiyan bi peyv û bêjeyên çawa di teksta armanc de bi kar bîne. Hokarên wekî dem, cih, navgîn û cureyên tekstan jî bandorê li ser bijartina peyvên a di tekstekê de dikin.

3.1.4.2.7. Hevoksazî

Nord (rr. 129-130) avaniya hevokî wekî hokareke giring dibîne û diyar dike ku bi rêya analîza hevokan daneyên têkildarî mijarê, kompozîsyona tekstê û taybetiyên raparçeyî bi dest dikevin. Her wisa hevoksaziya tekstekê derheqê niyeta nivîskar, navgînê û fonksiyona tekstê jî zanyariyan berdest dike. Wergêr dema ku avaniya hevokî ya tekstekê analîz dike bala xwe dide ser cure û dirêjîya hevokan, hevokên sereke û yê alîkar, hêmanên hevokê yê wekî gihanek, hoker û y.d. Analîza hevokan dibe bingeha şirovekirinê ji bo wergêr. Ji bo analîzeke berfireh a avaniya hevokî ya tekstekê, divê wergêr li teşeya hevokan û hevgerêdana wan a bi hev re binêre û bala xwe bide cureyên hevokan ên di tekstê de.

3.1.4.2.8. Taybetiyên Raparçeyî

Nord (rr. 131-132) hêmanên raparçeyî wekî taybetiyên tekstê pênase dike ku bi rêxistina peyv, hevok û paragrafan re têkildar in û di tekstekê de wekî nivîsên îtalîk, nivîsên qalind, nîşanekên dunikê, xêzek û parantezan derdikevin pêş me. Li gor Nordê (rr. 137-139) rola hêmanên raparçeyî ew e ku wergêr derbarê întonasyon û kirpandina tekstê dibe xwedî fikr, bi taybetî jî ji bo fêmkirina hokarên wekî naverok, mijar, feraziye û kompozîsyona tekstê rola wan giring dibe ji bo hin tekstan. Nivîskar piranî bi bikaranîna hin peyv, an jî bi sazkirina hevokan hewl didin helwesta xwe ya derbirînê nîşan bidin û bandorekê çê bikin, lê dema ku peyv an hevokan bi kar neyînin jî, wê gavê bi rêya kontekstê dixwazin bandorekê çê bikin ku ew jî bi taybetiyên grafîkî yên wekî îtalîk, nivîsara qalind, nivîsa binxêzkirî, dunik û tiştên din pêk tînin. Di analîza hêmanên raparçeyî de wergêr dikare bi pirsên wekî: 'kîjan taybetiyên raparçeyî di tekstê de hene?', 'gelo ew hêmanên raparçeyî aîdî taybetiya cureyî ne?', 'gelo întonasyon derbarê derûniya nivîskar fikrekê dide mirov?' û 'gelo adaptasyona hêmanên raparçeyî ya di zimanê armanc de pêwîst dike?' bi berfirehî rola vê hokarê diyar bike.

3.1.4.3. Bandora Tekstê ya Wekî Hokareke Wergêrê

Di modela Nordê de bandora tekstê ya li ser wergir xwedî roleke giring e û ji nêzik ve bi hokarên navmetnî û dermetnî re têkildar e. Piştî danasîna hokarên navmetnî û dermetnî pêwîst e ku em qala bandorê jî bikin ji bo ku modela Nordê baştir bê fêmkirin. Nord (rr. 143-144) bandorê wekî xasyeteke tekstê di çarçoveyeke wergir-navend de dinirxîne û diyar dike ku xwîner li gor zanyariyên xwe yên heyî û li gor bendewariyên xwe form û naveroka tekstê werdigirin. Xwîner li gor faktorên navmetnî û hêviyên xwe yên derveyî tekstê derheqê tekstê de dibin xwedî fikr û helwest. Bandora tekstê ya li ser xwîner di encama pêvajoya ragihanê de pêk tê û gelek faktor di vê bandorê de xwedî rol in. Nord bandorê li dor têkiliya hevpar a hokarên dermetnî û navmetnî dinirxîne û gelek sedem û taybetiyên bandorê rêz dike. Di nav wan hokaran de ku bi awayên cur bi cur têkildar dibin û bandorê çê dikin, Nord (rr. 144-149) bi taybetî balê dikişîne ser 1) têkiliya niyet û tekstê, 2) têkiliya wergir û cîhana-tekstê, 3) têkiliya wergir û şewazê. Di babeta bandorê de *niyeta nivîskar* xwedî roleke esasî ye, lewre nivîskar li gor bandora ku dixwaze tekstê jî wisa saz dike da ku tekstê vê niyetê pêk bîne. Helbet pîvandina pêkhatina bandorê tiştêkî cuda ye, lê ji bo mijara wergerê

giringiya vê qada bandorê ew e ku wergêr dikare di çarçoveya têkiliya niyeta nivîskar û tekstê de bifikire ka gelo teksta ku wê/î bi rêya wergerê hilberand(îye) dê li gor armanca (skopos) wergerê bandorekê li ba xwînerê armancê bike. Wergêr bi tercîhên xwe yê zimanî armanc dîke ku bandorê li ser xwînerê bike û ji bo ku derbarê bandora muhtemel de bibe xwedî fikr, lazîm e xwe bixê şûna xwînerê û bi çavê xwînerê li tekstê binêre.

Têkiliya duyem a derheqê bandorê de ku Nord balê dikişîne ser têkiliya *wergir û cîhana-tekstê* ye. Li gor Nordê (rr. 145-147) xwînerê cîhana nav tekstê bi hêvî û zanyariyên xwe berawirdî hev dîke û bi vî awayî têkiliyek navbera xwînerê û cîhana-tekstê çê dibe. Nord vê rastiye jî diçespîne ku mijarek spesîfîk bi xwe re ihtimala şeweyeke bandorê jî derdixe holê, an ku mijarek wekî tabû xwîneran şaşmatî dîke, mijareke populer xwîneran dilxweş dîke û mijareke sosret jî piranî bala xwîneran tûj dîke. Nord naveroka tekstê jî bi heman awayî dinirxîne û bandora tekstê bi hûrgiliyên naverokî yê nav tekstê ve girê dide. Di vê niqteyê de bandor li gor tercîhên nivîskarê derbarê hûrgiliyan çê dibe. Nord feraziyan jî di têkiliya wergir û cîhana-tekstê de wekî hokareke giring dibîne. Li gor wê lazîm e ku wergêr zanyariyên ku xwînerê armanc nikaribin bi awayekî ferazî bizanin jî veguhezîne. Nord wekî xaleke giring destnîşan dîke ku di wergerê de navbera cîhana-tekstê û bendewariyên wergirê her tim ferqek çandî, demî û mekanî heye ku divê wergêr wê mesafeyê kurt bike. Eger ferqên navborî zêde bin, hingê bandora teksta jêder û ya armancê dê zêdetir ji hev cuda dibin.

Têkiliya sêyem a ku Nord (rr. 147-149) destnîşan dîke têkildariya navbera *wergir û şewazê* ye. Nord bandora tekstê ya li ser xwînerê bi taybetiya wê ya şewazî ve girê dide, an ku şeweya vegotinê û retorîka tekstê bandora wê ya li ser xwînerê jî diyar dîke. Lewre, giring e ku wergêr hêmanên retorîkê û fonksiyonên wan ên di nav çandekê de bizane da ku têkiliya wan a bi tekstê û bandora tekstê re bikare çê bike. Bi rêya analîza şewaza tekstê wergêr, wekî wergirê tekstê, hem derbarê niyeta nivîskarê de dibe xwedî fikr û hem jî pêwendiya niyeta nivîskar, şewazên vegotinê û bandora muhtemel diyar dîke. Nord balê dikişîne ser vê yekê ku hokarên ku bandoreke şewazî pêk tînin, ên wekî peyv, hevok û hêmanên raparçeyî, divê bi awayekî pêwendîdar bînin nirxandin, ji ber ku bandora tekstê û wergirtina tekstê bi têkiliya wan a temamker çê dibe.

Nord bandorê bi sê cureyan disenifîne (rr. 149-150). Cureya yekem: *bandora biqestî dijî ya bêqestî* (intentional vs. non-intentional), cureya duyem: *dûrahiya çandî dijî nebûna-dûrahiyê*, cureya sêyem: *edetîbûn dijî reseniyê*. Piştî analîzeke bi pêwendiya hokarên dermetnî û navmetnî wekî bandor du encam bi dest dikevin. Bandora yekem a ku tekst diafirîne di rastiye de heman bandor e ku nivîskar niyet kiriye û ew dibe bandora biqestî. A duyem jî bandorek ji ya nivîskar niyetkirî cudatir e ku derveyê qesta nivîskar derdikeve holê. Nord destnîşan dike ku bandora rastiya ku nivîskar di tekstê de rave dike, girêdayî *dûrahiya çandî* ye. Ji hêla dûrahiyê ve, li gor Nordê sê rewş derdikevin holê. Di rewşa yekem de cîhana teksta jêder, an ku rastiya tê de, li gor xwînerên teksta jêder e (nebûna dûrahiya çandî), lê ji bo xwînerê teksta armanc tiştekî dîr e (dûrahiya çandî), lewre jî di navberê de dûrahiyeke çandî heye. Di rewşa duyem de rastiya nav teksta jêder ji bo xwînerên teksta jêder jî biyanî ye, lewre nivîskar ji bo xwînerên jêder jî hin tiştan eşkere dike. Di rewşa sêyem de cîhana tekstê wekî bingeş ji çanda jêder were jî, nivîskar hêmanên çandî di berhemê de nêtar kirine. Di vê rewşê de hêmanên kultur-spesîfik kêmtir dibin û bandora tekstê ji bo xwînerê jêder û yê armanc dibe sifir/bê dûrahî. Cureya sêyem, *edetîbûn dijî reseniyê*, têkildarî xwîner û şewaza tekstê ye. Şewazên edetî yên cureyî bandorên binas û texmînkirî derdixin holê. Ji hêla din ve jî, şewazgeriya ku zêdetir girêdayî afirînerê tekstê ye dê bi xwe re bandorên resen derxîne holê.

3.1.5. Kêşeyên Wergerê

Li gor Nordê (rr. 167-171) wergêr her çi qas xwedî şiyânên zimanî, çandî û teknîkî be jî, di pêvajoya wergerê de bivê nevē rastî kêşeyan tê. Ev jî kêşeyên wekî tekst-spesîfik, kêşeyên girêdayî wergêr, kêşeyên pragmatîk û kêşeyên teknîk in. Nord bi wan tespîtên xwe jî kêşeyên wergerê wekî çar kategorî disenifîne: a) kêşeyên wergerê yên pragmatîk, b) kêşeyên wergerê yên edetî/çandî, c) kêşeyên wergerê yên lînguîstîk, d) kêşeyên wergerê yên xweserê-tekstê. Nord (rr. 174-175) derbarê *kêşeyên wergerê yên pragmatîk* de diyar dike ku tekst bi armancên cuda dikarin ji bo zimanê din bî wergerandin, ji ber vê sedemê jî ji hêla rewşa ragihanê ve hin nakokî derdikevin holê. Ev jî ji ber rewşên cuda yên navbera wergirên teksta jêder û teksta armanc, motîva nivîsîna teksta jêder û motîva wergerandinê, cudatîyên fonksiyona teksta jêder û teksta armanc çê dibin. Nord

kêşeyên bi vî rengî wekî kêşeyên wergerê yê pragmatîk bi nav dike û ji bo tespîta wan analîza hokarên dermetnî pêşniyaz dike.

Nord (rr. 175-176) cudatîyên navbera çandan wekî bingeha *kêşeyên wergerê yê kultur-spesîfik* pênasê dike û wan bi edet, nerît û normên çandî ve girê dide. Kêşeyên wergerê yê kultur-spesîfik wekî nerîtên cureyî, nerîtên şêwazgerî an jî wekî hêmanên çandî yê spesîfik di tekstan de xuya dibin. *Kêşeyên wergerê yê lînguîstîk* ji ber cudatîyên avaniya zimanî, bi taybetî jî di asta peyv û hevokan de, derdikevin holê. Nord jêdera kêşeyên wergerê yê lînguîstîk bi tenê di yek zimanî de nabîne, lê di têkiliya zimanî ya bi rêya wergerê de wekî tiştekî xwezayî dinirxîne. Li gor Nordê, çareseriyêke giştî ya wan kêşeyan tune ye, lê wergêr ji hêla fonksiyona tekstê û rewşa wergir ve divê wan kêşeyan li ber çav bigire. Nord kêşeyên ku li derveyî yê pragmatîk, kultur-spesîfik û lînguîstîk dimînin tev wekî *kêşeyên tekst-spesîfik* bi nav dike, lewre ew pirsgerêk di çarçoveya tekstekê de hene. Bikaranîna hin peyvên û çêkirina peyvên nû mînakên kêşeyên bi vî rengî ne.

3.1.6. Rexneya Wergerê

Nord (rr. 179) destnîşan dike ku wekî edetî pirtûkek werger her wekî pirtûkek resen tê xwendin û çî dema ku dahûrînek derbarê wergera pirtûkê de tê kirin jî piranî ew li gor normên zimanî û edebî yê çanda armanc çê dibe. Bi awayekî din mirov bibêje, tiştê ku tê nirxandin berhema wergerandî ye. Nord her çî qas modela xwe ya analîzê ya li gor hokarên dermetnî û navmetnî ji bo analîza teksta armanc guncav bibîne jî, qîma xwe bi analîzeke yekalî nayne. Li gor wê, rexneyêke wergerê ya objektîf divê hem teksta jêder û hem jî teksta armanc bi awayekî berawirdî analîz bike, cudatî û manendiyên wan destnîşan bike û proseya wergerê û stratejiyên ku hatine bikaranîn rave bike. Dîsa jî Nord (r. 180) berawirdkirineke bi vî rengî ya teksta jêder û teksta armanc bi têrê nabîne, lewre eger berawirdkirin bi tenê di asta zimanî û şêwazî de bimîne, eger armanc û metodên wergerê nenirxîne û şertên derveyî yê ragihanê li ber çav negire, vê çaxê ew nabe rexneyêke tam.

Nord (rr. 180-181) ji bo rexneyêke îdeal wekî pîvan destnîşan dike ku divê tê de hem analîz û nirxandina proseya wergerê û armanca wergerê hebe û hem jî nirxandina teksta armanc û fonksiyona wê ya ji bo armanca wergerê bê kirin. Di

modela Nordê de rexneya wergerê bi berawirdkirina teksta jêder û teksta armanc dest pê dike. Bi vê berawirdkirinê rexnegir derbarê proseya wergerandinê de dibe xwedî fikr, helwest û stratejiya wergêr dibîne û heta dikare armanca wergerandinê jî şirove bike. Li gor Nordê (r. 182) di rexneya wergerê de berî her tiştî pêwîstî bi çarçoveyeke teorîk û bijartina pîvanên nirxandina wergerê heye. Ji bo kifşekirina referansên teorîk û pîvanên rexneyê, rexnegir an bala xwe dide nîşe û danezanên wergêr ên wekî pêşgotin û y.d., an jî eger ew referans, tercîh û pîvanên wergêr êşkere nehatibin diyarkirin jî, divê li gor analîzên xwe pêşbîniya tercîh û stratejiyên wergêr bike û hevgeriya wan li gor berawirdkirina teksta jêder û teksta armanc pêk bîne. Wekî rêya sêyem jî rexnegir/analîzkar divê li gor armanca wergerê (skopos) ya diyarkirî rexneya wergerê bike.

Nord (rr. 182-183) pêvajoya rexneya wergerê bi analîza teksta armanc a li gor modela xwe dide destpêkirin, an ku ji dawiyê ber bi destpêkê vedigere. Di vê analîza teksta armanc de rexnegir dê bala xwe bidê ka teksta armanc li bermaberî vê rewşa ragihanê tê ya ku ew ê tê de bibe xwedî fonksiyon. Ji bo rexnegir tiştê giring ev e ku tekst bi rewşa heyî bigunce, di çarçoveya armanca wergerê de fonksiyona xwe bi cih bîne û ev fonksiyon jî bi faktorên dermetnî re li hev bê. Nord di tu qonaxa rexneya wergerandinê de giringiyêke taybet nade tespîta xeletiyên wergerandinê. Tiştê esasî ya rexnekirinê ya di modela Nord de pêkanîna tekstê ya fonksiyon û bandora armanckirî ye.

Piştî ku rexnegirê wergerê bala xwe da teksta armanc û têkiliya wê ya rewşa ragihanê û fonksiyona wê ya wekî tekst kifşe kir, Nord (rr. 183-184) di qonaxa duyem de pêwîst dibîne ku ew hewl bide derbarê armanca, metod û helwesta wergêr a çareserkirina pirsgirêkên wergerê de bibe xwedî agahî. Rexnegir dikare ji pêşgotinên wergêr an jî edîtor hin zanyariyan di vê mijarê de bi dest bixe. Dibe ku tu zanyariyên êşkere tunebin, wê demê rexnegir dest bi analîza teksta jêder dike da ku hin rêgez û pîvanên sergirtî yên neqlkirina teksta jêder a ber bi teksta armanc kifşe bike. Eger rexnegir armanca wergerê ya êşkera bi dest xistibe, analîza xwe ya teksta jêder li gor armanca wergerê û biryarên wergêr ên êşkerebûyî dike. Eger armanca û pîvanên wergerandinê êşkere nebin jî, rexnegir hewl dide bi berawirdkirina teksta armanc û teksta jêder pîvan, metod û tercîhên wergêr ên sergirtî fêm bike. Piştî ku rexnegir hem teksta jêder analîz kir û hem jî bala xwe da ser rewşa armanca, dibe ku di encamê de metoda wergêr kêrhatî

nebîne. Di rewşek wiha de, rexnegir divê ji ber tercîha wê/î wergêr tawanbar neke, li şûna wê dikare li kêleka tercîha wergêr pêşniyaza xwe pêşkêş bike ji bo berawirdkirinê.

3.1.7. Têkiliya Fonksîyonalîzmê û Wergera Edebî di Modela C. Nordê de

C. Nord di berhema xwe de ya bi navê *Translating as a Purposeful Activity, Functionalist Approaches Explained* (1997) bi hûngilî behsa têkiliya fonksîyonalîzmê û wergera edebî dike û vê têkiliyê jî li dor modela xwe ya analîza tekstê û hokarên wê yên sereke rave dike. Li jêr em ê vê berhema navborî referans bigirin û nêrînên Nordê bi kurtî pêşkêş bikin. Nord balê dikişîne ser xasyetên cuda yên ragihandina edebî û taybetiyên wê şirove dike. Li gor Nordê (1997: 80-81) şanderê teksta edebî nivîskar e û bi awayekî eşkere navê nivîskêr li ser berhemê tê diyarkirin. Eşkerêbûna navê nivîskêr jî bandorê li ser rewşa wergirtinê û hêviyên xwîneran çê dike. Niyeta nivîskaran di tekstên edebî de bi awayên cur bi cur xuya dibin bes ev niyet bi vegotîneke derbirînî û di çarçoveya cîhanê pevbextî de diyar dibin. Wergirên tekstên edebî xwîner in û xwîner jî xwedî hêvî û bendewariyên spesîfîk in. Her çî navgîna teksta edebî ye, berhemên edebî piranî nivîskî ne. Derbarê hokarên wekî cih, dem û motîvê de jî Nord (r. 81) destnîşan dike ku ew hokar her çî qas taybetiya teksta edebî û ya ne-edebî nîşan nedin jî, di wergerê de ji bo diyarbûna ferqa çanda jêder û çanda armanc a ji hêla dem, cih û motîvê ve rola wan girîng e. Peyama teksta edebî jî gelek caran xwedî xasyeteke pevbextî ye. Her wisa peyama di tekstê de li gor nerîta cureyî û edetên din ên edebî xuya dibe û bi awayekî jî niyet an jî niyetên nivîskar dide kifşê.

Nord (rr. 82-84) bi taybetî balê dikişîne ser bandor û fonksîyonê, her ku cudatiya teksta edebî ji hêla wergerê ve pênase dike. Li gor Nordê, edebîtiya tekstê çî bi mijara berhemê be, çî bi koda edebî ya bijartî û çî jî bi nerîta zimanî re têkildar be, tiştê teqez ew e ku teksta edebî bandoreke poetîk û estetîk li ser xwînerê xwe çê dike. Ev bandor jî dibe bandora spesîfîk a tekstê û her wisa dibe fonksîyona tekstê ya edebî. Bi vê bandorê qîmeta edebî ya tekstê çê dibe û li ser vê bandorê têkiliyeke edebî navbera nivîskar û xwîner saz dibe. Nord edebîtiyê wekî nirxeke pragmatîk dibîne ku bi lihevhatina niyeta nivîskar a bi hêvî û bendewariyên xwîner çê dibe. Her çî qas niyeteke kifşe ya nivîskar û ya berhemê tune be jî, ji bo ku wesfê edebî yê berhemê çê be, divê bandor û fonksîyonek

têkildarî berhemê di pêvajoya xwendinê de bê afirandin. Hin nîşandekên edebî, wekî mînak senifandina berhemekê, di çêbûna bandor û fonksiyona edebî de kartêker in. Berhem bi berga xwe wekî helbest, çîrok an roman tê senifandin û xwîner jî li gor tecribeyên xwe yê xwendinê berê nêzikî berhemê dibe û hin bendewarî pê re çê dibin. Bi saya wan tecribeyên pêş, dema ku xwîner tekstekê dixwîne, jixwe hin bandor li ser çê dibin. Di çêbûna bandora edebî de niyeta xwîner û bendewariyên werger xalên esasî ne û ew di çarçoveya tekstê de li gor nirxên çandî û xasyetên cureyî û edebî teşe digirin.

Nord (r. 84) wergera edebî wekî ragihaneke navber-çandî (cross-cultural) bi nav dike û vê ragihandinê jî bi çar tîkiliyên bingeîn şirove dike: a) *têkiliya navbera niyeta şander/nivîskar û tekstê*, b) *têkiliya navbera niyeta şander/nivîskar û bendewariya wergir/xwîner*, c) *têkiliya navbera şander û wergir*, d) *têkiliya navbera wergir û tekstê*. Derbarê *têkiliya navbera niyeta şander/nivîskar û tekstê* de Nord (r. 85) dide zanîn ku nivîskarê (şander) teksta resen a edebî armanc dike ku bandorekê li ser wergir/xwîner çê bike û teksta xwe jî li gor vê armancê dinivîse. Di wergerê de, berpirsiyariya raguhestina niyeta nivîskar dikeve ser milê wergêr, an ku nivîskar niyeta xwe dike tekst û wergêr jî vê niyetê ji nû ve û bi zimanekî din dinivîse. Îcar, kêşeya sereke ev e ku di berhemên edebî de kifşekirina niyeta nivîskar ne hêsan e û berhemên edebî jî ji hêla wate û referansan ve tekstên ne zelal in. Dîsa jî, li gor Nordê hêmanên zimanî, şêwaz û nîşandekên temayî dibe ku bibin alîkar ji bo kifşekirina niyeta nivîskar. Nord ji ber rewşa taybet a wergerê, destnîşan dike ku şiroveya wergêr a tekstê dikeve şûna niyeta şander/nivîskar, lewre xwînerên zimanê jêder ên ku haya wan bi teksta resen tune ye, niyeta ku di wergerê de tê pêşberî wan wekî niyeta teksta resen dipejirînin.

Derbarê *têkiliya navbera niyeta şander/nivîskar û bendewariya wergir/xwîner* de Nord (r. 86) diyar dike ku di rewşa îdeal de haya nivîskar bi paşxaneyê zanyariyên xwînerên xwe heye û niyeta xwe jî li gor vê yekê di tekstê de bi cih dike. Bi vî awayî jî fonksiyona tekstê û niyeta nivîskar dibe heman tişt. Bi heman awayî, dema nivîskar tekstekê dinivîse zanyariyên xwînerên xwe, çanda wan û hîsiyata wan li ber çav digire û lewma jî hin tiştan bi awayekî sergirtî, ferezayî qal dike. Îcar, ji ber ku zanyarî, çand û civaka xwînerê jêder û xwînerê armanc cuda ye, di wergerê de ew cudahî ji bo tîgihîştinê dibe sedema kêşeyan. Her çî qas bi jêrnotan wergêr bikare valahiya agahiyan temam bike jî, dîsa jî ev

yek bi tamamî çareser nabe. Di dawiyê de, wekî encama wergerê, fonksiyona teksta wergerandî li ser bingeha şiroveya wergêr û li gor paşxaneya çandî û bendewariyên xwînerên armanc teşe digire.

Nord (rr. 86-87) di berhemên edebî de *têkiliya navbera şander û wergir* wekî *têkiliya navbera pevbestinê* (fiction) û *cîhana rasteqîn* pênase dike û ji hêla wergerê ve balê dikişîne ser hin taybetiyan. Her ku berhemên edebî xwedî rastiyan xweserê xwe ne ku piranî dûrî rastiya cîhanê ne, wergêr divê hem di çarçoveya çanda jêder de û hem jî di çarçoveya çanda armanc de cudatiya cîhana tekstê û cîhana rasteqîn li ber çav bigire. Hin tekst hene ku di esasê xwe de dekulaturalîze bûne û ji hêla xasyetên wekî dem û cih jî dibe ku nediyar bin. Ji ber vê yekê jî, Nord di vê fikrê de ye ku hem di teksta jêder de û hem jî di teksta armanc de têgihîştina xwîner a derbarê cîhana tekstê girêdayî zanyariyên wan û paşxaneya wan a çandî ye.

Derbarê *têkiliya navbera wergir û tekstê* de Nord (r. 88) dide kifşê ku berhemên edebî ji bilî hêmanên şewazê di heman demê de xwedî hêmanên wekî karakter, fikr, atmosfer û derbirînên ciyawaz in û ew hêman jî li gor taybetiyên çandî watedar dibin. Lewre wateya wan û bandora wan a li ser xwînerê jêder û xwînerê armanc jî nabe yek. Ji ber vê çendê, wergêr her çi qas hêmanên şewazgeriyê yên ku nivîskar bi kar anîne di wergera xwe de bike pîvan jî, dîsa jî dibe ku heman bandora edebî dernekeve holê. Hêmanên edebî yên edebiyata armanc û edebiyata jêder bi şertê ku xwedî heman nerîta edebî bin, heman bandorê li ser xwîner çê dikin.

Ji bo Nordê, hevsenga fonksiyonê û bandorê pir girîng e di ragihana edebî ya navber çandî (cross-cultural) de û ew vê hevsengê bi têgiha hevtayiyê li gor xwe şirove dike. Li gor Nordê (r. 89) di wergera edebî de ji wergêr tê hêvîkirin ku hevtayiyekê di navbera teksta jêder û teksta armanc de ji hêla fonksiyona tekstê û bandora tekstê ve saz bike. Lê sazkirina hevtayiyê bi vî rengî hin şert û mercan pêwîst dike ku Nord (rr. 89-93) wan di bin çar sernavan de wekî çar pêwîstekên hevtayiyê (equivalence requirement) formule dike û wan pêwîstekên hevtayiyê bi hin pêwîstekên nû yên li gor ranêzikiya skoposê berawirdî hev dike. Ev çar sernav jî bi dorê *Şirovekirina Tekstê* (interpretation), *Fonksiyona Tekstê*, *Dûratiya Çandî* û *Bandora Tekstê* ye.

Di mijara *Şirovekirina Tekstê* de, Nord pêwîsteka hevtayiyê wiha formule dike: "Divê şiroveya wergêr her wekî niyeta şander/nivîskar be" (r. 89). Lê Nord vê pêwîstekê li gor wergereke xwedî armanc wiha formule dike: "Wergêr tekstê ne bi tenê li dor niyeta şander/nivîskar şirove dike, lê belê ew lihevhatina tekstê ya bi rewşa zimanê armanc jî li ber çav digire (r. 92). Ji vê formulekirina nû jî xuya dibe ku ranêzikiya Nord ji nêrîna wê ya edebî ya armanc-navend derketiye holê. Nord hevtayiya ji hêla *Fonksiyona Tekstê* ve wiha formule dike: "Divê wergêr niyeta nivîskar wisa bîne ziman ku teksta armanc bikare di çanda armanc de heman fonksiyonê pêk bîne ku teksta jêder di çanda jêder de kariye pêk bîne" (r. 90). Nord di jwariya pêkanîna heman fonksiyonê destnîşan dike û vê pêwîstekê jî wekî: "Divê teksta armanc bi awayekî wisa saz bibe ku fonksiyonên wê yên di rewşa armanc de li niyeta nivîskar bigunce" (r. 92) formule dike. Îcar, wergêr dê biryarê bide bê ka kîjan fonksiyonên teksta jêder li gor niyeta nivîskar di teksta armanc de temsîl bike.

Wekî sernavê sêyem ê derbarê hevtayiya edebî de Nord *Dûratiya Çandî* dinirxîne û hevtayiya îdeal a ku tê hêvîkirin wekî: "Wergir/xwînerê armanc divê cîhana teksta wergerê wisa fêm bikin ku ev fêmkirin wekî ya wergir/xwînerên jêder ên teksta jêder be" (r. 90). Nord di jwariya pêkhatina hevtayiyêke bi vî rengî destnîşan dike, lewre mesafeya xwînerên jêder û yên armanc ne mimkun e ku bi heman awayî be. Ji ber vê çendî, Nord di mijara dûratiya çandî de jî hevtayiyê li gor ranêzikiya skoposê ji nû ve pênase dike: "Cîhana teksta wergerê divê li gor fonksiyona ku di teksta armanc de tê hêvîkirin bê bijartin" (r. 92). Ji vê nêrînê jî xuya dibe ku wergêr dikare di teksta armanc de li gor bendewariyên xwîneran û li gor armanca wergerê hin hêmanên çandî paşguh bike, an jî hinekan bi jênot û agahdariyên xwe zelaltir bike. *Bandora Tekstê* xala çarem a hevtayiyê ye ku Nord wê di rewşa îdeal de wekî: "Bandora wergerê ya li ser xwînerên xwe divê her wekî bandora teksta jêder be ku li ser xwînerê jêder pêk hatiye" (rr. 92-93). Nord (r. 93) vê hevtayiyê jî pêkan nabîne û li şûna vê, bi tenê lihevhatina bandora teksta armanc û fonksiyonên teksta armanc ên tîn hêvîkirin derdixe pêş û diyar dike ku divê wergêr hêmanên tekstê wisa bibijêre ku bandora teksta armanc û fonksiyonên wê li hev biguncin.

3.2. Dahûrandina Nimûneyên Wergerên Kurdî Bi Modela C. Nordê

Christiane Nordê modela xwe ji bo ku bi kêrî dahûrandina hemû cure tekstan were çê kiriye û bi awayekî berfireh hemû kêşeyên muhtemel ên ku di pêvajoya wergerê de derdikevin holê li ber çav girtiye. Ev modela dahûrandina tekstê hem ji bo wergêr û hem jî ji bo rexnegirên wergerê rêbazeke kartêker e. Wergêr berî ku dest bi wergerandina berhemekê bike, dikare bi rêya hokarên analîzkirinê berhemê nas bike û li gor rêgezên vê modelê jî stratejî û armanca xwe ya wergerê kifşe bike. Model, ji bo rexnegir û dahûrînerên wergeran jî derfetên berfireh ên berawirdkirin û rexneyê pêşkêş dike. Modela *analîza tekstê ya werger-navend* her çî qas wekî model xwedî pîvanên kifşe be jî, ev rêbaz dahûrîneran sînordar nake, berevajî vê, ji wan re derfeta hin tercîh û însiyatîfan çê dike da ku tekstê şirove bikin. Ji bilî vê jî, çarçoveya modela *analîza tekstê ya werger-navend* ji bo dahûrandineke sistematîk karê dahûrîneran hêsan dike û wan ji xeletiyên têkildarî rêbazê dûr digire.

Modela Nordê di dahûrandina tekstên edebî de jî derfetên cihê çê dike û îmkana bidestxistina encamên giştî û taybetî dide lêkolîneran. Ev model dibe ku ji bo nirxandina mijarên teorîk, ji bo diyarkirina normên giştî yê wergerê û niqaşkirina kêşeyên polîtîk û îdeolojîk ên têkildarî edebiyat û wergerê bersiva pirsên lêkolîneran bi awayekî têr û tijî nede. Dîsa jî, rêbaza dahûrandinê ya vê modelê ji bilî dabînkirina encamên li dor berawirdkirina tekstan a li gor fonksiyon, bandor û armanca wergerê, di heman demê de rê li pêş nirxandinên derbarê mijarên edebiyatê bi xwe jî vedike. Îcar, di mînaka wergera berhemên edebî ya ber bi Kurdî de, bi diyarkirina armanca wergerê lêkolîner dikarin armancên edebî yê aktorên wergera Kurdî û pêkhatina wan armancan destnîşan bikin. Bi rêya dahûrandina hevtayîya edebî îmkân çê dibe ku dahûrîner rewşa temsîla edebî ya ziman û edebiyata Kurdî kifşe bikin. Ji bilî wan jî, bi vê modelê rexneya edebî ya wergerên Kurdî û pozisyona wergerê ya di nav edebiyata Kurdî de jî dikare bê şirovekirin.

Ji bo dahûrandinê me neh tekstên edebî bijartin ku hin ji wan berhemên tam in û hin jî beşên berheman in. Nimûneyên me yê helbest, çîrok, fabl û meselê tekstên serbixwe ne, lê belê ji bo cureya roman, şanoname û cerebeyê ji ber dirêjîya berheman me beşeke wan berheman wekî teksta dahûrandinê bijart. Dahûrandina nimûneyan li ser esasê berawirdkirina **teksta jêder** (ji vir û pê de

TJ) û **teksta armanc** (ji vir û pê de **TA**) pêk tê. Di dahûrandina wan nimûneyan de, her wekî rêbaza ku Nord pêşniyaz dike, li destpêkê em jî di çarçoveya heşt hokarên dermetnî de dorhêla nivîsandina berhemê û têkiliya wê ya bi nivîskarê wê re diyar dikin. Bi analîza hokarên dermetnî em niyeta nivîskar, fonksiyona tekstê û taybetiyên wê yên wekî cih û dem kifşe dikin. Piştî ku li gor taybetiya tekstê hokarên navmetnî yên ku di tekstê de hene tên nirxandin, wê demê îmkana tespîtkirina tercîhên wergêr û armanca wergerê jî çê dibe. Bi vî awayî, bi rêya tespîta armanca wergerê û tercîhên wergêr, bingeha nirxandina hevtayiya edebî saz dibe. Daneyên rexneya wergeran jî di ser armanca wergerê, tercîhên wergêr û daneyên hevtayiyê re bi dest dikeve.

Di dahûrandina berhemên wergerê de, modela Nordê tekstê wekî keresteya lêkolînê bi kar tîne, lê belê wekî rêbaz têkiliya tekstê ji beşên din nabire. Ev model bi rêya hokarên dermetnî û navmetnî derfetê dide dahûrîneran da ku karibe têkiliya teksta heyî bi beşên din re jî dayne. Wekî nimûne, bi rêya dahûrandina hokarên dermetnî niyet û motîva nivîskar a nivîsînê xuya dibe û ev jî derbarê tekstê û fonksiyona wê de fikreke giştî ya têkildarî berhemê kifşe dike. Her wisa bi dahûrandina hokarên navmetnî yên wekî mijar, kompozîsyona tekstê, peyvsazî û hevoksazî jî agahiyên derbarê têkiliya tekstê ya bi beşên din re bi dest dikevin. Di nav keresteyên xebata me de jî tekstên ku me bijartine wekî mînak, wergera *Sone 10*, çîroka *The Gift of the Magi* (Diyariya Sersalê), fabla *Lion's Share* (Şêr û Parvekirin) û mesela *God* (Xweda) bi tekstên din re ku di heman berhemê de cih digirin ji nêzik ve têkildar in. Her wisa, beşa 1em a romana *The Animal Farm* (Çewlika Heywanan), sehneya yekem û sêyem a şanonameya *Macbethê* û beşa 5em a cerebeyê *A Room of One's Own* (Odeyek Ji Bo Xwe) jî ji hêla naverok û şêwazê ve girêdayî berhema bingeîn in. Her çî qas îhtimala guherîna stratejî û helwesta wergêr hebe jî, bi giştî wergêr di pêvajoya wergerandinê ji bo heman berhemê û şêwaza kifşe ya nivîskaran dibin xwedî heman helwestê û kêma an jî zêde stratejîyên wekî hev bi kar tînin.

Xulasa, di vê xebatê de modela Nordê bi du awayan bi mijara me ya lêkolînê re têkildar dibe. Ya yekem, her ku Nordê modela xwe li ser armanca wergerê, fonksiyona wergerê û bandora wê ava kiriye, bi rêya bikaranîna vê modelê derbarê armanc, fonksiyon û bandora wergerê ya di edebiyata Kurdî de îmkanên nirxandinê jî çê dibin. Jixwe armanc, fonksiyona wergerê û bandora wê

ya edebî jî wekî sê xalên sereke di xebat û hewldanên wergera Kurdî de timî di rojevê de bûne. Ya duyem jî, dahûrandina nimûneyên wergerên Kurdî ya bi rêya modela Nordê dê dibe mînakeke lêkolîna wergerê û di encamê vê lêkolînê de jî daneyên şênber ên nirxandinên nû dê berdest bin. Bi vî awayî jî, ji aliyekê ve çarçoveya teorîk a modela Nordê bi kêrî nirxandina rewşa wergera Kurdî tê, ji aliyê din ve jî rêbaza dahûrandinê ya vê modelê dibe nimûneyeke sepandina teoriyekê ya li ser nimûneyên wergerên Kurdî. Bi rêya têkildarkirina vê modela teorîk û sepandina wê ya li ser nimûneyên wergerên Kurdî, hem îmkanên gihîştina bi encamên rasterast ên derbarê tekstên werger û hem jî îmkanên encamên giştî yê ku meyla wergerê di edebiyata Kurdî de diyar bikin, bi dest dikevin.

3.2.1. Tekst 1.

Cureya Edebî: Helbest/Sone.

Navê helbestê: Sonnet 10 – Sone 10.

Nivîskar/Helbestvan: William Shakespeare (1564-1616).

Wergêr: Kawa Nemir.

Teksta Jêder: The Complete Sonnets and Poems, William Shakespeare, Oxford University Press Inc., New York, 2002.

Teksta Armanc: Hemû Soneyên William Shakespeare, Wer.: Kawa Nemir, Weşanên Lîs, 2010.

Teksta Jêder	Teksta Armanc
<p>Sonnet 10</p> <p>For shame deny that thou bear'st love to any, Who for thyself art so unprovident. Grant, if thou wilt, thou art beloved of many, But that thou none lov'st is most evident: For thou art so possessed with murd'rous hate That 'gainst thyself thou stick'st not to conspire, Seeking that beauteous roof to ruinate, Which to repair should be thy chief desire. O, change thy thought, that I may change my mind: Shall hate be fairer lodged than gentle love? Be as thy presence is, gracious and kind, Or to thyself at least kind-hearted prove: Make thee another self for love of me, That beauty still may live in thine or thee.</p>	<p>Sone 10</p> <p>Heyf! Tu nakî yekî bi evîna xwe baqî kî, Te wisa berê xwe girtiye, gidiyo, ne heyf? Tê bidî bide, te pîrr kirin Mela û Feqî, Lê pîrr eyan e, li ser wan miriyan dikî keyf; Ay tu ew çend bûyî êxsîrê kindariya kuj, Xwe deka mirina xwe danî, ne xema te ye. Dikî wê rindiyê bikî kavi, çavo birij, Li şûna ku wê çak bikî, hê ku dema te ye. Were biguheze hizra xwe, ez jî vangêr bim! Qey kîn xweştir e li şûna evîna nazenîn? Tu bî, xwe be, bibe ciwan û dilovan her tim, An jî qe nebe li xwe zulmê neke bi zanîn: Xweyeke din çêke li ser xatirê evîna min, Bila ew rindî bi wê an te re bijî hemin.</p>

3.2.1.1. Analîza Hokarên Dermetnî

Şander: Nivîskarê soneyan W. Shakespeare (1564-1616) helbestvan û şanonûsekî Îngilîz e. Li Stratford û Londonê jiyaye. Bi qezenca xwe ya di karê şangoriyê de jiyaneke dewlemend derbas kiriye. Derbarê jiyana wî de agahiyên salên pêşîn kêr û biguman in lê piştî sala 1592yan derbarê kariyera wî de agahî

hene. Navûdengiya W. Shakespeare zêdetir ji xebatên wî yên dramayê tê, lê belê Soneyên wî jî di wêjeya cîhanê de deng dane. Ji bilî helbestan, wî bi tevahî 38 listik û 154 jî sone nivîsîne (Shakespeare, 2002) ku ji bo bi dehan zimanên cîhanê hatine wergerandin. Ji bilî navûdengiya Shakespeare û berhemên wî, her wisa şêwazek bi navê Shakespearî jî bandor li edebiyata cîhanê kiriye. Lêkolîner û pisporên edebiyata Îngilîzî soneyên Shakespeare ji hêla hostatiya wî ya helbestvanîyê ve nixandine û her wisa pisporên qadên cuda jî sone ji bo bidestxistina encamên derbarê kesayeta wî û fikr û baweriyên wî şirove kirine.

Niyeta Şander: Soneyên Shakespeare wekî neynika hest û ramanên wî tên qebûlkin. Shakespeare wekî şairekî romantîk bi rêya soneyan hest û nêrînên xwe yên derbarê temayên wekî evîn, hesûdî, şadî, xemgînî, mirin û yên din de aniye ziman. Her wekî di Vendler (1999: 15) di analîza xwe de destnîşan dike, vegêrê Soneyan di hin nimûneyan de wekî şair dibe berdevkê gotinê û di *Sone 10* de cara yekem wekî [*I, me - ez, min*] beşdarî vegotinê dibe. Bi vê yekê jî, mimkun dibe ku em hest û nêrînên vî vegêrî rasterast wekî niyeta Shakespeare bihesibînin. Niyeteke din a sereke ya helbestvan a bi nivîsîna soneyan jî nîşandana hunera xwe ya helbestvanîyê ye, ji ber ku helbest di serdema wî de cureya herî bilind bû û helbestvanî jî wekî lûtkeya nivîskariyê dihat dîtin.

Wergir: Wergirên desteya yekem xwînerên serdema Shakespeare yên sedsala 17an in. Her wiha xwînerên Îngilîz ên îroyîn û Îngilîzxwînerên seranserê cîhanê jî wekî desteya duyem dibe bîhîsibandin, lê ji ber ku armanceke ragihanê navbera şander [*Shakespeare*] û xwînerên îroyîn tune bû û bandora bendewariyên li ser nivîskar çê nebûye, ji bo wergêr divê xwedî giringiyêke talî bin. Wergir/xwînerên têksta jêder ên serdema Shakespeare bi xwe tovrind û xwendeyên Îngilîz ên hevçaxê wî bûn. Wergirên îroyîn jî xwînerên xwedî şiyana xwendina bi Îngilîzî ne ku kêma zêde derbarê Shakespeare û cureya soneyê de xwedî agahî û bendewarî ne. Ji bo wergirên teksta werger jî, Shakespeare nivîskarê navdar ê ziman û edebiyatekî pêşketî ye û xwendina berhemeke wî ya bi zimanê Kurdî meseleya prestîja zimanî û edebî ye.

Navgîn/kanal: Sone wekî tekst bi kanala nivîsê gihîştîye wergir/xwînerên xwe. Rastî guherîneke navgînî nehatiye, an ku ji qonaxa destpêkê wekî nivîs ji destê Shakespeare derketiye û wekî nivîs bi rêya wergerê gihîştîye xwînerên Kurdî.

Cihê Ragihanê: Bi giştî tê texmînkirin ku Shakespeare soneyên xwe li Stratford û Londonê nivîsîne. Sone li Londonê çap bûn û di rûpela yekem de Shakespeare berhem îthafî kesekî bi navê *Mr W.H.* kiriye ku nehatiye zanîn bê ka ew kes kî ye û çî têkiliya wî bi Shakespeare re û bi naveroka soneyan re heye. Weşanxaneya Lîs wergera soneyan wekî Îngilîzî û Kurdî ji Amedê pêşkêşî xwînerên Kurdî kir.

Dema Ragihanê: Shakespeare soneyên xwe navbera salên 1590 û 1605 nivîsîne û li ber çav derbas kirine. Cara yekem soneyên Shakespeare di sala 1609an de ji aliyê Thomas Thorpe ve hat çapkirin (Shakespeare, 2002: 91-92). Sone di nav demê re gelek caran bi awayekî şirovekirî ji nû ve çap bûn. Wergera Kurdî ya soneyan ji aliyê Weşanxaneya Lîsê di 2010an de hat çapkirin. Di navbera ragihana teksta jêder a cara yekem û wergera yekem a Kurdî de zêdetirî 400 sal hene ku ew yek jî ji hêla demê ve bandorê li ser nirxandina çandî û zimanî ya her du tekstan çê dike.

Motîv: Li serdema ku Shakespeare lîstikên şanoyê dinivîsîn ji ber nexweşî û vebayê şano gelek caran girtî diman. Wisa diyar e ku Shakespeare dizanî ku lîstikên ku ew binivîse dê ji bo demekê neyên lîstin û lewma jî hewesa nivîsîna soneyan pê re çê bûye. Sanders (2019) destnîşan dike ku nivîskarê di serdema Shakespeare de diviya helbest binivîsiya ji bo ku wekî nivîskarekî mezin û giring bê qebûlîkirin, lewre wê demê hunera nivîsandinê bi helbestê dihat nirxandin.

Fonksiyona Tekstê: Soneyên Shakespeare di çarçoveya giştî ya edebî de tekstên derbirînî ne ku tê de hest û ramanên şair eşkere dibin. Di cureya soneyê de şair risteyên ji bo pêşkêşkirina gilî, gazinc û rexneyê bi kar tîne û piştî bi guherîneke berbiçav, bi *voltaye* (zivirîn) tona tekstê jî cihê dibe û şair dibe xwedî helwesteke din. Di wergera Kurdî de jî wekî pêwîstiyêke rêgezî divê fonksiyona tekstê wekî ya jêder vê xasyeta soneyê nîşan bide da ku teksta armanc bibe temsîleke cureyî.

3.2.1.2. Analîza Hokarên Navmetnî

Mijar: Mijara sereke ya *Sone 10ê* zêdebûna nifşê mirov, an ku zarokanîn e ku bi qasî 17 soneyên din de jî heman mijar derdikeve pêş me. Mijara vê soneyê bi temaya xwe ya zarokanînê parçeyêke mijara hevpar a soneyên pêş xwe ye, bi taybetî jî wekî berdewama soneya 9em e. Ciwanî, bedewî, hezkirin, giringiya

berdewamiya nifşê mirov û rastiya jiyana demborî di konteksta zêdebûnê de bûne mijara soneyê.

Naverok: Di *Sone 10* de helbestvan gilî û gazindan li Ciwanê Qeşeng -Fair Youth- dike û rexneyê li wî dike ku ew ji hezkirina yê din û heta ji hezkirina xwe jî dûr disekine. Di vê soneyê de Shakespeare bang li Fair Youth dike ku xweşdiviyekî helbestvan e. Di gelek soneyan de helbestvan bang li vî camêrê dike bes nasnameya wî bi tu awayî eşkere nake. Temayên sereke yê soneyê evîn û bedewî ye, her wisa nakokiya mirinê û abadîniyê jî temayeke din e. Ciwanê Qeşeng ê ku naxwaze bibe xwedi zarok wekî kujer tê sûcdarkirin. Helbestvan destnîşan dike ku her kes ji wî Ciwanê Qeşeng hez dike, lewre divê bibe bav. Eger bibe xwedî zarok dê bedewiya wî di bedena yeke/î din de berdewam bike.

Kompozîsyona Tekstê: Jêdera cureya soneyê edebiyata Îtalyanî ye û ji peyva “sonetto” ya Îtalyanî tê ku wateya strana kurt dide. Soneyên Îtalyanî bi sonenûs Petrarch navdar bûne û wekî kompozîsyon ji beşeke 8 riste û beşeke 6 riste bi tevahî 14 riste ne. Shakespeare ji hêla kompozîsyonê ve hin guhertinan di vê cureyê de çê dike û wekî şêwaza Shakespaerî tê qebûl kirin. Hays (2016) derbarê kompozîsyona şiklî û taybetiyên naverokî yê soneyên Shakespeare de wan agahiyan dide: Soneyên Shakespeare ji 14 risteyan pêk tên. Ev 14 riste wekî sê çarriste û du risteyên dawî di nav xwe de saz dibin. Kêşa vê soneyê jî wekî yê din li gor kêşa sereke ya helbesta Îngilîz a bi navê *iambic parameter* saz bûye. Di kêşa iambic de ji bo her risteyê 10 kîte hene ku yek biderb û yek jî bêderb e û li pey hev tên. Sone bi awayekî serwayî hatine nivîsandin û sîstema serwayê jî wekî ABAB CDCD EFEF GG. Her wekî tê dîtin, her du risteyên dawî hevserwa ne. Ji bilî vê Kompozîsyona şiklî a soneyan, her wisa kompozîsyoneke naverokî jî heye ku girêdayî derpêşkirina hîs, raman û niyetên helbestvan a di nav risteyan de ye. Ji analîza soneyê diyar dibe ku di her sê çarristeyan de arîşe, gilî û gazinde tê pêşkêşkirin û di her du risteyên dawî de jî çareseriya arîşeyê xuya dibe. Bi vî awayî her sê çarriste mijarê û arîşeyê pêşkêş dikin û her du risteyên dawî jî li mijar û arîşeyê vedigerin û çareseriya eşkere dikin.

Peyvsazî: Her ku Shakespeare soneyên xwe di sedsala 17an de nivîsîne ku beramberî serdema *destpêka Îngilîziya modern* tê, li gor Îngilîziya sedsala 21an hin peyvên teksta jêder dê wekî peyvên arkaîk xuya bibin. Her wisa Shakespeare hin peyvên wekî [*unprovident (improvident-xemsar), ruinate (ruin – hilweşandin)*]

thou (you-tu), tercih kirine di serdema wî de jî wekî peyvên nû û çêkirî hatine qebûlkirin. Dîsa jî, ji ber dûrahiya demê ew peyvên ku di serdema Shakespeare de nû bûn, dê ji bo zanyariya îroyîn wekî peyvên kevn xuya bibin. Peyvên ji bo bandora armanckirî ya wekî gilî, gazinc û daxwazê pêk bînin hatine bijartin.

Hevoksazî: Vendler (1999: 29) wekî xasyeta sereke ya hevoksaziya soneyan diyar dike ku gelek sone bi rêbaza *chiasmus* (guhertina rêza peyvên) hatine nivîsandin. Helbestvan dema ku bixwazin ranêzikiya xwe ya analîtîk nîşan bidin, an ku wisa nîşan bidin ku vegêr li ser rewşekê bi deng dirame vê rêbazê bi kar tînin. Lewma jî rêza hêmanên hevokê ji hevokên edetî cudatir e. Wekî mînak li jêr, [*thy chief desire*] û [*thy thought*] di du rêzikên pey hev de bi awayekî paralel û çeperastî dubare bûne.

[Which to repair should be thy chief desire.

O, change thy thought, that I may change my mind:]

Her wisa forma hevokê ji bo pêkanîna fonksiyona banglêkirin û sîtemê saz bûne. Bi rêya lêkerên fermanî [*make, change û y.d.*] merama daxwazê hatiye şayesandin.

3.2.1.3. Armanç û Tercîhên Wergêr

Di wergera Soneyê de -wekî skopos- armançeke wergerê diyar dibe. Xuya ye ku çalakiya wergerê bi handana weşanger, an ku weşanxane an jî weşanger wekî şexs, çê bûye. Ji ber ku weşanxaneyê ku ev sone çap kirine xwedî projeyê wergerê ya bi navê wêjeya cîhanê ye û gelek nimûneyên wergerên ji zimanên biyanî weşandiye (Url 6). Her wiha wergêr jî wekî kesê ku çalakiya wergerê bi xwe de dide destpêkirin xuya dibe, lewre di pêşgotinê de destnîşan dike ku wergera soneyên Shakespeare xewn û xeyala wî ya pêşîn bû ye (Shakespeare, 2010: 47). Projeya weşanxaneyê ya wergera klasîkan û xeyala wergêr a wergerandina Shakespeare bi hev re wekî skopos û motîva wergerandinê dibe bînjirandin.

Her çî qas projeya weşanxaneyê û daxwaza wergêr a şexsî wekî du motîvasyonên cuda xuya bikin jî, li gor sosyo-polîtîka edebiyata Kurdî wekî hewldaneke hevpar a bilindkirina prestîja ziman û wêjeya Kurdî diyar dibe. Wergerandina berhemên cîhanê yê kanonîk û temsîla wan bi zimanê Kurdî wekî skoposeke hevpar û giştî di heman demê de wekî armanca wergera soneyên

Shakespeare jî xuya dike. Dema ku mirov eleqeya xwîneran a li dor wergera soneyên Shakespeare li ber çav bigire, ku çapên duyem û sêyem nîşaneyê wê eleqeyê ne ku kêr pirtûkên werger ji yekê zêdetir car tîn çapkirin, giringiya wergera berhemê bêtir xuya dibe. Dîsa jî, ev her du armanc bandoreke rasterast li ser şêweya wergerê nakin, lê belê bi awayekî nerasterast dibe ku bandor li ser tercîhên wergêr ên di pêvajoya wergerandinê de kiribe.

Wergêr di pêşgotinê de behsa tercîheke xwe ya şêwazî dike ku ji bo nirxandina wergerê xaleke giring e, lewre ev tercîh yekser bi kompozîsyon û şêwaza wergerê re têkildar e. Wergêr, derheqê cureya soneyê û bi taybetî jî derheqê naverok û forma soneyan de şiroveyên pisporên Shakespeare neql dike û di dawiyê de jî behsê bi kurtî tîne ser helwesta xwe ya wergerandinê. Wergêr destnîşan dike ku wî ji bo kêşa *iambic pentameter* a 10 kîteyî kêşeke xwemalî ya Kurdî peyda nekiriye û li şûna wê hemû sone bi pergaleke 14 kîte wergerandiye (Shakespeare, 2010: 48). Helwesta wergêr di vir de bi senifandina Holmes *rêbaza analojîk* tercîh kiriye. Li gor rêbaza analojîk wergêr li fonksîyona forma helbestê dinihêre û formeke manendî wê di nav wêjeya-armanc de lê diguncîne.

Wergêr bi helwesteke serbest û şêwazeke afirîner hewl daye ku teksteke armanc biafirîne. Ev helwesta wî ya ber pê serbestiyê di tercîha peyv û bêjeyan de jî diyar dibe. Tercîha wergêr a ji bo çêkirina heman bandora ku helbestvan dil dike çê bike, bi bikaranîna peyvên kirpandinê û bi dubarekirina peyveke xwedî wateya şid, tê dîtîn. Di mînaka jêr de peyva [*heyf*] dubare dibe da ku sîtema vegêrê helbestê xurtir bike

For shame deny that thou bear'st love to any, Te wisa berê xwe girtiye, gidiyo, ne heyf?
Who for thyself art so unprovident. Heyf! Tu nakî yekî bi evîna xwe baqî kî,

Ji hêla serbestî û afirîneriyê ve nimûneye herî berbiçav di rêzika jêr de xuya dibe:

Grant, if thou wilt, thou art beloved of many, Tê bidî bide, te pirr kirin Mela û Feqî,

Ev tercîh nimûneyeke wergera serbest a ekstrem e. Wergêr du hêmanên spesîfîk û taybet ên çanda armanc, an ku du kesayetên navdar [*Mela û Feqî*] dixê nav rêzikên Soneyê, ji bo ku wateyê di çanda armanc de xurt û şênber bike. Ji hêla teknîka wergerê ve, ev tercîha wergêr ji sînorê wergera serbest wêdetir diçe û wekî rêbaza adaptasyonê reseniya berhema resen dixê nav şikberiyê.

3.2.1.4. Hevtayiya Edebî û Rexneya Wergerê

Wergêr ji hêla kompozîsyonê ve teksteke manendî ya jêder saz kiriye, lewma jî xwînerê Kurdî, tam nebe jî, dê ji hêla kompozîsyon û teşeyê ve soneya armanc nêzikî soneya Shakespeare bibîne û dê bi rêya xwendinê bikare wê tecrîbe bike. Li şûna *iambic parameter* a 10 kîte, adaptekirina 14 kîteyan di TJ de bi tena terciheke afirîner a wergerandinê ye, lê tiştê ku divê bê rexnekirin ranêzikiya wergêr a bi kêşa *iambic parameter* e, lewre taybetiya vê ya sereke ji hejmara kîteyan bêtir taybetiya wê ya kirpandinê ye. Di vê cureya kêşsaziyê de, dengê kirpandî û dengê nekirpandî bi dorê li pey hev tên. Di wergera soneyan de sîstemeke wekî hevşopandina dengê biderb û dengê bêderb a soneyên jêder pêk nehatiye. Taybetiya formel a soneyan ji hêla kêşa resen ve di TA de xuya nabe, lê wergêr di babeta serwayê de sîstema serwayê ya TJ bi awayekî hevta veguhestiye, an ku serwaya risteyan her wekî soneyên jêder e. Her wisa, di encamê de formeke nû ya hejmara kîteyan jî derketiye holê.

Soneyên Shakespeare zimanekî arkaîk pêşkêşî xwînerên Îngilîzî yên îroyîn dike. Lê di wergerê de zimanekî arkaîk ê Kurdî nebûye terciha wergêr. Bi vî awayî jî fonksiyona zimên û bandora zimanî ya li ser xwîner di TJ û TA de cihê ye. Koda civakî ya zimanê TJ û taybetiya wî ya sosyo-lingûstîk bi terciha zimanê TA li hev nayê. TJ zimanê arîstokrasîyê ye, lê belê TA li gor qaydeyên zimanê gel û bi biwêj û qeydên zimanê rojane hatiye xemilandin. Ev şiroveya wergêr a derbarê zimanê TJ de xuya ye dê ji hêla wergirtinê ve li gor bendewariyên xwînerên Kurdî nebe. Xwînerên Kurdî dê li benda zimanekî bilind, kevn û giran bin û ji ber navdariya helbestvaniya Shakespeare dê li benda risteyên sergirtî û wategiran bin. Shakespeare jî di nav de, şairên klasîk bi zimanekî giran û kûr xwestine temsîla hîs û ramanên kûr bikin. Ji ber vê terciha wergêr, di hevtayiya navbera niyeta şair, şiroveya wergêr û bendewariyên xwîneran de dê lihevnekirinek derkeve holê.

Wergera *Sone 10* li pêwîsteka *têkildarî raguhestina/şiroveya tekstê* ya Nord digunce. Ji tercihên wergêr tê dîtin ku raguhestina şiroveya tekstê bi tenê ne li gor niyeta nivîskar, lê li gor şert û mercên çand/teksta armanc pêk hatiye. Wergêr moda vegêr a sîtemkar a di TJ de bi heman awayî bi modeke bi gilî û gazinc neqil kiriye. Helwesta wergêr a di vê babetê de cihê ye, lewre xitaba sîtemkar a di TJ de di TA de li hin cihan bûye sîtemkarî û nifir. Wekî nimûne gotina TJ [*Seeking that*

beauteous roof to ruinate,] a ku ancax wekî sîtemkarî dibe bê şirovekirin, di TA de [*Dikî wê rindiyê bikî kavi, çavo birij,]* hatiye wergerandin û bi vî awayî ji bilî sîtemê, bi gotina [*çavo birij*] nifir jî lê zêde bûye. Di vê wergerê de, ji hêla *fonksiyona tekstê* ve tiştê giring ev e ku guherîneke fonksiyonî pêk nehate. Sone hem di TJ de û hem jî di TA de xwedî heman fonksiyonê ye, an ku peyama ku li niyeta nivîskar digunce bi giştî li gor naveroka xwe hatiye ragihandin da ku bandoreke kêr an zêde wekhev li ser xwîner çê bibe.

Armanca wergêr [*wergerandina Shakespeare wekî xewn û xeyala wî ya pêşîn*] û armanca wergêr û weşanger a hevpar [*bilindkirina prestîja ziman û edebiyata Kurdî*] dibe ku hevsenga maqûl a wergera serbest têk biribe û ji ber çosa di pêvajoya wergerandinê de reng e ku du nixên rûmetê yên edebiyata Kurdî [*Feqî û Mela*] daxilî nav tekstê kiribe. Her ku peyvên "Feqî" û "Mela" bi tîpên gir dest pê dikin, reng e ku wergêr bi îmaya "Feqiyê Teyran" û "Melayê Cizîrî" ew wekî bibîrxistin bi kar anîne û her wisa wekî jêrnot jî wergêr ew tercîha xwe diyar kiriye. Ji bo amajekirina gotina [*many/ gelek kes*] du kesayetên tekane [*Feqî û Mela*] nabin bergindeke sembolîk a îmaya nav tekstê. Her wisa, wergêr ji hêlekê ve hewl daye ku kompozîsyon û teşeyê manendî soneya jêder çê bike, ji hêla din ve jî du sembolên xurt ên aîdî çanda armanc daxilî nav tekstê kiriye û tekst jî naveroka wê ya resen dûr xistiye. Di normalê de, hêmanên çandî yên TJ ji bo neqilkirinê ji wergêr re dibin kêşe, lê di vê mînakê de wergêr hêmaneke çandî ya aîdî TA xistiye nav wergerê û lêzêdekirineke çandî pêk aniye. Bandora vê tercîhê ya li ser xwînerê Kurdî dibe wekî pejirandin an jî dijderketin be, lê belê wekî rêbaz di normên wergerê de lêzêdekirinê çandî nayên pejirandin.

3.2.2. Tekst 2.

Cureya Edebî: Helbest.

Navê Helbestê: A Late Walk – Meşa Dereng.

Nivîskar/Helbestvan: Robert Frost (1874-1963).

Wergêr: Rizgar Elegez.

Teksta Jêder: Complete Poems of Robert Frost, 1964, p. 11.

Teksta Armanc: Kovara W, 2012, h. 41, r. 28.

Teksta Jêder	Teksta Armanc
<p data-bbox="379 831 528 860">A Late Walk</p> <p data-bbox="300 925 778 1093">When I go up through the mowing field, The headless aftermath, Smooth-laid like thatch with the heavy dew, Half closes the garden path.</p> <p data-bbox="300 1135 730 1303">And when I come to the garden ground, The whirl of sober birds Up from the tangle of withered weeds Is sadder than any words.</p> <p data-bbox="300 1346 715 1514">A tree beside the wall stands bare, But a leaf that lingered brown, Disturbed, I doubt not, by my thought, Comes softly rattling down.</p> <p data-bbox="300 1556 667 1724">I end not far from my going forth By picking the faded blue Of the last remaining aster flower To carry again to you.</p>	<p data-bbox="906 831 1054 860">Meşa Dereng</p> <p data-bbox="906 925 1321 1093">Gava di zevîyên dirûtiyê re dibihurim, Dûmahî bêserî, Nerm-raxistî fenanî aşanê şilavî, Şiverêya baxçeyê nivvekirî.</p> <p data-bbox="906 1158 1257 1326">Û kata hatim nav baxçeyî, Çivteçivta çivîkên hayjixwe Bilind dibe ji giloka pûşê zenûn Bikesertir e ji hindek kelîme.</p> <p data-bbox="906 1391 1305 1559">Darek li ber dîwêr bi tenê, Lê belge xwe giran dike li zerbûnê, Sergêj, bêşik, ji şayîşa min, Tên xirtinî hêdîka ji binê.</p> <p data-bbox="906 1624 1369 1792">Ji derçûna xwe ya dûr re dawî nîn im Ji hilibijartina avgona şîn ê Ya şûnmahîyên dawî yên kulîlkên keştîyê Bînim ji te re bişînim.</p>

3.2.2.1. Analîza Hokarên Dermetnî

Şander: Robert Frost yek ji helbestvanên herî giring ê Amerîkî yê sed sala 20an e. Frost, ji bilî 3 salên li Londonê, jiyana xwe li Amerîkayê wekî mamosteyê kolej û zanîngehan derbas kiriye û bi karê nivîskarî û cotkariyê re mijûl bûye. Dê û bavê Frost zû dimirin û ev yek bandorê li ser derûniya wî dike û di seranserê jiyana xwe de bi depresyonê re rû bi rû dimîne (Hart: 2017). Frost li New Englandê karê cotkariyê dikir û cotkarî ji bilî mamostetî û nivîskariyê şixulê wî yê sereke bû. Zeviyên bê ser û ber, deşt û newal, şûreyên kevir ên hewşan û cotkarên zehmetkêş tev dibûn keresteyên helbesta wî. Di helbesta wî de hezkirina siruştê temayeke sereke ye (Farrell; Christensen, 1987: 402). Frost di helbestên xwe de xwezaya New Englandê û jiyana mirovên ji rêzê bi zimanekî sade aniye ziman. Berhemên wî li welatê wî û li seranserê gelek hatine ecibandin, bi çendîn zimanan ve wergera wan çê bûye û her wisa çar caran Xelata Pulitzerê wergirtiye.

Niyeta Şander: Dema ku em jiyana nivîskar a heyama nivîsîna helbestê û şert û mercên ku tê de ye didin li ber çav, nêrînek derbarê niyeta şander/helbestvan de bi me re çê dibe. Ew jî: Helbestvan tenêtiya xwe û xemgîniya xwe di helbestê de dide tîne ziman. Piraniya helbestên di nav berhevoka bi navê *A Boy's Will* de helbestên derbarê tenêtiyê û dûrketinê ne, wekî nimûne helbesta *Ghost House* a di heman koleksiyonê de bi rêzika [*I dwell in a lonely house I know*] dest pê dike û helbesta *My November Guest* rêzika [*My Sorrow, when she's here with me*] hîsa tenêtiyê ya helbestvan nîşan didin û lewre jî em niyeta helbestvan wekî derbirîna tenêtiyê û xemgîniya xwe dikarin bi nav bikin. Her wisa di TJ de ev niyet di risteya jêr de jî diyar e:

[By picking the faded blue

Of the last remaining aster flower

To carry again to you].

Kesera evîndariyeke jidestçûyî û daxwaza gurkirin û domandina heman hîsa evîne di vê risteyê de eşkere dibe. Ev hîsa navborî reng e ku bi kêliyeke jiyana helbestvan re têkildar e, lewre dê û bavê wî di temenê wê yê biçûk de mirine û helbestvan û xwişka wî di nav rewşeke depresyonê de jiyane.

Wergir: Wergirên teksta resen, çî yên serdema ku helbest hatine weşandin û çî jî yên ku di nav demê re helbest xwendine, xwedî derfetên zanyariyên

berfireh in derbarê Frost û berhemên wî de. Hêvî û bendewariyên wan bêtir berbiçav û kifşe ne û ji hêla amajeyên çandî ve jî helbest ji wan re bêtir nasyar e. Wergirên teksta Kurdî bi rêya Kovara Wyê di sala 2012an de rastî vê wergerê hatine. Piştî pêla wergerê ya dawîya salên 1990an û destpêka salên 2000an bi dehan berhemên werger ên helbestvanên Ewropî, çî wekî pirtûk û çî jî di kovaran de, hatine weşandin. Li gor lêkolînên me, ev helbesta Frost yekem helbest e ku bi Kurdî wergera wê hatiye çêkirin. Xwînerên Kurd aşinayê helbestên werger ên hevçaxên Frost in, lê belê ji ber ku berhemên Frost nehatine wergerandin, diyar e ku tecribeyên xwendinê yên xwînerên Kurd ên derbarê helbestvaniya Frost de kêm in. Ji hêla şert û mercên wergirtinê ve, ji bilî zanyariyên derbarê helbestvaniya Frost, xalên hevpar navbera wergirên TJ û TA de nîn e.

Navgîn/kanal: Helbesta *A Late Walk* hem di nav koleksiyeneke helbestan de wekî pirtûk çap bûye û hem jî bi formên dijîtal û li ser malperên edebî berdest e. Xuya ye ku wergêr bi rêya yek ji wan navgînan rastî helbestê hatiye.

Cihê Ragihanê: Pirtûka ku Helbesta *A Late Walk* (Meşa Dereng) jî di nav de li Londonê çap bû. Frost nivîsên xwe yên berê û hin helbestên nû lê zêde dike û dide çapkirin. Rasthatina wergêr a bi helbestê bi tenê di ser tekstê re çê bûye û ji ber vê çendê jî ji konteksta civakî ya berhema resen dûrtir pêk hatiye. Ji naveroka helbestê diyar dibe ku çoltera Buckinghamshireê bandor li ser şayesandina wî ya atmosfera helbestê çê kiriye.

Dema Ragihanê: Helbesta *A Late Walk* (Meşa Dereng) di sala 1915an de di nav komeke helbestan de bi navê *A Boy's Will* çap bû. Wê demê Frost li Îngilîstanê dijiya û di nav du salan de du pirtûk amade kirin û dan çapkirin. Di heman salan de li Londonê komeke helbestvanê Îngilîz bi pêşengiya Ezra Pound bingeha pêla îmajîst ava dikirin û berhemên nû çap dikirin.

Motîv: Frost wekî mamosteyê wêjeyê û wekî helbestvan xwedî motîveke pîşeyî ya nivîsînê bû. Jiyana wî ya nav xwezayê, jiyana tenêbûnê û jiyana wî ya ku bi tengejeyên derûnî derbas bûye tev motîvên giştî yên nivîsîna helbestê ne. Frost dema ku li Îngilîstanê li çoltera Buckinghamshireê dijî, hîsa tenêtiyeke giran pê re çê dibe û bi gotina wî "li destpêkê tenêtiyê bandoreke giran li ser min kir, lê vê ji bo min fersendek jî çê kir. Tenêtiyê ez teşwîq kirim û min dest bi nivîsînê kir û min bê navber nivîsî" (Sutton, 1976: 77). Helbesta *A Late Walk* jî di nav de

gelek nivîsên wî bi motîva tenêbûnê hatine nivîsîn. Di salên jiyana wî ya Îngilîstanê de nasîna wî bi helbestvanên wekî Edward Thomas, Ezra Pound û yên din çê dibe ku reng e ku wan têkiliyan ew bêtir teşwîq kirine ji bo berhemdayînê.

Fonksîyona Tekstê: Her wekî berhemên edebî, helbesta Frost jî hestên wî yên şexsî îfade dike û bi vî awayî jî teksteke derbirîna hest û ramanên şexsî ye. Fonksîyona TJ wekî yadkirina paşerojê û derbirîna hestên xemgîniyê û tenêtiyê dibe bê pênasekirin. Tekst vê fonksîyonê bi navgînên vegotinê yên wekî mecaz û şibandîne û bi peyvên ku vê atmosferê çê dikin pêk tîne.

3.2.2.2. Analîza Hokarên Navmetnî

Mijar: Helbesta *A Late Walk* (Meşa Dereng) temayên wekî tenêti, hesret û xemgîni ji xwe re kiriye mijar. Vegêr li hawirdoreke bi pelgên zerbûyî, zeviyên rakirî, gihayên dirûtî hesret û tenêtiya xwe tîne ziman.

Naverok: Vegêrê helbestê di nav zevîyekê de dimeşe û wisa xuya ye ku demsala payîzê ye. Pênaseya zevîyê wisa dike ku ber bi payîzê giha hatiye dirûtin û li şûna wê pirêze maye. Vêca, her wekî bihar û havîn li paşerojê mane û hesteke xemgîn pê re çê dibe. Dema tê nav baxçe jî çivte çivta çivîkan jê re wekî dengeke xemgîn tê û tekane pela darê jî bi hatina wî re diweşe. Vegêr di benda dawî de bang li kesa "tu" dike û kullilka dawî ya nav baxçe bi gotinkî pêşkêşî wê/î dike.

Kompozîsyona Tekstê: Helbest ji çar bendên çar riste pêk tê û risteyên yekem û sêyem ji yên duyem û çarem dirêjrit in. Helbest ji hêla teşeyê ve beramberî cureya baladê tê, lewre serwaya helbestê wekî **a b c b** ye û her bend bi serwayeke nû dest pê dike ku ji bendên din cihê ye.

Peyvsazî: Di teksta jêder de peyvên ku denganiya wan li hev tîne bûne tercîha helbestvan û rêzbûna wan jî dengên lasayî yên xwezayê didin der, wekî mînak peyvên "birds, weeds, words" dengê çîwtçîwta çiwîkan li ber guhê xwîner dixe. Her wisa peyvên ku xwedî heman dengdaran in ji bo hunera dubarekirinê hatine bikaranîn. Ev yek xasyeteke din a berhemê ye ku alîterasyona bi dengdarên yekem ên peyvên derdikeve pêş me, wekî mînak [*garden ground, withered weeds*].

Hevoksazî: Helbestvan di çar bendan de jî risteya yekem û çarem bi lêkerê saz kiriye, risteyên duyem û sêyem jî bi ravekên rengdêr-navdêr neqîşandiye.

Ravekên rengdêr-navdêr di tevahiya helbestê de hene, wekî mînak: *mowing field, heavy dew, sober birds, withered weeds, faded blue* û hwd. Helbest bi dema niha saz bûye. Di temamê TJ de teşeya lêkerê “present simple/dema niha” ye, Wergêr jî, ji bilî benda duyem [*Û kata hatim...*], TA li gor dema niha saz kiriye.

3.2.2.3. Armanc û Tercîhên Wergêr

Armanaceke spesîfik a wergêr a diyarkirî tune derbarê wergera helbestê de. Her ku kovarên edebî yên Kurdî giringiyê didin wergeran, weşandina vê wergerê jî bi vê giringiyê re têkildar e. Ji hêla wergêr ve, bijartina helbesteke Robert Frost û di nav helbestên wî de jî *A Late Walk*, hezkirina wergêr a ji bo helbestvan û vê helbestê nîşan dide. Hezkerin di wergerê de gelek caran dibe bingeha dilsoziya wergêr a ji bo nivîskar, jixwe di analîza me de jî derket holê ku wergêr xwestiye şêwaza helbestvan nîşan bide û stratejiya xwe jî bi tercîheke jêder-navend kifşe kiriye da ku taybetiyên helbestê yên sereke di wergera xwe de biparêze.

Tercîhên wergêr bi piranî li armanc û stratejiya ku me li jor qal kir diguncin, an ku parastin û raguestina xasyetên şêwaza helbestê bandor li tercîhên wergêr kiriye. Dîsa jî, em nikarin bibêjin ku tercîhên wergêr tev xizmeta wî armancê dikin, lewre di tercîha navê helbestê de guherînek wateyî û rewşeke nehevta derketiye holê. Wergêr navê helbestê [*A Late Walk*] ku bi wergereke hevta beramberî [*Meşeke Dereng*] tê, wekî [*Meşa Dereng*] wergerandiye. Bi vê tercîhê, meşa ku di TJ de wekî nebinavkirî û ji rêzê diyar dibe, di TA de bûye meşeke binavkirî û spesîfik.

Di helbestê de hunera şexsandinê heye, her ku ajal û riwek wekî mirovan bi fikr û hisiyat hatine şayesandin. Wergêr mînakên şexsandinê yên di TJ de di TA de jî dide kifşê, wekî mînak rewşa [*darê*] ya ku wekî [*bi tenê*] hatiye şayesandin, [*belgê*] ku xwe [*giran dike*]. Helbesta *A Late Walk* xwedî taybetiyeke muzîkî ye ku bi rêya dengên peyvan xwîner dengê sirûştê dibihîze. Peyvên wekî [*birds, weeds, words*] ku li dû hev rêz dibin, teqlîda dengê çiwîkan dikin. Wergêr di TJ de bi rêya bikaranîna cotepeyvan û peyvên hevdeng, wekî [*çîwteçîwta çiwîkan*] xwestiye hevtayê vê çê bike. Taybetiyeke kompozîsyona helbestê, her wekî me di analîza hokara kompozîsyona tekstê de qal kiriye, dirêjîya risteyên yekem û çarem e ku wergêr di teksta armanc de hevtayîyeke bi vî rengî pêk neaniye.

Ji sazkirina hevokan diyar dibe ku wergêr hem fonksiyona lêkeran û hem jî ya ravekên rengdêr-navdêr ya ji hêla şêwazgeriyê ve kifşe kiriye û hewl daye hevtayiyekê di navbera TJ û TA de pêk bîne. Lê wergêr ev yek di hemû malikan de û ji bo hemû ravekan pêk neaniye û şêwaza hevgirtî ya TJ di TA de bi awayekî yekser xuya nebûye. Wergêr ji bo [*mowing field/zeviyên dirûtî*] li şûna ravekê [*zeviyên dirûtîyê*] tercîh kiriye û dîsa di benda duyem de risteya yekem, sêyem û çarem bi lêkerê saz kiriye: [*kata hatim, bilind dibe, bikesertir e*]. Di risteya [*When I go up through the mowing field*] de lêkera “go up” wateya çûna “ber bi jor” û “through” jî wateya “di nav re/ sernaser” dide û nivîskar bi wan dîmena tevgerê nîşanî xwîner dide. Wergêr bi tercîha xwe ya wekî [*Gava di zeviyê dirûtîyê re dibihûrim*] meşê dike yeke ripîrast an jî hevrazbûna vê diyar nake. Bihûrîn tevgera di nav zêviyê re dide nîşandan, lê dîmena meşa ber bi jor a rêwiyeke çê nabe li pêş çavê xwîner. Di encamê de jî meşa ber bi jor –û bi ihtîmal e ku zehmet û westîner be– a di hişê xwînerê TJ de heman bandorê li ser xwînerê TA de çê nake.

3.2.2.4. Hevtayiya Edebî û Rexneya Wergerê

Tercîha wergêr a têkildarî wergerandina navê helbestê, ji hêla wergirtina xwînerê TJ û TA ve hin ciyawaziyan derdixe holê. Di TJ de qesta bi meşê ku ji sernavê [*A Late Walk*] diyar dibe meşeke nebinvakirî ye, an ku meşeke ji rêzê, meşeke hercar û bêtaybetî dinimîne. Bi tercîha wergêr a ku li şûna wergereke hevta ya wekî “Meşeke Dereng” meşa navborî bi tercîha [*Meşa Dereng*] bûye meşeke kifşe û berbiçav. Êdî bala xwînerê TA diçe ser sedem û armanca meşê û bendewariyek li ba xwîner çê dibe ku encameke vê meşa binavkirî û berbiçav dê hebe. Di encamê de jî di têkiliya niyeta nivîskar û bendewariyên xwîner de nelihevkiyên çê dibe. Dîsa jî em dikarin vê tercîha wergêr, çi bi qestî be çi jî bê qestî be, wekî lêbarkirina bandoreke nû ya di TA de şirove bikin.

Helbestvan/vegêr keserkûr e û kesera xwe bi dengê çiwîkan, bi zeviyên dirûtî yên bejî û bi darên bêpel ên rûtbûyî tîne ziman û halê xwe û rewşa wan dişibîne hev û din. Digel vê şibandîne jî, derdê dilê helbestvan/vegêr û mijûlahiya serê wî ew qas giran e ku ji rewşa belga bi tenê xirabtir e. Di TJ de ev rewş bi risteya [*Disturbed, I doubt not, by my thought*] diyar dibe her ku vegêr rewşa belga darê ya zerbûyî her wekî ji mijûliyên wî aciz bûbe rave dike. Lê wergêr ev berawirdkirina vegêr a navbera rewşa belgê û serê xwe yê mijûl ê tijî derd wekî

[*Sergêj, bêşik, ji şayîşa min*] raguestiye ku sergêjiya belgê derdikeve pêş, ne ku acizbûna wê ya ji derdê vegêr. Vegêr xwestiye ku mijûliyên xwe yên ji derdê dil bike sedemeke nerihetker li ser belga zer û bibe sedema ketina wê xwarê, lê belê ev niyet di TA de yekser diyar nebûye.

Wergêr di şiroveya xwe ya şewaz û kompozîsyonê ve xwedî helwesteke jêder-navend e û bala xwe daye ser taybetiyên şewazî yên TJ. Wergêr, yekser nebe jî sistemeke manendî serwaya TJ di TA de saz kiriye û bi vî awayî jî TJ û TA ji aliyê teşeyê ve li hev tên. Wergêr ji hêla şiklî ve dirêjiya risteyên TJ li ber çav negirtiye, lewma dirêjiya risteyên TA yê cihê ne. Wergêr bala xwe daye ser taybetiyên dengane, bi taybetî jî di TJ de dubarekirina dengê "s" yê ji bo şayesandina dengê çiwîkan di TA de bi dengê dubare yê "ç"yê diyar dibe. Ev tercîh jî dibe fonksiyoneke nû ya teşeyê, lê belê li fonksiyona TJ jî digunce. Bi vî awayî, niyeta nivîskar a hestkirina dengê xwezayê di TA de jî tê bihîstin, lê belê bi dengên cuda ev fonksiyon pêk tê.

Wergêr di navbera TJ û TA de ji hêla veguestina niyeta nivîskar û fonksiyona tekstê ve bi awayekî serkeftî hevtayîyeke edebî pêk anîye. Niyeta nivîskar a ku di TJ de reng vedide bi çend nuansên cihê yên ku me li jor destnîşan kirin di TA de jî diyar dibe. Wergêr hesta tenêtiyê ya ku di TJ de hesta bingehîn e, di TA de jî kiriye temaya bingehîn. Her ku TJ di ser təkiliya mirov û xwezayê re hesta tenêtiyê rave dike, tekst ji aliyê çandî ve nêtar e û lewma jî kêşeyeke kultur-spesîfik çê nebûye ji bo wergerê.

3.2.3. Tekst 3.

Cureya Edebî: Helbest / Haîkû.

Navê Helbestê: Seven Haikus – Heft Haîkû.

Nivîskar/Helbestvan: Jack Kerouac (1922- 1969).

Wergêr: Sidîq Gorîcan.

Çavkanî: **Teksta Jêder** Kerouac, Jack Kerouac, *Collected Haikus*, 1961.

(<http://terebess.hu/english/haiku/Kerouac-Haikus.pdf>).

Teksta Armanc: Kovara *Bar Helbest*, Hejmar 6, 2022.

Teksta Jêder	Teksta Armanc
<p>Haiku 1 The bottom of my shoes are clean from walking in the rain.</p>	<p>Haîkû 1 binê solê min ji qîma dil paqij bûne – spas şilişoyê</p>
<p>Haiku 2 Haiku my eyes! my mother is calling!</p>	<p>Haîkû 2 mizgînî li te çavê min ê haîkûnak – dadê bang dike</p>
<p>Haiku 3 Evening coming - The office girl unloosing her scarf</p>	<p>Haîkû 3 va ye êvar tê – stûpêça xwe hişk şidand keçika karmend</p>
<p>Haiku 4 Shall I say no? - fly rubbing its back legs</p>	<p>Haîkû 4 bêm na qe dibe ku lingên xwe yên paşiyê hekandin mêşikê</p>
<p>Haiku 5 This July evening, A large frog On my doorsill</p>	<p>Haîkû 5 li sivdera min –bi vê êvara Tirmehê va gewrebeqek</p>

<p>Haiku 6</p> <p>Those birds sitting out there on the fence - They're all going to die.</p>	<p>Haikû 6</p> <p>ev çûk çivîkên ku li ser sêncê vedane hew te dî mirine</p>
<p>Haiku 7</p> <p>The moon had a cat's mustache, For a second</p>	<p>Haikû 7</p> <p>ji bo kêlikekê xwe kire simbêlpişik heyîva îşev</p>

3.2.3.1. Analîza Hokarên Dermetnî

Şander: Nivîskarê Amerîkî Jack Kerouac (1922-1969) wekî nivîskarekî pirhêl di gelek cureyên edebî de berhem dane, bi taybetî jî bi romana xwe ya navdar *On the Road* li seranserê cîhanê bûye yekî navdar. Li gor agahiyên ku Theado (2000) derbarê jiyana û nivîskariya Kerouac de dide, nivîskar di wêjeya Amerîkî de kesayetekî giring ê ji nifşa *Beat* e. Wî romanên xwe jî çîrokên rast ên jiyana xwe saz kirine. Kerouac pêşengekî haîkûya Amerîkî ye û bi rêya haîkûyan hezkirina wî bi Bûdîzma Zen û ramanên mîstîk çê bûye. Di haîkûyên wî de jî şopên jiyana wî berbiçav in.

Niyeta Şander: Haîkûnûs hestên xwe û bertekên xwe yên demkî yên derbarê jiyana û bi taybetî yên derbarê xwezayê di risteyên kurt ên haikuyan de didin kifşê. Di haîkûyan de herî zêde hestên wekî xemgînî, şadî, ecibandîn, heyirîn, şaşmatîbûn tên dîtin. Niyeta haîkûnûsan bi fikr û hîsiyata wan a li hember mijar û naveroka haîkûyê kifşe dibe û ew fikr û hîsiyat jî di encama çavdêriyekê de çê dibe. Rewşa derûnî ya haîkûnûsê çavdêr û bandora bûyer an jî rewşa ku ew çavdêriya wê dike, dibin faktorên avaker ên niyetê û bi peyv û gotinên parzûnkirî haîkûyek saz dibe. Theado (2000: 9) derbarê Kerouac de dibêje ku nivîskariya wî piranî otobîyografîk e. Wî hewl daye ku jiyana xwe bike bingeha hunera xwe, lewre jî rasterast ji tecribeyên xwe yên jiyana berhemên xwe afirandine. Hûrgiliyên jiyana Kerouac ên dema ku ew wan haîkûyan dinivîse rasterast bi niyeta nivîskar re têkildar e. Di her haîkûyê de fikr û hîsiyateke berbiçav heye ku wekî niyeta şander/helbestvan derpêş dibe.

Wergir: Wergir, an ku xwînerên haîkûyên jêder, ji dema çapbûna berhemê ya salên 1960an heya roja îro xwînerên edebiyata Îngilîzî ne. Ji ber ku xwînerên

ku bi Îngilîzî dixwînin xwedî paşxaneyên çandî yê cihê ne, hêvî û bendewariyên wan ên ji haîkûyên Kerouac jî dê cihêreng bin. Dîsa jî, xwînerên ku li salên Kerouac ew haîkû nivîsîne û xwînerên ku xwedî bendewariyên hevpar in wekî xwînerên jêder divê bîn qebûlkin. Wergirên haîkûyên armanc jî xwînerên Kurd in ku piştî çapbûna pirtûka werger derfetên xwendina van haîkûyan bi dest xistine. Ji bo xwînerên Kurd haîkû dê wekî cure biyanî xuya bike, lê belê çend helbestvanên Kurd ên ku haîkû nivîsîne û sêxişteyên Kurdî dê li ba xwîner bendewariyeke cureyî çê bikin derbarê wan haîkûyên werger de.

Navgîn/kanal: Navgîna sereke ya teksta jêder û teksta armanc nivîs e, lewre her du tekst wekî pirtûk hatine çapkirin û di nav demê re bi vê kanalê gihîştine xwînerên xwe. Jack Kerouac hin haîkûyên xwe ji bo xwînerên xwe xwendine û dengê wî li ser platformên dijîtal berdest e, lê belê rewşeke wiha ji bo haîkûyên wergerandî nîn e.

Cihê Ragihanê: Haîkûyên resen li Amerîkayê çap bûn û di nav demê re bi rêya derfetên zêde yê belavkariya berhemên Îngilîzî, her wisa di ser çavkaniyên dijîtal re, gihîşt seranserê cîhanê. Haîkûyên werger ji hêla kovara Bar Helbestê ve li Wanê hatin weşandin û bi rêya vê kovarê derfeta xwendinê ji xwînerên Kurdî re çê bû.

Dema Ragihanê: Kerouac di navbera salên 1955 û 1969an de bi qasî 1000 haîkû nivîsîne û ji wan 72 heb bi navê 'Desolation Pops' bi bijartina Kerouac çap bûn. Di wan salan de li Amerîkayê haîkû bi wergerên haîkûyên klasîk hêj nû dihat naskirin. Wergera haîkûyên Kerouac di Hejmara 6em a kovara Bar Helbest de li sala 2022yan derket.

Motîv: Motîva Kerouac a haîkûyan bi ceribandina cureyeke nû re û bi armanca wî ya afirandina haîkûya Amerîkî re (Kerouac: 1961) têkildar e. Her wisa têkiliya nêzik a haîkûyê û baweriya Bûdîzmê baş tê zanîn. Kerouac jî bi rêya haîkûyê baweriya Bûdîzmê hîn dibe û meyleke wî ya ber bi Bûdîzmê û nivîsîna haîkûyan çê dibe (Hakutani, 2020: 154). Motîva nivîsîna haîkûyan a Jack Kerouac diyar e ku ji wê meyla wî jî tê. Ji hêla din ve, motîva wergerandina haîkûyan reng e ku ji meyla edebî ya wergêr tê, her ku wergêr bi xwe jî haîkûnûs e. Xuya ye ku wergêr xwestiye zêdetir mînakên pêşkêşî xwînerên haîkûyên Kurdî bike. Bi vî

awayî, wergêr tevger û motîva xwe ya nivîsandina haîkûyan bi wergerandina haîkûyên Îngilîzî bêtir çespandiye û berdewam kiriye.

Fonksiyona Tekstê: Haîkû wekî cureyeke edebî xwedî fonksiyona şayesandina hest û ramanên şexsî ye. Di haîkûyê de haîkûnûs tecribeya xwe ya jiyanê ya li dem û ciheke berbiçav û bi bûyereke spesîfik ve eleqedar radigihîne xwînerê xwe. Tekstên me yê nimûne ji hêla fonksiyonê ve armanca haîkûnûs a parvekirina hest û ramanên wî pêk tînin. Her haîkû beramberî hîsiyat û ramanêke berbiçav e û di çarçoveya bûyer an rewşekê de eşkere dibe.

3.2.3.2. Analîza Hokarên Navmetnî

Mijar: Heft haîkûyên ku me bijartine xwedî mijarên binas ên cureya haîkûyê ne û di hemiyana de ji hêmaneke sirûştî wekî biker cih digire. Her wekî xasyeteke haîkûyên Amerîkî ye, rewşa mirovî ji bi pêwendîya bi xwezayê re dibe mijar.

Naverok: Haîkû 1 kêfxweşiya bi barana boş û hîsa paqijbûnê, Haîkû 2 şaşmatî û kêfxweşiya bi bihîstina dengê dayîkê, Haîkû 3 hîsa qedandina kar û bêzarbûna ji karên rojane, Haîkû 4 dudiliya li hember tevgera mêşîkê, Haîkû 5 rasthatîneke metelhişt a bi beqa li ber dêrî, Haîkû 6 hebûna jîndar a çiwîkan, çîwteçîwta wan û rastiya mirinê û derbasbûna demê, Haîkû 7 şibandina nikilê heyvê ya bi simbêlê mişkê, sêwirîneriya danê şevê ya çavdêr pênase dike.

Kompozîsyona Tekstê: Haîkû bi gelemperî xwedî kompozîsyoneke kifşe ne û ji hêla teşeyê ve sînordar in, lê belê sînore teşeyî yê haîkûyên Japonan ku ji sê riste û 17 kîteyan pêk tê, ji bo haîkûyên Amerîkî derbasdar nîn e. Kerouac (1961) diyar dike ku wî haîkûyên bi şewaza Amerîkî wekî helbestên kurt û sade yê sê rêzik çê kirine. Heft nimûmeyên me ji hêla şewazê ve li gor tercîhên Kerouac in û bi vî awayî ji nimûneyên tîpîk ên haîkûya Amerîkî ne.

Peyvsazî: Haîkû 1, 2 û 3 ne di nav de, di haîkûyên mayî de hêmaneke sirûştê heye û li gor konteksta haîkûyan rola wan hêmanan roleke navendî ye. Wekî mînak di Haîkû 4 de "fly", di Haîkû 5 de "frog", di Haîkû 6 de "birds" û di Haîkû 7 de "moon" bikerên haîkûyê ne. Di Haîkû 2 de gotina "Haîkû my eyes!" wekî gotîneke biwêjî ku wisa diyar e helbestan ew afirandîye hesteke xurt a şabûnê dide haîkûyê.

Hevoksazî: Haîkû ji hevokên kurt û sade pêk tên û ev yek di TJ de jî tê dîtîn. Haîkûya Japonî de raweya demê bi giştî *dema niha* ye, lê belê di haîkûyên Amerîkî de raweyên demên din jî xuya dibin. Di van mînakên de, ji bilî Haîkû 7, raweya demê ya haîkûyên mayî tev dema niha ne. Lêker di TJ de an di forma *present continuous* de ne "walking", "calling", "coming" û y.d. an jî bi forma lêkera *to be* ya dema niha saz bûne.

3.2.3.3. Armanç û Tercîhên Wergêr

Yek ji armançên wergêr û weşangerên Kurdî yên ku ji zimanên biyanî bo Kurdî berheman werdigerînin ew e ku berhemên edebî yên bi zimanê Kurdî zêde bibin û nivîskarên cîhanê bi zimanê Kurdî bigihînin xwînerên Kurd. Wergêr Gorîcan jî reng e ku xwestiyê cureyeke wekî haîkûyê ya kêmpêyda di zimanê Kurdî de bi rêya wergerê zêde bike. Wergêr derbarê armanca xwe ya wergerandina haîkûyên Jack Kerouac de tu agahî belav nekirine, an ku armanceke rasterast a destnîşankirî tune. Wergêr bi xwe jî şairekî haîkûnûs e [Sidîq Gorîcan-Gumbil, 2022], ji ber vê çendê jî armanceke takekesî ya wekî '*bi nivîsîna haîkûyên resen û bi rêya wergerê temsîl û zêdekirina cureya haîkûyê ya bi Kurdî*' divê li ber çav bê girtin. Wergêrên helbestvan gelek caran ji bo ceribandîna nivîsînê û geşkirina derfetên derbirîna xwe ya şexsî jî ji çalakiya wergerê sîd werdigirin. Ev yek jî wekî motîv û armanca wergêr a nebinavkirî dibe bê qebûl kirin.

Di Haîkû 2 de gotina [*Haiku my eyes*] wekî afirandina biwêjeke nû ya helbestvan xuya dike û ji kontekstê diyar e ku wateya şaşmatîbûnê dide. Dibe ku haîkûnûs bi dengê dayîka nêzikî xwe, an ku dereke li malê, bihîstibe û ev bertek nîşan dabe. Wergêr li gor xwe rewş nirxandiye û her wekî dengê dayîka xwe ya ku ji dûr tê bihîstibe, bi fonksiyona şabûnê rewş şirove kiriye û ev gotin jî wekî [*Mizgînî li te*] wergerandiye. Em teqez nizanin bê ka ev niyet bi ya nivîskar digunçe an jî na, lê belê wergêr di vê mînakê de şiroveya xwe ya şexsî di çarçoveya konteksta haîkûya jêder de bes bi rengekî nû daxilî nav TA kiriye. Di Haîkû 3 de, wateya peyva [*unloosing*] a ku wateya vê di zimanê jêder de "sistkirin" e, wergêr wekî şidandin wergerandiye. Wergêr danê êvarê wekî dema derketina ji kar û derketina derve fikiriye û [*stûpêç şidandin*] wekî amadekariya derketinê şirove kiriye. Lê di çanda jêder de dibe ku sistkirina stûpêçê nîşaneyê xilasbûna kar be, lewre "office girl/keçîka karmend" karê xwe yê nav ofîsê bi "scarf/stûpêça" şidandî dike, lê bi xilasbûna kar jî vê stûpêçê sist dike.

Kerouac Haîkû 4 wekî nezîreya haîkûyeke şairê navdar ê Japon Kobayashi Issa (1763-1828) nivîsiye û wekî tema jî rehm û piyariya Bûdîzmê tê de xuya dike, lewre li wan salên ku Kerouac haîkû dinivîsîn meyleke wî ya ji baweriya katolîzma Xirîstiyaniyê ber bi Bûdîzmê hebû (Hakutani, 2020: 154).

You dare not strike him! Nebî tu lê bidî bikujî!
The fly is praying with hands Mêşik duayê dike bi destên xwe
And with legs Û bi lingên xwe jî
(Issa) (Kerouac)

Vêca em nizanin bê ka wergêr dema ku ev haîkû wergerandiye ji wê agahiya jor haydar bûye an jî na. Bi heman awayî piraniya xwîneran jî dê nezanibin ku Kerouac ev haîkû li ser haîkûya hostayekî berî xwe nivîsandiye. Tiştê giring ji bo nirxandina me ya wergera vê haîkûyê ew e: Gelo xwînerên Kurdî yên ku haya wan ji wê haîkûyê tune dê wate, hîs û fikra kakilê haîkûyê çawa wergirin. Dîsa em nizanin bê ka xwînerê haîkûya resen ji wê haîkûyê haydar bûn an jî gelo dizanîn ku Kerouac ew wekî nezîre nivîsiye.

3.2.3.4. Hevtayiya Edebî û Rexneya Wergerê

Haîkûyên jêder û yên armanç ji hêla mijarê ve hevgir in, an ku wergêr mijarên haîkûyên resen bi heman awayî veguhestine. Wergêr kompozîsyona haîkûyan ne li gor haîkûyên resen, lê berevajî vê, li gor haîkûyên Japonî saz kiriye. Her wekî me li jor jî diyar kir, haîkûyên Amerîkî ji hêla teşe û mijarê ve ji haîkûyên Japonî cuda dibin. Ji hêla kompozîsyona tekstê ve, ji ber du tercîhên wergêr haîkûyên resen û yên werger ji hev cihê ava bûne. Ya yekem, wergêr risteyên navîn ên 7 haîkûyan li gor risteyên din dirêjtir çê kirine, lê di haîkûyên jêder de taybetiyeke wiha tune. Ya duyem, wergêr haîkû tev kirine sê riste, lê Haîkû 2 ji du risteyan pêk tê. Di vê çarçoveyê de, em dibînin ku wergêr li şûna ku taybetiyên haîkûya Amerîkî û ya Kerouac nîşan bide, tercîha xwe li gor haîkûya Japonî daye. Bi vê tercîhê, wergêr ji aliyekê ve armanca danasîna cureyeke helbestê di ser forma resen a Japonî re pêk aniye, ji aliyê din ve jî ji nîşandana taybetiya sereke ya haîkûya Amerîkî û şêwaza Kerouac dûr ketiye.

Di mînaka Haîkû 2 de gotina [*Haiku my eyes*] wekî [*Mizgîni li te çavê min ê haîkûnak*]. Di vê haîkûyê de tiştê giring ew e ku mirov zanibe “bangkirina dadê /mother is calling” di konteksteke çawa de bandor li haîkûnûs kiribe. Dayîka Kerouac, Gabrielle-Ange Lévesque (1895–1973), 4 sal piştî Kerouac dimire û

heya mirina wî jî bi kurê xwe re li heman malê dijî. Hezkirina Kerouac a ji bo dayîka xwe di heypeyvînên wî de jî aşkera dibin û dayîka xwe wekî 'jina ku herî zêde jê hezkiriyê' bi nav dike. Lewma jî, bihîstina dengê dayîkê reng e ku ji bo helbestvan hîsiyateke şabûn û mizgîniyê dê çê bike. Bi rêya vê agahiyê, diyar dibe ku hokarên dermetnî û bi taybetî jî jînenigariya nivîskaran ji bo şiroveyeke rast a rewşekê gelek caran dibin rênîşander. Lê belê, em nizanin bê ka wergêr ev şirove ji analîza jiyana nivîskar bi dest xistiye, an jî li gor kontekstê û di pêvajoya wergerê de ev best jê re çê bûye.

Wergêr di Haîkû 3 de peyva [*unloose*] a ku di zimanê Îngilîzî de wateya "sistkirinê" dide wekî "şidandin" transfer kiriye. Wergerandina peyva "unloose" a berevajî wateya wê ya Îngilîzî tevgera keçikê di teksta jêder û ya armanc de ji hev cuda dike. Di teksta jêder de stûpêç sist dibe lê di wergerê de stûpêç dişide. Di vê mînakê de konteksta TJ û ya TA hevta nîn in û ji hêla wateyê ve hevtayî têk çûye. Di encamê de jî tevgera keçikê û bandora wê ya li ser xwîner jî dê cihê be. Wergêr hîsên ku di haîkûyên jêder de diyar nîn in li haîkûyên armanc bar kiriye. Wekî mînak di Haîkû 1 gotineke beramberî "qîma dil" a TA di TJ de tune. Peyama rasterast a teksta jêder [*binê solê min ji ber meşa bin baranê paqij bûne*] dibe ku ji wergêr re basît xuya kiribe, lewre jî wergêr dibe ku xwestibe hîsekê lê bar bike û hîsa ku pê re çêbûye wekî [*paqijbûna ji qîma dil*] aniye ziman û xwestiye heman bandor li ser xwînerê teksta armanc jî çê bibe. Ev helwesta wergêr li pêwîsteka 4 a ku Nord destnîşan dike digunce "Divê kod û hêman bi awayekî wisa bên tercîhkirin ku bandora teksta werger li gor fonksîyonên armanckirî yên wergerê çêbibe." Lêzêdekirina "ji qîma dil" bi armanca çêkirina bandoreke hîsî li ser xwîner çê bûye û fonksîyona wê lêzêdekirinê li konteksta haîkûyê tê.

Di Haîkû 4 de ji ber valahiya agahiyê ya ku me berî niha anî ziman, wergêr wateya haîkûyê wekî nêtar hiştiye, lewre di haîkûya resen de jî ew nêtarî heye bê ku mirov ji haîkûya Issa ya ku bûye feyz haydar be û ji hewldanên Kerouac ên keşifkirina baweriya Bûdîzmê nezanibe. Dîsa jî, wergêr bi wergera wekî [*bêm na qe dibe*] wateyeke şênber daye gotinê, lê belê bandoreke kifşe çê nebûye. Di analîza haîkûya Issa û ya Keouac de wateya hevpar eşkere dibe. Issa "hekandina lingê mêşê" dişibîne tevgera duakirinê. Kerouac jî di haîkûya xwe ya nezîre de xwestiye ku li hember hebûn û fermana yezdan "nepêkaniya bersiva nayê" derxîne pêş. Ji ber helwesta nêtar a wergêr û ji ber valahiya agahiyê, ev bandora ku me li

jor qal kir reng e ku dê li ser xwînerê armanc çê nebe. Di Haîkû 7 de risteya [*The Moon had a cat's moustache*] heyîvê di rewşeke tebatî de, an ku wekî tişteke derveyî û wekî têrker destnîşan dike. Di TA wergêr bi tercîha xwe ya wekî [*ji bo kêlikekê xwe kire simbêlpişik heyîva îşev*] heyîvê dike biker û haîkûnûs jî dikeve rewşeke pasîf a çavdêriyê. Wergêr bi vê tercîhê rola vegêrê haîkûyê û ya hêmaneke haîkûyê berevajî kiriye. Di encamê de nîvenga çalakiyê ji çavdêr derbasî heyîvê bûye û bi vî awayî wergêr bergeheke nû daye pêş çavê xwînerê TA.

Wergêr li gor armanca ku me ji çalakiya wergerê derxist tevgeriyaye û bi rêya wergerê temsîla cureyeke kêmpêyda ya edebî di Kurdî de pêk aniye. Dîsa jî, wergêrê haîkûnûs diyar e ku derfeta wergerê ji bo ceribandina nivîskariyê jî bi kar aniye û di hin mînakên jor de tercîhên şexsî yên derveyî kontekstê pêk aniye. Di vê niqteyê de hişyariya Dryden (1992: 23) hêjayî qalkirinê ye. Li gor wî, wergêr hewl dide nivîskarê ku werdigerîne hindî ji dest tê xweşik (charming) bide xuyakirin. Lê Dryden di heman demê de vê hişyariyê jî dide ku divê wergêr nivîskarê xwe neşibîne xwe û xasyeta wî/ê ya cudaker biparêze. Wergerên van heft haîkûyan, di gel raguhestineke serkeftî ya edebî û cureyî, ji ber derxistina pêş a taybetiya haîkûyên Japonî û bi hin şiroveyên şexsî yên derveyî konteksta resen, ji hêla edebî ve nebûne afirandinên tam ên hevta.

3.2.4. Tekst 4.

Cureya Edebî: Fabl.

Navê Berhemê: Aesop's Fables - Çîrokên Ezopî.

Nivîskar: Aesop.

Wergêr: Sîdîq Gorican.

Teksta Jêder: Aesop's Fables-with a life of Aesop, ed.: John Esten Keller & L. Clark Keating, University Press of Kentucky, 1993.

Teksta Armanc: Çîrokên Ezopî, Weşanên Sîtav, Wan, 2013.

Teksta Jêder	Teksta Armanc
<p data-bbox="379 824 576 853">The Lion's Share</p> <p data-bbox="300 871 842 1323">The Lion went once a-hunting along with the Fox, the Jackal, and the Wolf. They hunted and they hunted till at last they surprised a Stag, and soon took its life. Then came the question how the spoil should be divided. 'Quarter me this Stag,' roared the Lion; so the other animals skinned it and cut it into four parts. Then the Lion took his stand in front of the carcass and pronounced judgment: The first quarter is for me in my capacity as King of Beasts; the second is mine as arbiter; another share comes to me for my part in the chase; and as for the fourth quarter, well, as for that, I should like to see which of you will dare to lay a paw upon it.'</p> <p data-bbox="300 1346 842 1496">'Humph,' grumbled the Fox as he walked away with his tail between his legs; but he spoke in a low growl: "You may share the labours of the great, but you will not share the spoil.'</p>	<p data-bbox="943 824 1139 853">Şêr û Parvekirin</p> <p data-bbox="863 871 1406 1413">Carekê, şêr li gel rovî, wavik û gurekî derdikeve nêçîrê. Li vir û li wir, pir digerin û di dawiyê de gakoviyek derdikeve pêşiya wan. Di demeke hindik de nêçîra xwe dikin. Îcar dor tê parvekirina xenîmetê. Hirehir ji şêrî diçe: "Ji min re vî cendekê hanê biguherin û bikin çar qîsim!" dibêje ji wan heywanên din re. Ew jî digurin, kerkerî dikin û dixin çar qîsim. Dûvre, şêr diçe ba cendekê goştî, cihê xwe digire û wiha biryarê dide: "Hûn jî dibînin ku ev goşt çar qîsim e; qîsimê yekem ji bo qudret û hêza yekî wekî min e; ku ji bîr nekin Şahê weşan ez im. Yê duyem jî ji min re, ji ber ku hakem ez im û ev jî heqê parvekirina min e. Yê sêyem, ji ber îza û keda min ya ku min di nêçîrê de kişand, dîsa yê min e. Ku em werin beşa çaran, ji bo vê jî em wiha bikin; kî ji we biwêre lepê xwe dane ser vî goştî, bila ew jî ji wî re be. Çawa ye, hevalno?"</p> <p data-bbox="863 1435 1406 1615">Piştî vê yekê, axîn û himêneke nizm ji devê rovî derdikeve, dûvê xwe dixê nava lingên xwe û berê xwe dide aliyekî û diçe. Lê dema ku bi rê ve diçû, bolebleke wiha ji devê wî tê bihîstin: "Te xenîmet parve nekir bavo! Te karê hêzdarî û mezintiyê parve kir!"</p> <p data-bbox="863 1637 1406 1693">Îcar, dostî û şîrîkatî di parvekirinê de hez û mezinahiyê naxwaze.</p>

3.2.4.1. Analîza Hekarên Dermetnî

Şander: Derbarê jiyana Aesop de agahiyên pêbawer nîn in, heta teqez nîn e bê ka ev çîrokên ku wekî fabl tînen pênasekirin tev ji hêla Aesop ve hatine çêkirin

an jî na. Lêkolîner Gibbs (2002) wan agahiyan derbarê Aesop de dide ku dîroknas Herodotus wekî çavkanî nîşan dide: Aesop ji eslê xwe ve Firîgyayî bûye û koleyekî lal, kirêt û pir qelew bûye. Bi xêra qenciyeke wî Xwedawend zimanî wî vedikin, lê belê ew jî demildest qala xirabiya xudanê xwe dike. Ji ber vê yekê xudanê Aesop wî difiroşe kesên din. Ji bo heyamekê dibe xulamê filozofekî û di dawiyê de jî ji koletiyê rizgar dibe û dibe mirovekî azad. Heyamekê dibe şêwirmendê keysarê Babylonê jî. Aesop wekî mirovekî navdar dizivire bajarê Grekî yê bi navê Delphiyê. Aesop ji ber zimanê xwe welatîyên vî bajarî bêzar dike û dibe sedema tevliheviyan, lewma jî ew biryarê didin ku wî bikujin. Ew jî soza vegotina çîrokan dide wekî berdêla jiyana xwe. Welatî çîrokên wî guhdar dikin, lê belê di dawiyê de wî dikujin.

Niyeta Şander: Eger ku em agahiyên derbarê Aesop rast qebûl bikin ku ji bo ku neyê kuştin ew çîrok vegotine, wê demê niyeta şander wekî çêkirina çîrokên balkêş e da ku bi saya heyecana wan wî jî wekî çîrokbêj nekujin. Dîsa jî ev niyet ji bo analîzeke bi rêk û pêk zêde guncav nîn e û jixwe rastiya wê jî şikber e. Niyeta şander ancax bi têkildarkirina bûyera çêkirî ya mecazî û şîreta wê çîrokê dibe derkeve holê. Ji ber vê çendê jî, divê em niyeta fabla ku me ji analîzê bijartiye destnîşan bikin. Ji têkiliya bûyerê û bikeran diyar dibe ku niyeta fabla me ya nimûne jî di şexsê Şêr de nîşandana rola hêzê ye ku wekhevîyê têk dibe û dibe sedema neheqiyê.

Wergir: Li gor jînenigariya Aesop a trajîk, wergirên yekem ew kes in ku qesta canê wî kirine. Dawiya trajîk a Aesop nîşan dide ku bandora qanihkirinê ya fablan li ser wan wergirên destê yekem çê nebûye, lê belê di nav demê re fabl bûne navgînên sereke yên qanihbûna exlaqî û derswergirtinê. Her çi qas zarok wekî wergirên fablan bîn hesabandin jî, peyamên di fablan de û çîrokên wan ji bo mirovên ji her temenê jî derbasdar in û hêjayî xwendinê ne. Di wergera Kurdî de dorhêla rûpelên pirtûkê hatine nexşandin û zimanekî nerm bûye tercîha wergêr, lewre jî wergera Kurdî diyar e ku zarok ji xwe re wekî wergirên sereke bijartiye. Her ku di folklorê Kurdî de jî çîrokên wekî yên Aesopî hene ku wekî parçeyeke nerîta folklorê Îranî û Hindî ne, wergirên zimanê armanc jî xwedî paşxaneyêke naverokî ya hevpar in.

Navgîn/kanal: Fabl di esasê de cureyeke devkî bû li serdema antîk a Grekî û Romayê, lê belê di serdema modern de fabl êdî wekî tekstên nivîskî tên xwendin û nirxandin.

Cihê Ragihanê: Fablên Aesop li seranserê Ewropayê ji bo heyameke pir dirêj û bi gelek awayan ji xwîner û guhdaran re hatine pêşkêşkirin. Fabl bûne mijara nivîsarên din jî û nivîskarên afirîner û perwerdekarên ew çîrok ji bo armancên xwe bi kar anîne. Wergera Çîrokên Ezopî li Wanê cara yekem derket pêş xwînerên Kurdî. Bi rêya fûarên pirtûkan û bi rêya dijîtal danasîna berhemê çê bû û bi taybetî ji bo zarokan hat pêşniyazkirin.

Dema Ragihanê: Fablên Aesop wekî çîrokên devkî di serdemên qedîm de hatine vegotin. Li gor agahiyên ku Gibbs (2002: 6) dide wergera yekem a Îngilîzî di 1484an de çê bûye û ji wê demê û pê ve wergerên nû wekî tekstên şirovekirî ji xwînerên Îngilîzî re hatine pêşkêşkirin. Her wisa fablên Aesop cara yekem ji hêla Demetrius ve di 280 BZ de bi navê *Aesopia* hatine nivîsandin û di serdema Romayê de jî nivîsîna wan fablan berdewam kiriye (Gibbs, 2002: 36-37). Wergera Kurdî di sala 2013an de çap bû û li gor lêkolînên me ev yekem wergera fablên Aesop ku wekî pirtûk çap bûye.

Motîv: Ji ber ku Aesop rasterast ne nivîskarê fablên li ber dest e, em nikarin behsa motîveke berbiçav a nivîskar bikin. Her çî qas çêkirina çîrokan a ji ber gefa kuştinê wekî motîv bê qebûlîkirin jî, ev motîv faktoreke kêrhatî nîn e ji bo analîza vê hokarê. Dîsa jî, fablên ku ji hêla Aesop ve hatine çêkirin û gotin bi sedan salan ji bo armancên perwerdehiyê hatine bikaranîn. Piştî ku di serdema modern de bûn tekst, qîmeta wan çîrokan a edebî zêdetir derket pêş û çapkirina wan a wekî pirtûk bi motîva belavkirina tekstên edebî û materyalên perwerdehiyê pêk hat.

Fonksiyona Tekstê: Fabl wekî cureyeke çîrokê ya kurt li dor bûyerekê û çend karakteran diqewime. Di fablan de piranî heywan wekî mirovan tevdigerin û diaxivin, û bi vî awayî jî xwedî fonksiyoneke temsîlî ya nêrîn û baweriyên mirovan in. Fabl derbarê tevgerên mirovan de rênîşander in û bi rêya bûyera spesîfîk û karakterên temsîlî di encamê de derseke exlaqî didin mirov (Aesop's Fables, 1993: 7). Fonksiyona sereke ya fablê ya ji hêla guhdar û xwîneran ve ew e ku bûyera sembolîk bi awayekî çîrokî ragihîne û dersa exlaqî li pêş çavên wergiran şênber bike. Fonksiyona sereke ya fablê fêrkerî ye. Gibbs (1999: 2)

destnîşan dike fabl çîrokên nîvco ne, an ku em di dawiyê de nizanin bê ka çi tê serê karakterên tê de. Diyar e ku ev nîvcohiştin jî wekî taybetiyêke fablê derfetê ji bo fonksiyona temamkirinê ya ji hêla guhdar/xwîner ve çê dike. Gibbs (2002: 20) diyar dike ku dersa exlaqî ya fablê bi piranî bi devê heywaneke di nav çîrokê de tê ragihandin û dibe gotina dawî ya fablê. Bi vê gotinê jî xeletiyek di nav çîrokê de bi encameke exlaqî tê serastkirin.

3.2.4.2. Analîza Hokarên Navmetnî

Mijar: Mijara fabla bi navê Lion's Share (Şêr û Parvekirin) parvekirina nêçîrê ya bi destê heywaneke wekî şêr e ku li gor pîvana hêzê û bi awayekî neheq pêk tê.

Naverok: Fablên Aesop her yek wekî çîrokeke serbixwe ye, dîsa jî ji hêla hêmanên naverokê ve rengê hev didin. Karakterên ku bi giştî heywan in li dor bûyerekê dikevin nav têkiliyekê. Bûyerên ku lehengên wan heywan in bi awayekî metaforîk bi civaka mirovan re têkildar in. Di fabla me ya nimûne de, piştî ku Şêr, Rovî, Wavik û Gur nêçîra Gakoviyê dikin, dor tê parvekirinê. Şêr jî bi saya hêza xwe bi ser navê parvekirinê çar paran jî ji xwe re hildigire û navê vê yekê jî dike parvekirin. Versiyoneke din a vê fablê ya bi heman navî heye ku tê de Şêr jî parvekirina wekhev a Kerê nerazî dibe û wê dikuje. Rovî jî dema vê kirina Şêr dibîne, ji xwe re pareke hindik hildigire û yên mayî tev ji Şêr re dihêle.

Kompozîsyona Tekstê: Fabl cureyêke çîrokê ye ku tê de heywan wekî mirovan tevdigerin û diaxivin. Peyama di dawiya fablê de ku bi devê heywaneke nav çîrokê ve tê ragihandin taybetiya berbiçav a fablê ye ku vê cureyê ji çîrokên din cihê dike. Gibbs (2002: 25) dide zanîn ku şîret û encama fablê bi piranî di dawiyê de wekî *epimythium* (gotina dawî) û kêman jî li destpêkê wekî *promythium* (gotina destpêkê) cih digire. Di hin versiyonên çapkirî de peyama dawî wekî îtalîk û cuda tê nivîsandin. Di teksta jêder a li ber destê me de tercîheke wisa nîn e, lê belê wergêr peyamek dîtir li tekstê zêde kiriye û bi awayekî diyarker nîşan daye.

Peyvsazî: Her çi qas heywanên di nav fablê de xwedî taybetiyên mirovan bin jî, hin peyvên bêtir aîdî heywanan di teksta jêder de derbas dibin û xasyetên cinsê wan nîşan didin. Peyvên wekî [*Humph, growl, grumble, roar*] bêtir xasyetên dengdanê yên heywanan in û di teksta armanc de jî [*hirehir û bilebil*] bûye tercîha

wergêr. Di teksta jêder de lêkerên biwêjî hene ku derbirîna edebî ya berhemê dupat dikin, wekî [*go along with, cut into parts, lay a pawn upon, walked away with his tail between his legs*].

Hevoksazî: Hevokên fablê sade ne û bi fonksîyona vegotîneke rasterê û têngîner hatine bikaranîn. Axaftinên Şêr ji hêla vegêr ve tîrî neqlkirin. Axaftina Rovî [*You may share the labours of the great, but you will not share the spoil.*] ya ku di dawîya fablê de çê dibe rasterast tîrî dayîn û peyama fablê dide kifşê. TJ bi dema borî saz bûye, lê TA bi dema niha hatiye ragihandin ku di çîrok û çîrvanokên Kurdî de piranî ev forma demê li kar e.

3.2.4.3. Armanç û Tercîh Wergêr

Wergerandin û weşandina fablên Aesop diyar e ku bi armanca zêdekirina berhemên zarokan ên bi Kurdî pêk hatiye. Hejmara berhemên zarokan di nav wergerên Kurdî de kême û xuya ye ku vê kêmasiyê wergêr û weşanger li dor vê armançê xistiye nav hevkarîyê. Baldariya derbarê zimanê berhemê ya ji hêla pîvanên pedagojîk ve û stratejiya nermkirina zimanê vegotîne bi vê armançê re eleqedar xuya dike. Wergêr peyvên ku di TJ de wateyeke tund didin di TA de nerm kirine. Reng e ku wergêr xwînerên TA wekî zarok kifşe kirine, an jî destpêşxerê wergerê daxwazeke wisa ji wergêr kiriye. Bi vî awayî wergêr û weşanger xwestine ku bandoreke wekî çêbûna metirsiyê ya li ser xwînerên zarok ji holê rakin.

Sernavê fablê [*Lion's Share / Para Şêr*] di TJ de wekî biwêj cih digire, lê belê wergêr ev sernav wekî [*Şêr û Parvekirin*] wergerandiye. Wergêr hin peyvên TJ ku wateya tundiyê didin an jî dibe ku metirsiyê çê bikin di TA de guherandiye û li dewsa wan peyvên ku wateya wan nerm in tercîh kirine. Wekî mînak [*Surprised a Stag /Gakovî tirsandin*] wekî [*Gakoviyek derdikeve pêşiya wan*] wergerandiye. Dîsa, gotina [*took its life/ ew kuştin*] wekî [*Nêçîra xwe kirin*] bi wateyeke nerm hatiye wergerandin. Navên ajalan di TJ de bi tîpên gir wekî [*Lion, Fox, Jackal, Wolf, Stag*] derbas dibin, lê di TA de bi tîpên hûr [*şêr, rovî, wavik, gur, gakovî*] hatine nivîsandin. Gotina [*Humph*] a di teksta jêder de wekî [*axîn û himêneke nizm*] bi awayekî pênasekirî hatiye wergerandin.

Di berawirdkirina TJ û TA de diyar dibe ku vegotina TA ji ya TJ dirêjtir e. Wergêr li gor TJ zêdetir peyv û gotin bi kar anîne û wisa diyar e ku ev tercîh jî bi

armanca ravekirineke zelal a fablê pêk hatiye. Her ku xwîner wekî zarok hatine qebûlkirin, di zimanê wergerê de jî hêsanî û famdarî wekî stratejî bûye pîvana wergerandinê. Reng e ku xemilandina wergerê ya bi zimanekî edebî jî bandor li ser dirêjbûna TA çê kiriye. Wekî nimûne gotina TJ a [*'Humph,' grumbled the Fox*] ku ji çar peyvan pêk tê di TA de [*Piştî vê yekê, axîn û himêneke nizm ji devê rovî derdikeve*] bûye deh peyv.

3.2.4.4. Hevtayiya Edebî û Rexneya Wergerê

Wergêr li gor armanca hevpar a wergêr û weşangêr a ku me wekî 'wergerandina berhemeke zarokan li gor pêwîstiyên hişmendî û pedagojîk a zarokan' diyar kiribû, teksteke guncav di zimanê armanc de afirandiye. Ji bo ku vê armancê pêk bîne, wergêr bi rêya zimanekî ravekirî TA li gor TJ dirêjtir kiriye. Îcar, taybetiyeke fablê jî ew e ku bi vegotineke kêr û kurt çîrokê vedibêje û di gelek mînakên de jî tê dîtin ku fablê li ber pêşbîniyên xwîner û guhdaran jî vedike da ku hin valahiyên di vegotinê de bi xwe temam bikin. Di vê tercîha wergêr de dirêjkirina TA û zimanê raveker li gor armanca wergerê ye, lê belê wekî tercîh li dijî taybetiya şêwazî ya cureya fablê ye.

Nivîsandina navên heywanan a bi tîpên hûr dê bandorê li ser wergirtina xwînerên jêder a derbarê heywanên fablê de çê bike. Di TJ de navên heywanan bi tîpên gir hatine nivîsandin û ew jî rola wan a wekî bikerên bûyerê dupat dike. Di TA de navên heywanan bi tîpên hûr hatine nivîsandin û ji ber vê tercîhê jî ew heywan dibin parçeyê ji rêzê ya vegotinê. Heywan bi tîpên hûr pozisyona xwe ya bilind a di çîrokê de winda dikan. Ji hêla din ve, raweya demê ya TJ û TA hevta nîn in û ev yek jî dê bandorê li ser şêweya wergirtina xwînerê TA bike. Xwînerê TJ tekstê bi dema borî dixwîne û raweya demê ya "past simple" bûyerê bi kirinên kurt û kirpandî derdixe pêş. Di TA de wergêr vegotina bi dema niha tercîh kiriye ku di vegotinên Kurdî de gelek caran tercîha çîrokbêjan bi vî rengî ye. Di vegotina dema niha de ji çalakiyên çîrokê yê kurt zêdetir, vegêr balê dikişîne ser vegotinê û di encamê de jî nivînga wergirtina çîrokê diçe ser hêla vegotinê.

Biwêja [*Lion's Share*] a ku wateya "para şêr" dide, hem di çanda jêder de hem jî di çanda armanc de xwedî wateyeke sembolîk e, lê belê tercîha wergêr a [*Şêr û Parvekirin*] bandora sernavê ya ku bi hêza biwêjê xurt bûye, lawaz dike. Wergêr di şert û mercên teksta armanc de pêwîstî bi peyameke zelal dîtiye û

ferqek xistiye navbera dostî û şîrikatîyê û xwestiye ku pêwîstiya dadweriyê ya di parvekirinê de eşkere bike. Ji bo vê yekê jî wergêr di dawiya fablê de pend û şîretek li teksta armanc zêde kiriye: [*Icar, dostî û şîrikatî di parvekirinê de hez û mezinahiyê naxwaze*]. Ev şîret di teksta jêder de tune. Piraniya fablên ku di nav vê berhemê de cih digirin, bi pend û şîretekê bi dawî dibin. Lewre wergêr xuya ye ku ji bo lihevhatina fablên di nav heman berhemê de ev şîrove bi xwe li tekstê zêde kiriye. Ji bo hevtayiyê xala giring ew e bê ka ev şîrove bi çi awayî têkildarî niyeta nivîskar, bandora tekstê û fonksiyona tekstê ye. Her ku ji hêla niyet û fonksiyonê ve ev tercîh li gor TJ ye, ji hêla bandorê ve jî reng e ku dê bandora li ser wergir xurtir bes sînordar bike.

Heywan bi axaftin û tevgerên xwe di esasê de sembola tevgerên mirovan in û di ser kiryarên heywanan re rexneya helwestên mirovan tê kirin an jî kirinên wan wekî nimûneyên baş tîr pejirandin. Di vê fablê de, ji hêla hevtayiyê ve kiryarên temsîlî yê heywanan hem di çanda jêder de û hem jî di çanda armanc de hevta ne. Taybetiyên Şêr û Rovî jî, fonksiyona wan a nav çîrokê jî di konteksta her du çandan de rengê hev didin. Tercîhên wergêr bandoreke berbiçav li ser cîhana tekstê nekiriye, lewre cîhana pevbestî ya derveyî rastiyê di TJ û TA de hevta ne. Xwînerê TA jî her wekî xwînerê TJ di pratîka xwendinê de dikeve nav cîhana deredetî ya berhemê. Şîroveya wergêr bi niyeta TJ digunce û temaya sereke ya di zimanê armanc de li gor niyeta TJ dibe konteksta sereke ya fablê.

3.2.5. Tekst 5.

Cureya Edebî: Mesel (Parable).

Navê Berhemê: God –Xweda.

Nivîskar: Gibran Khalil Gibran (1883-1931).

Wergêr: A. Rahman Çelik.

Teksta Jêder: The Madman: His Parables and Poems, Gibran Khalil Gibran, Cornell University Library, 1918, pp. 9-10.

Teksta Armanc: Zilamê Dîn, Gibran Khalil Gibran, Kovara Tabularasa, h. 3, Flîtto Weşan, Stenbol, 2012, rr. 8-9.

Teksta Jêder	Teksta Armanc
<p>God</p> <p>In the ancient days, when the first quiver of speech came to my lips, I ascended the holy mountain and spoke unto God, saying, "Master, I am thy slave. Thy hidden will is my law and I shall obey thee for ever more."</p> <p>But God made no answer, and like a mighty tempest passed away.</p> <p>And after a thousand years I ascended the holy mountain and again spoke unto God, saying, "Creator, I am thy creation. Out of clay hast thou fashioned me and to thee I owe mine all."</p> <p>And God made no answer, but like a thousand swift wings passed away.</p> <p>And after a thousand years I climbed the holy mountain and spoke unto God again, saying, "Father, I am thy son. In pity and love thou hast given me birth, and through love and worship I shall inherit thy kingdom."</p> <p>And God made no answer, and like the mist that veils the distant hills he passed away.</p> <p>And after a thousand years I climbed the sacred mountain and again spoke unto God, saying, "My God, my aim and my fulfilment; I am thy yesterday and thou art my tomorrow. I am thy root in the earth and thou art my flower in the sky, and together we grow before the face of the sun."</p> <p>Then God leaned over me, and in my ears whispered words of sweetness, and even as the sea that enfoldeth a brook that runneth down to her, he enfolded me.</p> <p>And when I descended to the valleys and the plains God was there also.</p>	<p>Xweda</p> <p>Di wan rojê berê de, wexta lêvên min yekem car bi peyvê ricifi, ez derketim ser çiyayê pîroz û bi Xwedê re peyivîm, min got, "Xweda, ez evdê te me. Daxwaza te ji bo min zagon e û heta hetê ezê pê bimeşim."</p> <p>Lê Xwedê tiştek negot û wekî bayekî xurt derbas bû û çû.</p> <p>Û piştî bi hezar salê ez dîsa derketim ser çiyayê pîroz û bi Xwedê re peyivîm, min got, "Ey ê dinya û alem xuliqandiyê, Te ez xuliqandim. Te ez ji heriyê çê kirim, her tiştê min bi te ye."</p> <p>Û Xwedê tiştek negot, lê belê wekî hezar baskên xurt derbas bû û çû.</p> <p>Û piştî bi hezar salê ez dîsa hilkişiyam çiyayê pîroz û bi Xwedê re peyivîm, min got, "Bavo, ez kurê te me. Te bi rehm û hezkirina xwe ez anîm, û bi perestî û hezkirinê ezê keysariya te hilgirim."</p> <p>Û Xwedê tiştek negot, û wekî mija ku girên dûr veşêre, derbas bû û çû.</p> <p>Û piştî bi hezar salê ez dîsa hilkişiyam çiyayê pîroz û bi Xwedê re peyivîm, min got, "Xweda, armanc û daxwaza min; ez beriya te me, tu pêşeroja min dixemilîni. Ez rehê te yê di axê de me, tu jî kulîlka min a dirêjî êzmên dibe yî. Û li ber rûyê rokê, emê bi hev re şîn bibin."</p> <p>Xwedê nêzikî min bû, peyvên xweş di guhên min de got, wekî deryayeke ku çemê diherike çawa hambêz dike, ez werê hambêz kirim.</p> <p>Û gava ez daketim beriyê, Xwedê li wir jî bû.</p>

3.2.5.1. Analîza Hokarên Dermetnî

Şander: Gibran Khalil Gibran helbestvan û çîroknûsekî Amerîkî ye ku bi eslê xwe Lubnanî ye. Di 11 saliya xwe de bi malbatî koçî Amerîkayê dîkin. Demeke bi şûn de dizivire Beyrûtê û li Medreseya Hikmetê dixwîne. Piştî ku ji ber berhema xwe ya bi navê *Spirits Rebellious* ji Dêra Katolîk a Maronite tê derxistin, jiyana xwe bi piranî li Boston û Parîsê derbas dike (Young, 1945: 135-138). Altabaa û Hamawiya (2019: 103-107) di lêkolîna xwe ya derbarê jînenîgarî û nivîskariya wî de didin zanîn ku Gibran yek ji damezrînerê civata edebî ya Ereb-Amerîkî ya bi navê *al-Mahjar* e ku ji nivîskarên koçber ên Ereb pêk dihat. *The Prophet, Jesus- Son of Man, The Madman And His Parables* û *Broken Wings* berhemên wî yên herî navdar in. Gibran berhemên xwe bi zimanê Îngilîzî û Erebî nivîsîne û berhemên wî bi dehan zimanan ve hatine wergerandin. Di berhemên wî de evîna mîstîk a mîstîzma Îslamê û hezkirina Îsa Mesîh temayên sereke ne. Her wisa bandora baweriyên Hind û Çînê yên wekî koça ruh û nirvanayê jî di berhemên wî de tên dîtin. Li gor nêrîna Buck (2010: 116) helbestvanê romantîk ê Îngilîz William Blake ji hêla sêwirana helbestî ve, Fîlozofên Amerîkî R. Valdo Emerson û Henry Thoreau ji hêla fikrên felsefî ve bandor li ser wî çê kirine.

Niyeta Şander: Lêkolîner Altabaa û Hamawiya (2019: 104) destnîşan dîkin ku Gibran, wekî mamosteyekî cîhana modern, materyalîzma serdemê red kir û li şûna wê, di çarçoveya mîstîzma Îslamî de bi awayekî nû Xirîstiyaniyê şirove kir. Rengvedana vê bawerî û felsefeya wî di berhemên wî de jî tê dîtin û bi awayekî jî dibe niyeta giştî ya navxweyî ya berhemên wî. Her wisa, derbarê niyeta şander de mimkun e ku em pêwendiyekê navbera nivîsa ku bi daxwaza Gibran li ser kêlika gora wî hatiye nivîsandin û hevokên dawî yên mesela "God/Xweda" girê bidin. Li ser gora wî wiha dinivîse: "Ez jî wekî we jîndar im, û ez li kêleka we sekinîme, çavên xwe bigirin û li dora xwe binêrin, hûnê min li pêşberî xwe bibînin..." (Tabularasa, h. 3). Pêwendiyekê fikr û baweriyê ya wan gotinên li jor û gotinên di dawîya mesela God -Xweda- de yên wekî "Ez rehê te yê di axê de me, tu jî kulîlka min a dirêjê ezmên dibe yî. Û li ber rûyê rokê, emê bi hev re şîn bibin. ... Û gava ez daketim beriyê, Xwedê li wir jî bû." Eger ku em nivîsa li ser kêlika Gibran wekî kakilê fikr û bawerîya wî, wekî peyama wî ya abadîn bihesibînin, niyeta paralel a di hevokên mesela God -Xweda- de jî bi hêsanî dibe niyeta nivîskar a

nivîsînê. Mesela *God -Xweda-* neynika fikr û baweriyên Gibran e û wî di vê meselê de kakilê fikr û baweriya xwe pêşkêş kiriye.

Wergir: Gibran hem bi zimanê Erebi û hem jî bi zimanê Îngilîzî berhemên xwe nivîsîne. Her ku axêverên wan zimanan li seranserê cîhanê hene, xwînerên berhemên Gibran jî xwedî paşxaneyên çandên cihêreng in. Gibran berhemên xwe ji bo xwînerên miletekî an jî welatekî nenivîsîne, lewre peyamên wî ji bo takekesên hemû cîhanê ne. Naveroka berhemên wî, temayên ku ew dike mijar û nêrînên wî yên mîstîk tev xwedî bingeheke qedîm in. Bi vî awayî jî, têkiliya Gibran a bi xwînerên wî re ji sînorê çand û zimanekî spesîfik wêdetir dibe û her wekî (Buck, 2010: 117) destnîşan dike, berhemên wî û edebiyata wî ya îrfanê di ser pêwendiyêke giyanî re xwe digihîne xwînerên rojhilat û rojava.

Navgîn/kanal: Di vê nimûneyê de jî navgîna ragihanê tekst e û bi rêya nivîsê berhema Gibran gihîştîye ber destê xwîneran. Wergera Kurdî wekî hejmara 3 ya kovarê gihîşt ber destê xwîneran û ji ber ku çapa kovarê nemaye, hejmara xwînerên wergerê kêma maye.

Cihê Ragihanê: Pirtûka *The Madman: His Parables and Poems* a ku mesela *God - Xweda-* tê de ye dema ku Gibran li New Yorkê dijî çap dibe. Li gor agahiyên ku Young (1945: 45) dide, piştî demeke kurt wergera berhemê ya Fransî, Almanî, Îtalyanî û Îspanyolî hat çêkirin û li welatên Latîn û Amerîkaya Başûr jî hat naskirin û berhemê hin xelat jî standin. Di wan salan de dostaniya Gibran bi helbestvanên Amerîkî yên hevçaxên wî çê dibe û eleqeyêke zêde di nav civaka şairên rojava de dibîne.

Dema Ragihanê: Berhema *The Madman: His Parables and Poems -Zilamê Dîn: Mesel û Helbestên Wî* di sala 1918an de çap dibe û ji 35 meselan pêk tê. Li gor agahiyên ku Buck (2010: 117) dide, bi vê berhemê Gibran êdî wekî nivîskarekî navdar ê ku bi Îngilîzî dinivîse tê qebûl kirin.

Motîv: Naimy (1974: 129-138) dide zanîn ku Gibran ji navdariyê pir hez dikir û dema berhemên wî eleqeyek baş didîtin gelek kêfxweş dibû. Heta li şûna ku wekî yekê Lubnanî xwe bide naskirin, dixwest ku wekî mîstîkekê ji Hindistanê bê zanîn û wisa jî bêtir balê bikişîne ser xwe. Ji wê agahiyê xuya dibe ku motîvasyona Gibran a nivîsînê navdariya wekî nivîskarekî mîstîk ê rojhilat e. Motîva navdariyê bi tena serê xwe bandorê li ser peyam û naveroka berhemê neke

jî, daxwaza navdariya wekî nivîskarekî mîstîk bivê nevé dê daxilî nav berhemê bibe û bandorê li ser naverokê bike. Motîveke din a nivîskar a nivîsînê derbirîna fikr, bawerî û felsefeya wî ya şexsî ye. Wisa diyar e ku ev pêwîstî ji nivîskar re wekî hisiyateke xurt çê bûye ku bedêlên giran jî ev ji vê yekê dûr nexistiye. Lewre li gor agahiyên ku wergêr di pêşgotina wergerê de dide, pirtûka Gibran a bi navê El-Erwahu'l-Mutemerrid (Giyanên Serhildêr) li Lubnanê qedexe bûye, pirtûka wî li wir şewitandine û ew ji aliyê Dêra Maronit Katolîk ve hatiye pindandin (Tabularasa, 2012, h.3.).

Fonksiyona Tekstê: Mesel wekî cureyeke edebî ji bo çîrokên kurt û sade tê gotin ku bi alegorî û fablê re têkildar e û xwedî peyameke rewîştî ye (Cuddon, 2000: 634). Peyama meselê bi devê vegêr bi zimanekî edebî, bi navgînên vegotinê yên wekî alegorî û sembolan tê ragihandin. Her wekî di tevahiya meselên berhemê de tê dîtin, vegêrê mesela God - Xweda- heman *Mirovê Dîn* e ku berî niha heft caran jiyaye. Mirovê Dîn berdevkê meselan e jî û peyamên ku ji tecribeya xwe ya giyanî dariştine, rave dike (Buck, 2010: 118). Derbarê peyama meselê de Young (1945: 44) dibêje ku ev nimûneyeke serkeftî ya hafizaya abadîn e. Mesel têkiliya vegêrê mirov û Xwedê ya di heyameke bi hezaran salan de radixe pêş çav û bi vî awayî jî xwedî fonksiyona hafizaya giyan û baweriyê ye.

3.2.5.2. Analîza Hokarên Navmetnî

Mijar: Evîna giyanî, hezkirin, pêhisîna bi Xwedê/Afirîner û tecribekirina Wî ya bi rêya yekîtiya sirûştê û hebûna mirov wekî temayên sereke dibin mijarên berhemên Gibran. Mesela God -Xweda- jî bawerî û pêhisîna vegêr a bi hez û hebûna Xwedê ya mezin kiriye mijar.

Naverok: Mesela God- Xweda- behsa hewldanên pêhisîna bi Xwedê ya vegêr dike. Vegêr, bi sefereke giyanî di maweyeke dirêj de çar caran hewl dide ku bi Xwedê re biaxive. Vegêr ji tevgerên xwezayê bersivên ji Xwedê werdigire ta ku di dawiyê de Xwedê hin tiştan di guhê wî de dibêje. Di TJ de dijberiyêke dualî heye û wekî dijberiya “afirîner û afirande”, “bav û kur”, “esmûn û erd”, “piyarî û hezkirin” xuya dibe. Ev dijberî di yekîti û hebûna teqez a Afirîner de ji holê radibe.

Kompozîsyona Tekstê: Berhemên Gibran dikevin nav sînorê cureya “prose poetry -helbesta pexşanî- û tekstên di nav berhema Madman -Mirovê Dîn- de jî

xasyetên vê cureyê nîşan didin. Mesela God -Xweda- bi zimanê xwe yê sembolîk û bi dubarebûna peyvên û ahenga denganiyê ji hêlekê ve nêzikî helbestê dibe, ji hêla din ve jî bi hevoksaziya pexşanî û bi nebûna serwayê jî nêzikî pexşanê ye. Di berhemê de hunera şibandênê heye ku di TJ de bi qalibê "like a..." diyar dibe.

Peyvsazî: Di teksta jêder de peyvên [*God, Master, Creator, Father*] tev Xwedê dinimînin. Di teksta Armanc de jî bi tenê peyvên [*Xweda*] û [*Bavo*] wekî hevtayê wan peyvên derbas dibin. Di teksta jêder de zimanê arkaîk heye ku bi tercîhên nivîskar ên peyvên wekî "thy", "thou", "hast" xuya dibe. Ev peyvên navborî li dema nivîsîna wê tekstê jî peyvên kevn bûn. Reng e ku nivîskar ev wekî "anakronîzmeke bizanetî" ji bo qedîmkirina tekstê bi kar aniye. Di teksta jêder de peyvên [*And, I, God, Thy, Ascend, Climb*] dubare dibin. Dubarekirina peyvên a bi vî rengî wekî hunera "anaphora" tê binavkirin û armanc jî sazkirina têkiliyeke wateyî ya di navbera beşên tekstê de ye. Di teksta armanc de jî bi heman awayî hevtayên wan peyvên jor wekî dubarebûyî xuya dibin.

Hevoksazî: Zimanê berhemê di navbera şewaza helbest û pexşanê de ye. Berhem bi dema borî ya têdeyî "past simple tense" saz bûye û qertafa lêkerên dema borî "ed" jî wekî hêmaneke denganiya biaheng hatine bikaranîn. Hevokên berhemê bi kêrî armanca lêpîrsînê ya vegêr tîn, lê di heman demê de ev cure lêpîrsîn dibe tevna edebî ya şewaza nivîskar. Vegêr bi şiklê dîyalogê bes bi fonksiyona monologê derbirîna xwe ya lêpîrsînê û lêgerîna xwe ya bersivan tîne ziman. Hevokên ku fonksiyona vegotinê bi cih tînin sade ne û nêzikî zimanê hevdem in, lê belê hevokên ku vegêr pê diaxive bi zimanekî arkakîk saz bûne.

3.2.5.3. Armanc û Tercîhên Wergêr

Wergêr, ku di heman demê de edîtor û amadekarê hejmarê 3yê a kovara Tabularasayê ye, armanca wergerandina berhemê di pêşkêşîya kovarê de bi kurtî wiha destnîşan dike: "Nivîskariya Gibran di sedsala xwe de bêhempa ye û li gelek zimanan belav bûye, hatiye xwendin û hîna jî tê xwendin. Loma jî Tabularasa xwestiye ev forma nivîsê ragihîne xwendevanên wêjeya Kurdî" (Tabularasa, h. 3. 2013). Wergêr her wisa balê dikişîne hêleke din a nivîskariya Gibran û diyar dike ku ev pêşengekî giring ê Edebiyata Mehcerê ye. Edebiyata Mehcerê ji edebiyata Ereban re tê gotin ku li Amerîkayê şax vedaye. Wergêr vê edebiyatê û edebiyata Kurdî ya li sirgûnê dişibîne hev û vê yekê wekî sedemeke tercîhkirina wergerê

destnîşan dike. Her ku wergêr/edîtor armanca wergerandinê wekî danasîna vê forma nivîsê û pêşkêşkirina şêwaza Gibran a ji xwînerên Kurdî re diyar dike, hingê divê em bala xwe bidinê bê ka xasyeta şêwezgarî ya mesela Gibran di teksta armanc de heta çî radeyê û bi kîjan guherînan hatiye wergerandin.

Vegêr di meselê de wekî şexsê yekem çar caran derdikeve pêşberî Xwedê û her carê jî li gor pênasekirin, xîtab û naveroka axaftinê em têderdixin ku wekî kesayetekî cuda diçe hizûra Xwedê. Çûyîna her carê ji hêla peyama vegêr ve ji yên din cihêtir e, lê çûna dawî ji her sê çûyînên din bi awayekî berbiçav vediqete. Di çûyîna cara çarem de hem peyama ku vegêr pêşkêşî Xwedê dike, hem taybetiya xitaba wî û hem jî helwesta Xwedê û bersiva Wî cihê ye. Cara yekem çûna vegêr bi dilqê mirovê yekem–reng e ku Adem– e û wekî [*Master*] bangî Xwedê dike. Diyar e ku bi nêrîna vegêr wateya hebûna Xwedê ji bo wî "Master/Hosta yan Efendî" ye.

Yê ku cara duyem diçe –reng e ku Mûsa ye– wekî [*Creator/Afirîner*] bangî Xwedê dike. Vegêr bi sifetê [*Creator/Afirîner*] bandoreke xurt a danûstandina rasterast çê dike. Wergêr li şûna vê sifetê muxatabê vegêr pênaseyêke nerasterast tercîh kiriye: [*Ey ê dinya û alem xuliqandiye*]. Çûna cara sêyem û bangkirina wekî [*Father*] fikra çûna Îsa dide me û wergêr jî ev wekî [*Bavo*] bi awayekî hevta wergerandiye. Çûna cara çarem, a ku bi her awayî ji yên din cihêtir e, bi banglêkirina wekî [*My God/Xwedayê Min*] dûratiya navbera vegêr û Xwedê ji holê radike.

Di teksta armanc de gotina [*In my ears whispered words of sweetness*] wekî [*Peyvên xweşik di guhên min de got*] wergerandiye. Peyva "whisper/pistîn" xuya ye gotina Xwedê ya mîstîk rave dike û danûstandinê dixwe renegeke nepen. Mîmkun e ku Gibran bi peyva "whisper/pistepistê" qesta hîsa bihîstinê kiribe, an mebesta wî bi feyza gotinê ye ku ji hêla guhdêr ve ji dil tê hîskirin.

3.2.5.4. Hevtayiya Edebî û Rexneya Wergerê

Wergêr diyar kiriye ku wî xwestiye cureya meselê bi rêya wergerê di Kurdî de nîşan bide. Meselên di nav berhema *The Madman de*, û her wisa mesela *God/Xweda* ji hêla cureyê ve hem helbestî û hem jî pexşanî ye, an ku cureyêke dureh e. Wergêr vegotîneke pexşanî tercîh kiriye û lewma jî hêla helbestî ya TJ di TA de diyar nebûye. Wekî mînak, di TJ de nivîskar li şûna ku bibêje [*...I said...*]

formeke bêtir helbestî ya wekî [...saying...] tercîh kiriye. Wergêr bi tercîha wekî [...min got...] tekst nêzikî pexşanê kiriye. Di encama vê yekê de, werger dê tameke pexşanî bide xwînerên Kurdî û bi vî awayî jî TA dê bibe temsîleke nîvco ya şêwazgeriyê.

Taybetiyeke şêwazgerî ya mesela *God/Xweda* ev e ku "anaphora", an ku dubarekirina peyvan, wekî faktoreke şêwazgeriyê xwe dide kifşê. Wergêr di TA de bi dubarekirina [*û, ez, Xwedê/a*] hunera dubarekirinê daye nîşan û bi vî awayî jî şêwaza nivîskar ji hin hêlan ve raguestiye xwînerê Kurdî. Arkaîzma bi zanetî ya ku nivîskar di berhema xwe de bi rêya peyvên [*thy, thou, hast*] saz kiriye, di TA de xuya nabe. Dibe ku wergêr arkaîzma bi wan peyvan wekî xasyeteke kultur-spesîfik a zimanê Îngilîzî nirxandibe û di Kurdî de hewl nedabe ku hevtayê wan peyda bike. Tercîha wergêr a bi peyva [*gotinê*] ya li şûna [*pistinê*] bandorê li ser wergirtina xwîner dike û rê li ber watedarkirineke kûrtir digire. Bi heman awayî, tercîha wergêr a [*Xweda*] ya ji bo [*My God*] têkiliya nêzik a vegêrê cara çarem di TA de wekî têkiliyên din ên bi mesafe hiştiye.

Wergêr, bê ku şiroveyeke derveyî konteksta TJ daxilî wergerê bike, naveroka TJ di TA de bi awayekî hevta ragihandiye. Şiroveya wergêr bi niyeta nivîskar digunçe, lê belê hin nuansên giring ji ber temsîla teng a peyvan di TA de winda bûne. Her wekî me di bin sernavê tercîhên wergêr de destnîşan kir, vegêr bi awayên cuda bang li Xwedê dike û sifetên cihê bi kar tîne, lê belê di TA de wergêr ev zengîniya banglêkirinê û fonksiyona wan a cudaker nedaye nîşandan. Ton û moda TJ a aram û nerm di TA de jî tê dîtin. Wergêr hem moda vegotinê û hem jî hîsiyata vegêr bi awayekî hevta veguestiye. Cîhana TJ di navbera asayî û derasayiyê de ye. Vegêr wekî mirovekî jîndar û xwedî hişmendî bi lêgerîna xwe ya mîstîk di cîhaneke asayî de derdikeve pêş xwîner. Dema ku behs tê ser danûstandina bi Xwedê re, xwîner ji rastiya cîhana fîzîkî wêdetir dikeve nav cîhaneke metafîzîk. Di TA de xwîner cihêbûna wan her du cîhanan dikare ji hev cuda bike, lewre wergêr şêwaza xwe ya neqîlkirinê li gor taybetiya TJ bi awayekî jêder-navend çê kiriye û di encamê de jî cîhana TJ û TA li hev hatiye.

Di TJ de ji hêla niyeta nivîskar û bandora tekstê ya li ser xwîner ve xala giring ew e: vegêr wekî bikerê meselê çar caran bi hêviya axaftinê û bi pirsekê derdikeve hizûra Xwedê û ev yek dibe taybetiya hevpar a tekstê. Vegêr her carê bi dilqekî cihê bi pirs û hêviyeke cihê û di encamê de jî bi temsîleke cihê ya kesayet

an jî hebûnekê derdikeve hizûra Xwedê. Wergêr di veafirandina taybetiya hevpar a tekstê de nimûneyeke hevta ya TA pêşkêşî xwîner dike, lê belê di nîşandana nûansên cihê yên TJ de werger bi heman awayî nebûye tekseteke hevta. Di vê yekê de rola şayesandin û binavkirina wergêr diyarker e, lewre wergêr ji bo her çar rasthatina vegêr ya bi Xwedê de nav, motîv û pênaseyên hevpar bi kar anîne û bi vî awayî jî cihêrengiya hundirê TJ di TA de temsîla xwe nedîtiye.

3.2.6. Tekst 6.

Navê Çîrokê: The Gift of the Magi - Diyariya Sersalê.

Nivîskar/Helbestvan: O. Henry.

Wergêr: Sîdar Jîr.

Teksta Jêder: 100 Selected Stories, O. Henry, Wordsworth Classics, Hertfordshire, 1995.

Teksta Armanc: Diyariya Sersalê, O. Henry, Wer.: Sîdar Jîr, Weşanên Lîs, 2013.

Teksta Jêder	Teksta Armanc
<p>The Gift of the Magi</p> <p>One dollar and eighty-seven cents. That was all. And sixty cents of it was in pennies. Pennies saved one and two at a time by bulldozing the grocer and the vegetable man and the butcher until one's cheeks burned with the silent imputation of parsimony that such close dealing implied. Three times Della counted it. One dollar and eighty-seven cents. And the next day would be Christmas.</p> <p>There was clearly nothing left to do but flop down on the shabby little couch and howl. So Della did it. Which instigates the moral reflection that life is made up of sobs, sniffles, and smiles, with sniffles predominating.</p> <p>While the mistress of the home is gradually subsiding from the first stage to the second, take a look at the home. A furnished flat at \$8 per week. It did not exactly beggar description, but it certainly had that word on the look-out for the mendicancy squad.</p> <p>In the vestibule below was a letter-box into which no letter would go, and an electric button from which no mortal finger could coax a ring. Also appertaining thereunto was a card bearing the name "Mr. James Dillingham Young."</p> <p>The "Dillingham" had been flung to the breeze during a former period of prosperity when its possessor was being paid \$30 per week. Now, when the income was shrunk to \$20, the letters of "Dillingham" looked blurred, as though they were thinking seriously of</p>	<p>Diyariya Sersalê</p> <p>Dolarek û heştê û heft sent. Hew ew qas bû. Û şêst sent jî jê perê hûr bû. Wê ew perê hûr piç bi piç, bi bazarkirinên dijwar ên bi dikandar, fêkîfiroş û goştîroşan re, ku her dem rûyê wê ji şermê soromoro dibû – ku jê re digotin çavtengê, – bi wî awayî dabû ser hev. Dellayê ew pere sê caran jimart. Dolarek û heştê û heft sent.</p> <p>Ji bilî ku mirov biavêta ser qenepeya ku peritîbû û bikira qûreqûr, tu tiştêkî din nîn bû. Dellayê jî ew tişt kir. Ew rewş jî mirov ber bi ramana ku dibêje, jîyan ji iskeîsk, pozhildan û bişirîne pêk hatiye dikişîne, lê pozhildan li gorî yên din girantir e.</p> <p>Heta jinika malê ji rewşa pêşin ber bi ya duyem ve tê, em hêdî hêdî li hundirê malê binihêrin. Heftayê bi heştê dolaran, maleke raxistî. Çênabe ku em bibêjin, mala parsekan e, lê belê rewşa malê perîşan e.</p> <p>Li hêwana malê, qutîkeke nameyan hebû, ku tenê nameyek jî nediçû wê qutîkê, û bişkokeke elektrîkê ya ku tu tiliyên faniyan nikaribû pê li zengilê bidaya. Û karteke li ser navê "Mr James Dillingham Young" li wir bidarvekirî bû.</p> <p>Navê "Dillingham", wexta ku xwediyê wî navî heftayê sî dolar digirt, di dema xweşiyê de derketibû holê. A niha, piştî ku heftayî dakete bîst dolaran, tîpên "Dillingham" jî şolî bûbûn, çilmisîbûn, wekî ku dixwest xwe bi D'yeke nefsbîçûk derbibire, wiha dixuya. Lê belê herçî Mr Dillingham dihate malê, Dellaya</p>

contracting to a modest and unassuming D. But whenever Mr. James Dillingham Young came home and reached his flat above he was called "Jim" and greatly hugged by Mrs. James Dillingham Young, already introduced to you as Della. Which is all very good.

Della finished her cry and attended to her cheeks with the powder rag. She stood by the window and looked out dully at a grey cat walking a grey fence in a grey backyard. Tomorrow would be Christmas Day, and she had only \$1.87 with which to buy Jim a present. She had been saving every penny she could for months, with this result. Twenty dollars a week doesn't go far. Expenses had been greater than she had calculated. They always are. Only \$1.87 to buy a present for Jim. Her Jim. Many a happy hour she had spent planning for something nice for him. Something fine and rare and sterling--something just a little bit near to being worthy of the honour of being owned by Jim.

There was a pier-glass between the windows of the room. Perhaps you have seen a pier-glass in an \$8 Bat. A very thin and very agile person may, by observing his reflection in a rapid sequence of longitudinal strips, obtain a fairly accurate conception of his looks. Della, being slender, had mastered the art.

Suddenly she whirled from the window and stood before the glass. Her eyes were shining brilliantly, but her face had lost its colour within twenty seconds. Rapidly she pulled down her hair and let it fall to its full length.

Now, there were two possessions of the James Dillingham Youngs in which they both took a mighty pride. One was Jim's gold watch that had been his father's and his grandfather's. The other was Della's hair. Had the Queen of Sheba lived in the flat across the airshaft, Della would have let her hair hang out of the window some day to dry just to depreciate Her Majesty's jewels and gifts. Had King Solomon been the janitor, with all his treasures piled up in the basement, Jim would have pulled out his watch every time he passed, just to see him pluck at his beard from envy.

So now Della's beautiful hair fell about her, rippling and shining like a cascade of brown waters. It reached below her knee and made itself almost a garment for her. And then she did it up again nervously and quickly. Once she faltered for a minute and stood still while a tear or two splashed on the worn red carpet.

On went her old brown jacket; on went her old brown hat. With a whirl of skirts and

ku mel qal kiribû bi navê "Jim" bangî wî dikir û xwe diavêt hembêza wî. Tiştê ku herî xweş e.

Dellayê dev ji girî berda û rûyê xwe bi sungerekê pudra kir. Wê çû li ber pencereyê sekini û bi gelhoyî li pisîka cûnik temaşe kir, a ku li hewşê, di ser diwarê hewşê re dimeşiya. Roja din serê salê bû, ji bo ku wê ji Jim re diyariyek bikiriya, bi tenê dolarek û heştê û heft sentên wê hebû. Wê ew pere bi mehan penî bi penî bi vê armancê dabû ser hev, lê tewş bû. Hefte bi bîst dolaran nedîçû sêrî. Hesabê sûkê û yê malê li hev derneketibû. Timî wiha ye jixwe. Ji bo ku wê ji Jimê xwe re diyariyek bikiriya, bi tenê dolarek û heştê û heft sentên wê hebû. Jimê berdilê wê. Wê bi saetan tiştên xweş xeyal kirin ji bo wî. Tiştêkî kêmpêyda û jîndar, tiştêkî ku hinekî ji layiqî Jim be.

Di navbera pencereyên odayê de, awêneya diwêr hebû. Dibe ku we ew di malên bi 8 dolaran de – awêneyên diwaran – dîtibin. Mirovekî pir jîr û çalak bi çavdêriyê baş li vebeyandina bilez a ku di navbera her du pencereyan de pêk dihat binihêriya, ew ê der heqê bejn û bala xwe de bibûya xwedî fikreke rasteqîn. Dellaya narîn jî ev huner xweş fam kiribû.

Della ji ni nişkê ve ji pencereyê bi dûr ket û çû ber awêneyê. Çirûska çavên wê şewqa xwe dida, lê belê di nava bîst çirkan de rûçikê wê sar bû. Wê porê xwe yê dirêj ji hev vekir û berî ser girdikên milên xwe da.

Du tiştên malbata James Dillingham Young hebûn, ku pê şanaz bûn. Yek jê katjimêra Jim a zêr bû, ya ku ji bavê wî yadigar mabû, ya rast, ji kalikê wî mabû: yê din jî porê Dellayê bû. Ku şahbanûya Shebayê li wî aliyê karîteya bê ya xênî bijiya, Dellayê wê porê xwe di şibakeyê re berjêr bikira ji bo ku xişt û gewherên şahbanûyê ji qîmet bixista. Heke Silêman dergevanê apartmanê bûya û gencîneya xwe, almastên xwe di mexzenê de veşarta, dê Jim, ji bo ku wî bihesidîne û ji hesidîne riye wî bi wî bide gevçilandin, her gav katjimêra xwe ji berîka xwe derxista û riye wî bida.

Porê Dellayê yê xweşik xwe berî ser piştê dabû û mîna sûlaveke qehweyî berba dibû û diteyisî. Por digihişt heta çonga wê û mîna cilên wê bedena wê radipêça. Wê bi dû re bi hêrs û bi lez porê xwe dîsa da ser hev. Bo kêliyêkê bi wî awayî di cî de sekini, dilopek du dilop hêsirên wê ketin ser xaliçeya sor a ku xavên wê rewisibûn.

Wê rahişte çakête xwe yê sor û kumê xwe yê sor. Bejna xwe li ba kir û bi teyisana çavên şil di dêrî derket, bi lez di pêlikan re daket û derkete kuçeyê.

Della li ber tabelayeke ku li ser dinivîsî,

with the brilliant sparkle still in her eyes, she cluttered out of the door and down the stairs to the street.

Where she stopped the sign read: "Mme Sofronie. Hair Goods of All Kinds." One Eight up Della ran, and collected herself, panting. Madame, large, too white, chilly, hardly looked the "Sofronie."

"Will you buy my hair?" asked Della.

"I buy hair," said Madame. "Take yer hat off and let's have a sight at the looks of it."

Down rippled the brown cascade.

"Twenty dollars," said Madame, lifting the mass with a practised hand.

"Give it to me quick" said Della.

Oh, and the next two hours tripped by on rosy wings. Forget the hashed metaphor. She was ransacking the stores for Jim's present.

She found it at last. It surely had been made for Jim and no one else. There was no other like it in any of the stores, and she had turned all of them inside out. It was a platinum fob chain simple and chaste in design, properly proclaiming its value by substance alone and not by meretricious ornamentation--as all good things should do. It was even worthy of The Watch. As soon as she saw it she knew that it must be Jim's. It was like him. Quietness and value--the description applied to both. Twenty-one dollars they took from her for it, and she hurried home with the 78 cents. With that chain on his watch Jim might be properly anxious about the time in any company. Grand as the watch was, he sometimes looked at it on the sly on account of the old leather strap that he used in place of a chain.

When Della reached home her intoxication gave way a little to prudence and reason. She got out her curling irons and lighted the gas and went to work repairing the ravages made by generosity added to love. Which is always a tremendous task dear friends--a mammoth task.

Within forty minutes her head was covered with tiny, close-lying curls that made her look wonderfully like a truant schoolboy. She looked at her reflection in the mirror long, carefully, and critically.

"If Jim doesn't kill me," she said to herself, "before he takes a second look at me, he'll say I look like a Coney Island chorus girl. But what could I do--oh! what could I do with a dollar and eighty-seven cents?"

At 7 o'clock the coffee was made and

"Xanim Sofronie. Bi Her Cureyî Pertalên Por" sekinî. Della bi carekê re hilkişiya jorê; helkehelka wê bû. Jinika ku xwediya wê kargeha bi navê Sofronie bû, yeke girdomirido, spiçolkî û rûsar bû.

Dellayê pirsî: "Hûn ê porê min bikirin?"

Ez por dikirim, ka kumê xwe derxe û em lê binihêrin, em bibînin hela."

Dellayê porê xwe mîna sûlaveke qehweyî bi ser sermola xwe de berda.

Jinikê bi destê xwe yê serhatî porê wê peland, hilda û got, "Bîst dolar."

Dellayê got, "Temam, ka zû bide min."

Della du saetên dawiyê wekî ku di nava ewrên pembe de biborîne kêfxweş bû. Hemû hest li wê li bin guhê hev ketibûn. Wê hemû dikan li bin guhê hev dixistin ji bo diyariya Jim.

Wê di taliyê de dît. Te yê bigota qey ji bo Jim hatibû çêkirin, ne ji bo tu kesekî din. Tu yê din mîna wê li tu dikanên din jî tunebûn. Yek bi yek li dikanan gişan geriyabû. Zincîreke platîn a katjimêran bû û xeml û bihayê wê, her wekî di hemû tiştên baş de, ne di nexşên xapînok de bû; bi sadebûn û kubariya wê de bû. Tam li gorî katjimêra Jim a hêja bû. Çer ku Dellayê ew dîtibû, gotibû, ev li gorî Jim e. Zincîr jî mîna Jim bû – Bê şatefat, lê belê hêja. Ji bo her duyan jî di cî de bû ev gotin. Bîst û yek dolar jê standibûn ji bo wê zincîrê. Û bi heştê û heft sentan bi lez ber bi malê ve meşiya. Êdî Jim bi piştrastî, bêmetirsî, kingê ku bixwaze, dikare li katjimêra xwe binihêre û ew daxwaz ê pê re peyda bibe. Lê belê, ji ber ku bi vê katjimêra hêja ve di dewsa wê zincîra platîn de qeytaneke çerm hebû, bi dizîka lê dinihêrî.

Gava ku Dellayê xwe gihande malê, ew mestiya wê hinekî ji ser rabû. Wê rahişte maşeyên por û gaz vexist û dest bi çakkirina kaviilkirinên piştî hevguhîna camêrî û evînê kir. Ev yek her dem karekî mezin e, karekî gewre ye!

Di nava çil xulekan de, porê wê alîn alîn bû, wê yekê jî ew bêtir dişibande şagirtekî revîn. Wê di avênayê re baş li rewşa xwe nihêrî, bi çavekî ku xwe naecibîne û ji xwe nerazî, bi baldarî li xwe nihêrî.

Wê xwe bi xwe got: "Heke Jim min nekuje baş e, beriya ku careke din jî li min binihêre, ew ê bibêje, tu dişibî keçikên Korisê. Lê belê min dikaribû çî bikira – Ax! Bi dolarek û heştê û heft sentan çî dihat?"

Di saet heft û nîvan de, qehwe hatibû çêkirin û tawe jî di paş sobeyê de ji bo qelîsêlê hatibû sorkirin?"

the frying-pan was on the back of the stove hot and ready to cook the chops.

Jim was never late. Della doubled the fob chain in her hand and sat on the corner of the table near the door that he always entered. Then she heard his step on the stair away down on the first flight, and she turned white for just a moment. She had a habit of saying little silent prayers about the simplest everyday things, and now she whispered: "Please, God, make him think I am still pretty."

The door opened and Jim stepped in and closed it. He looked thin and very serious. Poor fellow, he was only twenty-two--and to be burdened with a family! He needed a new overcoat and he was with out gloves.

Jim stepped inside the door, as immovable as a setter at the scent of quail. His eyes were fixed upon Della, and there was an expression in them that she could not read, and it terrified her. It was not anger, nor surprise, nor disapproval, nor horror, nor any of the sentiments that she had been prepared for. He simply stared at her fixedly with that peculiar expression on his face.

Della wriggled off the table and went for him.

"Jim, darling," she cried, "don't look at me that way. I had my hair cut off and sold it because I couldn't have lived through Christmas without giving you a present. It'll grow out again--you won't mind, will you? I just had to do it. My hair grows awfully fast. Say 'Merry Christmas!' Jim, and let's be happy. You don't know what a nice--what a beautiful, nice gift I've got for you."

"You've cut off your hair?" asked Jim, laboriously, as if he had not arrived at that patent fact yet, even after the hardest mental labour.

"Cut it off and sold it," said Della. "Don't you like me just as well, anyhow? I'm me without my hair, ain't I?"

Jim looked about the room curiously.

"You say your hair is gone?" he said, with an air almost of idiocy.

"You needn't look for it," said Della. "It's sold, I tell you--sold and gone, too. It's Christmas Eve, boy. Be good to me, for it went for you. Maybe the hairs of my head were numbered," she went on with a sudden serious sweetness, "but nobody could ever count my love for you. Shall I put the chops on, Jim?"

Out of his trance Jim seemed quickly to wake. He enfolded his Della. For ten seconds

Jim qet dereng nedima. Dellayê zincîr xiste nava destê xwe û xwe da quncika maseyê ya li ber dêrî, ciyê Jim her dem tê re diket hundir. Bi dû re pejna wî, dengê piyên wî ji qatê jêr hat, ji nişkê ve wechê wê guherî, spîçolkî bû. Wê ji bo tiştê rojane û hêsan duakirin ji xwe re kiribû adet û di ber xwe de kir pistepist, "Xwedayê dilovan, bike ku ez hê jî bi xweşik bêm, li ber dilê wî bibim şîrîntir."

Jim derî vekir, derbasî hundir bû û derî li pey xwe girt. Barîk û eseh dixuya. Jaro, hê bîst û du salî bû – û toqa malê ketibû stû. Jê re qapûtek diviya û bêlepik bû jî.

Jim wekî kûçikekî nêçîrê bêlebt û liv ket hundir û ziq li Dellayê nihêrî, ku Dellayê nikaribû ji wan awiran tişteke fam bikira, wê rewşê ew tirsand. Ne enîrîn bû, ne surprîz bû, ne qayîlbûn, ne bizdîn, ne jî tu hestên ku Dellayê xwe ji bo wan amade kiribû. Jim di wê rewşê de ziq li rûyê wê dinihêrî.

Dellayê di ber maseyê re xwe gihand balê.

"Jim, hezkiriyê min," qurînî bi Dellayê ket, "bi vî awayî li min nenihêrî. Min nikaribû, nedibû ku min sersal bêyî ku ji te re diyariyekê bistînim derbas bikira. Ew ê dîsa dirêj bibe. Tu li min dobrî, ne wisa? Ez neçar bûm ku min jê bikira. Porê min zû tê. Ka bibêje, "Sersala te pîroz be, "û em bi hev şa bin, bextewar bibin. Tu nizanî min diyariyêke çi qasî narîn – çi qasî xweşik û narîn ji te re kiriye."

Jim bi awayekî ku gelekî serê xwe pê re êşandibe, lê tê negihîştibe, jê pirsî, "Ma te porê xwe jê kiriye?"

"Min jê kir û firot," Dellayê got, "Qey kêfa te jê re nehat, te necciband, çawa ye? Bêpor jî ez dîsa ez im, ne wiha?"

Jim bi zanxwazî çavên xwe li hundir gerandin.

"Te got, min porê xwe jê kir?" Wî bi awayekî xirpoyî got.

Dellayê got, "Ne hewce ye ku tu lê bigerî, min por firot – Ez ji te re dibêjim, min ew firot û çû. Kuro, îşev sersal e. Min bibexşîne, ew ji bo te hat kurtkirin. Belkî porê serê min bêhevta bê hesibandin; lê belê tu kes nikare hezkirina min a ji te bipîve." Wê bi awayekî rûken got, "Jim, ez wê qelîsêliyê sor bikim?"

Jim, wekî ku ji xilmaşiya xwe hişyar bûbe, Della xist hembêza xwe. Ka em bo deh çirkan bo rewşeke sincî berê xwe bidin hêlekê din û bi tiştêkî din re mijûl bibin. Di hefteyekê de, heşt dolar yan jî salê milyonek – Çi ciyawaziya xwe heye? Lê belê ku hûn ji

let us regard with discreet scrutiny some inconsequential object in the other direction. Eight dollars a week or a million a year--what is the difference? A mathematician or a wit would give you the wrong answer. The magi brought valuable gifts, but that was not among them. This dark assertion will be illuminated later on.

Jim drew a package from his overcoat pocket and threw it upon the table.

"Don't make any mistake, Dell," he said, "about me. I don't think there's anything in the way of a haircut or a shave or a shampoo that could make me like my girl any less. But if you'll unwrap that package you may see why you had me going a while at first."

White fingers and nimble tore at the string and paper. And then an ecstatic scream of joy; and then, alas! a quick feminine change to hysterical tears and wails, necessitating the immediate employment of all the comforting powers of the lord of the flat.

For there lay The Combs--the set of combs, side and back, that Della had worshipped for long in a Broadway window. Beautiful combs, pure tortoise-shell, with jewelled rims--just the shade to wear in the beautiful vanished hair. They were expensive combs, she knew, and her heart had simply craved and yearned over them without the least hope of possession. And now, they were hers, but the tresses that should have adorned the coveted adornments were gone.

But she hugged them to her bosom, and at length she was able to look up with dim eyes and a smile and say: "My hair grows so fast, Jim!"

And then Della leaped up like a little singed cat and cried, "Oh, oh!"

Jim had not yet seen his beautiful present. She held it out to him eagerly upon her open palm. The dull precious metal seemed to flash with a reflection of her bright and ardent spirit.

"Isn't it a dandy, Jim? I hunted all over town to find it. You'll have to look at the time a hundred times a day now. Give me your watch. I want to see how it looks on it."

Instead of obeying, Jim tumbled down on the couch and put his hands under the back of his head and smiled.

"Dell," said he, "let's put our Christmas presents away and keep 'em a while. They're too nice to use just at present. I sold the watch to get the money to buy your combs. And now

matematîkzanekî yan jî ji yekê zana bipirsin, ew ê bersiveke çewt bide we, çi ku ew nizanin. Lewre di nava diyariyên ku di sersalê de dihatin de, bersiva vî tiştî tunebû. Ev xala nediyar wê bi dû re bê ronîkirin.

Jim ji berîka qapûtê xwe pakêtek derxist û danî ser maseyê.

Jim got, "Şaşiyên nekî, Della. Bi min, ez qet bawer nakim ku tu tişt, porjêkirin, rîkurkirin yan jî serşûştin, tu tişt ne giring e ku ez pê biêşim. Û tu tişt nikare hezkirina min a ji te kêmbike. Lê belê ku tu pakête vekî, tu yê fam bikî bê ka ez ji ber şaşmayî bûm di sêrî de."

Dellayê bi tiliyên xwe yê spî û narîn kaxiza pakête çirand, benikê wê qetand û bi dû re, bi vekirina pakête re, qîrînî bi Dellayê ket, lûrikên wê hatin. Û giriya. Wê rewşê sermiyanê malê neçar hişt ku hemû hunera xwe ji bo aşkirinê derxe holê.

Şeh hatibûne rêzêkirin, taximê şehan a ku Dellayê ew demeke dirêj bû di mezdeka dikaneke li kolana Broadwayê dîtibû û ecibandibû. Şehên xweşik û ji qalikên kûsiyan, dora wan jî bi gewheran neqîşandî. Şehên biha bûn, rengên wan û porê wê gelekî li hev dikirin. Ji ber ku ew qasî biha bû, bêguman wê di cî de ecibandibû. Belkî ew taximê şehan ji bo wê xeyalek bû û niha li cem wê bû. Lê belê porê xweşik çûbû. Dellayê diyariya ku Jim anibû xist hembêza xwe, da ser dilê xwe, dawiyê ziq li çavên Jim nihêrî û bişirî, bi dû re got, "Porê min zû tê, Jim."

Bi dû re fena pisîkekê baz da; şermê girtibû ser wê.

Jim hê jî diyariya xwe ya xweşik nedîtibû. Dellayê ew di kefa destê xwe yê vekirî de dirêjî wî kir. Ew metalê hêja, wekî ku bi giyanê wê yê pîroz şewq bide, dixuya.

"Jim, qey ne hêja ye? Min navçe arav tarav kir heta ku min ew peyda kir. Êdî tu yê rojê sed caran li katjimêra xwe binihêrî wekî wext hîn bibî. Hela ka katjimêra xwe, bê çawa li hev tîn."

Ji dêvla ku Jim bi ya wê bike û katjimêrê ji berîka xwe derxe, xwe avêt ser qenepeyê û xwe dirêj kir, destê xwe da paş serê xwe û kenîya.

Jim got, "Dellayê, ka em diyariyên xwe bo demekê bidin alî, hilîmin. Qet li rewşa me ya niha nayê. Ji bo ku ez bikarim vî taximê şehan bikirim, min katjimêr firoto. Ka îcar wê qelisêlê bîne sor bike."

Wekî ku tê zanîn, Mecûsî yê pir baqîl bûn ku ji Îsa re diyarî dianîn. Wan rêya diyarîdayînê didîtin di sersalê de. Baqîlî, diyariyên wan tu

suppose you put the chops on."

The magi, as you know, were wise men-wonderfully wise men-who brought gifts to the Babe in the manger. They invented the art of giving Christmas presents. Being wise, their gifts were no doubt wise ones, possibly bearing the privilege of exchange in case of duplication. And here I have lamely related to you the uneventful chronicle of two foolish children in a flat who most unwisely sacrificed for each other the greatest treasures of their house. But in a last word to the wise of these days let it be said that of all who give gifts these two were the wisest. Of all who give and receive gifts, such as they are wisest. Everywhere they are wisest. They are the magi.

kes nedixist şik û gumanan û yên ku cot bûn diguherandin. Û di vir de min mijara xortekî û xamayeke ku hêjatirîn tiştên xwe ji bo hev feda kirin anî zimên. Lê belê xortên jîr û zana yên îro, bihêlin ez vî tiştî bibêjim ku ku jiyariyên ku wan her duyan dabûne hev hev çêtir diyarî nîn bûn. Û ji diyariyên ku hatibûne dayîn û girtin jî, ji wan diyariyan binirxtir tunebûn. Ew li her derê yên herî baqil in. Ew Mecûsî ne.

3.2.6.1. Analîza Hokarên Dermetnî

Şander: William Sydney Porter bêtir bi navê xwe yê nivîskariyê wekî O. Henry tê naskirin û di wêjeya Amerîkî de çîroknûseke navdar e. Li gor agahiyên ku Scofield (2006: 115-120) dide, piraniya çîrokên O. Henry di kovarên navdar de yên wekî Dispatch, Ainslee's û Sunday World hatin weşandin û temamê çîrokên wî di koleksiyoneke 12 pirtûk de hatine çapkirin. Di salên 1920an de çîrokên wî bi milyonan kopî difirotin. Wergera çîrokên wî bi gelek zimanan çê bûye û wekî *Maupassantê Yankê* hatiye binavkirin. O. Henry di çîrokên xwe de behsa jiyana şênîyên bajêr ên ji rêzê dike. Bûyerên ku li destpêkê normal dixuyin bi zimanê wî yê jîr û bi encameke suprîz dibin çîrokên balkêş. Her wisa karakterên O. Henry yên jîndar û cihêreng, zimanê wî yê rengîn û îroniya tûj û jîr a vegotina wî wekî taybetmendiyên cudaker ên nivîskariya wî xuya dibin.

Niyeta Şander: Lêkolîner Long (1949: 2-3) nivîsîna O. Henry a nivîsîna kurte çîrokan bi du armancan ve girê dide. Yek daxwaza wî ya populerbûne yê û ya duyem jî nîşandana wêneya giştî ya civakî û jiyana mirovên ji çîna navîn e ku li wan salan bi kêşeyên aborî û civakî re rû bi rû diman. Di çîroka *The Gift of the Magi* de O. Henry nakokiya nebûna madî û hebûna manevî rûberî hev dike û xuya ye ku dixwaze ji wan her duyan ya ku bi xwe qîmetê didê nîşan bide û wê derxîne pêş. O. Henry ji hêlekê ve diwariyên aborî yên Jim û Della dijîn bi helwesta rojnamevanekî dide kifşê, ji hêla din ve jî di ser mînaka wan re peyamên manevî û

exlaqî dide xwînerên xwe da ku li hember wan kêşeyên madî bibe teseliya dilê wan.

Wergir: Xwînerên O. Henry, her wekî Long (1949: 2) dide zanîn, şênîyên bajarên Amerîkayê bûn ku di çîrokên wî de jiyana xwe ya rojane didîtin û dixwendin. Wergirên zimanê resen ên O. Henry di çîrokên wî de rewşa xwe dibînin, bi mîzaha wî li rewşa xwe dikenin û bi ranêzikiya wî ya exlaqî jî peyama xwe ya manevî werdigirin. Bi vî awayî jî, ew xwînerên xwe û karakterên xwe dike yek. O. Henry rewşa civakî û aborî ya takekesên çîna navîn wekî belgeyeke rojnamevaniyê û bi helwesteke rexneya civakî radixîne pêş çavên wan. Vê yekê jî bi nîşandana armancên wan ên rojane û daxwazên wan ên ji rêzê pêk tîne ku gelek caran bi dilê wan pêk nayê. Nivîskar bi destnîşankirina nirxên manevî yên wekî hezkirin, dilsozî û fedakariyê stargeheke giyanî û exlaqî ji karakterên xwe re çê dike û vê niyeta xwe pêşkêşî xwînerên hevçaxên xwe dike.

Navgîn/kanal: Çîrok di nav koleksiyona çîrokên O. Henry de wekî berhemeke çapkirî gihîşt xwînerên jêder û xwînerên armanc. Berî ku wekî pirtûk bê çapkirin, piraniya çîrokên wî di rojname û kovaran de jî hatine weşandin. Wergera Kurdî ya çîrokên O. Henry wekî pirtûk çap bû û pêwendî bi xwînerên Kurdî çê kir.

Cihê Ragihanê: O. Henry, bi xwe jî wekî bajariyekî, çîrokên xwe li bajarên Amerîkayê û ji bo bajariyan nivîsiye û mirovên çîna navîn, kedkar, karmend û mirovên ji rêzê yên desteng kirine karakter û mijara çîrokên xwe. Çîrokên O. Henry û mijarên wan ji ber vê taybetiya cihê ragihanê dibe ku lokal xuya bikin, lê belê peyamên exlaqî û hûrgiliyên mîstîk û dîrokî bandora çîrokên wî ji sînorên cihê ragihanê wêdetir dike.

Dema Ragihanê: O. Henry çîrokên xwe li destpêka sedsala 20an nivîsîne û di wan salan de, her wekî Long (1949: 1) dide zanîn, çîroka kurt cureya populer a serdemê bû. Rojname û kovaran nivîskar teşwîq dikirin û telîf didan wan da ku çîrokên kurt ji wan re bişînin.

Motîv: Dema ku em di çarçoveya danezanên Long (1949: 1-2) de li hûrgiliyên jiyana O. Henry dinêrin, nivîsîna çîrokên balkêş ên ji bo rojnameyan wekî motîveke nivîsînê xwe dide kifşê. O. Henry ji bo rojnameyan çîrok dinivîsin û ji bo ku bêtir bê xwendin û eleqeyekê bibînin diviya wî çîrokên balkêş peyda

bikira. Îcar, ji bo ku çîrokên balkêş peyda bike O. Henry bi helwesta çavdêriya rojnamevanekî di kolanan de digeriya û bala xwe dide ser çîrokan da ku wan bi awayekî balkêştir, bi karakter û bûyerên nû yên ku wî daxil dikir ji nû ve binivîse.

Fonksiyona Tekstê: Fonksiyona tekstê ya ji hêla xweîner ve ew e ku nakokiya navbera destengiya madî ya Jim û Dellayê bi hebûna wan a hezkirin û fedakariyê berawirdî hev dike. Zivîrna îronîk a rewşê jî fonksiyoneke din a berbiçav a vê tekstê ye ku nivîskar bi vê yekê nakokiyê çareser dike. Çîroka me ya nimûne bandoreke şaşwazkirinê pêk tîne bi encama xwe ya suprîz û îronîk. Ev jî dibe fonksiyona edebî ya vê tekstê ku hesteke empatîk a heyirîn û metelmayînê çê dike. Jixwe yek ji taybetiyên sereke yên çîrokên O. Henry ew e ku dawîya çîrokên wî bi awayekî nehêvîkirî çê dibe û xwîneran şaşmatî dike. Xulasa, çîroka me ya nimûne du fonksiyonan bi hev re pêk tîne. Yek ji wan nîşandana rastî û nakokiyên jiyana rojane ye. Ya duyem jî, nivîskar peyameke manevî di ser wan nakokiyên re dide xwînerên xwe.

3.2.6.2. Analîza Hokarên Navmetnî

Mijar: Hezkirina her du jin û mêrê ciwan ên bi navê Jim û Della û dijiwariya rewşa wan a aborî li dor bûyereke têkildarî kirîna diyariya Noelê tê vegotin.

Naverok: Jim û Della, her yek bê ku yê din bizane, dil dikin ji bo Noelê diyariyan ji hev re bikin, lê belê malbateke desteng in û pereyê wan ji bo tiştên ku dixwazin têrê nake. Ji ber vê çendê jî, tiştên xwe yên herî binirx difiroşin. Della pora xwe difiroşe ji bo ku zincîrekê ji saeta Jim re bikire. Jim jî saeta xwe difiroşe da ku şehê poran ji Dellayê re bikire. Ev bûyera sereke ya nakok di çîrokê de wekî vegeerîna dramatîk derdikeve pêş me.

Kompozîsyona Tekstê: Kurteçîrok bi piranî li dor çalakiya yek an du lehengan û li ser yek bûyer û rewşê saz dibe. Piştî ku tengejeya çîroksaziyê gihîşt lûtkeyê, nivîskar bala xwîner dibe encama çîrokê û di dawiyê de arîşeyê bi rewşeke nû an jî bi peyamekê ji bo leheng û xwîneran çareser dike. Çîrokên O. Henry bi piranî di navbera 5 an 6 rûpelan de ne. Barê vegotinê li ser vegêrê kesê sêyem e ku bi diyalogên navbera karakteran navberê dide vegotina xwe û tabloyeke zindî datîne ber çavê xwîneran. O. Henry di vê çîrokê de jî bûyereke ji

jiyana normal bi listikên peyvan, bi çavdêriyên rewşên nakok û bi encameke suprîz wekî dîmeneke zindî pêşkêşî xwînerên xwe kiriye.

Peyvsazî: Di çîrokê de navên kesayetên dîrokî yê wekî [*King Solomon, Queen of Sheba*] derbas dibin û nivîskar wan ji bo şibandinên îronîk bi kar tîne. Her wisa di ser peyva [*Magi - Mecusî*] re paşxaneyêke exlaqî û dînî ji bo çîrokê çê dibe. Hin peyv di çîrokê de bi niyeta nîşandana nîrxên sembolîk hatine bikaranîn. Wekî nimûne [*combs, pure tortoise-shell combs / Şehên ji qalikê kûsiyê*] û saeta zêr a Jim sembola zengîniyê ne. Pora Dellayê jî sembola bedewiyê ye. Her wisa di çîrokê de ji bo kirpandina rastiya madî ya jiyane jimare û nîrxên pereyê gelek caran hatine bikaranîn.

Hevoksazî: O. Henry di çîrokên xwe de li şûna şayesandinê teknîka nîşandanê bi kar tîne û hewl dide ku bandoreke dîtbarî li ser xwîner çê bike. Hevokên di TJ de jî ji bo pêkanîna vê bandorê hatine kardarkirin. Wekî mînak, di TJ de hevoka [*Where she stopped the sign read: "Mme Sofronie. Hair Goods of All Kinds."*] tabelaya firoşgehê nîşanî xwîner dide. Hevokên O. Henry ji bo ku vegotîneke cihêreng hevokên basîd, hevedudanî û kompleks bê ku vegotîne giran bike bi awayekî hosta bi kar tîne. Piştî behskirineke kurt a derbarê bûyer û rewşê, nivîskar bi rêya dîyalogên navbera karakteran vegêranê zindî dike. Di çîrokê de hevokên biwêjî barê îronî û mîzahê digirin ser xwe, wekî nimûne di TJ de [*Oh, and the next two hours tripped by on rosy wings.*] û [*She was ransacking the stores for Jim's present*] mînakên vê bikaranînê ne.

3.2.6.3. Armanç û Tercîhên Wergêr

Ev berhem yekem werger e ku çîroknûs Sîdar Jîr ji Îngilîzî wergerandiye Kurdî. Çend nimûneyên wergerên çîrokên kurt ên O. Henry di kovarên wekî Sirwe û Rewşenê de berî çapkirina vê wergerê hatine weşandin. Wergêr berî vê wergerê bi navê "Ariya Giyanên Stewr" (2004) û "Dozdeh Çirk" (2011) du berhemên çîrokan jî nivîsîne. Wergêr bi xwe jî nivîskarekî çîrokan e û her wekî di mînakên wergêrên din de jî xuya dibe, meyla wî ya wergerê bi cureya edebî re têkildar e ku bi xwe jî bi vê cureyê berhemên dinivîse. Çîrokên O. Henry bi zimanê xwe yê sade û bi kurtbûna berhemên ji bo wergerandinê hêsan xuya bikin jî, nivîskar di çîrokên xwe de teknîkeke xweser bi kar tîne û cih dide gelek

sembol, referansên çandî û gotinên biwêjî. Ji ber vê çendê, divê wergêrê wan berheman berî temamkirina karê wergerandinê analîzeke baş a wan hêmanan bike.

Wergêr peyva [*Sersal*] wekî berginda [*Christmas*]ê hem wek sernav û hem jî di nav tekstê de bi kar aniyê. Peyva [*Christmas*] wekî rojêke pîroz a dînê Xirîstiyaniyê di zimanê Îngilîzî de beramberî roja serê salê [*New Year*] nîn e. Wergêr di sernavê berhemê de peyva [*Magi - Mecûsî*] jê biriye û li şûna wê peyva [*Sersal*] bi kar aniyê. Her wisa, di teksta jêder de jimareyên têkildarî bihayên tiştan bi jimare û bi sembolên pereyî cih digirin, her wekî di wan mînakên de tê dîtin, TJ: [*Only \$1.87 to buy a present for Jim*] TA: [*ji bo ku wê ji Jim re diyariyek bikiriya, bi tenê dolarek û heştê û heft sentên wê hebû*] û TJ: [*Perhaps you have seen a pier-glass in an \$8 Bat.*] TA: [*Dibe ku we ew di malên bi 8 dolaran de – awêneyên dîwaran – dîtibin*]. Her wekî tê dîtin, di TA de sembola pereyî tune û di mînaka yekem de bi tîpan hatiye nivîsîn û ya duyem de jî jimare heye bes sembola pereyî cih nagire.

Şêwaza nivîskar a vegotinê bi rêya nişandinê ye û xwîner daxilî nav bûyeran dike. Di hin cihan de nivîskar rasterast xitabî xwîner dike. Di vê mînakê de, TJ: [*While the mistress of the home is gradually subsiding from the first stage to the second, take a look at the home.*] TA: [*Heta jinika malê ji rewşa pêşîn ber bi ya duyem ve tê, em hêdî hêdî li hundirê malê binihêrin.*] bi gotina [*take a look at home.*] rasterast xitabî xwîner dike û jê re dibêje ku “ka (tu/hûn) li odê binêre/binêrin.” Di tercîha xwe de wergêr li şûna ku xwîner/wergir bike bikerê nêrinê, vegêr û xwîner dike yek û hevokê wekî "em binêrin" werdigerîne. Heman tercîh di vê mînaka jêr de jî xuya dibe: TJ: [*Which is always a tremendous task dear friends--a mammoth task.*] TA: [*Ev yek her dem karekî mezin e, karekî gewre ye!*]. Peyva jêder [*dear friends -hevalên hêja-*] di wergerê de cih nagire û bi vî awayî jî xitaba vegêr/nivîskar a li xwîneran pêk nehatiye.

3.2.6.4. Hevtayiya Edebî û Rexneya Wergerê

Her wekî me li jor qal kir, navê çîrokê [*The Gift of the Magi*] wekî [*Diyariya Sersalê*] hatiye wergerandin, an ku wergêr li şûna navê "Magi" (Mecûsî) ku kesekî dinimîne peyva "Sersal" a ku rojêke kifşe a salê nişan dide tercîh kiriye. Li gor Hamawandy û Abbas (2014: 360) peyva magi/magus bi Kurdî ye û tê wateya keşeyê (priest) Medan. Ev peyv ji zimanê Avestayî derbasî zimanê

Greki bûye û ji zimanê Greki jî paşgira “sus/ses)” wergirtiye û bi guherîna dengê “g” yê ya bi dengê “c”yê jî wekî “mecus” derbasî zimanê Erebi bûye. Ev tercîh wekî adaptasyon dibe bê qebûlkirin ku wergêr ji ber sedemên cihê di wergerên xwe de vê teknîkê bi kar tînin. Dûrahiya navbera çanda jêder û çanda armanc, cudatîyên zimanî û armancên din ên wergerê gelek caran dibin egera adaptasyonê. Dibe ku wergêr ji ber kêmtanîna "Mecusîyan" an jî ji ber bandoreke muhtemel a vê peyvê ya neyînî ew bi kar neanibe. Her wisa mimkun e ku wergêr xwestiye navê berhemê li gor naveroka çîrokê be, lewre çîrok di çanda armanc de dê kirîna diyariyan a dema sersalê bixe hişê xwîner û bi vî awayî jî bandora tekstê ya li ser xwîner dê li dor sersalê û edetê dayîna diyariyan çê bibe.

Dîsa jî, tercîha wergêr a bikaranîna peyva "Sersalê" ku di zimanê Îngilîzî de bergînda “New Year” e, hevtayîya demê ya di TJ û TA de têk biriye. “Christmas” di TJ de referanseke sereke ya çîrokê ye. Ev peyv hem wekî rojbûna Îsa Mesîh semboleke bawerî û xwebexşiyê ye, hem sernavê berhemê ye û hem jî hêmaneke sereke ya çîroksaziyê ye. Bi tercîha wergêr ya bi peyva "Sersalê" nixê çandî yê ku bi peyva jêder "Christmas" re têkildar in di TA de wînda bûne. Nivîskar bi navê "Magi" xwestiye li dor temsîla dînî û çandî bi şiklekî alegorîk bandorokê li ser xwîner çê bike, ji hêla din ve jî wergêr bi adaptasyona “Sersalê” li şûna bandoreke alegorîk bala xwîner dibe ser roja sersalê û balê dikişîne ser bûyera diyarîkirîna ya wê rojê. Tercîha wergêr tekstê bêtir rojane dike ji bo xwîneran. Lê belê fikr û şiroveya di dawîya çîrokê de ku nivîskar wateya diyarîdayîna û rola Mecûsiyan bi karakterên çîrokê re bi awayekî gelemperî têkildar dike ji holê radişe. Ji ber guherîna sernavê çîrokê ev xala giring wekî beşeke cuda û pêvekî di TA de xuya dibe. Eger mecûsî di sernavê de cih bigirta, hingî peyama nivîskar a di dawîya çîrokê de ku di ser nimûneya kiriyara mecûsiyan re şirove dike, dê bêtir têgîner bûya. Di vê nimûneyê de jî diyar dibe ku tercîhên wergêran ji aliyekî ve hin xasyetên nû li tekstê bar dîkin û ji aliyekî din ve jî dibin sedema windabûna hin xasyetên TJ ku nivîskar mînkun e ku fonksiyonên taybet dabe wan.

Çi bi tercîha nivîskar çî jî bi biryara edîtor be, reng e ku bi bikaranîna jimareyan û sembola pereyî tê armanckirin ku hebûna tiştan û wateya wan bi nixê wan ên madî derkeve pêş. Diyar e ku reqem û sembolên pereyî di TJ de wekî sembolên eşkere û rasterast ên dijberê nixê rewîştî cih digirin. Nivîskar wan hêmanên madî berawirdî fedakariya Jim û Dellayê dike û bi nimûneya

kirinên Mecûciyan jî vê yekê dupat dike. Tercîha wergêr a jêbirina sembola pereyî û bikaranîna tîpan a li şûna jimareyan, nakokiya navbera dinya madî û nixên rewîştî lawaz dike û reng e ku bandora ku nivîskar xwestibe bi vê nakokiyê nîşan bide jî kêr dike.

Şêwaza nivîskar a nîşandanê û niyeta nivîskar a daxilkirina xwîner di wergerê de pêk nehatiye, lê belê wergêr di teksta armanc de roleke din daye xwîner, an ku xwîner teşwîq kiriye li ser rewşê bifikire, lewre rola xwîner a çalak a di teksta jêder de vediguhere roleke pasîf. Di vê mînaka jêr de jî, teknîka daxilkirina xwîner a nav çîrokê di wergerê de pêk nehatiye: TJ: *[Oh, and the next two hours tripped by on rosy wings. Forget the hashed metaphor. She was ransacking the stores for Jim's present.]*. TA: *[Della du saetên dawiyê wekî ku di nava ewrên pembe de biborîne kêfxweş bû. Hemû hest li wê li bin guhê hev ketibûn. Wê hemû dikan li bin guhê hev dixistin ji bo diyariya Jim.]*. Di vê mînakê de nivîskar bi gotina *[Forget the hashed metaphor]* bi xwîner re diaxive, lê berginda vê gotinê di TA de tune. Di encamê de jî taybetiyeke bingehîn a şêwaza O. Henry û helwesta wî ya îronîk di TA de winda bûye. Mînaekeke din a windabûna helwesta îronîk a nivîskar ji ber wergera kêr a hevokekê pêk nehatiye TJ: *[Three times Della counted it. One dollar and eighty-seven cents. And the next day would be Christmas.]* TA: *[Dellayê ew pere sê caran jimart. Dolarek û heştê û heft sent.]*. Nivîskar di TJ de qala pereyê hindik û hijmartina wê ya sê caran dike û piştê jî dibêje ku sibê Noel e. Bi vî awayî rewşeke nakok û dramatîk pêşkêş dike. Lê belê di TA de wergêr hevoka dawî wernegerandiye û lewma jî rewşa dramatîk tam nehatiye fêmkirin.

Cîhana TJ û TA hevta ne, an ku di çarçoveya cîhana pevbestî ya çîrokê de û li dor bûyera realîst a çêkirî, heman bandorên muhtemel dê li ser xwînerên TJ û TA çê bibin. Çîroka modern wekî cureyê pevbestî bi rêya radeya rasteqîniyê sêwiraneke derbarê cîhana tekstê çê dike. Dîsa jî, ji ber hokarên dem, cih û naverokê yê TJ, rasteqîniya mijarê, bandora bûyerê û motiva karakteran dê ji bo xwînerên TA cihê be. Ev yek jî dê xwînerê TA ji realîzmê dûr bixe û xwendinê bike ezmûneke bêtir alegorîk. Ji hêla xwînerên Kurdî ve, yekîtiya xwîner û karakteran ku O. Henry pêk aniye yekser ne pêkan e. Ji ber ku xwînerên Kurdî ne New Yorkiyên salên 1900an in ku nivîskar jiyana wan a rojane dişopand. Di vê niqteyê de, wergêr dikarî bi nîşandana helwesta îronîk a nivîskar û şêwaza

vegotinê ya înteraktîf xwînerên Kurdî bi empatiya di ser lehengan re bike parçeyeke konteksta berhemê. Eger îroniya nivîskar û teknîka vegotinê di wergerê de xuya biba, wê demê xwînerên Kurdî dê serpêhatiya Jim û Dellayê wekî meseleya xwe bidîtana û bi heman awayî nebe jî niyeta O. Henry a hevgihandina xwîner û karakteran dê heya radeyekê pêk bihata.

3.2.7. Tekst 7.

Navê Berhemê: Animal Farm (Chapter I) – Çewliga Heywanan (I).

Nivîskar: George Orwell (1903-1950).

Wergêr: Salih Agir Qoserî.

Teksta Jêder: Animal Farm, George Orwell, Oxford University Press, 1977, pp. 25-34.

Teksta Armanc: Çewlika Heywanan, George Orwell, Weşanên Lîs, 2015, rr. 21-29.

Teksta Jêder	Teksta Armanc
<p data-bbox="379 857 496 887">Chapter I</p> <p data-bbox="300 904 823 1178">Mr. Jones, of the Manor Farm, had locked the hen-houses for the night, but was too drunk to remember to shut the pop-holes. With the ring of light from his lantern dancing from side to side, he lurched across the yard, kicked off his boots at the back door, drew himself a last glass of beer from the barrel in the scullery, and made his way up to bed, where Mrs. Jones was already snoring.</p> <p data-bbox="300 1196 823 1653">As soon as the light in the bedroom went out there was a stirring and a fluttering all through the farm buildings. Word had gone round during the day that old Major, the prize Middle White boar, had had a strange dream on the previous night and wished to communicate it to the other animals. It had been agreed that they should all meet in the big barn as soon as Mr. Jones was safely out of the way. Old Major (so he was always called, though the name under which he had been exhibited was Willingdon Beauty) was so highly regarded on the farm that everyone was quite ready to lose an hour's sleep in order to hear what he had to say.</p> <p data-bbox="300 1671 823 2033">At one end of the big barn, on a sort of raised platform, Major was already ensconced on his bed of straw, under a lantern which hung from a beam. He was twelve years old and had lately grown rather stout, but he was still a majestic-looking pig, with a wise and benevolent appearance in spite of the fact that his tushes had never been cut. Before long the other animals began to arrive and make themselves comfortable after their different fashions. First came the three dogs, Bluebell, Jessie, and Pincher, and then the pigs, who</p>	<p data-bbox="922 857 943 887">I</p> <p data-bbox="847 904 1374 1178">Jones Beg, xwedîyê Çewlika Manorê, wê şevê pînika mirîşkan kilîd kiribû, lê ji ber ku pir serxweş bû, wî ji bîr kiribû taqikên biçûk bigire. Bi xelesa şewqa fanosê, a ku li vî alîyî û wî alîyî kil dibû, hewş derbas kir, li paş derî, bi pihênê bota xwe ji pêyên xwe avêt, qedeheke dawîn a bîrayê ji kûpê qûncêrkê derxist û berê xwe da karyoleyê xwe ku Xanim Jones berî wî li ser raketibû û dikir xirexir.</p> <p data-bbox="847 1196 1374 1626">Çawa ronîya odeya raketinê hat vemirandin, yekser li seranserê xanîyên çewlikê tevgerêke bi kelecana dest pê kir. Temama rojê belav bûbû ku Rêberê Rihspî, xenzîrê gewr, şeva berê xewneke xerîb dîtiye û dixwaze vê xewnê ji heywanên din re vebibêje. Wan ji hev re gotibû dema bawer bibin ku Jones Beg êdî çûye, wê hemû li navenda gova mezin li hev du bicivin. Rêberê Rihspî (her çiqas navê ku ew pê hatibû naskirin Xweşikê Willingdonê bû jî, her tim jê re weha dihat gotin) li çewlikê pir bi qîmet bû, loma jî her kes amade bû saetekê di xewa xwe bibihurin û guhdarî bikin bê ka ew ê çi ji wan re bibêje.</p> <p data-bbox="847 1644 1374 2033">Di dawîya gova mezin de, li ser dikeke bilind, di bin fanoseke bi stûnekê ve bidarvekirî de, Rêberê Rihspî li ser nivînên xwe yên pûş rûniştibû jî. Ew duwazdehsalî bû û van demên dawîyê, ew baş gihîştibû, ji tevgera wî dîyar bû ku wî ji alîkarîyê hez dikir, li gel ku diranên wî tu carî nehatibûn jêkirin jî, ew xenzîrêkî bi heybet bû. Piştî bîstekê, heywanên din hatin, her yekî li gor xwe cihek ji xwe re girt û mexel hat. Ewî her sê kûçik, Bluebell, Jessie û Pincher hatin, di pey re xenzîr hatin û ew yekser li jêr, li pêşîya dikê, li ser pûş rûniştin. Mirîşk li ber pencereyê lûsiyan, kevokan xwe li jor li ser</p>

settled down in the straw immediately in front of the platform. The hens perched themselves on the window-sills, the pigeons fluttered up to the rafters, the sheep and cows lay down behind the pigs and began to chew the cud. The two cart-horses, Boxer and Clover, came in together, walking very slowly and setting down their vast hairy hoofs with great care lest there should be some small animal concealed in the straw. Clover was a stout motherly mare approaching middle life, who had never quite got her figure back after her fourth foal. Boxer was an enormous beast, nearly eighteen hands high, and as strong as any two ordinary horses put together. A white stripe down his nose gave him a somewhat stupid appearance, and in fact he was not of first-rate intelligence, but he was universally respected for his steadiness of character and tremendous powers of work. After the horses came Muriel, the white

goat, and Benjamin, the donkey. Benjamin was the oldest animal on the farm, and the worst tempered. He seldom talked, and when he did, it was usually to make some cynical remark—for instance, he would say that God had given him a tail to keep the flies off, but that he would sooner have had no tail and no flies. Alone among the animals on the farm he never laughed. If asked why, he would say that he saw nothing to laugh at. Nevertheless, without openly admitting it, he was devoted to Boxer; the two of them usually spent their Sundays together in the small paddock beyond the orchard, grazing side by side and never speaking.

The two horses had just lain down when a brood of ducklings, which had lost their mother, filed into the barn, cheeping feebly and wandering from side to side to find some place where they would not be trodden on. Clover made a sort of wall round them with her great foreleg, and the ducklings nestled down inside it and promptly fell asleep. At the last moment Mollie, the foolish, pretty white mare who drew Mr. Jones's trap, came mincing daintily in, chewing at a lump of sugar. She took a place near the front and began flirting her white mane, hoping to draw attention to the red ribbons it was plaited with. Last of all came the cat, who looked round, as usual, for the warmest place, and finally squeezed herself in between Boxer and Clover; there she purred contentedly throughout Major's speech without listening to a word of what he was saying.

All the animals were now present except Moses, the tame raven, who slept on a perch behind the back door. When Major saw that they had all made themselves comfortable and were waiting attentively, he cleared his throat

stûnan danî, mî û çêlek li paş xenzîran mexel hatin û dest bi kayîka xwe kir. Her du hespên parxêlê, Boxer û Clover, hêdî hêdî bi meşa giran, bi hev re hatin hundir, simên wan mezin û bi pûrt bûn, ji tîrsa ku hin heywanên biçûk di nav de hebin û ew pê li wan bikin, ew bi haydarî û baldarî li ser pûş mexel hatin. Laşê Cloverê yê girs, wekî dayîkeke ku xwe digihîne temenê navsere, piştî anîna çar zarokan, laşê wê qet ne gengaz e bibe mîna berê, êdî ew dagirtî û fireh bûbû. Boxer heywanekî baran, girs, bi qasî du metreyan bilind û bi qasî du hespên ji rêzê xurt bû. Çixêzeke spî li ser pozê wî berjêr dibû, vê çixêzê hinekî nêrîneke ehmeqî dida wî, ji xwe ne gelekî jîr bû jî, lê bi tevayî ji ber kesayetîya wî ya gihiştî û hêza wî ya qewîn a ji bo kar, rêz ji wî re dihat girtin. Piştî hespan, bizina spî Muriel û ker Benjamin hatin. Benjamin li çewlikê heywanê herî pîr û yê herî bêexlaq bû. Ew kêman caran dipeyivî û dema ku ew dipeyivî jî, wî tinazîyên xwe dikirin, wekî mînak, digot; Xwedê dêl daye wî da ku mêşan ji xwe biqewirîne, lê xwezî ne dêl heba ne jî mêş. Di nav temama heywanên çewlikê de, ew tenê qet nedikenîya. Dema ku jê dihate pirsîn, çima tu nakenî, wî digot tiştêkî ku ez pê bikenim tune. Lê bêyî ku ew eşkere qebûl bike, ew bi Boxer re sadiq bû, her duyan, ji baxçeyê fêkîyan û bi wir de, li mêrga biçûk, rojên Yekşeman bi hev re derbas dikirin, li gel hev diçerîyan, lê qet bi hev du re nedipeyivîn.

Dema ku komeke çêlikên werdekan ku dêya xwe wînda kiribûn, bi dengêkî qels dikir çîveçîv û dabûn dû hev, ketin hundirê govê û li vî alîyî û wî alîyî ji xwe re li cihêkî ku tu kes pê li wan neke digerîyan, her du hesp nû mexel hatibûn.

Cloverê bi lingên xwe yên pêşiyê yên mezin, li dora wan wekî dîwarê hewşekê çêkir, ew çêlik di navbera wan lingan de xwe dan ser hev û yekser di xew re çûn. Piştî, ciwanîka spî Mollie, a xweşik û kêmaqil ku erebeya Jones Beg dikişand, qevdeke pincarê şekir dicût di devê xwe de, hêdî hêdî bi nazîkî hat hundir. Li pêşiyê mexel hat û bi hêvîya ku balê bikşîne ser gulîyên xwe yên sor ên hûnayî, wê rîşîkên xwe hejandin. Piştî hemûyan, pisîk hat, wekî her tim, ji bo cihê herî germ, li dora xwe nêrî, dawîya dawîyê xwe bera navbera Boxer û Cloverê da û bi kêfxweşî li wê derê dest bi miremirê kir, stra, bêyî ku li gotîneke Rêberê Rihspî guhdarî bike.

Ji bilî Moses, qiralka kedîkirî ku li paş derî, li ser darekê raketî bû, temama heywanan hazir bûn. Dema Rêberê Rihspî dît ku hemûyan cihê xwe xweş kiriye û bi meroq li hêvîya wî ne, wî qirika xwe paqij kir, dest pê kir û got:

“Gelî rêhevalan, xewna min a seyr ku min şeva çûyî dît, we bihîstiye. Lê ez ê dawîyê

and began: “Comrades, you have heard already about the strange dream that I had last night. But I will come to the dream later. I have something else to say first. I do not think, comrades, that I shall be with you for many months longer, and before I die, I feel it my duty to pass on to you such wisdom as I have acquired. I have had a long life, I have had much time for thought as I lay alone in my stall, and I think I may say that I understand the nature of life on this earth as well as any animal now living. It is about this that I wish to speak to you.

“Now, comrades, what is the nature of this life of ours? Let us face it: our lives are miserable, laborious, and short. We are born, we are given just so much food as will keep the breath in our bodies, and those of us who are capable of it are forced to work to the last atom of our strength; and the very instant that our usefulness has

come to an end we are slaughtered with hideous cruelty. No animal in England knows the meaning of happiness or leisure after he is a year old. No animal in England is free. The life of an animal is misery and slavery: that is the plain truth. “But is this simply part of the order of nature? Is it because this land of ours is so poor that it cannot afford a decent life to those who dwell upon it? No, comrades, a thousand times no! The soil of England is fertile, its climate is good, it is capable of affording food in abundance to an enormously greater number of animals than now inhabit it. This single farm of ours would support a dozen horses, twenty cows, hundreds of sheep—and all of them living in a comfort and a dignity that are now almost beyond our imagining. Why then do we continue in this miserable condition? Because nearly the whole of the produce of our labour is stolen from us by human beings. There, comrades, is the answer to all our problems. It is summed up in a single word—Man. Man is the only real enemy we have. Remove Man from the scene, and the root cause of hunger and overwork is abolished for ever.

“Man is the only creature that consumes without producing. He does not give milk, he does not lay eggs, he is too weak to pull the plough, he cannot run fast enough to catch rabbits. Yet he is lord of all the animals. He sets them to work, he gives back to them the bare minimum that will prevent them from starving, and the rest he keeps for himself. Our labour tills the soil, our dung fertilises it, and yet there is not one of us that owns more than his bare skin. You cows that I see before me, how many thousands of gallons of milk have you given during this last year? And what has happened to

werim ser xewnê. Berî wê ez ê hinek tiştên din ji we re bibêjim. Gelî rêhevalan, ez bawer nakim ku ez ê ji niha û pê ve demeke dirêj bi we re bim, berî ku ez bimirim, ez ji xwe re wekî wezîfeyê dibînim ku zanebûna ku min bi dest xistiye bidim we. Min jîyaneke dirêj derbas kiriye, dema ku ez bi tena serê xwe li gova xwe vediketim, ji bo fikirê, gelek dema min çêdibû. Ez bawer im min hinde temama heywanên ku niha dijîn, xwezayîya jîyana li ser vê cîhanê fêm kiriye. Ez dixwazim di der barê vê yekê de çend tiştan ji we re bibêjim. Gelî rêhevalan, gelo jîyana me ya siruştî çawa ye? Ka em bala xwe bidinê: Jîyana me jîyaneke kurt, kambax û dijwar e. Em tîn dinyayê, êm ji bo me tê dayîn da ku em bikaribin bêhna xwe bidin û bistînin û jîyana xwe bidomînin. Em, ên ku dikarin kar bikin, heta ku misqaleke hêza me hebe, bi zorê kar bi me tê kirin û dema ku em nema bi kêr tîn, em yekser bi xedarîyeke kerax tîne serjêkirin. Li Îngilistanê, tu heywan piştî ku temenê wan dibe salek, wateya bextewerî û rehetiyê nizane. Tu heywan li Îngilistanê ne azad e. Jîyana heywanan zivarî û koletî ye: Ev rastîyeke eşkere ye.

Ma gelo ev beşekî rêbazên siruştê ye? Ma ev ji ber ku welatê me xizan e û nikare jîyaneke rehet bide yên ku lê dijîn, loma? Na gelî rêhevalan, hezar carî na! Ruhê erda Îngilistanê bi bereket e û dewlemend e, av û hewa wê baş e, dikare heywanên ku niha hene û ji yên heyî bêhtir têr bike. Ev çewlika me tenê, dikare bi dehan hespan, bi bîstan dewaran, bi sedan mîyan têr bike û jîyaneke rehet û bi rûmet ku dûtî xewn û xeyalên me ye, bide jîyandin. Wê demê, çima em vê rewşa kambax dijîn? Ji ber ku nêzikî temama keda me, bi destên mirovan tê dizîn. Belê, gelî rêhevalan, bersiva tevayîya pirsgirêkên me ev e. Bi kurtayî hemû tişt di gotineke tenê de ye -Mirov. Mirov tenê dijminê me ne. Mirovan ji holê rakin, wê koka birçîbûn û karê zêde heta hetayê ji holê rabe.

Ruhberên ku tu hilberînê nakin, tişteki naafirînin û dixwin, mirov in. Ew şîr nadin, hêkan nakin, pîr qels in, nikarin gîsin bikişînin, nikarin zû birevin û kîvroşkan bigirin. Lê dîsa jî, efendiyên temama heywanan ew in. Ew kar bi heywanan dikin, hew ji bo ku ji birçînan nemirin, êm didin wan û ên mayî ji xwe re hiltînin. Em dixebitin heta ruhê me tê stendin û rêx, bişkul û zelqa me ji bereketê dixwe erdê. Lê hîn ji tu kes ji me, ji bilî çermê li bedena xwe, ne xwedîyê xwe û tişteki ye. Hûn, çêlekên ku li hemberî min mexel hatine, we îsal çend hezar galon şîr dane? Û çî bi wî şîrê ku divê golik xwedî bikirana, hat? Ew şîr dilop bi dilop di qirika dijminên me re çûye xwarê. Û hûn, mirîşkino, we îsal çend hêk kirin û we çend heb ji wan kirin çêlik? Ên ku zêde man, hemû çûn

that milk which should have been breeding up sturdy calves? Every drop of it has gone down the throats of our enemies. And you hens, how many eggs have you laid in this last year, and how many of those eggs ever hatched into chickens?

The rest have all gone to market to bring in money for Jones and his men. And you, Clover, where are those four foals you bore, who should have been the support and pleasure of your old age? Each was sold at a year old—you will never see one of them again. In return for your four confinements and all your labour in the fields, what have you ever had except your bare rations and a stall? “And even the miserable lives we lead are not allowed to reach their natural span. For myself I do not grumble, for I am one of the lucky ones. I am twelve years old and have had over four hundred children. Such is the natural life of a pig. But no animal escapes the cruel knife in the end. You young porkers who are sitting in front of me, every one of you will scream your lives out at the block within a year. To that horror we all must come—cows, pigs, hens, sheep, everyone. Even the horses and the dogs have no better fate. You, Boxer, the very day that those great muscles of yours lose their power, Jones will sell you to the knacker, who will cut your throat and boil you down for the foxhounds. As for the dogs, when they grow old and toothless, Jones ties a brick round their necks and drowns them in the nearest pond.

“Is it not crystal clear, then, comrades, that all the evils of this life of ours spring from the tyranny of human beings? Only get rid of Man, and the produce of our labour would be our own. Almost overnight we could become rich and free. What then must we do? Why, work night and day, body and soul, for the overthrow of the human race! That is my message to you, comrades: Rebellion! I do not know when that Rebellion will come, it might be in a week or in a hundred years, but I know, as surely as I see this straw beneath my feet, that sooner or later justice will be done. Fix your eyes on that, comrades, throughout the short remainder of your lives! And above all, pass on this message of mine to those who come after you, so that future generations shall carry on the struggle until it is victorious.

“And remember, comrades, your resolution must never falter. No argument must lead you astray. Never listen when they tell you that Man and the animals have a common interest, that the prosperity of the one is the prosperity of the others. It is all lies. Man serves the interests of no creature except himself. And among us animals let there be perfect unity,

bazarê û ji bo Jones û zîlamên wî bûn pere û serwet. Û tu, Clover, kanî ew çar ciwanikên ku te ew zan, ne wê di pîrbûna te de, ji te re bûbana piştgirî û kêfxweşî? Temama wan di yeksaliya xwe de hatin firotin û tu yê êdî tu carî yekê jî ji wan nebîni. Dîsa, piştî çar ciwanikan û temama karên we yên li nav erd ji êmê we pê ve, hûn bûne xwedîyê çî?

Her weha ew nahêlin jîyana kambax a ku em derbas dikin bigihîje dawîya xwe ya xwezayî jî. Ez bi xwe, ji bo xwe tu gazinan nakim, lewre ez yek ji yên bextewer im. Ez duwazdehsalî me û zêdeyî çar sed zarokên min çêbûne. Xwezaya xenzîran wisa ye. Lê dawîya dawîyê tu heywan ji kêra zalim kelas nabin. Hûn, xenzîrên ciwan, ên li hemberî min rûniştî, di hundirê salekê de, hûn ê yek bi yek, bi serjêkirineke bi qîrîn, bighîjin dawîya jîyana xwe. Em ê hemû bi wê erjengîyê re bijîn, em hemû, dewar, xenzîr, mirîşk, pez, hemû. Heta qedera hesp û kûçikan jî ji ya me ne baştir e. Tu, Boxer, wê rojek were, wê ew lingên te yên qelew hêza xwe winda bikin û wê Jones te bifiroşe selexaneyekê, wê stûyê te bibirin, te ser jê bikin, wê goştê te bikelînin û bidin gurêxan. Û kûçik; çawa ku kûçik pîr bibin û diranên wan bikevin, wê Jones kevirêkî bi stûyê wan ve girêbide û wan biavêje gola herî nêzîk, wan tê de bifetisîne.

Belê rêhevalino, ma ne eşkere ye ku sedemên temama xerabîyên vê jîyanê zordestîya mirovan e? Tenê bi hilweşandina serdestîya mirovan, wê hilberîna keda me ji me re bimîne. Di hundirê şevekê tenê de, em ê azad û dewlemend bibin. Wê gavê, divê em çî bikin? Divê em bi şev û roj, bi beden û ruhê xwe, ji bo hilweşandina nijadê mirovan bixebitin. Peyama min ji bo we ev e rêhevalino: Serîhildan! Ez nizanim wê kengê ev serîhildan çêbibe, dibe ku di heftayekê de û dibe jî sed salên din, lê ez dizanim, wekî vî pûşê di bin min de, ez ji vê yekê bawer im, dûr an nêzîk, wê edalet pêk were. Ji jîyana we ya kurt, di tiştê mayî de, bila bala we li ser vê yekê be! Berî her tiştî, vê peyama min bigihînin nişên di dû xwe re da ku nişên pêşerojê vê têkoşînê hilgirin ser milên xwe û wê heta roja serkeftinê dewam bikin.

Ji bîra nekin gelî rêhevalan, divê biryar û têkoşîna we tu carî raneweste. Divê tu tiştê we ji rê dernexe. Dema ku hinan ji we re got berjewendîyên Mirov û yên heywanan yek in, serkeftina yekî ya yê din e, tu carî guhên xwe nedin wan. Hemû derew in. Mirov ji berjewendîyên xwe pê ve li yên tu ruhberên din nafikirin. De ka werin em heywan, di nav xwe de, ji bo têkoşînê yekîtiyê rêhevaltîyeke bêpayan ava bikin. Temama mirovan dijmin in. Heywan hemû rêheval in.”

perfect comradeship in the struggle. All men are enemies. All animals are comrades.” At this moment there was a tremendous uproar. While Major was speaking four large rats had crept out of their holes and were sitting on their hindquarters, listening to him. The dogs had suddenly caught sight of them, and it was only by a swift dash for their holes that the rats saved their lives. Major raised his trotter for silence.

“Comrades,” he said, “here is a point that must be settled. The wild creatures, such as rats and rabbits—are they our friends or our enemies? Let us put it to the vote. I propose this question to the meeting: Are rats comrades?” The vote was taken at once, and it was agreed by an overwhelming majority that rats were comrades. There were only four dissentients, the three dogs and the cat, who was afterwards discovered to have voted on both sides. Major continued: “I have little more to say. I merely repeat, remember always your duty of enmity towards Man and all his ways. Whatever goes upon two legs is an enemy. Whatever goes upon four legs, or has wings, is a friend. And remember also that in fighting against Man, we must not come to resemble him. Even when you have conquered him, do not adopt his vices. No animal must ever live in a house, or sleep in a bed, or wear clothes, or drink alcohol, or smoke tobacco, or touch money, or engage in trade. All the habits of Man are evil. And, above all, no animal must ever tyrannise over his own kind. Weak or strong, clever or simple, we are all brothers. No animal must ever kill any other animal. All animals are equal.

“And now, comrades, I will tell you about my dream of last night. I cannot describe that dream to you. It was a dream of the earth as it will be when Man has vanished. But it reminded me of something that I had long forgotten. Many years ago, when I was a little pig, my mother and the other sows used to sing an old song of which they knew only the tune and the first three words. I had known that tune in my infancy, but it had long since passed out of my mind. Last night, however, it came back to me in my dream. And what is more, the words of the song also came back—words, I am certain, which were sung by the animals of long ago and have been lost to memory for generations. I will sing you that song now, comrades. I am old and my voice is hoarse, but when I have taught you the tune, you can sing it better for yourselves. It is called Beasts of England.” Old Major cleared his throat and began to sing. As he had said, his voice was hoarse, but he sang well enough, and it was a stirring tune, something between Clementine

Di vê bîstê de, dengekî xurt bilind bû. Dema ku Rêberê Rihspî diaxivî, çar mişkên girs ji qulên xwe derketibûn, li ser qûna xwe rûniştibûn û wan li wî guhdarî dikir. Wê gavê, kûçikan ew dîtin, lê wan bi tevgerêke bilez xwe gihand qula xwe û canê xwe rizgar kir. Ji bo ku bêdeng bisekinin, Rêberê Rihspî lingê xwe yê pêşîyê bilind kir.

Ji wan re got: “Rêhevalino, xaleke divê ku were sererastkirin heye. Ruhberên kovî, ên wekî mişk û kîvroşkan, hevalên me ne yan dijmin in? Ka em vê yekê bidin dengdanê. Ez vê pîrsê pêşniyazî civînê dikim: “Mişk rêheval in?” Dengdan bi carekê pêk hat û piraniya heywanan mişk wekî rêheval pejirandin. Çar hebên mixalif hebûn, piştî hat fêmkirin ku her sê kûçikan û pisikê ji bo her du alîyan deng daye. Rêberê Rihspî gotina xwe domand û got:

“Bi kurtayî, ez ê çend gotinên din jî ji we re bibêjim. Ez careke din dibêjim, bila her tim di bala we de be ku wezîfeya we dijminîya mirovan û hemû kiryarên wan e. Hemû tiştên ku li ser du lingan dimeşin, dijminên me ne. Hemû tiştên ku li ser çar lingan dimeşin an jî bi bask in, hevalên me ne. Her weha ji bîr nekin ku di şerê li hemberî wan de, divê em neşibin wan. Heta, heger ku hûn li hemberî wan bi ser ketin jî, adetên wan ên xerab wernegirin. Divê tu heywan di xaniyan de nejin, di nav nivînan de ranekevin, cilan li xwe nekin, alkolê venexwin, tûtînê nekişînin, nêzikî pereyan nebin û bala xwe nedin ser bazirganîyê. Temama tevgerên mirovan xerab in. A herî girîng, divê tu heywan li qewmê xwe zilimê neke. Xurt an qels, bîaqil an sade, em hemû bira ne. Divê tu carî, tu heywan, heywanên din nekuje. Temama heywanan wekhev in.

Rêhevalino, ez ê niha xewna xwe ya şeva berê ji we re bibêjim. Nayê tarîfkirin. Di der barê paqijkirina mirovan jî cihanê de bû. Lê tiştêkî ku min ji zû de ji bîr kiribû, anî bîra min. Berî niha bi gelek salan, dema ku ez xenzîrekî biçûk bûm, dêya min û xenzîrên din ên mezin, straneke kevn ku wan meqam û sê gotinên wê yên destpêkê tenê dizanîbûn, digot. Dema ku ez di pêçekê de bûm, min ew melodî dizanîbû, lê ew ji mêj ve ji bîra min çûbû. Lê duh bi şev di xewna min de, ew dîsa hate bîra min. Û ne tenê ev, her weha hemû gotinên stranê jî hatin bîra min. Belê, bi bawerîya min berî niha bi gelek salan, heywanan ew gotin wekî stran digotin, lê berî niha bi gelek nîfşan hatiye jibîrkirin. Ez ê niha wê stranê ji we re bibêjim, gelî rêhevalan. Ez kal im û dengê min hinekî qels e, lê dema ku min meqamê wê fêrî we kir, hûn ê bikaribin ji xwe re baştir bistrên. Navê wê stranê, “Heywanên Îngilistanê” ye.

Rêberê Rihspî qirika xwe paqij kir û dest

and La Cucaracha. The words ran:

Beasts of England, beasts of Ireland,
Beasts of every land and clime,
Hearken to my joyful tidings
Of the golden future time.

Soon or late the day is coming,
Tyrant Man shall be o'erthrown,
And the fruitful fields of England
Shall be trod by beasts alone.

Rings shall vanish from our noses,
And the harness from our back,
Bit and spur shall rust forever,
Cruel whips no more shall crack.

Riches more than mind can picture,
Wheat and barley, oats and hay,
Clover, beans, and mangel-wurzels
Shall be ours upon that day.

Bright will shine the fields of England,
Purer shall its waters be,
Sweeter yet shall blow its breezes
On the day that sets us free.

For that day we all must labour,
Though we die before it break;
Cows and horses, geese and turkeys,
All must toil for freedom's sake.

Beasts of England, beasts of Ireland,
Beasts of every land and clime,
Hearken well and spread my tidings
Of the golden future time.

The singing of this song threw the animals into the wildest excitement. Almost before Major had reached the end, they had begun singing it for themselves. Even the

bi gotina stranê kir. Dema ku wî dest pê kir, dengê wî qels bû, lê têra xwe stra. Meqamekî bi kelecana bû, tiştêkî di navbera "Clementine" û "La Cucaracha"yê de bû. Gotinên stranê wisa bûn:

Heywanên Îngilistanê, heywanên Îrlandayê,

Heywanên hemû welatan û herêman,
Guh bidin mizgîna min a dilgeş,
Ku tê ji demên pêşeroja zêrîn

Dûr an nêzîk, ew roj ê were,
Wê zordestîya mirovan hilweşe,
Baxçeyên Îngilistanê yên tije fêkî
Wê bimîne ji heywanan tenê re.

Wê xelekên pozên me werin derxistin,
Kurtanên li piştta me werin avêtin,
Wê gem, zengû, qûş û navtengên me birizin,

Qamçiyên zalim êdî nema li me dikevin.

Dewlemendiyên ku nayên aqilan,
Genim, ceh, xirpûk, rêsi,
Nefel, biaqil û pincar,
Wê ji me re bimînin di wan rojan de.

Wê erdên Îngilistanê hêşin bibiriqin,
Wê ava wê zelaltir biherike,
Wê bayê hêniktir û şîrîntir rabe,
Wê roja ku em azad bibin.

Divê em hemû bixebitin ji bo wê rojê,
Heger ku em bimirin jî berî wê rojê,
Divê dewar, hesp, qaz û elok,
Hemû bixebitin ji bo xatirê azadîyê.

Heywanên Îngilistanê, heywanên Îrlandayê,

Heywanên hemû welatan û herêman,
Baş li min guhdarî bikin û
Vê mizgînîya pêşeroja zêrîn belav bikin.

stupidest of them had already picked up the tune and a few of the words, and as for the clever ones, such as the pigs and dogs, they had the entire song by heart within a few minutes. And then, after a few preliminary tries, the whole farm burst out into Beasts of England in tremendous unison. The cows lowed it, the dogs whined it, the sheep bleated it, the horses whinnied it, the ducks quacked it. They were so delighted with the song that they sang it right through five times in succession, and might have continued singing it all night if they had not been interrupted.

Unfortunately, the uproar awoke Mr. Jones, who sprang out of bed, sure that there was a fox in the yard. He seized the gun which always stood in a corner of his bedroom, and let fly a charge of number 6 shot into the darkness. The pellets buried themselves in the wall of the barn and the meeting broke up hurriedly. Everyone fled to his own sleeping-place. The birds jumped on to their perches, the animals settled down in the straw, and the whole farm was asleep in a moment.

Temama heywanan bi gotina vê stranê re ketin nav kelecaneke biheybet. Berî ku Rêberê Rihspî bigihê dawîya stranê, êdî wan bi xwe dest bi gotina wê kir. Heta bi yê herî gêj jî, meqamê wê ji ber kiribû û çend gotin bi yê herî bîaqil, ên wekî xenzîr û kûçikan re, digotin. Wan di nav çend deqeyan de, temama stranê ji ber kir. Piştî çend peyamên destpêkê, temama çewlikê bi ahengeke bêqisûr, bi gotina strana “Heywanên Îngilistanê” hejîya. Çêlek oriyan, kûçik reyan, mî kalîyan, hesp hîrîyan û qazan kirin qareqar. Wan pir ji vê stranê hez kir, loma wan pênc caran got, heger ku ew nehatinbana sekinandin, wan ê temama şevê ev stran bigota.

Mixabin, vê hengameyê Jones Beg ji xew rakir, bi gumana ku rûvî ketiye hewşê, ji nav nivînan pengîzî û derket derve. Rahişt tifînga xwe ya ku her tim li qorzîyeke odeya wî ya raketinê spartî bû û derbeyeke saçmeyên şeşebik bera tarîbûnê da. Saçme di dîwarê govê de wînda bûn, wê gavê civîn zû qedîya. Hemû revîyan, çûn cihên xwe yê xewê. Kevok firîyan û çûn xwe li ser darikên xwe danî, heywanên din çûn û li ser pûş veketin, di demeke kurt de temama govê kete xewê.

3.2.7.1. Analîza Hokarên Dermetnî

Şander: George Orwell yek ji nivîskarên navdar ên Îngilîz ê sedesala 20an e ku bi romanên xwe li tevahiya cîhanê tê naskirin. Her du romanên wî, *Animal Farm* (Çewlika Heywanan) û *1984* bi dehan zimanan ve hatine wergerandin û wekî berhemên kûlt bûne mijara gelek lêkolînan. Her ku *Animal Farm* (Çewlika Heywanan) nimûyeke serkeftî ya alegoriya polîtîk e, berhema wî ya bi navê *1984* jî yek ji nimûneyên herî navdar ê romana dîstopîk e. Wergêr di pêşgotina *Çewlika Heywanan* de (Orwell, 2015: 5-18) derbarê jiyana nivîskar de agahiyên dide û diyar dike ku Orwell Hindistanê ji dayîk bûye, ji teşkilata polîsan heya karê mamosteyê bi gelek kar û şixulan mijûl bûye. Di şerê navxweyî yê Îspanyayê de li nav refên Marksîstan li hember hêzên dîktator Franco şer kiriye. Di heyama Duyem Şerê Cîhanê de wekî rojnamevan ji bo BBCyê xebitiye. Di sala 1950yan de ji ber nexweşîya jana zirav li Londonê jiyana xwe ji dest daye.

Niyeta Şander: Ji agahiyên ku wergêr di pêşgotina berhemê de dide (Orwell, 2015: 6) em hîn dibin ku Orwell dema di sala 1911an de li dibistana St. Cyprioneyê dixwîne, sîstema civakî ya Îngilîstanê ya newekhev nas dike û dibe

şahid ku zarokên zengînan ji yên feqîr zêdetir qîmetê dibînin. Her wisa, dema li Burmayê di teşkîlata polîsan a Îngîlistanê de kar dike dibe şahidê neheqîya li ser gelê niştecih. Ev agahiyên ku wergêr derbarê jiyana Orwell de dide, nişan didin ku kêşeya newekheviyê wekî rastiyêke jiyane bi awayekî berbiçav bandor li jiyana wî û li ser teşegirtina fikrên wî kiriye. Dema ku mirov jiyana wî û temayên berhemên wî dide ber hev, niyeta Orwell ya destnîşankirin û rexnekirina newekhevî, zordarî û neheqiyê ya bi rêya berhemên ku nivîsînê bêtir xuya dibe.

Divê em qala hûrgiliyêke din a jiyana Orwell bikin ku niyeta wî ya nivîsîna Çewlika Heywanan rave dike. Orwell wekî alîgirekî Troçkîstan beşdarî şerê navxweyî yê Îspanyayê dibe û fikrekî wî yê dijber li hemberî Stalînîstan çê dibe (Bloom, 2006: 14). Bûyer, tema û kesayetên di Çewlika Heywanan de bi awayekî alegorîk rexneya Stalînîzmê ne ku Orwell bi xwe jî bandor ji vê fikrê û encamên siyaseta wê girtiye. Ji vê em dikarin bigihîjin encameke wisa ku Orwell bi niyeta rexneya fikrekî dijberî xwe ev berhem nivîsiye, an jî ev armanc yek ji niyetên wî yên nivîsîna berhema navborî ye.

Wergir: Ev berhem ji aliyê edebiyatnasan ve wekî alegoriyêke polîtîk hatiye qebûlkirin ku rexneya sîstemeke îdeolojîk û bi taybetî jî rexneya sîstema Sovyetê ya di bin desthilatiya Stalîn de dike. Ji sala 1945an heya îro nêrînên derbarê vê sîstemê timî wekî alîgir û dijber ji hev cuda bûne. Îmkanên xwendinê yên pirtûkê li welatên alîgirê vê îdeolojiyê ji bo demeke dirêj çê nebûye, lê belê li welatên dijber ev berhem û xwendina wê gelek hatiye teşwîqkirin. Helwesta xwînerên vê berhemê li gor nêrînên serdemê û li gor paşxaneyên siyasî û îdeolojîk a xwîneran jî guheriye. Di roja îro de, her ku ev sîstem û kesayetê navborî êdî ne di rojevê de ne, rengê xwendinê jî guheriye û berê xwîneran ji faktorên derveyê bêtir ziviriye ser çîrok û temaya navxweyî. Her wisa, ev berhem li seranserê cîhanê tê naskirin û derbarê wê de gelek zanyarî û lêkolîn hene, lewma jî xuya ye ku xwînerên Kurdî jî dê bi hin zanyariyên pêş berhemê bixwînin. Reng e ku xwînerên Kurd ev berhem bi rêya zimanê Tirkî hem bi çîroka wê û hem jî bi paşxaneyên îdeolojîk û dîrokî ya mijara wê, berî wergera Kurdî, nas kiribin.

Navgîn/kanal: Roman di sala 1945an de li Londonê û salek piştê jî li Dewletên Yekbûyî çap bû û bi hezaran kopiyên wê hat firotin. Di nav demê re jî wergera wê ya bi 32 zimanan çê bû (Bloom, 2006: 15). Roman bi adaptasyonên wekî film û şano jî derket pêşberî temaşevanan.

Cihê Ragihanê: Roman destpêkê li Îngilîstanê û li Dewletên Yekbûyî çap dibe ku her du welat jî wekî navendên kapîtalîzmê tînen qebûlkirin. Li wan welatan îdeolojiya komunîzmê ji bo desthilatdaran û ji bo piraniya welatiyan dibû sedema endîşeyê, lewma jî şert û mercên erênî hebûn da ku berhem bala xwîneran bikişîne. Dîsa jî, ji ber hevpeymanîya Îngilîzîtanê û Dewletên Yekbûyî ya bi Sovyetê û Stalîn re, li destpêkê weşangeran nexwestine vê pirtûkê çap bikin.

Dema Ragihanê: Orwell berhema *Animal Farm* (Çewlika Heywanan) di navbera salên 1943 û 1944an de dinivîse û pirtûk di 1945an de çap dibe. Pirtûk di heyama Şerê Cîhanê yê Duyem de hatiye nivîsandin û di konteksta trajîk a şer de derketiye pêş xwîneran ku vê heyamê dewleta Sovyetê ya di bin rêveberîya Stalin de dibe serwerê nivê Ewropayê.

Motîv: Orwell hezkirina xwe ya bi nivîsê bi heyama zarokatîya xwe ve têkildar dike û diyar dike ku dema zarok bûye pir tenê maye, qîmet nedîtiye, lewre xwe bi çêkirina çîrokên xeyalî mijûl kiriye (Orwell, 2015: 5-6). Her wisa nivîskarê berhema bi navê *Brave New World* Aldous Huxley di koleja Etonê de dibe mamosteyê wî (Orwell, 2015: 6) û reng e ku hem bandora Huxley û hem jî temaya berhema wî bandor li ser nivîskarîya Orwell çê kiriye û motîva nivîsandinê daye wî. Bloom (2006: 10) gotinên Orwell neqil dike ku dibêje wî di navbera salên 17 û 24 saliya xwe de hewl daye ku dev ji nivîsînê berde, lê belê baş zaniye ku ew ê li ser vê biryarê nemîne û dîsa dê dest bi nivîsînê bike. Ji wan her du jêgirtinên ji Orwell diyar dibe ku nivîskarî azweriyeke wî ya şexsî bûye. Her çî nivîsandina romana *Animal Farmê* (Çewlika Heywanan) ye, ev jî bi fikr û hêviyên wî yê siyasî û îdeolojîk re têkildar e ku bûye motîva wî ya nivîsandinê. Jixwe Orwell jî vê yekê piştrast dike û li gor neqilkirina Bloom (2006: 11) dibêje ku piştî 1936an çî nivîsî be, bi awayekî rasterast an jî nerasterast têkildarî Sosyalîzma demokratîk e û li dijî totalîteriyê ye.

Fonksiyona Tekstê: Romana *Animal Farm* (Çewlika Heywanan) li ser têkçûna hêviyekê, berevajîbûna ûtopoyayekê radiweste. Berhem li destpêkê hêviyekê dide xwîner, lê belê bi xirabûna pergala heywanan a wekhevîyê jî têkçûna vê hevîyê nîşan dide. Beşa yekem a ku me wekî teksta dahûrandinê bijart qala çêbûna hevî û ûtopoyayê dike û bertekên heywanan ên derbarê jiyanê azad û wekhev nîşan dide. Tekst hîsiyata xweşbîn a heywanan radigihîne xwîner û wan jî daxilî nav vê atmosferê dike. Berazê pîr Old Major axaftineke wekî propagandaya

komunîzmê dike ku bandorê li ser hemû heywanan dike. Axaftina wî xwedî fonksîyoneke îdeolojîk e ku nêrînên sereke yê komunîzmê dihewîne. Sirûda heywanan a ku bi forma helbestê di vê beşê de cih digire jî sembola vê ûtopyaya wekhevîyê ya îdeolojiya kmonunîzmê ye.

3.2.7.2. Analîza Hokarên Navmetnî

Mijar: *Animal Farm* (Çewlika Heywanan) çîroka komeke heywanan vedibêje ku li hember xudanê xwe serê radikin û piştî ku wî dehf didin jî di nav xwe de bi serokatiya berazan dest bi jiyaneke nû dikin. Mijara beşa yekem jî derketina fikra wekhevî û şoreşê ya di nav heywanan de ye.

Naverok: Heywanên çewlikê di nav şert û mercên giran de dijîn, xudanê wan hem barê giran dide ser piştê wan û hem jî zor û êşkencê li wan dike. Bi teşwîqa Old Major (Rêberê Rihspî) di nav heywanan de fikra jiyaneke azad û wekhev şax vedide. Naveroka beşa yekem xewn û xeyala heywanan e ku bi çirûska ku Old Major bi axaftineke kartêker vêdixê, di dilê wan de wekî agireke xurt geş dibe. Di beşa yekem de, vegêr karakterên nav romanê li gor taybetiyên wan dide naskirin û derbarê rola wan a li nav bûyerên pêşerojê hin palpiştan jî dide.

Kompozîsyona Tekstê: TJ wekî roman xwedî taybetiyên cureya pexşanê ye, lê belê di beşa yekem de stranek bi kompozîsyona helbestê jî cih digire. Di TJ de risteyên 2yem û 4yem ên stranê hevserwa ne, lê di TA de her çi qas di çend mînakên de dengên nêzik hebin jî, ev taybetiya TJ di TA de xuya nabe. Nivîskar di TJ de xêza dirêj (—) bi kar aniye, lê wergêr li şûna wê gihaneka "û" tercîh kiriye.

Peyvsazî: Peyva "comrade" "rêheval" a ku Old Major di TJ de bi kar tîne wî li pêş guhdarên wî wekî yekî zana nîşan dide û helwesta wî ya derbarê heywanên din û wekhevîyê dide kifşê. Peyama ku ji çar peyvan pêk tê [*All Animals are Equal*] dibe dirûşmeya serhildana heywanan û nakokiya sereke ya berhemê destnîşan dike (Moran, 2000: 22-23). Navên di TJ de yê wekî "Old Major", "Napoleon", "Snowball", "Boxer" ne bi tenê navên ji rêzê ne, lê belê her yek karakterekî dîrokî tilnîşan dike. Li gor şiroveya Fadaee (2011: 23) Old Major temsîla Marks an jî Lenin, Snowball temsîla Troçkî, Napoleon jî temsîla Stalin e, û Boxer jî sembola proleterên zehmetkêş e.

Hevoksazî: Hevokên beşa yekem a TJ bêtir pênaseker in, ji ber ku di vê beşê de nivîskar karakteran li gor taybetiyên wan ên şexsî terîf dike. Di TJ de nivîskar hevokên basîd bi taybetî jî ji bo rewş û çalakiyên berbiçav bi kar tîne û ev jî berhemê dike teksteke hêsan ji bo xwendin û fêmkirinê. Hêmanên hevokên basîd jî wekî hev rêz dibin û bi vî awayî jî însîcameke vegotinê çê dibe. Di TJ de mînakên hevokên hevedudanî û kompleks jî hene, lê belê ji hêla têgihîştin û dirêjîyê ve bi hevokên basîd re di nav ahengê de ne.

3.2.7.3. Armanc û Tercîhên Wergêr

Wergêr ji bo wergera Çewlika Heywanan pêşgotinek nivîsiye û tê de derbarê Orwell û berhema wî de hin agahî dane. Wergerên romanên ên ku di nav koleksiyona Edebiyata Cîhanê ya weşanxaneya Lîsê de çap bûne bi piranî bê pêşgotin çap bûne. Diyar e ku wergêr û weşanger ji bo vê berhemê pêwîstî bi pêşgotinekê dîtine. Di naveroka pêşgotinê de agahiyên derbarê jiyana Orwell û wateya sembolîk a berhema wî zêdetir cih digirin, an ku wergêr wekî nivîskarê pêşgotinê taybetiya berhemê ya dermetnî û peyama wî ya siyasî û civakî giring dîtiye. Di pêşgotinê de derheqê şewaza wergerê û hêmanên şewazgerî yê berhemê de rexne û nirxandin cih nagirin.

Wergêr di teksta armanc de ji bo hin nasnavên Îngilîzî bergindên Kurdî çê kirine. Li şûna [*Mr Jones*] navpêdaneke wekî [*Jones Beg*] tercîh kiriye û ji dêvla [*Mrs Jones*] jî gotineke wekî [*Xanim Jones*] bi kar aniye. Bi heman awayî navê karakterê [*Old Major*] jî wekî [*Rêberê Rihspî*] lokalîze kiriye, lê navên karakterên din [*Bluebell, Jessie, Pincher*] wekî xwe hiştiye. Wergêr di raguhestina hin peyvên jêder de, wekî mînak peyvên "soil" û "nature", bala xwe nedaye wateya peyvên a nav kontekstê û li gor wateya wan a ferhengî ew neqil kirine.

Wergêr TA ji hêla şikl û kompozîsyonê ve li gor qaydeyên TJ çê kiriye. Wergêr strana di TJ de li gor kompozîsyona helbestê bi heman awayî di TA de afirandiyê. Di TJ de risteyên 2yem û 4yem ên stranê hevserwa ne, lê di TA de her çî qas di çend mînakan de dengên nêzik hebin jî, ew xasyeta TJ di TA de xuya nabe. Ji hêla xalbendiyê ve cudatîyek heye ku ew jî nivîskar di teksta jêder de xêza dirêj (—) bi kar aniye, lê wergêr li şûna wê gihaneka "û" tercîh kiriye. Wergêr ji hêla raweya demê ve di TA de, her wekî TJ, bi dema borî bûyer ragihandine.

Di TJ de nivîskar behsa du stranan dike û wan stranan dişibîne strana bi navê *Beasts of England / Heywanên Îngilîstanê*. Vegêr dema ku behsê tîne ser strana ku Old Major qala wê dike, wê stranê dişibîne du stranên din: TJ: [*...and it was a stirring tune, something between Clementine and La Cucaracha*]. TA: [*Meqamekî bi kelecana bû, tişteki di navbera "Clementine" û "La Cucaracha"yê de bû*]. Ev her du stran, Clementine û La Cucaracha, ne bi tenê bi armanca şibandinê di TJ de cih digirin, lewre nivîskar bi wan mînanan bi berdevkiya Old Major peyameke sergirtî jî dide. Ji ber vê çendê, ji bo ku fonksiyona wan a her du stranan bêtir eşkere bibe, pêwîstî bi dabînkirina agahiyên têkildarî paşxaneyê wan derdikeve holê. Wergêr bi tenê di pêşgotinê de agahiyeke kurt derbarê stranan de daye, lê belê sedema şibandinê û xalên hevpar ên wan stranan û rola wan a şewazgeriyê eşkere nekiriye.

3.2.7.4. Hevtayiya Edebî û Rexneya Wergerê

Ji pêşgotina wergêr a ku jînenîgariya Orwell û rengvedana berhemê ya siyasî û îdeolojîk derdixe pêş diyar dibe ku wergêr pêşekî daye wate û qîmeta berhemê û peyama wê ya giştî giringtir dîtiye. Ji ber vê helwestê ye ku wergêr bala xwe bi taybetî nedaye ser xasyetên sereke yê berhemê. Di beşa yekem de, ku me wekî TJ bijart, tercîhên wergêr ên derbarê nasnav, peyv û şeweyên gotinê nîşan didin ku wergêr hêlên şewazgerî yê berhemê zêde analîz nekirine. Di encama vê helwestê de jî, ji aliyekî ve berhema Çewlika Heywanan li gor peyama xwe ya alegorîk û referansên xwe yê fikrî bûye wergereke temsîlî ya hevta, ji aliyê din ve jî hin taybetiyên tekstê yan nehatine neqilkirin, an jî di neqilkirina wan de xeletiyên madî çê bûne.

Wergêr, wergera nasnavan bi bergindên newekhev [*Mr Jones/Jones Beg*] û [*Mrs Jones/Xanim Jones*] çê kirine û navê karakterekî [*Old Major*] wergerandiye û yê din wekî yê resen hiştiye. Bi vê yekê jî diyar dibe ku wergêr bi stratejiyeke diyar nêzikî vê kêşeyê nebûye, an jî biryar nedaye bê ka di wergerandina hêmanên kultur-spesîfik de stratejiyeke jêder-navend an jî armanc-navend hilibijêre. "Old Major" ji navekê bêtir wekî nasnav e û bi vî awayî wergêr dibe xwestibe wê ji navên resen cuda bike. Dîsa jî, du tercîhên cuda yê navpêdanê di TA de çê bûne. Ji hêlekê ve, binavkirinên wekî Jones Beg û Xanim Jones rengê teksteke kedîkirî didin xwîner, navên din ên resen ên neguhertî xwînerê TJ ji vê hîsî bi dûr dixê û derbarê cîhana tekstê hisiyateke dudil çê dike.

Terciha wergêr a wergerandina navê [*Old Major*] a wekî [*Rêberê Rihspî*] şêweya wergirtina xwînerê TA ji wergirtina xwînerê TJ bi dûr dixîne, lewre hem "rêbertî" û hem jî "rihspî" du wesfên nû ne ku wergêr li karakterê "Old Major" kiriye. Di nirxandinên li ser vê berhemê de "Old Major" wekî "Karl Marx" ê afirînerê îdeolojiya komunîzma Marksîst tê qebûlkin. Dibe ku wergêrê ku ji vê şibandina alegorîk haydar e, xwestibe girêdana navbera "Old Major" û "Karl Marks" bêtir eşkere bike li pêş çavê xwîner. Her wisa gengaz e ku têkiliyek navbera peyva "old/kal" û "rihspî" bê avakirin, lê fonksiyona karakterê "Old Major" ji rêbertiyê bêtir, taybetiya zanebûn û tecrîbeyê dide der. Binavkirina wekî "Rihspî" her wisa îmajê kevnepîyê û dîndariyê jî dide karakterê Old Major.

Dema ku Old Major (Rêberê Rihspî) li pêş heywanên çewligê yên mereqdar gotinê tîne ser mijara sereke, bi pirsê axaftina xwe didomîne: [*Now, comrades, what is the nature of this life of ours?*]. Bi vê pirsê Old Major (Rêberê Rihspî) armanc dike ku rastiya jiyana wan a li çewliga heywanan wekî pirs bide pêş çavên wan. Lê, her ku ji wergerê diyar dibe, wergêr peyva "nature" a ku hem wateya "sirûştê" û hem jî wateya "xasyeta tiştê" dide, bi wateya sirûştê têgihîştîye û wisa neqil kiriye: [*Gelî rêhevalan, gelo jiyana me ya sirûştî çawa ye?*]. Diyar e ku di vê kontekstê de peyva "nature" wateya xasyeta jiyana heywanan dide. Wergêr bi terciha "sirûştê" jiyana heywanan a sirûştî wekî pirs pêşkêş kiriye, lê mebesta Old Major a bi vê pirsê ew e ku xasyeta dijwar a jiyana wan a li çewligê bike mijara lêpîrsînê. Di dewama axaftina Old Major de mebesta wî çêtir eşkere dibe, lê bandora pirsê yekemîn û nîvenga wateya wê ne wekî TJ ye û ev jî bandora pirsê lawaz dike.

Peyva "soil/ax" wisa diyar e ku wergêr ev peyva ku li du cihan derbas dibe bi peyva "soul/ruh" tevlihev kiriye. Wateya peyvên "soil/ax" û "soul/ruh" ji hev dûr in û lewma jî wê tevliheviyê di TA de encameke nezelal a wateyê derxistiye holê. Di mînaka yekem de [*The soil of England is fertile*] wekî [*Ruhê erda Îngilîstanê bi bereket e.*] hatiye wergerandin. Di mînaka duyem de jî [*Our labour tills the soil*] ku berginda wê bi wergereke rasterast "Keda me axê radike" wekî [*Em dixebitin heta ruhê me tê stendin*] hatiye wergerandin. Di mînaka yekem de peyva "ruh" di TA de zêde bûye û wateyê nediyar a wekî "ruhê erda Îngilîstanê" derxistiye holê. Di nav tevahiya peyama Old Major de mebesta "Bereketa ruhê erdê" kêma zêde tê fêmkirin lê însîcama vegotina "Old Major a rexneyî xirab dike.

Di mînaka duyem de wergereke rasterast a hevoka jêder divê wekî "Keda me axê radike" be, her ku "Old Major" bi vê gotinê kedxwariyê amaje dike. Wergera wê hevokê ya nehevta jî dijiwariya xebatê rave dike. Di vê têkiliya nehevta ya ku ji ber wergera xelet a peyvekê çê bûye, peyama teksta jêder, an ku rakirina erdê, di TA de bûye encam û şiroveya karê dijiwar.

Di TJ de Old Major bi pirsên ku ji heywanên guhdar dipirse niyet û peyama xwe zelal dike. Pirsên wî di heman demê de peyamên wî xurt dikin û wateya wan a wekî manîfestoyê diçespinîn. Hin pirs û niyeta pirsan di TA de xwedî heman fonksiyonê û bandorê nîn in. Wekî mînak, bi gotina [*Why, work night and day, body and soul, for the overthrow of the human race!*] Old Major niyeta xwe wekî vebijêrk dadine pêş heywanan da ku di hişê wan de lêpirsînek çê bibe. Lê belê, di TA de heman hevok her wekî pêwîstî an divêtiyek destnîşan bike, an jî peywîrekê bide pêş heywanan diyar dibe: [*Divê em bi şev û roj, bi beden û ruhê xwe, ji bo hilweşandina nijadê mirovan bixebitin.*]. Cîyawaziya xalbendiyê jî cihêbûna her du peyaman dide kifşê. Di TJ de baneşan (!) heye lewre armanca peyamê çêkirina lêpirsînê ye di hişê heywanan de, ji hêla din ve di TA de xal (.) heye û ev jî bi armanca peyama jêder a peywîrdarkirinê li hev dike.

Xewna Old Major ku heywan tev li bendê ne, wekî tema ûtopyaya komunîzmê ye û ji bo bandora armanckirî ya tevahiya tekstê giring e: [*It was a dream of the earth as it will be when Man has vanished.*]. "Old Major" bi vê hevokê ûtopyaya xwe û ya hemû heywanan diyar dike. Xewna wî derbarê dinyaya pêşerojê wisa ye ku êdî hukmê mirov li ser nîn e. Lê peyama Old Major di TA ne heman wateyê dide û ne jî heman bandorê çê dike: [*Di der barê paqijkirina mirovan ji cîhanê de bû.*]. Bi vê tercîha wergerandinê, peyama Old Major di TA de bi tenê mijara xewnê rave dike, lê behsa dinyayeke hêvîkirî nake.

Di mînaka stranan de, wergêr dikarî bi rêya jênotan hin agahî dabîn bikira ji xwînerê armanç re da ku têkiliya strana *Beasts of England/ Heywanên Îngilîstanê* bi her du stranên din re, Clementine û La Cucaracha, çê bike. Strana Clementine ya Percy Montrose derbarê bûyereke sala 1884an de ye û çîroka xemgîn a keçikeke biçûk a madenvan vedibêje. Keçika bi navê Clementine dilikume û dikeve nav çem, bi ro de diçe ê dixeniqe. Şibandina bi vê stranê li ber çavê xwîner hîs û toneke xemgîn dide strana Old Major a bi navê *Beasts of England/Heywanên Îngilîstanê*. Strana La Cucaracha jî di salên 1910-1920 de

heyama şoreşa li Meksîkayê hatiye nivîsîn û bi awayekî henekî û tiraneyî qala dîktator Victoriano Huerta yê alkolîk dike. Wisa diyar e ku şibandina wê ya bi strana *Beasts of England/Heywanên Îngilîstanê* ji rewşa heywanan a neçar tê û her wisa kesayeta dîktorê alkolîk û xwediyê çewligê Mr Jones ê ku pir alkolê vedixwe dişibîne hev. Di vir de kêşeyeke kultur-spesîfik diyar dibe, lewre xwînerê TA ji bihîstina wan stranên dûr in, lewma jî hîs û tona xemgîn a strana Clementine û îroniya di La Cucaracha de dê heman bandorê li ser xwînerên TA nekin.

Her çi qas tercîha wergêr a bikaranîna gihaneka "û" yê ya li şûna "(—)" negiring xuya bike jî, divê bê diyarkirin ku fonksiyona "û" yê û fonksiyona ya "(—)" cihê ye û her du jî ji hêla wateyê ve bandorên cihê li ser wergir çê dikin. Nivîskarê tekstekê bi rêya "(—)"yê agahiyeyeke din a zêde dide û wê bi fonksiyoneke manendî ya sembola kevanê dide. komeka bi "(—)"yê wekî darazeke serbixwe cuda dibe û wekî encama mantiqî ya daraza yekem e. Ji hêla din ve gihaneka "û" têkiliyeke kordîne di navbera her du firazan de çê dike û wan wekî du darazên hevta pêşkêş dike. Tercîha wergêr a bikarneanîna xêza dirêj bandorê li ser hevtayiya hevoksaziyê jî dike. Wekî mînak, li şûna hevoka kompleks a ku bi xêza dirêj pêk hatiye [*Each was sold at a year old—you will never see one of them again.*] di TA de [*Temama wan di yeksaliya xwe de hatin firotin û tu yê êdî tu carî yekê jî ji wan nebînî.*] hevok bûye hevedudanî.

3.2.8. Tekst 8.

Cureya Edebî: Şanoname.

Navê Berhemê: Macbeth.

Nivîskar: William Shakespeare (1564-1616).

Wergêr: Kawa Nemir.

Teksta Jêder: Shakespeare's Macbeth, William Shakespeare, Ed., Sidney Lamb, Hungry Minds Inc., New York, 2000, pp. 29-38.

Teksta Armanc: Macbeth, William Shakespeare, Weşanên Avesta, Stenbol, 2021, rr. 55-65.

Teksta Jêder	Teksta Armanc
<p>ACT I, SCENE 1</p> <p>A desert heath.</p> <p><i>[Thunder and lightning. Enter three Witches]</i></p> <p>First Witch When shall we three meet again In thunder, lightning, or in rain?</p> <p>Second Witch When the Hurlyburly's done, When the battle's lost and won.</p> <p>Third Witch That will be ere the set of sun.</p> <p>First Witch Where the place?</p> <p>Second Witch Upon the heath.</p> <p>Third Witch There to meet with Macbeth.</p> <p>First Witch I come, Graymalkin!</p> <p>Second Witch Paddock calls.</p> <p>Third Witch Anon.</p> <p>All Fair is foul, and foul is fair: Hover through the fog and filthy air. <i>[Exeunt]</i></p>	<p>PERDEYA I. SEHNEYA I.</p> <p><i>Dereke bê dar û ber.</i></p> <p><i>Gurregura 'ewran û şîrşeşîrqa birûskan. Sé PÎREBOK dikevîne hundir.</i></p> <p>PÎREBOKA YEKEM. Kingê em ê her sê dîsa civata xwe bigerînin? Dema gurrîniya 'ewran, şîrqîniya birûskên ku bîn, Yan em dema baranê dîsa civata xwe bigerînin?</p> <p>PÎREBOKA DUYEM. Dema ku têr hev du pêpes kirin, wê hingê, Em bibînin bi şer de kî ket, kî rabû, wê hingê.</p> <p>PÎREBOKA SÊYEM. Hê roj neketî tasê, wê bê girtinê serê vê lodginkê.</p> <p>PÎREBOKA YEKEM. Em ê li kê derê civatê bigerînin?</p> <p>PÎREBOKA DUYEM. Li tanga tûmên hewşanan.</p> <p>PÎREBOKA SÊYEM. Li wêrê, me li gel Macbeth heye civan.</p>

ACT I, SCENE 3

A heath.

[Thunder. Enter the three Witches]

First Witch Where hast thou been, sister?

Second Witch Killing swine.

Third Witch Sister, where thou?

First Witch A sailor's wife had chestnuts
in her lap,

And munch'd, and munch'd, and
munch'd: 'Give

me,' quoth I:

'Aroint thee, witch!' the rump-fed ronyon
cries.

Her husband's to Aleppo gone, master o'
the Tiger:

But in a sieve I'll thither sail,

And, like a rat without a tail,

I'll do, I'll do, and I'll do.

Second Witch I'll give thee a wind.

First Witch Thou'rt kind.

Third Witch And I another.

First Witch I myself have all the other;

And the very ports they blow,

All the quarters that they know

I' the shipman's card.

I'll drain him dry as hay:

Sleep shall neither night nor day

Hang upon his pent-house lid;

He shall live a man forbid.

Weary se'nnights nine times nine

Shall he dwindle, peak and pine:

Though his bark cannot be lost,

Yet it shall be tempest-tost.

Look what I have.

PÎREBOKA YEKEM.

Pîşîka Gewr, ez tēm, pitê!

PÎREBOKA DUYEM.

Beqa Çavzoq gazî dike.

PÎREBOKA SÊYEM.

Va ez tēm!

PÊK VE.

Heçî yekrû ye, durû ye; heçî durû jî, yekrû
ye tam:

De bi fir û ger bidine nava moranê, hewayaya
'hilî'heram.

[Derdikevin.

SEHNEYA III.

'Erdekî hewşanan.

*Gurregurra 'ewran. Sê PÎREBOK dikevîne
hundir.*

PÎREBOKA YEKEM.

Ka tu li kê derê bûyî, xûçê?

PÎREBOKA DUYEM.

Min beraz serjêdikir, lêlê.

PÎREBOKA SÊYEM.

Xûçê, tu li kubûyî?

PÎREBOKA YEKEM.

Jina deryagerekî şambelot topî pêşa xwe
kiribûn,

Û qurp ha qurp, qurp ha qurp hey dixwar: –
'Ka bide min jî,'

Min gotê:

'Lê de here, pîrebokê!' gurriya qûnlengerî bi
ser min de qîriya.

Mêrê wê yê serkarê keştiya bi navê *Piling*
tê çûye Helebê:

Lê ez ê li bêjîngêkê pêkdar bibim û xwe
bişêlinîme wî diyarî,

Bi gorra pîrikên xwe, ez ê bikevîme dilqê
cirdoneke bêterrî,

Ez ê bikutîme wî, ez ê wî bikutîm, ez ê hey
bikutîme wî.

PÎREBOKA DUYEM.

Nexwe ez bayekî bidîme te.

<p>Second Witch Show me, show me.</p> <p>First Witch Here I have a pilot's thumb, Wrack'd as homeward he did come. <i>[Drum within]</i></p> <p>Third Witch A drum! a drum Macbeth doth come.</p> <p>All The weird sisters, hand in hand, Posters of the sea and land, Thus do go about, about: Thrice to thine, and thrice to mine, And thrice again, to make up nine, Peace! the charm's wound up.</p> <p><i>[Enter MACBETH and BANQUO]</i></p> <p>Macbeth So foul and fair a day I have not seen.</p> <p>Banquo How far is 't call'd to Forres? What are these, So wither'd and so wild in their attire, That look not like th' inhabitants o' the earth, And yet are on 't? Live you? or are you aught That man may question? You seem to understand me, By each at once her choppy finger laying Upon her skinny lips: you should be women, And yet your beards forbid me to interpret That you are so.</p> <p>Macbeth Speak, if you can: what are you?</p> <p>First Witch All hail, Macbeth! hail to thee, Thane of Glamis!</p> <p>Second Witch All hail, Macbeth! hail to thee, Thane of Cawdor!</p> <p>Third Witch All hail, Macbeth! that shalt be king hereafter.</p>	<p>PÎREBOKA YEKEM. Xweşpîrebok î, ava be mala te. PÎREBOKA SÊYEM. Ka ez jî bayekî bi te dim. PÎREBOKA YEKEM. Mala te ava, xwedana bayên mayîn gişan her ez im: Benderên ku ew lê radibin, ez beled im bi wan hemûyan, Nas dikim hêlên ku ew berê xwe didinê hemûyan Ku têne xuyanê li ser karta cînumayê ya deryageran. Ez ê mêrê wê hişk bikim, bikim ku bibe wek ka û qersel: Ez ê nehêlim ne bi şev razê, ne jî bi roj, wî bikime çavbel, Ew ê ti caran nikaribe palikên çavên xwe bide hev, Dê bibe mêrikekî bi nifirê ketî, ew ê wisa bijî bi roj û şev: Ku neh caran neh carên heft şevên şerpezeyiyê rabûne ser zîn e, Ew ê malviritî bibe, bibe zîzok, jî îzrabê waywaya wî bimîne: Çi qasî jî mehfa keştiya wî ya sêbabirrkî dê neyê, Lê dîsa jî çelqeçelq û bahoz dê deynin konê keştiyê. – Lê binihêrin çî yê min heye. PÎREBOKA DUYEM. Ka nîşanî min bide, nîşanî min. PÎREBOKA YEKEM. Tiliya beranekê ya kaptanekî bi min re heye, Wexte vegera bo welatê xwe, keştî hûrxwaş bûye, kaptan miriye. <i>[Ji pişt sehneyê de gurmîniya daholan tesele dibe.</i> PÎREBOKA SÊYEM. Gurmîniya daholan, gurmîniya daholan! Macbeth tê bi hêlehêl û olan. PÊK VE. Xwîşkên nexalî, destên xwe dikine destên hev, Çust û çalak digerin di derya û welatan tev,</p>
--	---

<p>Banquo Good Sir, why do you start, and seem to fear Things that do sound so fair? I' the name of truth, Are ye fantastical, or that indeed Which outwardly ye show? My noble partner You greet with present grace and great prediction Of noble having and of royal hope, That he seems rapt withal: to me you speak not. If you can look into the seeds of time, And say which grain will grow and which will not, Speak then to me, who neither beg nor fear Your favours nor your hate.</p> <p>First Witch Hail! Second Witch Hail! Third Witch Hail!</p> <p>First Witch Lesser than Macbeth, and greater. Second Witch Not so happy, yet much happier. Third Witch Thou shalt get kings, though thou be none: So, all hail, Macbeth and Banquo!</p> <p>First Witch Banquo and Macbeth, all hail! Macbeth Stay, you imperfect speakers, tell me more: By Sinel's death I know I am Thane of Glamis; But how of Cawdor? the Thane of Cawdor lives, A prosperous gentleman; and to be king Stands not within the prospect of belief, No more than to be Cawdor. Say from whence You owe this strange intelligence? or why</p>	<p>Wihakî govendê, govendê ji xwe re hey digerinin, Bi sê gavan bi vir de, bi sisêyan bi wir de, tey tey, Bi sisêyên din jî, wekî xwe kil bikin neh caran, hey hey: – Huş bin! – sehrê dek û dava xwe rist, bisteqirin.</p> <p>MACBETH û BANQUO dikevîne hundir; SERBAZ li dereke piçekî ji wan dûr disekinîn.</p> <p>MACBETH. Di 'emrê xwe de min rojêke wiha hem mirarî hem rind nedîtiye. BANQUO. Hê çi qas rê maye heta Forresê? – Peyîî, ev çi teba ne Wisa spîçolkî bûne, tevî wî dilqê xwe wisa hov têne xuyanê, Ku tu dibêjî qey ew neyî şênîyên cîhana me ne, Lê dîsa jî li vir in? – Oro, ruh di ber we de ye? Yan hûn mirî ne Wekî gotî mirov bikeve gumanan? Heçku hûn ji min fîmî dikin, Wekî her yek ji we di cî de tiliya xwe ya qirtikgirtî dibê Ber wan lêvên xwe yê qeretke: – yeqîn hûn jin in, Lê dîsa jî ew rî û rîdana we rê nade min ez bibêjime xwe Ku hûn jinên tam û tamam in. MACBETH. Heke hûn dikarin, bipeyivin; – gelo hûn çi teşabet in? PÎREBOKA YEKEM. Bila Macbeth xweş be! Bila tu xweş bî, baronê Glamisê! PÎREBOKA DUYEM. Bila Macbeth xweş be! Bila tu xweş bî, baronê Cawdorê! PÎREBOKA SÊYEM. Bila Macbeth xweş be, ew ê ku dê bibe şah ji wir û wiha! BANQUO. Ezbenî, qubanê, ji çi re tu vecinîqiyî; qey tirs</p>
--	--

<p>Upon this blasted heath you stop our way</p> <p>With such prophetic greeting? Speak, I charge you.</p> <p><i>[Witches vanish]</i></p> <p>Banquo The earth hath bubbles as the water has,</p> <p>And these are of them. Whither are they vanish'd?</p> <p>Macbeth Into the air, and what seem'd corporal melted</p> <p>As breath into the wind. Would they had stay'd!</p> <p>Banquo Were such things here as we do speak about?</p> <p>Or have we eaten on the insane root That takes the reason prisoner?</p> <p>Macbeth Your children shall be kings.</p> <p>Banquo You shall be king.</p> <p>Macbeth And Thane of Cawdor too; went it not so?</p> <p>Banquo To the self-same tune and words. Who's here?</p> <p><i>[Enter ROSS and ANGUS]</i></p> <p>.....</p>	<p>li te firiya</p> <p>Ji wê yeka ku zehf xweş tê guhê mirov? – Hûn bi xwaza rastiyê kin,</p> <p>Gelo hûn ji ‘alema xewn û xeyalan in, yan ‘eseh</p> <p>Hûn bi sûretên xwe ve xwe wisa nîşan didin? Hûn tînin bi payeya</p> <p>Wî ya niha kêfxweşiyê didine hevkarê min ê malmezî, û pê re jî</p> <p>Al û bal êgir didine binê sîtilê, dibêjinê, mala te dê mezintir bibe,</p> <p>Tê bibî şah, mêrik bi cizbê ket pê: – lê hûn bo min tiştêkî nabêjin:</p> <p>Heke hûn dikarin ji tovên demê beşer bikin wekî çi dê biqewime,</p> <p>Û hûn dikarin bibêjin kîjan heb ê biseride û kîjan heb ê neseride,</p> <p>Nexwe, bi min re bipeyivin, ez ne parsekê qencyên we me,</p> <p>Ne jî ez çu caran mineta xwe digirim ji kîn û buxa we.</p> <p>PÎREBOKA YEKEM.</p> <p>Xweş bî!</p> <p>PÎREBOKA DUYEM.</p> <p>Xweş bî!</p> <p>PÎREBOKA SÊYEM.</p> <p>Xweş bî!</p> <p>PÎREBOKA YEKEM.</p> <p>Tu yê di bin Macbeth re bî, lê bextewartir bî pê re.</p> <p>PÎREBOKA SÊYEM.</p> <p>Dê şah ji piştta te peyda bibin, tevî ku tê bi xwe nebî şah:</p> <p>Wekî wisa, bila Macbeth û Banquo xweş bin her gah!</p> <p>PÎREBOKA YEKEM.</p> <p>Banquo û Macbeth, bila ew xweş bin!</p> <p>MACBETH.</p> <p>Rawestî, çima hûn bi serê poz xeber didin, tûrikê xwe vala bikin:</p> <p>Li dû mirina bavê xwe Sinel ez dizanim ez bûme baronê Glamisê;</p> <p>Lê çawa bûm ê Cawdorê? baronê Cawdorê li dinyayê xweş e,</p> <p>Camêr î xwedanrastmal e; îcar meseleya ku</p>
---	--

	<p>ez ê bibim şah,</p> <p>Ha ew yek qet nakeve binê kumê min, îmkana wê derê tine,</p> <p>Baroniya min a Cawdorê çi qasî rast be, şahbûna min jî ew qasî.</p> <p>Bibêjin, gelo we ev zanyariya seyr ji kê derê wergirt? yan jî çima</p> <p>Bi silavdayîna wisa remmalane li vî ‘erdê hewşanan ê xirxopan</p> <p>Li ser riya me hûn li me derketin? Ez dikime ser we, bipeyivin.</p> <p><i>PÎREBOK betave dibin</i></p> <p>BANQUO.</p> <p>Wek peqilkên avê li wan hat, ‘erdê kire bilqebilq, ew jî wisa ji xwe re bûn pariyek nan: – gelo betave bûn û çûne kê derê?</p> <p>MACBETH.</p> <p>Tevî hewayê bûn; can û cesedên wan ên me dîtî heliyan</p> <p>Weku hilm tevî bê bibe. – Xwezî lê nedana û neçûna!</p> <p>BANQUO.</p> <p>Ev teşabetên ku em qala wan dikin, gelo berra jî li vir bûn?</p> <p>Yan gelo me gîhayek xwar û serê me li me xweş bû,</p> <p>Hiş û sewda li serê me qet nema?</p> <p>MACBETH.</p> <p>Zarokên te dê bibine şah.</p> <p>BANQUO.</p> <p>Tu yê bibî şah.</p> <p>MACBETH.</p> <p>Qaşo ez ê bibime baronê Cawdorê jî, – ma qey wan wisa negot?</p> <p>BANQUO.</p> <p>Bizzebit wan wisa got. – Ev kî ye têye vir?</p> <p><i>ROSS Û ANGUS dikevîne hundir</i></p> <p>.....</p>
--	--

3.2.8.1. Analîza Hokarên Dermetnî

Şander: William Shakespeare (1564-1616) helbestvan û şanonûsekî navdar ê Îngilîz e. Jiyana wî li Stratford û Londonê derbas bûye. Bi qezenca xwe ya di

karê şangoriyê de jiyaneke dewlemend derbas kiriye. Ji bilî helbestan, wî bi tevahî 38 lîstik û 154 jî sone nivîsîne (Shakespeare: 2002) ku ji bo bi dehan zimanên cîhanê hatine wergerandin. Şanonameyên Shakespeare wekî trajedy û komedy li seranserê cîhanê hatine xwendin û lîstin. Othello, Romeo and Juliet, Hamlet, The Merchant of Venice çend berhemên wî yên navdar in. Shakespeare hem şanone nivîsîne û hem jî wekî lîstikvan di wan de rol wergirtine (Pfordresher û y.d., 1989: 185). Bandora Shakespeare li ser geşedana ziman û edebiyata Îngilîzî jî pir mezin e û bûye semboleke neteweyî ji bo çand û nasnameya Îngilîzan.

Niyeta Şander: Lîstika Macbeth wekî tema têkildarî daxwaza desthilatîyê û encamên xirabker ên wê azweriyê ye. Her çî qas jêdera wî rasterast ji bûyer an jî kesayetên dîrokê nebe jî, li gor Braunmuller (1997: 2-5) bûyer û kesayetên tê têkildarî keysariya Skotlandê ne û bi awayekî jî Shakespeare dixwaze peyamekê derbarê rewşa aloz a desthilatîyê ya li Îngilîstanê û Skotlandê bide. Shakespeare dixwaze ku di nav tevliheviya siyasî de li şûna pirsê 'mafê kî ye bibe serwer?' pirsê 'kî dikare bi awayekî dadwerane serweriyê bike?' derxîne pêş. Reng e ku Shakespeare bi rêya trajediya Macbethê niyet kiriye ku azweriya hilweşîner a serweriyê nîşan bide û ji bo rewşa serdema xwe jî peyamên ku nekariye bi awayekî eşkere û bi bûyerên kuştinên qralan nîşan bide, xwestiye bi rêya lîstikekê ragihîne muxatabanên serdemê. Braunmuller (1997: 8) dide zanîn ku Shakespeare ev lîstik ji bo şanaziya Qral James û mêvanê wî Qral Christian IVê Danîmarkî nivîsiye û wan jî lîstik temaşe kirine. Ev agahî jî şiroveyên me yên li jor piştrast dike.

Wergir: Wergirên berhemên Shakespeare temaşevanên şanoyê, guhdarên radyo-kompozîsyonan û xwînerên şanonameyên çapkirî ne ku di maweyeke 400 salî borî de bi bendewarî û zanyariyên cihê yên derbarê Shakespeare û berhemên wî de bûne xwîner û şopîner. Berhemên Shakespeare wekî tekstên xwendinê ji hêla bedewiya gotinê ku bi awayekî şairane hatine nivîsandin bala xwîneran kişandiye, lê belê bandora mezin a Shakespeare ya li ser xwîneran her wekî Lamb (2000: 1) diyar dike hinek jî bi tevkarîya adaptasyon û nûjenkirina berhemên wî çê bûye. Xwînerên Kurdî her çî qas bi giştî jî Shakespeare û berhemên wî haydar bin jî, wergerên berhemên wî yên Kurmancî piranî di wan de salên dawî de çê bûn.

Navgîn/kanal: Shakespeare lîstikên xwe ji bo lîstina ser sehneyê nivîsîne, lewma jî navgîna seretayî ne nivîs bû. Piştî mirina Shakespeare, lîstikên wî hatine komkirin û çapkirin. Di roja îro de bi piranî li gor formata şanoyê wekî pirtûk tîn çapkirin, lê belê ji bo hêsankirina xwendinê jî gelek têbinî û pêvekên ferhengê jî di wan berhemana de cih digirin. Macbeth bi kanala gelek adaptasyonên wekî film û radyo-kompozîsyon jî hatiye pêşkêşkirin.

Cihê Ragihanê: Lîstika Macbeth li Londonê li şanogehê hatiye lîstin û piştê jî wekî tomarên nivîskî li Londonê çap bûye. London wekî paytexta Îngilîstanê hem navenda karên çandî û hunerî bû û hem jî navenda siyaseta Împaratoriya Îngilîz bû ku bûyerên wekî ya Macbethê rastî eleqeyeke zindî dihatin.

Dema Ragihanê: Macbeth di sala 1606an de ji hêla Shakespeare ve hatiye nivîsandin ji bo ku wekî lîstik derkeve ser sehnê. Cara yekem di sala 1623an de, heft sal piştî mirina Shakespeare lîstikên wî, Macbeth jî di nav de, wekî Folioya Yekem çap kirin ku ev jî tişteki nû bû, lewre wê demê lîstik ji bo xwendinê nedihatîn belavkirin (Lamb, 2000: 5). Wergera Macbethê ya bi Kurdî di sala 2021an de bi du pêşgotinan wekî pirtûk çap bû.

Motîv: Shakespeare dema ku li *grammar schoolê* (dibistana gramerê) xwendekar bûye, berhemên nivîskarên Romayî yên wekî Plautus, Ovid, Seneca û Horace xwendiyê û bandora wan li ser tercîhên wî yên mijarên trajîk û dîrokî çê bûye (Lamb, 2000: 2). Shakespeare xudanê şîrketa tîyatroyê ya bi navê the King's Men bû û her wisa şîrketa Globe Theaterê jî bû (Pfordresher û y.d., 1989: 185). Ji wan agahiyan jî diyar dibe ku Shakespeare şanomeyên xwe bi motîveke ticarî jî nivîsandine da ku bazara şîrketê û şanogehê bigere. Di wê serdemê de temaşekirina lîstikên şanoyê ji bo esîlzadeyên Londonê bûyereke sereke ya çandî û civakî bû û lewma jî vê yekê motîva nivîsîna bi domdarî ya şanomeyan li ba Shakespeare çê kiriye.

Fonksiyona Tekstê: Tekstên şanoyê bi piranî ji bo lîstinê tîn nivîsandin û fonksiyona wan a sereke jî bi rêya sehnekirinê û bi tevkariya lîstikvanan pêk tê. Armanc çêkirina bandoreke dramatîk e li ser fikr û hîsiyata temaşevanan. Macbeth wekî trajedyaya veguherîna baronekî mîrxas a ber bi kujerekî çavsor pêşkêşî temaşevan/xwîneran dike. Trajediya jiyanî mirovekî baş a ku ji ber azweriyeke

xurt û bi tesaduf an jî teşwîqa hêzên derasayî ji normalê derdikeve û ber bi têkçûnê û kiryarên erjeng ve diçe. Di wan du sehneyan de ku me ji bo dahûrandinê bijartin, her sêr pîrebok roleke giring dilîzin. Pîrebok du pêşbîniyên xwe ji Macbeth û Banquo re dibêjin ku li gor şiroveya Butt (1976: 18) hemû bûyerên nav trajediyayê li ser wan pêşbîniyan saz dibin. Ji van pêşbîniyan yek qraltiya Macbeth e û ya din jî qraltiya zarokên Banquo ye ku li destpêkê wekî mizginî ji her duyan re xuya bike jî, piştêr dibe sedema aloziyên mezin.

3.2.8.2. Analîza Hokarên Navmetnî

Mijar: Macbeth derbarê serpêhatiya trajîk a serleşker û baronê Cawdorê yê bi navê Macbeth e. Piştî ku sê Pîrebok bi pêşbîniyeke efsûnî mizginiya qralbûnê didin wî, Macbeth û xanima wî bi hev re, kuştina Qral Duncan jî tê de, gelek xirabiyên giran dikin û dikevin ser rêyeke jêneveger.

Naverok: Di sehneya yekem û sêyem a perdeya yekem de Macbeth û hevalbendê wî Banquo ji şerekî giran bi şanaziya serkeftinê vedigerin û di rê de rastî sê *cadûyan* (di TA de pîrebok) tèn. Pîrebok bi awayekî metelokî û hinek jî sergirtî ji wan re pêşbîniya qraltiya Macbeth û ya kurên Banquo dikin. Bi wan pêşbîniyên pîrebokên sêrdar hişê Macbeth û Banquo tevî hev dikin. Dîsa jî, ev pêşbîniya ku pîrebok dikin dibe destpêka nakokiya sereke ya lîstikê û Macbeth bi hewesa qraltiyê dibe kesayetekî cuda, li gel hevkarîya jina xwe tiştên deredetî pêk tîne û dibe bayîsê hemû bûyerên trajîk.

Kompozîsyona Tekstê: Macbeth wekî tekst li gor formata lîstikê hatiye nivîsandin. Lîstik ji 5 perde û sehneyên wan perdeyan pêk tê. Li destpêka her sehneyê cihê bûyerê tê pênasekirin û piştêr jî karakterên ku di sehnê de cih digirin tèn pêşkêşkirin. Macbeth ji aliyê teşeyê ve berhemeke kêşsaz e û xwedî serwa ye. Shakespeare ev berhem jî bi kêşa iambic pentameter, wekî deh kîteyên pênc biderb û 5 jî bêderb nivîsiye (Smith: 70). Shakespeare wekî piraniya berhemên xwe, Macbeth jî li gor avaniya dramatik saz kiriye ku bi qonaxa nakokî û terciha xelet dest pê dike û bi mirinê dawî dibe.

Peyvsazî: Zimanê lîstikên Shakespeare ji bo xwînerên îroyîn ên TJ jî giran tê. Dawiya sedsala 16an û destpêka sedsala 17an wekî serdema destpêkê ya Îngîlîziya modern tê qebûlkirin û berhemên Shakespere jî hem taybetiyên

Îngiliziya navîn û hem jî ya modern dihewîn. Di Macbethê de peyvên wekî "hail", thither, "Thane" "shalt" nimûneyên peyv û gotinên arkaîk in.

Hevoksazî: Taybetiya bingehîn a zimanê Macbethê ew e ku bi forma diyalogê bes bi şeweya helbestî hatiye nivîsandin. Her ku Smith (1970: 65) dide zanîn, zimanê trajediyên Shakespeare helbestî ne, lê komedyayên wî pexşanî ne. Hevokên Macbethê jî bi awayê helbest ne. Hin hevokên kurt tevgerên ketina nav sehneyê an jî derketina ji sehneyê rave dikin. Zimanê pîrebokan metaforîk e û wateyên kompleks û sergirtî tê de hene. Cînavkên wekî "thee" û "thou" (hûn/tu), "thy" û "thine" (ê we/te) wekî nimûneyên arkaîk di tekstê de derbas dibin. Zimanê Macbethê li gor şewezara esîlzadeyan e, lê belê axaftina pîrebokan sosret e û wekî zimanê tebeqeyên nizm e.

3.2.8.3. Armanç û Tercîhên Wergêr

Hem wergêr û hem jî Berfin Zenderlioglu, wekî şewirmenda hunerê, du pêşgotinên cuda nivîsîne ji bo wergera Macbethê. Zenderlioglu li ser paşxaneyê dîrokî ya berhemê radiweste û li gor çavakniyên dîrokî agahiyên dabîn dike derbarê bûyer û kesayetên dîrokî yên di lîstikê de. Her wisa behsa çîroka lîstikê dike û karakter û rolên wan dide nasîn. Wergêr jî bi dorê qala jînenîgariya W. Shakespeare û şanoya wê demê dike û kurteyêke bûyerên nav lîstikê pêşkêş dike. Wergêr di heman demê de bi çend gotinan giringiya wergerandina berhemên wekî Macbethê ya ji bo zimanê Kurdî destnîşan dike û armanca xwe ya wergerandinê ya vê berhemê jî wekî "... pêdivî ye ku em berhemên bi vî rengî wergerînine zimanê xwe da ku em xwe ji gelek ezberên xwe yên qurs û giran pak bikin" dide kifşê (Shakespeare, 2021: 48). Ji wan pêşgotinên dirêj diyar dibe ku wergêr û weşanger pêwîst dîtine ku hin agahiyên pêş bidin xwîner da ku valahiyên zanyariyê yên berî xwendinê kêmtir bikin û bi vî awayî di pêvajoya wergirtinê de daneyên madî û fikrî bidin xwînerên Kurdî.

Wergêr kompozîsyona TJ li ber çav girtiye, sernavên perde û sehneyan nîşan daye û danezanên cih, dem û tevgera karakteran li gor şewaza tekstên şanoyê di TA de dîtbar kiriye. Wergêr hewl daye ku serwaya TA li gor serwaya TJ saz bike û ji bilî çend nimûneyan di vî karî de jî serkeftî bûye. Ji bo pêkanîna serwayê wergêr serî li dubarekirina peyvan û lêzêdekirinan daye. Di TA de diyardeyêke berbiçav a kêşa *iambic* a TJ xuya nake. Ji hêla din ve jî, wergêr bi

xemilandina edebî ya zimanê TA û bi rêya lêzêdekirinan hewl daye ku TA ji bo xwendinê jî guncav be. TA ji TJ dirêjtir e û diyar e ku ev yek bi stratejiya ravekirina tekstê ya wergêr re têkildar e. Her wisa wergêr bi armanca xemilandina TA ya bi zimanekî edebî peyv û gotin li TA zêde kirine û vê yekê jî teksta werger li gor a resen dirêjtir kiriye. Wekî mînak, di TJ de [*Killing swine.*] di TA de wekî [*Min beraz serjêdikir, lêlê.*] bi awayekî dirêj û li gel lêzêdekirinan hatiye wergerandin. Dîsa, pîrsa di TJ de [*Who's here?*] di TA de wekî [*Ev kî ye têye vir?*] bi lêzêdekirina "têye vir hem dirêj bûye û hem jî wate û tevger bi vê yekê berfirehtir bûye.

Wergêr ji bo peyva jêder "witch" gotina "pîrebok" tercîh kiriye. Pîrebok di zargotina Kurdî de bêtir jinên pîr ên xwedî kirin û şiyânên deredetî pênase dike, lê ji bo navê jêder "witch"ê xisleteke têkildarî temenê nîn e, an ku witch/cadû dibe ku keçikên ciwan bin jî. Wergêr di hin mînakan de zimanê TA bi awayê argo, dijûn û navnîçikan xemilandiye ku di TJ de wateyeke wiha ya berbiçav nîn e. Wekî mînak TJ: [*Aroint thee, witch!*] *the rump-fed ronyon cries.*] di TA de wekî [*Lê de here, pîrebokê!*] *gurriya qûnlengerî bi ser min de qîriya.*] hatiye wergerandin. Her wisa gotina TJ a [*I'll do, I'll do, and I'll do.*] ku bi wateya kirina xirabiyekê ji devê pîreboka yekem derdikeve, di TA de bi awayê [*Ez ê bikutime wî, ez ê wî bikutim, ez ê hey bikutime wî.*] wateyeke dijûnker wergirtiye.

3.2.8.4. Hevtayiya Edebî û Rexneya Wergerê

Wergera Macbethê hem wekî şanoname bi kêrî adaptekirina ser sehneyê hatiye û hem jî çêjeke edebî dide xwînerê ku bi rêya xwendinê berhemê tecrîbe dike. Di vê çarçoveyê de tercîh û biryarên wergêr ên ji bo afirandina teksteke xwendin û lîstinê TJ û TA dike hevta. Her wisa agahiyên ku bi rêya pêşgotinê di berhema werger de cih girtine dê ji bo wergirtineke têkûztir ji xwînerên Kurdî re bibin alîkar. Ji hêla cîhana tekstê ve, şeweya wergirtina xwînerê TJ û TA bi giştî dê wekî hev be, ji ber ku cureya şanonameyê pêhisîneke hevpar ji bo xwîner û temaşevanan çê dike û bi wan dide zanîn ku ew berhemeke temsîlî ya şanoyê dixwînin an jî temaşe dikin. Her wisa fonksiyona di TJ de di TA de jî bi cih hatiye. Di TJ de pîrebok pêşbîniyên xwe ji Macbeth û Banquo re eşkere dikin, wan şaş û metel dihêlin. Heman bandor bi rêya raguhestina naverokê ya rast di TA de jî reng e ku dê pêk were.

Di destana Memê Alan de Tavbanû, Hîvbanû û Stêrbânû wekî sê keçik an jî jin qedera evîndariya Mem û Zînê bi hev ve girê didin. Fonksiyona wan her sê xwişkan wekî her sê cadûyên di Macbethê de ye. Rêyeke nû li pêş lehengan vedikin û pêşbîniya pêşerojê dikin. Ji ber vê çendê, pîrebokên ku di folklorê Kurdî de karê pêşbîniyê nakin wekî tîpolojî li fonksiyona di çîrokê de nayên. Wekî encama vê tercîhê jî, rasthatina Macbeth û Banquo ya bi cadûyên falbêj bi navlêkirina wekî "pîrebok" diyar e ku ji bilî pêhisîna pêşbînî û aloziyên pêşerojê, dê atmosfereke metirsiyê jî li ba xwînerên Kurdî çê bike.

Axaftinên pîrebokan û şeweya banglêkirina wan a bi hev û din re, li pênaseya ku Banquo di TJ de derheqê wan dide nayê. Banquo wan wekî [*withered, wild, choppy*] pênase dike. Her wekî tê zanîn "witch/ cadû" afirîdeyên sosret in, lê belê di TA de ji ber şeweya axaftina wan bêtir bûne tîpên pêkenokî. Zimanê henekî yê cadûyan, dijûnên wan berhema resen a ku wekî jêrcure trajedyaya ye ber bi zimanê komedyayê ve kaş dike. Her wisa tîpolojiya metirsîdar a pîrebokan a di çanda Kurdî de û zimanê wan ê henekî û dijûnker ê di TA de dê bandora kirin û gotinên wan a li ser xwîner bixe nav xetereya dubendiyê.

Hejmara peyv û hevokan di teksta armanc de zêdetir e. Wergêr hewl daye ku dûrahiya çandî û zimanê girift û arkakîk ê teksta jêder bi lêzêdekirinan û bi şewazeke raveker ji bo xwînerê armanc hêsantir bike da ku mijar û kontekst baştir were famkirin. Ev yek di xwendinê de nebe kêşe jî, di bikaranîna tekstê ya bi armanca sehnekirinê de ji aliyê demê ve dibe hin arîşeyan derxîne holê. Di navbera TJ û TA de ji aliyê hevtayiyê ve kêşeya sereke ciyawaziya zimanê karakteran e. Di TJ de zimanê pîrebokan sosret û tijî kînyayê ye. Heman şeweya axaftina bi kînyayê di TA de jî heye, lê belê li şûna zimanê sosret ê di TJ de wergêr di TA de zimanê rojane yê fêambar tercîh kiriye. Bi heman awayî, şeweya axaftinê ya Macbeth û Banquo jî di TJ û TA de hevta nîn in. Macbeth û Banquo di TJ de li gor şewezara esîlzadeyan diaxivin, lê belê di TA de devoka wan guherbar e û şeweya axaftina wan jî wekî ya çîneke spesîfik a civakî nîn e.

3.2.9. Tekst 9.

Cureya Edebî: Cerebeya Çîrokî.

Navê Berhemê: A Room of One's Own – Odeyek Ji Bo Xwe.

Nivîskar: Virginia Woolf.

Wergêr: Aynur Kaş.

Teksta Jêder: A Room Of One's Own, Virginia Woolf, Grafton Harper Collins Publishers, London, 1977. pp. 86-89.

Teksta Armanc: Odeyek Ji Bo Xwe, Virginia Woolf, Wer.: Aynur Kaş, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2021. rr. 87-90.

Teksta Jêder	Teksta Armanc
<p data-bbox="379 936 400 965">V</p> <p data-bbox="300 987 841 1809">I had come at last, in the course of this rambling, to the shelves which hold books by the living; by women and by men; for there are almost as many books written by women now as by men. Or if that is not yet quite true, if the male is still the voluble sex, it is certainly true that women no longer write novels solely. There are Jane Harrison's books on Greek archaeology; Vernon Lee's books on aesthetics; Gertrude Bell's books on Persia. There are books on all sorts of subjects which a generation ago no woman could have touched. There are poems and plays and criticism; there are histories and biographies, books of travel and books of scholarship and research; there are even a few philosophies and books about science and economics. And though novels predominate, novels themselves may very well have changed from association with books of a different feather. The natural simplicity, the epic age of women's writing, may have gone. Reading and criticism may have given her a wider range, a greater subtlety. The impulse towards autobiography may be spent. She may be beginning to use writing as an art, not as a method of self-expression. Among these new novels one might find an answer to several such questions.</p> <p data-bbox="300 1827 841 2027">I took down one of them at random. It stood at the very end of the shelf, was called <i>Life's Adventure</i>, or some such title, by Mary Carmichael, and was published in this very month of October. It seems to be her first book, I said to myself, but one must read it as if it were the last volume in a fairly long series, continuing</p>	<p data-bbox="943 936 963 965">V</p> <p data-bbox="863 987 1404 1720">Di vê gerê de taliyê hatibûm ber refên kitêbên nivîskarên sax ên roja me; ên jinan û mêran; ji ber ku kitêbên ji aliyê jinan ve hatine nivîsin êdî hema bi qasî yên mêran in. Lê eger hîn ne wisa jî be, eger mêr hîn jî zayenda axivok be, ev jî راستیەک e ku jin êdî ne tenê romanên dinivîsin. Jane Harrison li ser arkeolojîya yewnanan; Vernon Lee li ser estetîkê, Gertrude Bell li ser Persiyê kitêb nivîsîne. Li ser her cure mijaran kitêbên jinan hene ku nîşkek berê tu jinê nikaribû dest bide wan. Şi'r, şanname û rexne hene; dîrok û biyografi, kitêbên seyahatê, kitêbên zanyariyê, û lêkolînê; heta çendek kitêbên felsefeyê, kitêbên zanistî û yên derbarê aborinasiyê de hene. Û tevî ku hejmara romanên bêhtir e, bi têkildariya kitêbên cureyên din re dibe ku roman bi xwe jî guherîbin. Sadeyîya sirûştî, ew serdema destanî ya nivîsîna jinan, dibe ku êdî bi dawî bûbe. Xwendin û rexneyê dibe ku cureyên di bergeha wê de zêdetir, jîriya wê xurttir kiribe. Meyla otobiyografiyê dibe ku êdî qels ketibe. Belkî êdî nivîsînê ne wekî rêbazeke îfadekirina xwe, lê wekî hunerê pêk tîne. Meriv dikare di nav kitêban de de bersiva çendek pirsên wiha bibîne.</p> <p data-bbox="863 1738 1404 2027">Min hema ketober rahişte yekê ji wan. Tam li dawîya refê bû, sernavê wê tişteki wekî <i>Life's Adventure</i> [Serpêhatiya Jiyanê] û nivîskara kitêbê Mary Carmichael û, vê Cotmehê hatibû weşandin. Min di dilê xwe de got, wekî ku kitêba wê ya yekem e, lê divê meriv wekî cildê dawîn ê wê rêzekitêba dîvdîrêj bixwîne, wekî dewama wan kitêbên min çav li wan digêrandin tev -şî'rên Lady Winchilsea, şanomeyên Aphra behn û romanên wan çar romannûsên gewre. Çimkî</p>

all those other books that I have been glancing at - Lady Winchilsea's poems and Aphra Behn's plays and the novels of the four great novelists. For books continue each other, in spite of our habit of judging them separately. And I must also consider her - this unknown woman - as the descendant of all those other women whose circumstances I have been glancing at and see what she inherits of their characteristics and restrictions. So, with a sigh, because novels so often provide an anodyne and not an antidote, glide one into torpid slumbers instead of rousing one with a burning brand, I settled down with a notebook and a pencil to make what I could of Mary Carmichael's first novel, *Life's Adventure*.

To begin with, I ran my eye up and down the page. I am going to get the hang of her sentences first, I said, before I load my memory with blue eyes and brown and the relationship that there may be between Chloe and Roger. There will be time for that when I have decided whether she has a pen in her hand or a pickaxe. So I tried a sentence or two on my tongue. Soon it was obvious that something was not quite in order. The smooth gliding of sentence after sentence was interrupted. Something tore, something scratched; a single word here and there flashed its torch in my eyes. She was 'unhanding' herself as they say in the old plays. She is like a person striking a match that will not light, I thought. But why, I asked her as if she were present, are Jane Austen's sentences not of the right shape for you? Must they all be scrapped because Emma and Mr Woodhouse are dead? Alas, I sighed, that it should be so. For while Jane Austen breaks from melody to melody as Mozart from song to song, to read this writing was like being out at sea in an open boat. Up one went, down one sank. This terseness, this shortwindedness, might mean that she was afraid of something; afraid of being called 'sentimental' perhaps; or she remembers that women's writing has been called flowery and so provides a superfluity of thorns; but until I have read a scene with some care, I cannot be sure whether she is being herself or someone else. At any rate, she does not lower one's vitality, I thought, reading more carefully. But she is heaping up too many facts. She will not be able to use half of them in a book of this size. (It was about half the length of *Jane Eyre*.) However, by some means or other she succeeded in getting us all - Roger, Chloe, Olivia, Tony and Mr Bigham - in a canoe up the river. Wait a moment, I said, leaning back in my chair, I must consider the whole thing more carefully before I go any further.

I am almost sure, I said to myself, that Mary Carmichael is playing a trick on us. For I feel as one feels on a switchback railway when

kitêb, tevî ku edeta me ye em wan ji hev cihê dinirxînin jî, dewama hevdu ne. Herwiha divê ez wê jî -vê jina nenas- wekî neviya wan jinên din bibînim, ew jinên ku min li şertên wan nêrîbû, û bibînim ka ji taybetmendî û sînardariyên wan çi an çiqas wergirtiye. Ji ber ku roman pir caran ne jehrkujekê lê tevzînekê didin, ji dêvla bi hesinekî sincirî dax bidin û meriv hilpekînin ser piyan, meriv wisa nîv-razayî gêj dîkin ditevîzînin, min axînek kişand û bi defter û qelemê rûniştîm da ku binêrim ka ez ê çi ji yekem romana Mary Carmichael, *Serpêhatiya Jiyanê* derxim.

Wekî destpêkê, min ji serî heta binî çavê xwe li rûpelê gerand. Min got berî ez hiş û bîra xwe bi çavên şîn û qehweyî, bi tîkiliya mihtemel a navbera Chloe û Roger dagirim, ez ê şêweyê bikaranîna wê ya hevokan fêm bikim. Piştî ku min fam kir ka gelo ya di destê wê de qelem e an bivir e, bo wan hûrgiliyên din jî wextê hebûya. Lewma min hevokê du hevok li ser zimanê xwe gerandin. Di nêz de eşkere bû ku tiştêkî bêaheng hebû. Ew herikîna şayik a hevok li pey hevokan hatibû birrîn. Tiştêkî vedîçirand, tiştêkî neperûşk dida; li vir û wir peyveke bi serê xwe wekî birûskê di çavê min de vedida. Wekî di listikên berê de tê gotin, nivîskarê xwe "sist berdabû". Fikirîm, wekî keseke wisa bû ku derbikeke wê qet pê nekeve, bi qutiya wê ve bihekîne. Wekî li ba min be, min jê pirsî, lê çima şiklê hevokên Jane Austen ne durist in ji bo te? Çima ku Emma û Mr. Woodhouse mirine, divê ew hevok wekî qirşûqalan bîn avêtin? Eger wisa be, heyf û xebînet, min axînek kişand. Mîna ku Mozart ji besteyekê derbasî besteya din bibe, Jane Austen jî wiha ji newayekê derbasî newayaya din bibe, ji ber vê yekê, xwendina vê kitêbê wisa bû ku meriv wekî di qeyîkekê de, di nîveka deryayê de be. Meriv geh bi hewayê diket geh dadiket. Ev hevokên qutebir û ev bêhçikîn belkî jî nîşan dide ku nivîskar ji tiştêkî ditirsiya; belkî ditirsiya ku wî navê "dîlzîz" li pey bigerînin; an hatiye bîra wê ku nivîsîna jinan wekî nivîseke xemilandî hatiye binavkirin lewma wê jî bi zehfî pîj û strî bi nivîsa xwe wer kirine; lê heta ez bi baldarî sehneyekê nexwînim, ez ê nikaribim emîn bibim ka wekî xwe dinivîse an wekî hinekên din. Her çi jî be, min bi baldariyeke zêdetir dixwend û fikirîm ku ji şênbûniya meriv naxwe. Lê gelek bûyer li hev kom kirine. Di kitêbeke bi vê stûrayiyê de wê nikaribe nivê wan jî bi kar bîne. (Dirêjahiya wê nivê ya *Jane Eyre* bû.) Lê belê wê bi awayekî, em tev -Roger, Chloe, Olivia, Tony û Mr. Bigham- li qeyîkekê siwar kiribûn û em berjorî çêm dibirin. Min got ka hêde bisekine, min pala xwe da kursiya xwe, berî ku bêhtir pê de herim divê bi dêhdaneke zêdetir her tiştî careke din bifikirim.

Hema bibêje pê bawer bûm ku Mary Carmichael xapînokiyek li me dikir. Çimkî, li ser rêhesineke fetlonekî, dema vagon ji dêvla ku -

<p>the car, instead of sinking, as one has been led to expect, swerves up again. Mary is tampering with the expected sequence. First she broke the sentence; now she has broken the sequence. Very well, she has every right to do both these things if she does them not for the sake of breaking, but for the sake of creating. Which of the two it is I cannot be sure until she has faced herself with a situation. I will give her every liberty, I said, to choose what that situation shall be; she shall make it of tin cans and old kettles if she likes; but she must convince me that she believes it to be a situation; and then when she has made it she must face it. She must jump. And, determined to do my duty by her as reader if she would do her duty by me as writer, I turned the page and read . . . I am sorry to break off so abruptly. Are there no men present? Do you promise me that behind that red curtain over there the figure of Sir Charles Biron is not concealed? We are all women you assure me? Then I may tell you that the very next words I read were these - 'Chloe liked Olivia . . . ' Do not start. Do not blush. Let us admit in the privacy of our own society that these things sometimes happen. Sometimes women do like women.</p>	<p>wekî meriv hêvî dike- dakeve jêr, careke din yekser berjor dibe, di rewşeke wisa de meriv çî hîs bike ez jî wiha hîs dikim. Mary bi rêzeya ku meriv hêvî dike, dilize. Pêşî hevok parçe kir; niha jî heman tiştî li rêzeyê dike. Baş e, eger wisa dike ne ji bo ku hema parçe bike, eger bi mebesta afirandinê vê yekê dike, heqê wê heye herduyan jî bike. Heta Mary bi rewşekê re rûbirû nemîne, ez ê fam nekim ku mesele ji herduyan kîjan e. Min got, ez ê wê bi temamî bi temaî serbest bihêlim da bi dilê xwe rewşê hilbijêre; eger bixwaze bila bi qutiyên teneke û çaydankên kevn çêke; lê divê min qane bike ku ew bi xwe bawer dike ew rewşek e, û dema çêkir jî, divê bikare pê re rûbirû bimîne. Divê hilpeke. Eger peywira xwe ya li hember min wekî nivîskarekê pêk bianiya, min ê jî peywira xwe ya li hember wê wekî xwendevanekê pêk bianiya, min rûpel bi vê biryardariyê quliband û dest bi xwendina... Li min biborin ku min wisa ji nişkê ve qut kir. Mêr tune ne li vir ne wisa? Sond bixwin ku li pişt wê perdeya sor figura Sir Chartres Biron ne veşartî ye? Hûn baş dizanin ku em tev jin in li vir? Naxve dikarim ji we re bibêjim ku peyvên min xwendin ev bûn –“Kêfa Chloe ji Olivia re dihat...” Nebehitin. Bila hinarikên rûyê we sor nebin. Kesî xerib tune ye li vir, mêr tune ne, em qebûl bikin ku carinan ev tiştên wiha diqewimin.</p>
--	--

3.2.9.1. Analîza Hokarên Dermetnî

Şander: Virginia Woolf romanûseke navdar a Îngilîz e ku hem bi jîyan û nêrinên xwe û hem jî bi romanên xwe bandoreke mezin li edebiyata Îngilîz a destpêka sedsala 20an kiriye. Di nav edebiyata modern a cîhanê de jî nivîskareke girîng e û berhemên wê li seranserê cîhanê eleqê dîtine. Li gor danezanên ku Robinson û Smith-Laing (2017: 9-10) derbarê jiyana wê de didin, Woolf li malbateke zanyar a çîna bilind mezin dibe, lê belê ew û xwişka xwe wekî birayên xwe derfeta xwendina li dibistanê û zanîngehê bi dest naxin. Dîsa jî têkiliya Woolfê bi komên entelektuel a serdema xwe çê dibe û jiyaneke çalak a civakî derbas dike. Di navbera salên 1915 û 1941an heft romanên wê çap bûn û berhema wê ya dawî jî demeke kurt berî xwekuştinê çap bû. Woolf di bin bandora Joyce jî maye û teknîka vegotinê ya ku wekî stream of consciousness (pêla hişmendiyê) tê zanîn ku Joyce pêşengê wê ye di berhemên xwe de bi kar aniye (Pfordresher û y.d., 1989: 804). Woolf bi helwest û nêrîna xwe ya femînîst ji nivîskarên din ên serdema xwe cuda dibe.

Niyeta Şander: Nivîskar wekî femînîsteke navdar xuya ye ku bi rêya mijara vê berhemê xwestiyê fikrên xwe yê derbarê newekheviya zayendî ya di civakê

de û astengiyên madî û yên din ên li pêş jinê bîne ziman. Rewşa civakî ya Îngilîstana salên 1920an ji hêla qanûnî ve nebe jî di pratîkê de rê li pêş jinan digirt û nedihîşt ew wekî mêran daxilî nav civakê bibin. Bi rêya karakterên jin ên çêkirî ku temsîla cihê jinê ya di nav civakê de dikin, nivîskar xwestiye xwînerên wê bi şiklekî empatîk li mijara newekheviyê binêrin û li ser angaştên wê bifikirin. Her wisa li dor pîrsa 'kêmbûna nivîskarên jin' û bersiva şênber a wekî 'pêwîstiya bi odeyekê' jî niyet kiriye ku mijarê bi rewşeke zelal û û bi mînaekeke şênber pêşkêş bike. Di beşa 5em de nivîskar di ser mînaka romanûsa jin Mary Carmichael xwestiye ku nivîskariya îdeal a jinê teswîr bike.

Wergir: Wergirên desteya yekem beşdarên semînerên zanîngehê ne ku Woolfê di çarçoveya mijara *Jin û Pevbestin* de nêrînên xwe pêşkêşî wan kirine. Piştî çapbûna pirtûkê jî heman nêrîn bi awayekî berfirehtir gihîştîye wergirên heman serdemê. Diyar e ku Woolfê xwînerên serdema xwe wekî armanca peyamên xwe bijartiye, ji ber ku helwesta wê li ser rexneya rewşa wê demê ye. Woolf rexneya newekheviyê di ser nebûna îmkanên madî ya ji bo jinan re wekî rastiyeke serdema ku tê de ne nîşan dide. Ji ber vê rastiye jî, di navbera wergirê îroyîn û yên 90 sal berî niha de ji hêla bandora tekstê û ranêzikiya Woolfê ve dê mesafeyeke çandî û civakî hebe. Her ku wergirên serdema Woolfê rexneyên heyî wekî tiştên aktuel xwendine, wergirên îroyîn dê berhemê wekî qonaxeke rexneya femînîst a edebiyatê bixwînin.

Navgîn/kanal: Her ku Woolfê nêrînên xwe yên di vê berhemê de bi rêya semînerê pêşkêş kirine, diyar e ku nêrînên Woolfê cara yekem ji hêla beşdarên wê semînerê ve hatine bihîstin û piştê bi çapbûna pirtûkê jî û bi awayekî berfirehtir berhem û peyamên tê de gihîştine xwîneran. Navgîna yekem axaftin e, lê belê wekî tekst û bi rêya xwendinê peyamên Woolfê gihîştine girseyên mezin ên xwîneran.

Cihê Ragihanê: Virgina Woolf di sala 1928an de li Newnham Collegeê, li Girton Collegeê û li du kolejên din ên jinan ên Zanîngeha Cambridgeê semîneran dide li ser mijara 'jin û Pevbestin'ê (Robinson û Smith-Laing, 2017: 28). Woolf piştê jî naveroka wan semîneran berfireh dike ta ku bibe berhemeke serbixwe.

Dema Ragihanê: Berhema *A Room of One's Own/Odeyek Ji Bo Xwe* di 1929an de çap bû. Di destpêka sedsala 20an de li Îngilîstanê li hember tevkarîya

jinan a nav civakê astengiyên kevneşopî hebûn. Rexneyên ku Woolf di berhemê de pêşkêş dike di heyama nivîsandina pirtûkê de bêtir berbiçav bûn, lê belê ji bo xwînerên Kurdî yê ku cara yekem di ser wegera Kurdî re ji naveroka berhemê haydar dibin, reng e ku referansên Woolfê û rexneyên wê dê dûrî rewşa heyî xuya bikin. Dîsa jî, wekî mînakeke rexneya femînîst a serdemekê û wekî berhemek ku angaştên Woolfê yê ku derfetên madî û hebûna mekaneke taybet derdixe pêş, ev berhem mimkun e ku fikrekê bide xwînerên îroyîn.

Motîv: Virgina Woolf di jiyana xwe de timî newekheviya zayendî rexne kiriye û ev yek di berhemên xwe de aniye ziman. Her ku me ragihand, malbata wan wekî edetên serdemê wê û xwişka wê naşînin dibistanê û zanîngehê, lê perwerdehiyeke baş li malê ji wan re çê dikan. Xuya ye ku wê nakokiyê, an ku sînorkirina di hundirê malê de û bidestxistina îmkanên zanyariyê, motîva nivîsê ya ji bo rakirina sînoran û rexneya newekheviyê ji Woolfê re çê kiriye. Her wisa derfeta axaftinê ya li zanîngehan jî jê re bûye bingeha motîvasyonê da ku li qadên ku cih li jinan re teng bûye rexneyên pêşkêş bike. Her wisa eleqeya axaftinan jî reng e ku ew teşwîq kiriye ku axaftinên xwe yê derbarê mijarê de berfirehtir bike û bi rêya weşandinê bigihîne zêdetir kesan.

Fonksiyona Tekstê: Berhema *A Room of One's Own/Odeyek Ji Bo Xwe* her wekî Robinson û Smith-Laing (2017: 9) jî destnîşan dikan, bi mijar û naveroka xwe bûye klasîkeke edebiyata femînîst û di çarçoveya rexneya femînîst de jî gelek lêkolîn li ser hatine kirin. Bi vî awayî jî, fonksiyona sereke ya berhemê rexne bû ku Woolf di çarçoveya mijarê de nêrînên xwe yê rexneyî pêşkêş dike. Ji hêla din ve jî, nêrînên Woolfê yê di nav pirtûkê de dibin mijara rexneya edebiyata femînîst. Beşa 5em a TJ nivîskara îdeal a jin pênase dike û li gor tespîta (Sparknotes, 2014: 34) jî Carmichael temsîla Woolfê ye û helwesta wê nîşan dide. Ev beş li gel rexneya giştî ya di berhemê de, dibe temsîla rewşa îdeal a nivîskariya jinê.

3.2.9.2. Analîza Hokarên Navmetnî

Mijar: Virgina Woolf di berhema *A Room of One's Own/Odeyek Ji Bo Xwe* de li ser cihê zayenda jinê ya di civakê de radiweste û bi taybetî derfetên wê yê nivîskariyê dike mijar. Di beşa 5em de jî, bi rêya romana yekem a bi navê *Life's*

Adventure ya ku nivîskara jin Mary Carmichaelê nivîsiye, nivîskar pêşveçûna nivîskariya jinê û rewşa ku ew ji bo nivîskareke jin îdealîze dike, rave dike.

Naverok: Her wekî Robinson û Smith-Laing (2017: 9) destnîşan dikin, Woolf di berhema *A Room of One's Own/Odeyek Ji Bo Xwe* de li ser du pirsên sereke radiweste: pîrsa yekem 'Çima di dîrokê de hejmara nivîskarên jin ew qas hindik e?', û pîrsa duyem jî 'Ji bo ku jin karibin binivîsin pêwîstiya wan bi çi heye?' Woolf odeyê wekî mekanek mahrem ji bo nivîskariyê wekî pêwîstiya esasî şirove dike û di ser mînaka odeyê re nebûna qadeke taybet a ji bo jinê derdixe pêş. Di beşa 5em a ku me TJ jê wergirt de, nivîskar di rewşa îdeal de nivîskareke jin a îdeal pênase dike. Bi mînaka Mary Carmichael û romana wê *Life's Adventure* Woolf qala reseniya nivîskariya jin dike. Carmichaelê romaneke wisa nivîsiye ku bi çavekî xweserê jinan li mijara zayendê dinihêre, û li gor şiroveya (Sparknotes, 2014: 34) ew nivîskar hem miratgira nivîskarên jin ên berî xwe ye û hem jî dê mîraseke xurt a nivîskariyê bihêle ji bo nivîskarên jin ên dahatûyê.

Kompozîsyona Tekstê: Kompozîsyona berhemê û teksta ku me bijartî li gor taybetiyên cerebeya edebî ye. Gewdeya bingehîn a tekstê, têkiliya paragrafan wekî mantiqa pexşanê bi hev re têkildar in. Dîsa jî, berhem ji cerebeyên edebî yên edetî cihê ye, lewre vegêrê pevbestî her çi qas nêrînên nivîskarê ragihîne jî, nivîskar bi xwe nîn e. Ji ber vê çendê jî rexnegirên edebiyatê vê berhemê li gor neqilkirina Fakılı (1997: 39) wekî cerebe çirok (essay story) bi nav dikin. Woolf di berhemê de çend kesayetên jin ên xeyalî û çêkirî dike berdevkê vegotinê û di ser şexsê wan re xitabî xwîneran dike. Kesayetên bi navê Mary Carmichael (romanûseke xeyalî), Mary Beton (meta nivîskarê), Mary Seton (xwendekarek) dibin hevkarên vegotinê (Sparknotes, 2014: 8-9). Ji ber vê taybetiya xwe jî, hem berhem bi giştî û hem jî teksta ku me jê wergirtiye agahdariyên rast û tiştên pevbestî bi hev re dike keresteyên vegotina xwe.

Peyvsazî: Woolf, her wekî beşên din ên pirtûkê, di vê beşê de jî navên kesayetên edebiyatvan û hunermend û berhemên wan ji bo nimûneyên angaşten xwe dide. Ji bo têgihîştineke yekser pêwîstiya xwîner a bi zanîna navên wekî Jane Harrison, Vernon Lee, Getrude Bell û Jane Austen û listik, roman û helbestên nivîskarên din heye. Woolf peyvên razber ên wekî criticism, aesthetics, self-expression, peyvên ku cureyên edebî dinimînin ên wekî novel, poem, play,

biography di nav konteksteke hev girtî de bi kar tîne. Nivîskar ji bo ku bala xwîner zindî bihêle gotinên wekî [*Alas, I sighed....*], [*I am almost sure, I said to myself*] û [*I am sorry to break off so abruptly....*] dixê navbera niqaşa xwe ya edebî.

Hevoksazî: Hevokên Woolfê şêwaza vegotinê ya ku wekî pêla hişmendiyê didin kifşê, lewre nivîskar vegotina xwe di çarçoveya nêrîna xwe ya şexsî û tecribeyên xwe de wekî pêleke herikbar a ramandinê pêşkêş dike. Woolf hevokên dirêj û kompleks bi kar tîne û ji bo girêdana wan jî gelek çaran ji nuqtebêhnokan sûd werdigire. Hevokên berhemê her wekî vegêr bi deng dirame û di hişê xwe de lêpirsina tiştan dike û encaman pêşkêş dike saz bûne. Hevokên pirsyariyê bi fonksiyonên pîrhêl hatine bikaranîn. Ev hevok ji aliyekê ve dibin pirsên lêpirsîna Mary Carmichaelê, û ji aliyekê din ve jî dibin pirsên vegêr ên ber bi xwîneran û bi vî awayî jî wan daxil dike nav pêvajoya vegotinê.

3.2.9.3. Armanç û Tercîhên Wergêr

Wergera Kurdî ya berhema Woolfê bê pêşgotin hatiye çapkirin, lewma jî armançeke diyarkirî ya wergerê ji aliyê wergêr an jî weşanxaneyê ve nehatiye destnîşankirin. Her ku weşanxaneya Avestayê wergerên klasîkên din ên cîhanê jî çap kirine, em dikarin wergera vê berhemê jî wekî parçeyekê pîlansaziya weşangeriyê ya weşanxaneyê qebûl bikin. Taybetiyekê cuda ya vê wergerê ew e ku wergêr jî wekî nivîskar jin e. Hem Woolf bi xwe wekî nivîskar û hem jî berhema wê *A Room of One's Own* ji bo edebiyata femînîst û niqaşên zayendî yê di edebiyata cîhanê de nîrxên sembolk in. Di vê çarçoveyê de zayenda wergêr jî diyar e ku ne tesaduf e. Mîmkun e ku wergêra jin ji ber helwesta Woolfê û naveroka berhemê ev berhem tercîh kiriye û reng e ku wergêr ji aliyê weşanger ve jî hatiye teşwîqkirin.

Wergêr bala xwe daye ser şêwaza nivîskar û hewl daye ku hevokên dirêj ên Woolfê di TA de jî bi heman awayî dirêj çê bike. Ji bo pevgerêdana hevokên dirêj her wekî mînak TJ wergêr di TA de serî li bikaranîna nuqtebêhnokan daye. Dîsa jî, baldariya wergêr a têkildarî hevokên dirêj ên TJ di mijara raweya demê de bi heman awayî pêk nehatiye. Wergêr di TA de tercîhên xwe yê li ser demên vegotinê li gor pêwîstiyên teknîka pêla hişmendiyê ya TJ çê nekirine. Wekî mînak, di TJ de [*...but until I have read a scene with some care, I cannot be sure whether she is being herself or someone else.*] di TA de [*...lê heta ez bi baldarî*

sehneyekê nexwînim, ez ê nikaribim emîn bibim ka wekî xwe dinivîse an wekî hinekên din.] cih girtiye û bi vê tercîha dema bê ya wergêr nivenga demê û qesta nivîskar a bi gotinê guheriye. Heman rewş di mînaka TJ de [*But she is heaping up too many facts*] jî tê dîtin ku di TA de wekî [*Lê gelek bûyer li hev kom kirine*] cih girtiye. Li gor pêwîstiya pêla hişmendî ya vegotinê divê hevok berteka vegêr a vê bîskê nîşan bide û divê tiştêkî wekî "*Lê gelek bûyeran li hev kom dike*" bibe tercîh.

Wergêr di tercîhên xwe yên peyvan de li gor stratejiyê jêder-navend an jî armanc-navend biryar nedane. Wekî mînak wergêr ji bo peyva jêder "biography" li şûna vebijêrkên Kurdî yên wekî "jînenîgarî" û "yadaşt" tercîheke wekî "bîyografî" kiriye. Ji hêla din ve jî, ji bo peyva jêder "economics" ku wekî "ekonomî" jî di Kurdî de cih girtiye, bi tercîheke armanc-navend peyva resen "aborînasî" bi kar aniye. Di TJ de gelek navên kesan, berheman û referansên din hene ku piranî jî wekî hêmanên kultur-spesîfik ên çanda jêder ji xwînerên TJ re binas in, an ku nivîskar xwînerê xwe her wekî bi wan navan beled bin qebûl kiriye. Bi heman awayî ji wan navan hinek aîdî kes an jî tiştên rastî û hinek jî yên pevbestî ne. Di vê rewşê de, ji bo xwînerê TA pêwîstiyê ravekirin û agahiyên zêdehî çê dibe da ku têkiliya wan referansên navan bi mijarê re çê bikin. Wergêr agahiyên wekî jênot derbarê wan kesayet û navan de nedane.

3.2.9.4. Hevtayîya Edebî û Rexneya Wergerê

Tercîha li ser vê berhemê ya wergêra jin a ku me wekî armanceke wergerê hesiband, rasterast li ser şêweya wergerandinê bandorê çê neke jî, mimkun e ku baldarî û hesasiyeteke li ba wergêr çê bike da ku teksteke tekûz û tam biafirîne. Wergêra jin a ku ji ber hezkirina bi nivîskar û nîrxê sembolîk ê berhemê xwe dabe ber wergerê, bivê nevê dê derbarê berhemê de xwedî sempatî be û dê ji bo raguestina berhemê ya rast û tekûz bêtir hesas be. Di mînaka me de hezkirina wergêr a ji bo nivîskar û berhemê helwesta wergereke dilsoz li ba wergêr derxistiye holê. Tercîha wergêr a bi hevokên dirêj ji bo nîşandana şêwaza nivîskar biryareke di cih de ye, lê belê ev biryar di hin mînan de li normên sentaktîk ên Kurdî nayê an jî zorê dide hevoksaziya Kurdî ya edetî. Ev yek dê li gor bendewariyên xwînerên Kurdî jî nebe, her ku tecribeya xwendina bi Kurdî li ser qebûla "kurt û kurmancî" teşe girtiye. Her wisa di mînakên hevokên nehevta de jî kêşeyêke giring derdikeve holê. Her wekî me li jor bi du mînan nîşan da, di hin hevokan de raweya dema TJ û TA hevta nîn in.

Di pêvajoya wergerê de ciyawaziya demê ya navbera TJ û TA nabe kêşeyeke giring bi şertê ku raweya demê navgîneke esasî ya şêwazê û vegotinê nebe. Lê belê hevgeriya raweya deman di teknîka pêla hişmendiye de taybetiyeke esasî ye û me di mînakên jor de ev kêşe û encamên wê rave kirin. Nivîskar di ser faktora demê re bandora tişt û bûyeran a li ser ramanên xwe vedibêje û vê yekê jî bi têkiliyeke aloz a bîskên hevdem û paşdem saz dike. Wergêr wekî stratejî dikare raweyên demê yên TJ yekser di TA de jî bi kar bîne ku ev rêya hêsan e. Di hin şert û mercan de rêbaza yekem guncav nabe, wê demê jî wergêr li gor mantiqa zimanê armanc demên vegotinê saz dike. Di teksta me ya nimûne de wergêr bê ku ji wan rêbazan yekê hilbijêre, tercîha xwe hevok bi hevok kiriye û di encamê de jî rewşeke nehevta ya vegotinê derketiye holê.

Virginia Woolf di beşa pêncemîn de ku me ji bo dahûrandinê bijart qala nivîskarên jin dike yên wekî Jane Harrison, Vernan Lee, Getrude Bell û yên din. Woolf berhemên wan bi nav dike her wekî xwînerên wê jî ji wan û berheman beled bin. Hin ji wan nivîskar û berheman jî dema xebata wê ya li pirtûkxaneyê cara yekem derdikevin pêş Woolfê. Referansên ku Woolf wekî kes û berhem dide bi saya nêzikbûna çandî û perwerdehiya edebî ji xwînerê TJ re bêtir binas in. Xwînerê TJ di heman demê de xwedî agahî ne derheqê paşxaneya civakî, dîrokî û şexsî ya wan nivîskar û berhemên wan. Ji hêla din, ji bo xwînerê TA ew agahî dibin kêşeyên têgihîştinê. Ev nav û berhemên ku Woolf qal dike, mijarên wan, peywenda civakî ya nivîsandina wan tev wekî valahiyên berfireh dimînin. Xwînerê TA ancax bi hin agahiyên ku nivîskar derbarê wan dide dibe xwedî agahiyên sînordar.

Rêyeke dabînkirina agahiyên bi vî rengî, her wekî me di dahûrîna tekstên din de jî qal kir, bikaranîna jênotan an jî amadekirina pêşgotineke berfireh e. Her çî qas derfetên xwînerên îroyîn a peydakirina agahiyên derheqê nivîskar û berheman zêdetir be jî, dema ku wergêr agahiyên kultur-spesîfik pêşkêşî xwînerên TA nekin, têgihîştina xwînerê armanc û ya xwînerê jêder bi awayekî berbiçav ji hev cuda dibe. Xwînerê jêder bêtir nêzikî paşxaneya fikrî ya angaştên nivîskar e. Ji hêla din ve, xwînerê armanc her çî qas ji angaştên nivîskar têbigihîje jî, ev têgihîştin bêyî agahiyên dermetnî xuya ye ku dê nivco bimîne û dê dijwar be ku xwînerê armanc bibe xwedî helwesteke rexnegir.

Her wisa Woolfê hin karakter û berhem li ba xwe çêkirine ku di dîrokê de nîn in. Li gor agahiyên ku Tearle (2022) dide, Judith Shakespeare, ku Woolf wê wekî xwişka Shakespeare pênase dike, û romanûsa bi navê Mary Carmichael û romana wê *Life's Adventure* ji hêla Woolfê ve ji bo ku niqaşa angaştên xwe bi ser wan mînak bide hatine afirandin. Di vê rewşê de, dibe ku xwînerê TA wan nivîskaran wekî kesayetên dîrokî û berhemên wan jî wekî berhemên heyî bihesibîne, wê demê bandora teksta armanc û fonksiyona wê dê biguhere. Ji ber ku berhema Woolfê berhemeke edebî ye, fonksiyona TJ jî her wekî piraniya tekstên edebî *derbirînî* ye. Ji hêla din ve, eger xwînerê TA Judith Shakespeare û Mary Carmichaelê wekî kesayetên dîrokî bizane, hingê fonksiyona tekstê di bibe *agahîdêr*. Her ku TJ bi fonksiyoneke derbirînî li ser xwînerê jêder bandoreke bêtir edebî çê bike, TA dê ji bo xwînerê armanc bêtir bibe çavkaniya agahiyê û fonksiyoneke agahdariyê pêk bîne.

ENCAM

Di vê xebata me de, her wekî bi nimûneyên wergeran ên aîdî serdemên cihê jî dupat bû, diyar bû ku di qonaxên cihê yên edebiyata Kurdî de hewldanên wergerandina berhemên edebî timî çê bûne. Xebatên wergerê yên ku bi handana takekesan û bi derfetên kovar û weşanxaneyan meşiyane, ji ber şert û mercên siyasî û aborî nîvco mane. Di encamê de jî em nikarin behsa pêvajoyeke domdar û bi îstiqrar a wergera Kurdî bikin. Dîsa jî, ew destpêxeriyên nivcomayî û hewldanên wergerê bûn paşxane û bingeh ji bo wergera Kurdî ya îroyîn. Têkiliya edebiyata Kurdî û edebiyata cîhanê ya bi rêya wergerê bi awayekî rasterast çê nebûye. Klasîkên edebî bi xwendinên şexsî yên di ser zimanên fermî re hatine keşifkirin. Di wergera Kurdî de ji bo demeke dirêj zimanên Tirkî, Erebî, Farsî û Ermenî bûne zimanên navbeynkar ji bo wergerandina berhemên Îngilîzî, Fransî, Almanî, Rûsî û yên din, lê belê piştî salên 2000an di vê rewşê de guhertinên berbiçav çê bûne.

Her wisa xebatên wergerê yên ku bi însiyatîfa weşanxane, kovar û wergêran dest pê kiriye, bi awayekî pisporane nemeşiyaye, nimûneyên wergeran bi awayekî rêkêpêk nehatine parastin, weşanxane an jî kesên di nav karê wergerê de agahiyên derbarê pêvajoya wergeran, daneyên jimaryarî û mijarên din tomar nekirine. Ji ber vê yekê ye ku nimûneyên lêkolîn, gotar û tezên derbarê wergerê de yên ku me di lêkolîna xwe de tespît kirin giranî dane ser dîroka wergerê û bi vê yekê jî armanc kirine ku xebatên wan tevkariya avabûna bingeh û bergeheke dîrokî ya wergera Kurdî bike. Ji hêla din ve, nivîs, vekolîn û rexneyên derbarê wergerê bi qasî nimûneyên wergeran kevn nîn in. Di navbera gotara Cemal Nebez a li ser mijara wergerê û wergerên Mela Mehmûdê Bazidî de bi qasî sed sal derbas bûye. Lêkolînên derbarê wergera Kurdî de wekî mijar li dor armanc û pêwîstiya wergerê, wergera baş û xirab, kêşeyên wergerê û metirsiyên ku werger ji bo ziman û edebiyatekê çê dike kom bûne. Lêkolîn bêtir di çarçoveya têkiliya ziman û wergerê de çê bûne û kêm be jî têkiliya wergerê û edebiyatê bûye mijara wan lêkolînan. Derbarê têkiliya çand û wergerê de lêkolîn û xebatên Kurdî kêm in, sedema vê yekê jî ew e ku ranêzikî, teorî û têgihên ku li dor çandê û çandnasiyê wergerê lêkolîn dikin di qada xebatên Kurdî de zêde nayên zanîn. Her wisa

rexneyên tekst û berhemên werger ên li gor rêbaz û teoriyên zanistî jî kêr in. Di gel ku hejmara wergeran zêde be jî, nebûna rexneya wan berheman bi kêmasiya çavkaniyên wergerê yên teorîk ên bi Kurdî re eleqedar e.

Wergêr, weşanger û edebiyatvanên Kurd bi armancên wekî geşkirina edebiyata Kurdî û danasîna berhem û nivîskarên cîhanê bi motîvasyoneke civakî û kolektîf serî li wergerê dane. Weşanxane, kovar û kesayetên bi wergerê re eleqedar xwestine ku cureyên di edebiyata Kurdî de nîn in an jî mînakên wan kêr in, bi rêya wergerê di Kurdî de nîşan bidin. Lê belê, ji ber tercîhên şewazî an jî ji ber nebûna stratejiyêke guncav a wergerê ev armanc yekser pêk nehatine. Di hin mînakan de şewaza nivîskar û di hin mînakan de jî taybetiya cureyî ya berhemê di pêvajoya wergerê de wînda bûye. Wergêran li gor eleqeya xwe ya bi edebiyatê re û tercîhên xwe yên nivîskariyê yên şexsî berhemên edebî bijartine ji bo wergerê. Her ku wergêrên helbestvan bi piranî berhemên helbestê bijartine, yên ku nivîsên pexşanî dinivîsin jî berhemên wekî çîrok û roman tercîh kirine. Di nimûneyên ku me bijartin de, wergêr Kawa Nemir û Rizgar Elegez helbestvan in û helbest wergerandine; Sidîq Gorîcan haîkûnûs e û haîkû wergerandine; Sîdar Jîr çîroknûs e û çîrok wergerandine. Tercîha wergêr Aynur Kaş a berhema Virginia Woolfê jî bi tercîha wê ya zayendî û temsîla berhemê ya wekî zayenda civakî re eleqedar xuya dike. Piraniya wergêrên Kurd di heman demê de berhemên edebî jî dinivîsin. Hat raçavkirin ku wergêrên nivîskar şewaza xwe ya nivîsînê dikin bingeha wergera xwe û bi helwesteke armanc-navend wergerê dikin. Carinan jî şewaza teksta jêder bandorê li ser wergera wan dike û bi helwesteke jêder-navend wergerê pêk tînin. Hat dîtin ku wergêr bi piranî li gor hin biryaran wergerê dikin, lê belê ev biryar di asta stratejiyêke hevîr û teorîk de nîn in.

Di ve xebatê de diyar bû ku modela *analîza tekstê ya werger-navend* li gor pêşekiyên lêkolînê derfetên bidestxistina encamên cihê berdest dike. Modela C. Nordê hem ji bo sepandina bi tevahî ya modelê hem jî ji bo bijartina hin hokarên analîzê modeleke guncav e. Hokarên dermetnî ji bo diyarkirina çarçoveya derveyî ya tekstên nimûne daneyên kêrhatî pêşkêşî me kirin. Di pêvajoya dahûrandina hokarên navmetnî de, me dît ku ji heşt hokarên navmetnî *mijar*, *naverok*, *kompozîsyona tekstê*, *peyvسازی* û *hevoksازی* ji bo dahûrandinê daneyên şênber pêşkêşî me kirin, lê belê hokarên wekî *hêmanên ne-peyv* û *hêmanên raparçeyî* ji

ber taybetiya tekstan amarên şênber dabîn nekirin. Pêwîstekên hevtayiya edebî yên ku Nord di modela xwe de pêşkêş dike ji bo berawirdkirina nimûneyên me yên TJ û TA bûn pîvanên sûdewer.

Wergera Teksta 1em mînaeke balkêş e ji bo niqaşên derbarê sînorê wergera serbest de. Di vê nimûneyê de, wergêr bi tercîheke berbiçav a wergera serbest hêmanên kultur-spesîfik ên çanda armanc daxilî nav TA kiriye. Wergêrê şair bi helwesteke şairane zimanê TA bi hêmanên çandî û sembolên îkonîk ên Kurdî xemilandiye. Di wergera Sone 10ê de motîvasyona şexsî ya wergêr û xeyala wî ya wergerandina Shakespeare ew ji berpirsiyariya nîşandana reseniya tekstê dûr xistiye û xetereya danasîna berhema resen a nerast derxistiye holê. Di gel vê yekê jî, ev werger nimûneyeke serkeftî ye ji bo nîşandana pêkaniya wergera helbestê ya bi teşeyeke helbestî ya xwemalî.

Di nimûneya Teksta 2yem de wergêr stratejiyeye jêder-navend daye pêş xwe û hewl daye ku taybetiyên şewazî yên TJ di TA de nîşan bide. Di vê mînakê de, giringiya pêkanîna heman stratejiyê ya di tevahiya wergerê de derdikeve pêş. Wergêr pîvanên xwe yên ku di tevahiya tekstê de pêk anîne, di tercîha xwe ya sernavê de binpê kiriye û di encamê de jî bandoreke neyînî li ser hevtayiya TJ û TA çê bûye. Sernavên berheman bandorê li ser wergirtina tevahiye berhemê çê dikin û lewma jî divê bi biryarên wergêr ên din re biguncin.

Di Teksta 3yem de wergêrê haîkûyê, ji ber zanyarî û tecribeyên xwe yên derbarê cureya haîkûyê de, ji hêla teşeyê ve li gor nerîta haîkûya Japonî teşeya tekstê saz kiriye. Di encamê de jî li şûna kompozîsyona haîkûya resen a Amerîkî kompozîsyona haîkûya Japonî derketiye pêş. Berevajî helwesta xwe ya teşeyî, wergêr ji hêla naverokê ve stratejiyeye serbest bijartiye. Bi vî awayî jî, stratejiya wergêr a derbarê teşe û kompozîsyonê li tercîha wî ya wergera serbest nehatiye û hevtayiya edebî di asteke îdeal de pêk nehatiye.

Teksta 4em lihevhatina armanca wergerê û stratejiya wergêr nîşan dide. Her ku TJ ji bo xwînerên zarok û ciwan hatiye wergerandin, wergêr li gor pîvanên pedagojîk zimanê berhemê nerm kiriye û rê li pêş çêbûna bandora tundiyê ya li ser xwîner girtiye. Wergêr ji bo hêsankirina têgihîştinê û xurtkirina peyama fablê TA li gor TJ dirêjtir wergerandiye û peyamek jî di dawiyê de lê zêde kiriye. Ji ber pekanîna armanca wergerê di ziman û şewaza cureyî ya TJ de hin guhertin çê

bûne. Di vê mînakê de armanca wergerê û fonksiyona tekstê bi bedêla lawazbûna taybetiya cureyî pêk hatiye.

Di nimûneya Teksta 5em de wergêr di navbera taybetiya cureyî ya meselê de tercîha xwe li ser hêla wê ya pexşanî daye û hêla helbestî ya berhemê paşguh kiriye. Di rewşên wiha yê cureyên dureh de temsîla her du hêlên berhemê ne mimkun e. Bi tercîha wergêr wate, tema û referansên TJ bi awayekî zelal di TA de diyar bûne, lê belê xasyetên wekî danganî û ahenga peyvên di TA de nehatine nîşandan. TA ji hêla cihêrengiya navlêkirinê ve li gor TJ qels maye û ji ber vê yekê jî kûrahiya fikrî ya berhemê di TA de bi têrê çê nebûye.

Teksta 6em, wekî mînakeke berbiçav, nîşan dide bê ka paşguhkirina hin hûngiliyan bandorên çawa li ser wergirtina teksteke werger dikan. TJ li gor şewaza nîşandinê ya O. Henry di vegotinê de dîtbariyê derdixe pêş û bi helwesteke înteraktîf çîrokê vedibêje. Wergêr di TA de cih nedaye hin peyv û gotinên kirîfîk û bi vî awayî jî ji nîşandana şewaza xweser dûr ketiye. Her wisa îronî wekî parçeyeke giring a şewaza O. Henry di wergerê de ji ber stratejiya jêbirinê ya wergêr winda bûye.

Çewlika Heywanan di cîhana edebiyatê de wekî berhemeke alegoriya siyasî hatiye senifandin û vê yekê di mînaka Teksta 7em de bandor li ser tercîhên wergêrê Kurd jî kiriye. Wergêr pêşekî daye nîrxê dermetnî yê berhemê û stratejiya xwe ya wergerê li ser nîşandana taybetiya alegorîk a berhemê çê kiriye. Di encama vê yekê de, taybetiyên şewazgerî yê berhemê û tercîhên nivîskar ên vegotinê di TA de bi têrê dîtbar nebûne. Her ku berhemên edebî bi yekîtiya şewaz û naveroka xwe ve dibin xwedî estetîk û hêmanên kultur-spesîfîk jî parçeyeke vê yekîtiyê ne, pêwîstî bi stratejiyên wergerandinê yê tevger hene ji bo ku berhemeke resen di zimanê armanc de taybetiyên xwe winda neke.

Di nimûneya Teksta 8em de wergêr fonksiyona dualî ya şanonameyê li ber çav girtiye û TA hem ji bo xwendinê û hem jî ji bo lîstinê wergerandiye. Ji ber ku pêwîstiyên teksta xwendinê û lîstinê ji hev cihê ne, wergêr ji bo pêkanîna hin biryarên xwe yê wergerê di temsîla hin taybetiyên berhemê de ji pîvana hevtayiyê dûr ketiye. Her ku Macbeth berhemeke biserwa ye, wergêr ji bo pêkanîna serwayê ya di TA de peyv û gotinên aîdî devok, şewezar û komên axaftinê yê cihê bi kar aniyê û bi vê yekê jî bûye sedema têkçûna hevgeriya

navxweyî ya vegotinê. Zimanê karakterên esîlzade di TA de wekî zimanekî dureh ê tovrindan û zimanê rojane hatiye nîşandan. Di vê mînakê de diyar bû ku temsîla taybetiyên şiklî û neverokî yên berhemekê di heman astê de pêk nayê û wergêr bivê nevê ji bo nîşandana hin taybetiyên dev ji hin taybetiyên din berdide.

Di nimûneya Teksa 9em de tercîha wergêr a têkildarî nivîskar û naveroka berhemê, wergêr ber bi helwesteke dilsoz a wergerandinê biriye. Wergêr ji ber vê helwesta xwe ya dilsoz rîska zimanekî giran û rexneya xwîneran wergirtiye bi berdêla ku şêwaza resen a nivîskar bi hevokên dirêj di zimanê jêder de temsîl bike. Di gel vê yekê jî, ji ber nebûna stratejiyê hevgir û domdar dilsoziya wergêr temsîleke tam a şêwaza nivîskarê misoger nekiriye. Her çî qas hevokên dirêj ên nivîskarê di TA de xuya bûbe jî, wergêr stratejiyê taybet ji bo teknîka vegotinê ya pêla hişmendiyê di TA de têtîq nekiriye.

Di vê xebata xwe de, di çarçoveya teorîk a wergerê de, me têkiliya cureya tekstê, qayde û normên wergera edebî û taybetiyên cureyî yên berhem û tekstan analîz kir. Me li gor modeleke teorîk a wergerê nimûneyên wergeran, ên ku ji cureyên cihê yên edebî hatin bijartin, di çarçoveya hevtayîya edebî de nirxandin. Di encama dahûrandina me de kifşe bû ku di tekstên helbestê de kêşeyên cure-spesîfik bêtir xuya dibin. Di mînakan de diyar bû ku wergêr ji bo pêkanîna hevtayîyê di navbera tercîha forma helbestî û wateya helbestê de dimînin. Di tekstên pexşanî de jî kêşeyên sereke zêdetir bi biryar û hevgiriya helwesta wergêr re têkildar in. Xebata me, bi vê nîvenga xwe ya lêkolînê, ji bo lêkolînên pêşerojê yên cure-spesîfik, ên ku wergerên heman cureyê analîz dikin, dê bibe destpêkek. Di pêşerojê de, gengaz e ku lêkolînerên qada Kurdnasiyê bi lêkolînên ku bi cureyê edebî ve sînorkirî bala xwe bidin ser şêwaz û tercîhên wergêran û analîzên hevdem û paşdem pêk bînin. Analîz û encamên ku me di vê xebatê de bi dest xistin bi tekstên bijartî û bi rêbaz û modela teorîk ve sînordar in. Li pêşerojê, bi rêya xebatên cihê, bi nîvengên dîtir ên ku bi model, rêbaz û disîplînen din ve têkildar in, derfetên şirovekirina wergera edebî ya Kurdî dê zêdetir çê bibe. Bi rêya xebatên hevtamamker, di pêşerojê de derfeta pêşxistina model, stratejî û ranêzîkiyên xwemalî jî dê gengaz bibin.

Her wisa di encama xebata me de pêwîstiyek berbiçav diyar bû ku divê bîbliyografyayê tîkûz a berhemên werger ên Kurdî tamam bibe. Di xebata me de, her çî qas armanca lêkolînê ya sereke nebe jî, nimûneyên wergeran bi awayekî

kronolojîk û li gor herêm û zaravayan hatine pêşkêşkirin. Dîsa jî, ji ber pêşkêşkirina sînordar a nimûneyên wergeran, rewşa dîrokî ya wergera Kurdî û geşedan û hewldanên wergerê bi awayekî tam diyar nebû. Ev jî pêwîstiya xebatên jîmaryarî û bîblîyografîk derdixîne holê. Bi xebatên pêşerojê yê bi vî rengî, tekstên werger ji hêla pardem, cureya berhemê û zaravayê ve dê bîn dabeşkirin; û bi vî yekê jî, ji bo şirovekirineke baştir a rewşa wergera Kurdî ya dîrokî û edebî zêdetir dane dê berdest bin. Di vî xebatê de, ji bilî analîzkirina problematîka sereke ya tezê, me behsa teorî û modelan kir, me mijarên wergera edebî yê lêkolînê destnîşan kirin û giringiya xebatên tomarkirin û senifandina berhemên werger û pêwîstiya rexneyê derxist pêş. Mîmkun e ku ev helwesta me dê lêkolînên pêşerojê yê di van babetan de jî teşwîq bike.

JÊDER

- Aaltonen, Sirkku. (1996). "Translator in Theatre – Pariah or Master". *Transferee Necesse Est, Proceedings of the 2nd International Conference on Current Trends in Studies of Translation and Interpreting*. 5-7 September, 1996. Budapest. Hungary. pp. 455-459.
- Açar, Zafer. (2020). "Wergera ji Tirkî bo Kurdî û Bikaranîna Hin Peyv û Qalibên Girîng ên Kurdî di Wergerê de". *Kurdiyat*. Sal 2020. Hejmar 1. rr. 83-103.
- Adak, Abdurrahman. (2015). "Li Gorî Serdemên Tarixî Têkiliyên di Navbera Edebiyatên Kurdî û Tirkî yên Klasîk de. Sempozyuma Edebiyata Berawirdî "Ji Duh Heta Îro di Edebiyatên Tirkî û Kurdî de Texeyulên Nasnameyî". *Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları*. Mêrdîn, rr. 75-110.
- Ahmed, Amr Taher. (2017). "Doğudan Batıya Goran Şiirleri". *Kürt Edebiyatı*. Weşanxaneya Avesta. Stenbol. rr. 69-82.
- Alakom, Rohat. (1991). *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi, 1787-1987*. Deng Yayınları. İstanbul.
- (2023). *Rêya Teze (1930)*. Weşanxaneya Avesta. Stenbol.
- Altabaa, Homam; Hamawiya, Adham. (2019). "The Life and Works of Kahlil Gibran: A Critical Review". *Asiatic*, Vol. 13, No. 1, June 2019, pp. 103-118.
- Avcı, Ziya. (06 Çileyê Paşîn 2021). "Çarşema We Bi Xêr: Jiyan û Serpêhatiya Pîremêrd. Beş 2. <https://youtu.be/Ud5kL7xRPdE?t=2>. (d.x.: 14.10.2023
- Aydogan, Mustafa. (2001). "Wergêr hinerek e". *Nûdem*. hejmar 38, rr. 114-143.
- Aydogan, Î. Seydo. (2013). "Hin Pirsgerêkên wergerê Di Kurdî de". *Guman I*, Weşanên Lîs. Amed. rr. 267-283.

- Aykaç, Yakup. (2022). "Kêşeya Wergera Biwêj û Gotinên Pêşyan Di Navbera Tirkî û Kurdî De". *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Yıl: 7, Cilt: 7, Sayı: 14, ss. 69-83).
- Azadî. (1978). Hejmar 4, Paris.
- Babler, Ottzo, F. (1970). "Poe's 'Raven' and the Translation of Poetry". *The Nature of Translation, Approach to Translation Studies*. No.1 ed. By James, S. Holmes. Slovak Academy of Sciences. Bratislava.
- Baker, Mona. (1992). *In Other Words, a course book on translation*. Routledge. London & New York.
- (2001). *Routledge Encyclopedia of Translation Studies*, Routledge. London & New York.
- Bar Helbest. (2022). *Kovara Helbestê*. Hejmar 5-6.
- Barslund, Charlotte. (2011). "The Translation of Literary Prose". *The Oxford Handbook of Translation Studies*. Ed.: Kirsten Malmkjær and Kevin Windle. Oxford University Press. UK.
- Bassnett, Susan. (1998). "Transplanting the Seed: Poetry and Translation". *Constructing Cultures, Essays on Literature Translation*. Multilingual Matters. Clevedon.
- Bassnett, Susan; Lefevere, Andre. (1992). *Translation History Culture*, Routledge. London and New York.
- Bassnett, Susan. (2002). *Translation Studies (New Accents)*. Routledge. London & New York.
- Belloc, Hilaire. (1931). *On Translation*. The Clarendon Press. Oxford.
- Benjamin, Walter. (1992; 1921). "The Task of the Translator". *Theories Of Translation, An Anthology of Essays from Dreyden to Derrida*. Ed.: Rainer Schulte and John Biguenet. The University of Chicago Press. Chicago and London. Translated by Harry Zohn, pp. 71-82.
- Blau, Joyce, (2017). *Kürt Edebiyatı*. Weşanxaneya Avesta. Stenbol. rr. 11-42.

- Bloom, Harold. (2006). *George Orwell's Animal Farm*. Chelsea House Publishers. USA.
- Boyik, Eskerê. (2019). *Çanda Kurdên Sovête*. Weşanxaneya Peywend. Stenbol.
- Braunmuller, A. R. (1997). *Macbeth- The New Cambridge Shakespeare*. Cambridge University Press. United Kingdom.
- Bruinessen, Martin von. (1985). "Onyedinci Yüzyılda Kürtler ve Dilleri: Kürt Lehçeleri Üzerine Evliya Çelebi'nin Notları". *Studia Kurdica*, ss.13-37.
- Buck, Christopher. (2010). "Kahlil Gibran". *American Writers: A Collection of Literary Biographies*. American Writers Supplement. GALE CENGAGE Learning, USA.
- Bulletin of School of Orient and African studies. (1923). London. pp. 69-88.
- Butt, M. N. Riaz. (1976). "An Analysis of Literary and Philosophical Elements in Macbeth". Submitted to the Faculty of the Grauate College of the Oklahoma State University for the Degree of Doctor of Philosophy. December, 1976.
- Catford, J. C. (1965). *A Linguistic Theory of Translation*. Oxford University Press. Oxford London.
- Cewerî, Firat. (1996). *Kultur Huner û Edebiyat*. Weşanxaneya Nûdem, Stockholm.
- Chesterman, Andrew. (1997). *Memes of Translation- the spread of ideas in translation theory*. Benjamins Publishing Company. Amsterdam/Philadelphia.
- Cuddon, J. A. (2000). *Dictionary of Literary Terms & Literary Theory*. Penguin Books. England.
- Çeçen, Ramazan. (2017). "Qonaxa Stenbolê di Edebiyata Kurdî ya Modern de". *Nûbihar Akademî*. Jimar 8. Sal 4. 2017.

- Çelik, Bilal. (2019). "Translation in the Kurdish magazine Hawar, The making and legitimization of a cultural identity". *Translation and Interpreting Studies* 12: 2 (2019). pp. 283-305.
- Çirokên Ezopê. (2013). Wer.: Sidîq Gorîcan. Weşanxaneya Sîtav. Wan.
- Devy, Ganesh. (1999). "Translation and Literary history: An Indian View". *S. Bassnett et al (eds.), Post-colonial Translation: Theory and Practice*. London and New York. Routledge. pp. 182-188.
- Dihokî, Xelîl. (2005). "Letîf Helmet". *Antolojiya Edebiyata Kurdî*. Mehemed Uzun. Cild 2. Tûmzamanlar Yayıncılık. İstanbul. r. 150.
- Dost, Jan. (2009). "Pêşengê wergera bi kurdî: Mela Mehmûdê Bayezîdî". *Tîroj*. Sal 7. Hejmar 40, 2009. Stenbol. rr. 36-37.
- Dryden, John. (1992). "On Translation". *Theories of Translation, An Anthology of Essays from Dreyden to Derrida*. Ed.: Rainer Schulte and John Biguenet, The University of Chicago Press, Chicago and London. Translated by Harry Zohn. pp. 17-31.
- Duzen, Husên. (2005). "Pira di Navbeyna Ziman û Çandên Cihê de: Wergera Wêjeyî". *Bîr*. Hejmar. 3. Payîz-2005. rr. 152-156.
- Duzen, Husên. (2009). "Werger karekî gunehkarî û pîroz e", hevpeyvîn bi Husên Duzen re. *Zinar Şîno. Tîroj*. Hejmar 40. rr. 37-39.
- Ehmed, Kemal Mezher. (1997). "Şerefname di Kurdnasiya Sovyetê de". *Nûdem*. Hejmar 22, havîn 1997, rr. 44-45.
- Egîd, Qadir. (2018). *Wergera Kurdî ji Destpêkê ta Salên 1950, "Dîrok, Giringî û Alozi"*. Teza Masterê ya Neçapkirî. Zanîngeha Rojava. Qamişlo.
- Elalef, Perwîn Osman Mustefa. (2009). *Wate û Wergêran, Lêkolîneweyekî Watesaziye*. Weşanên Mukriyanî. Hewlêr.
- Eşo, Wezîrê. (2018). *Kilam û Pênûs, Kurdên Kafkasyaya Başûr*. Amd.: Nihat Gültekin. Weşanên Lîs, Amed.
- Etymonline. (d.t.). "Translation". Online Etymology Dictionary. d.t.: 20.10.2023. <https://www.etymonline.com>

- Eugene, Nida. (1964). *Towards a Science of Translating*. Leiden E. J. Brill, Netherlands.
- Evdilezîz, Nêçîrvan. (2020). "Bizava Wergerê li Rojavayê Kurdistanê". *Kovara Şermola*. Hejmar 8, 2020. rr. 26-30.
- Even-Zohar, Itamar. (1990). "Polysystem Studies". *Poetics Today International Journal for Theory and Analysis of Literature and Communication*. Volume 11, number 1 ([1990] 1997).
- Fadaee, Elaheh. (2011). "Symbols, metaphors and Similes in Literature: A Case Study of 'Animal Farm'", *Journal of English and Literature*, V.2 (2), pp. 19-27.
- Fakılı, N. İlknur. (1997). *A Translation Criticism of Virgina Woolf's a Room of One's Own*. A Master Thesis submitted to the Department of Translation and Interpretation. Hacettepe University. Institute of Social Sciences. January 1997. Ankara.
- Farrel, Edmund; Christensen, Jane. (1987). *Discoveries in Literature - America Reads Classic Edition*. Scott Foresman Edition. USA.
- Friedrich, Hugo. (1992). "On the Art of Translation". *Theories of Translation An Anthology of Essays from Dreyden to Derrida*. Ed.: Rainer Schulte and John Biguenet. The University of Chicago Press. Chicago and London. Translated by Harry Zohn. pp. 11-16.
- Frost, Robert. (1964). *Complete Poems of Robert Frost*. Holt, Rinehart and Winston. USA. p. 11.
- Gelawêjî Nwê. (1997). *Kovara Edebî û Siyasî*. Hejmar. 3.
- Ghazala, Hasan, S., (2015). *Literary Translation from a Stylistic Perspective*. ISSN2372-9740 (print) ISS 239-311X (Online) Vol.3, No 2, 2015.
- Gibran Khalil Gibran. (2012). *Zilamê Dîn*. Wer.: A. Çelik. Kovara Tabularasa. Filîtto Weşan.
- Gibbs, Laura. (2002). *Aesop's Fables*. Oxford University Press. USA.

- Gottlieb, Henrik. (2005). "Multidimensional Translation: Semantics turned Semiotics". *EU-High-level Scientific Conference Series*. Copenhagen.
- Göktürk, Akşit. (2004). *Çeviri: Dillerin Dili*. YKY. İstanbul.
- Gutas, Dimitri. (2003). *Yunanca Düşünce, Arapça Kültür; Bağdat'ta Yunanca-Arapça Çeviri Hareketi ve Erken Abbasi Toplumu*. Çev.: Lütfü Şimşek. Kitap Yayınevi. İstanbul.
- Gutt, Ernst-August. ([2000] 2010). *Translation and Relevance - Cognition and Context*. Routledge. London & New York.
- Hakutani, Yoshinobu. (2020). *American Haiku, Eastern Philosophies, and Modernist Poetics*. Lexington Books. Lanham.
- Hamawandy, Azad T.; Abbas, A. Mustafa. (2014). "Some Kurdish Lexemes in The Holy Qur'an", *Journal of Zankoy Sulaimani*. Part B. N. 44. February 2014. rr. 353-364.
- Haneen, Islam Saleem, Hakar, Hazim M.A. (2021). "Problems Students Face in Translating Discourse Markers from English into Kurdish". *Academic Journal of Nawroz University /AJNU*, Vol.10, No.3, 2021. rr. 1-7.
- Haque, Ziaul. (2012). "Translating Literary Prose: Problems and Solutions". *International Journal of English Linguistics*; Vol. 2, No. 6; 2012. pp. 97-111.
- Hart, Henry. (2017). *The Life of Robert Frost*. Blackwell Critical Biographies. Wiley Blackwell. UK.
- Hasan, Abdul-Nafi Khidir. (2020). "Difficulties in Translating Culturally Bound Conversational Words and Phrases in English and Kurdish". *Koya University Journal of Humanities and Social Sciences (KUJHSS)*. Volume 3, Issue 1, 2020. pp 174-180).
- Hassanpour Amir. (2005). *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil 2005, 1918-1985* (Nationalism and Language in Kurdistan 1918-1985, Mellen Research University Press, San Fransisco, 1992). Wergera Ji Îngilîzî: İbrahim Bingöl, Cemil Gündoğan, Weşanxaneya Avesta, Stenbol.

- Hawar. (1932-1945). *Kovara Edebî*. Hejmar 32.
- Hays, Andrew. (2016). "What are the differences and similarities between Petrarchan and Shakespearean sonnets?". Edited by eNotes Editorial, 12 Apr. 2016. (<https://www.enotes.com/topics/william-shakespeare>).
- Hemed, P. Sabîr. (2019). "Wergêran û Çalakkirdinî Alugorrî ye Roşenbîrîyekan lê Nêwan Zmanî Kurdî û Erebi da". *Kovari Zankoyî Slêmanî/ Beşî (B) Zaniste Mirov Mirovayetîyekan*. Jimare 59. Kanûnî Duwem, 2019. rr. 89-110.
- Henry, O. (2013). *Diyariya Sersalê*. Wer.: Sîdar Jîr. Weşanên Lîs.
- Hermans, Theo. ([1985] 2014). *The Manipulation of Literature, Studies in Literary Translation*. Routledge. New York.
- Hesen, Aram. (2020). "Werger". *Kovara Şermola*. Hejmar 8, payîz 2020. r. 12-14.
- Hêvî. (1983-1982). *Kovara Çandî ya Giştî*, Hejmar: 1-2-3-4-5-6-7-8.
- Hêzil, Samî, (2021), "Werger û Wêjeya Kurdî", *Kürt Araştırmaları Dergisi*, Kürt Edebiyatı Özel Sayısı. (<https://www.kurdarastirmalari.com>)
- Holmes, James, S. (1970). "The Nature of Translation, Approach to Translation Studies". No.1. Ed. By James, S. Holmes. *Slovak Academy of Sciences*. Bratislava.
- (1988; 1975). "The Name and Nature of Translation Studies". *Translated!: Papers on Literary Translation and Translation Studies*, Rodopi. Amsterdam. pp. 66-80.
- House, Juliane. (2018). *Translation, the basics*. Routledge. New York.
- Gibran, Kahlil. (1968; 1918). *The Madman: His Parables and Poems*. Alfred A. Knopf, Inc., Canada.
- Gostand, Reba. (1980). "Verbal and Non-Verbal Communication: Drama as Translation". *The Languages of the Theatre. Problems in the Translation and Transposition of Drama*. Ed. Zubert, O. Oxford. Pergemon Press. pp. 1-9.

- Îbrahîm, Kînyazê. (1990). "Kürt ve Ermeni Edebi İlişkileri". *Kovara Bergeh* hejmar 5, Sal 1990. Stockholm. rr. 88-95.
- Jakobson, Roman. (1959). "On Linguistics Aspects of Translation". *On Translation*. Edited by R. A. Drawer. Harvard University Press, Cambridge. pp. 232-239.
- Jiyana Rewşen. (1996). *Kovara wêjeyî çandî û hunerî*. Hejmar 1. Stenbol.
- Kan, Güneş. (2024). "Ji Perspektîfa Teoriya Polîsîstemê Rol û Karîgeriya Wergêranê di Geşadana Edebiyata Kurdî da". *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*. 2024 12 (1) 33-49.
- Keller, John Esten; Keating, L. Clark. (1993). *Aesop's Fables-with a life of Aesop*. University Press of Kentucky. USA.
- Kerouac, Jack. (1961). *Collected Haikus*.
<http://terebess.hu/english/haiku/Kerouac-Haikus.pdf>. (d.x.: 10.03.2024).
- Kırkan, Ahmet. (2020). "Kur'anı Kerim'in Kürtçe Tercümeleeri ve Zazaca İlk Kur'an-ı Kerim Tercümesinin Dilbilimsel Analizi". *Artuklu Akademi* 7(2), Kasım 2020.
- , (2022), "Zazacaya Çevrilen Eserler ve Bunların Çeviri Bilimsel İncelemesi." *The Journal of Mesopotamian Studies* 7 no. 1: 25-42.
- Koller, Werner. ([1979] 2004). *Einführung in die Übersetzungswissenschaft*. Quelle & Meyer. Heidelberg, Wiebelsheim.
- Konê Reş. (2013). *Ji Stêrên Welatê Qedexe*. Çapxaneyê Parêzgeha Duhokê. Duhok.
- Kovara Şermola. (2020). *Kovara Wêjeyî, Çandî, Werzane*. Hejmar 8.
- Kovara Tabularasa. (2012). *Kovara Wergerê*, Hejmar: 1-2-3, Flitto Weşan. Stenbol.
- Kovara W. (2006). *Kovara Wêjeyî Çandî Hunerî*. Hejmar 12. rr. 3-21. Hejmar 41. r. 28.
- Kurij, Seyîdxan. (2014). "Xebatê Peter J. A. Lerch Derheqî Kurdolojî de". *Nûbihar Akademî*. Jimar 1, Sal 1, 2014. rr. 93-108.

- Lamb, Sidney. (2000). *Shakespeare's Macbeth*. Commentary by Christopher L. Marlow, Hungry Minds Inc., New York.
- Landers, Clifford E. (2001). *Literary Translation -A Practical Guide-*. Multilingual Matters. Clevedon.
- Lebert, Marie. (2016). *A short history of translation and translators*. <https://marielebert.wordpress.com/2016/11/02/translation/>.
(d.x.:15.03.2024).
- Lefevere, Andre. (1975). *Translating Poetry: Seven Strategies and a Blueprint*. Van Gorcum. Amsterdam.
- (1980). "Translating Literature/Translated Literature: The State of the Art". *The Languages of the Theatre. Problems in the Translation and Transposition of Drama*. Ed. Zubert, O., Oxford: Pergemon Press. pp. 153-161.
- LEWerger. (2022-2024). Kovara Wergera Helbestê Ya Çarmehane. Hejmar: 1-2-3-4-5-6.
- Lezgîn, Roşan. (2005). "Tercume û Aversîyayîşê Ziwanî De Rola Tercumeyî". *Kovara Bîr*. Hejmar 3. Payîz.
- Long, E. Hudson. (1949). *-O. Henry- The Man and His Work*. University of Pennsylvania Press, Philadelphia.
- M. Malmisani. (2006). "The Past and Present of Book Publishing in Kurdish Language in Turkey". Next Page Foundation.
- (2006). "The Past And The Present of Book Publishing in Kurdish Language in Syria". Next Page Foundation.
- Mehmûd, Berzo. (2020). "Pirsgirêka Têrmsazîyê Di Pêvajoya Wergêrana Kurdî De". *Kovara Şermola*. Hejmar 8. Payîz 2020. rr. 15-25.
- Menbari, Server; Farzaneh, Farahzad. (2024). "Unveiling the Marginalized: Translation to and from Kurdish in Iran during the Pahlavi Era (1925-1979)." *Translation Studies*. Spring 2024. Vol. 22, No. 85. pp. 9-24.

- Mihemedpûr & Rizaî. (2017). *Lêkolînên Kurdolojiyê li Îranê: Destpêkek ji bo Mijar û Xwendinan*. Ji Farsî: Ferhat Yılmaz, Kovara Nûbihar Akademî, Jimar 8 Sal 4 2017.
- Moran, Daniel. (2000). *CliffsNotes Animal Farm*. Wiley Publishing, Inc. New York.
- Muhammed, Husein. (2012). *Bo Te Ji Welatekî Dûr Dinivîsim*. Weşanxaneyê Dîwan. Amed.
- Munday, Jeremy. (2001). *Introducing Translation Studies*. Routledge. London & New York.
- Naimy, Mikhail. (1974). *Kahlil Gibran: A Biography*. Philosophical Library. New York.
- Nebez, Cemal. (2021). *Wergerandin Huner e*. Kurmancîkirin: Muhsîn Ozdemîr-Brahîm Ronîzer. Weşanxaneyê Sîtav. Wan.
- Newmark, Peter. (1988). *A Textbook of Translation, Shanghai Foreign Language Education Press*. Hertfordshire Prentice Hall International (UK) Ltd. London & New York.
- (1981). *Approaches to Translation*. Hemel Hempstead: Prentice Hall.
- (1997). "The Customer as King". *Current Issues in Language and Society* 4 (1) <https://doi.org/10.1080/13520529709615482>.
(d.x.: 04.12.2023).
- Nida, Eugene. (1976). "A Framework for the Analysis and Evaluation of Theories of Translation". in Richard W. Brislin (ed.) *Translation, Application and Research*. New York: Gardner Press. pp. 47-91.
- Nida, Eugene, Taber, Charles R. (1982). *The Theory and Practice of Translation*. Published for the United Bible Societies by E. J. Brill. Leiden, the Netherlands.
- (1964). *Toward a Science of Translating*. E. J. Brill. Leiden, the Netherlands

- Nord, Christiane. (1991). *Text Analysis in Translation, Theory Methodology, and Didactic Application of a Model for Translation-Oriented Text Analysis*, Amsterdamer Publikationen zur Sprache und Literatur.
- (1997). *Translating as a Purposeful Activity, Functionalist Approaches Explained*. St Jerome Publishing. Manchester, UK & Kinderhook (NY), USA.
- (2011). "Manipulation and Loyalty in Functional Translation". *Current Writing: Text and Reception in Southern Africa*. 14:2, 32-44, DOI:10.1080/1013929X.2002.9678123.
- Nûbihar. (1992-2024). *Kovara Çandî Hunerî Edebî*, Hejmar: 2-7-9-18-20-21-22-24-66-67-90-97-98-102-104-107.
- Nûdem. (1992-2001). *Kovara Hunerî, Edebî û Çandî*. Hejmar: 2-3-5-6-9-16, Swêd.
- Nûdem Werger. (1996). *Kovara Wergerê*. Hejmar 1. Swêd.
- O. Henry. (1995). *100 Selected Stories of O. Henry*. Wordsworth Classics. Hertfordshire.
- (2013). *Diyariya Sersalê*. Wer.: Sîdar Jîr. Weşanên Lîs. Amed.
- Omar, Feryad Fazil. (1993). *Dengî Şî're namoyek - Stimme eines fremden Gedichts, Kurdische Lyrik*. VWB-Verlag für Wissenschaft und Bildung. Berlin.
- Omer, Hêmin A. (2022). *Durrû'l Mecalîs, Mela Mûsayê Hekarî (Komek Çîrokên Ewil Di Dîroka Pexşana Kurmancî -Wergeranê Da 1857*. Weşanxaneyê Peywend. Wan.
- Orwell, George. (1977). *Animal Farm*. Oxford University Press. London.
- (2015). *Çewlika Heywanan*. Wer.: Salih Agir Qoserî. Weşanên Lîs. Amed.
- Öpengin, Ergin. (2011). "Bizava Wergerê di Kurmanciyê de", *In Proceedings of first international conference on Kurdish Literature*, xxx. Sanandaj. University of Kurdistan Press, 4.

- Özdaş, Haşim. (2016). "Kürtçe Meal-Tefsir Gelişim Süreci (Kurmanci Örneği)". *e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*. Nisan 2016. Cilt:8 Sayı:1 (15). s. 340-357.
- Özgürlük Yolu. (1975-1977). Aylık Siyasi Dergi. Sayı 7, 8 (1975), 25, 26, 27 (1977). Ankara.
- Öztürk, Mustafa. (2018). "Çîrokên Werger Ên Mela Mehmûdê Bazidî (1797-1870)". *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*. Yıl: 4, Cilt: 4, Sayı: 8, 2018/2, ss.33-63.
- Palumbo, Giuseppe. (2009). *Key Terms in Translation Studies*. Continuum International Publishing. London & New York.
- Pîrbal, Ferhad. (1995). "Şêzad Hesên". *Antolojiya Edebiyata Kurdî*. Mehemed Uzun. Cild 2. Tüzmamanlar Yayıncılık. İstanbul, s. 296-297.
- (2002). *Mêjûy Wergêranî Kurdî*. Çapxaney Wezaretî Perwerde. Hewlêr.
- Popoviç, Anton. (1987). *Yazın Çevirisi Terimleri Sözlüğü (Dictionary for the Analysis of Literary Translation, 1976)*. Çev.; Suat Karantay, Yurdanur Salman. Metis Yayınları. İstanbul.
- Pfordresher, John; Veidemanis V. Gladys; McDonnel, Helen. (1989). *England in Literature*. America Reads Classic Edition. Scott Foresman Edition. USA.
- Pym, Anthony. (2010). *Exploring Translation Theories*. Routledge. London & New York.
- Qasim, H. Ebdulqadir; Receb, Î. Silêman. (2018). "Stratîjîyeta Wergêrana Îdiyoman Di Navbera Zimanê Kurdî û Farsî". *Govara Zankoya Duhok*, Perbenda: 21, Jimare: 2. 2018. rr. 6-15.
- Reynolds, Kimberly. (2011). *Children's Literature, A Very Short Introduction*. Oxford University Press.
- Rêbiwar, Dawud. (2009). "Di pêşketina ziman, çand û ramanê de rola wergerê". *Tîroj*. Hejmar 40. rr. 28-30.

- Riffaterre, Michael. (1992). "Transposing Presuppositions on the Semitics of Literary Translation". *Theories of Translation, An Anthology of Essays from Dreyden to Derrida*. Ed.: Rainer Schulte and John Biguenet. The University of Chicago Press. Chicago and London. pp. 204-217.
- Robinson, Fiona; Smith-Laing, Tim. (2017). *An Analysis of Virginia Woolf's A Room of One's Own*. Macat Library. Routledge. London.
- Roj, Cîhan. (2009). "Çeviri, dilin sınırlarını genişletir". *Kovara Tîroj*. Hejmar 40. r. 35.
- Ronahî. (1942-1945). *Pêveka kovara Hawarê*. Hejmar: 15-19.
- Orwell, George. (2016). *1984*. Wer.: Salih Agir Qoserî. Weşanên Lîs.
- Sanders, Hollis, (2019), "Why did Shakespeare write sonnet poetry?", edited by eNotes Editorial, 12 Sep. 2019 (<https://www.enotes.com/topics/william-shakespeare>. (d.x.: 14.02.2024).
- Sayım, İlyas. (2024). *Yekemîn Încîla Kurdî bi Alfabe ya Ermenî Transkrîpsîyon û Lêkolîn*. Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanê Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî. (Teza Doktorayê ya Neçapkirî).
- Schleiermacher, Friedrich. (1992). "On the Different Methods of Translating". *Theories of Translation, An Anthology of Essays from Dreyden to Derrida*, Ed.: Rainer Schulte and John Biguenet. The University of Chicago Press. Chicago and London, pp. 36-54.
- Seleskovich, Danica, Lederer, Mariann. ([1984] 1993). *Interpréter Pour Traduire*. Didier érudition, Paris.
- Serdar, Emerîkê. (2011). *Berhevoka Gotar, Hevpeyvîn û Pêşgotinê Pirtûka*. Neşireta VMV-PRÎNT. Yêrêvan.
- Serfiraz, Mesut. (2014). "Di Çapemeniya Kurdî ya Dewra Osmanî de Wergera Wêjeyî". *Wêje û Rexne*. rr. 57-58.
- Scalbert Yücel, Clemence. (2018). *Kürt Edebiyatının Anatomisi*. Ayrıntı Yayınları. İstanbul.

- Scofield, Martin. (2006). *The Cambridge Introduction to the American Short Story*. Cambridge University Press. UK.
- Shakespeare, William. (2002). *The Complete Sonnets and Poems*. Oxford University Press London & New York.
- . (2010). *Hemû Soneyên William Shakespeare- The Complete Sonnets of William Shakespeare*. Amadekar & Wergêr: Kawa Nemir. Weşanên Lîs. Amed.
- . (2021). *Macbeth*. Wer.: Kawa Nemir. Weşanxaneyê Avesta. Stenbol.
- Shi, Aiwei. (2012). "Translatability and Poetic Translation". <https://www.translatum.gr/journal/5/translatability-and-poetic-translation.htm> (d.x. 25.02.2021).
- Shuttleworth, Mark. (2014). *Dictionary of Translation Studies*. Routledge. London & New York.
- Smith, Emma. (1970). *Macbeth: Language & Writing*. Bloomsbury. UK & USA.
- SparkNotes Guide to A Room of One's Own, Virginia Woolf*. (2014). Spark Publishing. New York
- Steiner, George. (2004). "Homer in English translation". In R. Fowler (ed.) *The Cambridge Companion to Homer*. Cambridge University Press, Cambridge. pp. 363-75.
- Şanlı, Esat. (2022). "The Potentials and Challenges of Zazaki Translation for Language Revitalisation. *Kurdish Studies*. Volume: 10, No: 2, pp. 103-119.
- Şêxo, Ebdilah. (2020). "Pêdivîya Rojava bi hezaran wergêran û bi dehan sazîyên çalak ên wergerê û bipêşvebirina zimanê Kurdî heye". *Kovara Şermola*. Hevpeyvîner: Aram Hesên. Hejmar 8. rr. 40-43.
- Sutton, William A. (1976). *Newdick's Season of Frost -An Interrupted Biography of Robert Frost*. MW Books. State University of New York Press. Albany.

- Tabularasa. (2012). Kovara Wergerê. Lewhe 1 (hejmar: 3). Rêbendan 2012. Flitto Weşan. Stenbol.
- Taha, Segvan Ebdulrehman. (2006). *Wegera Edebî û Bizava Vê li Devera Bahdînan*. Dezgehê Nalbend Yê Çap û Weşanê. Hewlêr.
- Taştan, Yusuf. (2019). *Dîroka Wergerê û Xebatên Wegera Kurdî*. Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Enstîtuya Zimanên Zindî. (Teza Masterê ya Neçapkirî).
- Tearle, Oliver. (2022). *A Summary and Analysis of Virginia Woolf's A Room of One's Own*. <https://interestingliterature.com/2022/02/woolf-room-of-ones-own-summary-analysis/> (d.x. 20.10.2023).
- Theado, Matt. (2000). *Understanding Jack Kerouac*. University of South Carolina Press. USA.
- Tîrêj. (1979). *Kovara Çandî û Pîşeyî*, Hejmar 1.
- Toury, Gideon. (1995). *Descriptive Translation Studies and Beyond*. John Benjamins Publishing Company. Amsterdam/Philadelphia.
- Tumanyan, Hovhannes. (2012 [1932]). *Gîkor*. Wer.: Heciyê Cindî û Emînê Evdal. Înstîtûta Kurdzanîyê. Wien.
- Url 1. (d.t.). "Kurdish text&literature". <https://www.lexilogos.com/kurdish-texts&literature>. (d.x. 10.01.2024).
- Url 2. (2007). "*Man frage nicht -Gerek kes nepirse-*". www.amude.net 2007. (d.x. 05.10.2023).
- Url 3. (2008). "*Ich glaub nicht an den Himmel -Baweriya min bi ezmên nayê-*". amude.net 2008. (d.x. 05.10.2023).
- Url 4. (2008). "*Şewitandina Pirtûkan - Die Bücherverbrennung*". amude.net 2008. (d.x. 05.10.2023).
- Url 5. (2007). *Wilo werdigerînim; wilo dixapînim; wilo heme!*, Sîrwan H. Berko, amude.net 2007. (d.x. 12.12.2024).
- Url 6. (2018). "Projeya Wergerê ya 1001 Pirtûkan", <https://www.diyarname.com/news>. (d.x. 15.09.2025).

- Uzun, Mehmed. (1995). *Antolojiya Edebiyata Kurdî, Cild 2*. Tüzmamanlar Yayıncılık. İstanbul.
- Vanderauwera, Ria. (2014). "The Response to Translated Literature". *The Manipulation of the Literature*. Routledge. New York.
- Varol, Murat. (2015). "Zazaca Yazılan Eserlere Dair Bir Bibliyografya (1899-2014)". *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*. Yıl: 1, Cilt: 1, Sayı: 1, Ocak 2015, ss. 39-54.
- Vendler, Helen. (1999). *The Art of Shakespeare's Sonnets*. The Belknap Press of Harvard University Press. USA.
- Venuti, Lawrence. ([1995] 2008). *The Translator's Invisibility: A History of Translation*. Routledge. London & New York.
- Vermeer J. Hans; Reiss, Katharina. (2014). *Towards a General Theory of Translational Action- Skopos Theory Explained*. Translated by C. Nord. Routledge. London & New York.
- Wechsler, Robert. (1998). *Performing Without a Stage -The Art of Literary Translation*. Catbird Press.
- Williams, Jenny; Chesterman, Andrew. (2002). *The Map, A Beginner's Guide to Doing Research in Translation Studies*. St JEROME Publishing. Manchester, UK.
- Wikander, Stig. (1959). *Recueil de textes kourmandji*. Almquist & Wiksells, Boktryckeri Aktiebolag. Uppsala.
- Windle, Kevin; Pym, Anthony. (2012). "European Thinking on Secular Translation". *The Oxford Handbook of Translation Studies*. Ed.: Kirsten Malmkjær and Kevin Windle. Oxford University Press.
- Windle, Kevin. (2011). "The Translation of Drama". *The Oxford Handbook of Translation Studies*. Ed.: Kirsten Malmkjær and Kevin Windle. Oxford University Press.
- Woodstein, B. J. (2022). *Translation and Genre*. Cambridge University Press. UK.

- Woolf, Virginia. (1977). *A Room Of One's Own*. Grafton Harper Collins Publishers. London.
- (2021). *Odeyek Ji Bo Xwe*, Weşanên Avesta, Stenbol.
- Yazıcı, Mine. (2005). *Çeviribilim Temel Kavram ve Kuramları*. Multilingual Yayınları. İstanbul.
- Yıldırım, Kadri. (2013). "Kürtlerin İslam Öncesi Alfabe Serüveni". *Kürt Tarihi* (5). 28.
- Yıldırımçakar, Ziyattîn. (2021). *Weger Wek Kirineke Çandî: li ser rêyên ji wergernasiyê ber bi kurdolojiyê ve*. Weşanên Peywend. Wan.
- Yıldız, Ayhan. (2020). "Tevgera Wegera Kurmancî li Sûrî û Tirkîyeyê". *Nûbihar Akademî*, Jimar 13, Sal 7, 2020, 115-137.
- Young, Barbara. (1945). *This Man From Lebanon, A Study of Kahlil Gibran*. Alfred A. Knopf Inc. Canada.
- Yücel, Faruk. (2007). *Tarihsel ve Kuramsal Açıdan Çeviri Edimi*. Dost Yayınevi. Ankara.
- Zeraq, Dilawer. (2009). "Em Werdigerînin an Werdigerin?" *Tîroj*. Hejmar 40. rr. 33-34.
- (2022). *Rengê Hebûnê*. Weşanên Lîs. Amed.